


CIGERXWÎN



TARÎXA
KURDISTAN
2

EFRANDÎNÊN CİGERXWÎN YÊN HETA NIHA ÇAPKIRÎ

1. Dîwana yekem, Pirîsk û Pêtî, Sûriye 1945
2. Cîm û Gulperî, Çîroka Yekem, Sûriye 1948
3. Dîwana Duwem, Sewra Azadî, Sûriye 1954
4. Reşoyê Darê, Çîroka Duwem, Sûriye 1956
5. Gotinên Pêşîyan, Sûriye 1957
6. Destûra Zimanê Kurdî, Îraq 1961
7. Ferheng, Perçê Yekem, Îraq 1962
8. Ferheng, Perçê Duwem, Îraq 1962
9. Dîwana Sêyem, Kîme Ez, Libnan 1973
10. Mîdya û Salar, Libnan 1973
11. Dîwana Çaran, Ronak, Swêd 1980
12. Dîwana 5'a, Zend Avista, Swêd 1981
13. Dîwana 6'a, Şefaq, Swêd 1982
14. Dîwana 7'a, Hêvî, Swêd 1983
15. Tarîxa Kurdistan (Cîld 1), Swêd 1985
16. Dîwana 8'a, Aşitî, Swêd 1986

WEŞANÊN ROJA NÛ-21

Adress:

Döbelnsgatan 16 B, 2 tr.

113 27 Stockholm / Sweden

ISBN 91 76 72 019 5

© Kesra Cigerxwin

Printed in Sweden

Stockholm 1987

TARÎXA KURDÎSTAN

Cigerxwîn

CÎLD **2**

STOCKHOLM 1987



DEWLETA İSLAMÊ LI HICAZÊ

Di çaxekî de, ko welatê Ereb di nav destûra derebegî, êlperestî de di nav şevreşa talan û berdîberdan de digewizî bi navê Muhamed, kurê Ebdulah mirovekî mezin û bîrewer weke sitêreke geş di nav ezmanê Hicazê de çirisand û çend mirovên mezin weke Ebûbekir, Umer, Osman, Elî, Telha, Zübeyr, Sad Seîd, Ebdurehman xwe dane ber ronahiya vî mirovê mezin û bihev re welatê xwe ji vê şevreşê derxistin û oleke nû digeldestûreke nû anîne meydanê û piştî mirina Muhammed ne tenê welatê xwe kirin yek perçe, belkî jî welatê Rom, Îran û Misir jî xistin bin darê xwe.

1- MUHEMED, KURÊ EBDULAH(PEYXAMBER):

Di bîstê nîsana sala 571 de hate hebûnê û di sala 623 de ji bajarê Mekehê çûye bajarê Medîne û di sala 630 de Mekehê bi zor xiste bin destê xwe û destûra Îslamê li dar xist û di sala 632 de serê xwe daniye.

2- EBUBEKİR, KURÊ QEHAFA(SEDIQ):

Ji sala 632 ta bi sala 634 fermandarî kiriye, di çaxê wî de leşkerê Ereb ji Hicazê derket û dirêjî Sûriye, Iraq û Misrê kirin. Û di sala 634 de serê xwe daniye.

Mirovekî mêr û merd û bîrewer û hozan bû. Serekwezîrê dewleta Muhamed peyxamber bû. Di pişt mirina wî re bû padîşah û serdarê leşker û çavên xwe berdane firehkirina Împeratoriya Îslamê û yekîtiya millet û welatê Ereb.

3- UMER, KURÊ XETTAB:

Ji sala 634 ta bi sala 644 fermandarî kiriye. Serdarên leşker guhartin û leşker li pey leşker rêkirin, nav wela -

NAVEROK

Dewleta Îslamê li Hîcazê.....	7
Dewleta Îslamê li Dimişq.....	8
Dewleta Ebbasiya li Bexda.....	10
Dewleta Ebûmislimê Xeresanî, yan Dewleta	
Kurdî ya Pêşî.....	12
Dewleta Deylemî.....	18
Bi kurtî tarîxa Selçûqîya.....	22
Selçûqiyên Qonya.....	25
Dewlet û Femandariya Hezbanî.....	30
Hozanên Hewlêrê.....	37
Femandariya Humeydî.....	40
Cografîya welatê Humaydî.....	47
Femandarên Hemîdî.....	47
Zirzarî.....	49
Mîr Salarê Zirzarî.....	50
Melek Adil kurê Mîr Salarê Zirzarî.....	50
Zirzarî di nav leşkerê Eyyûbî Kurdî de.....	51
Dewleta Ertuqî li Heskîf.....	53
Dewleta Turkmênê Ertuqî li Mardîn.....	56
Femandarî û rewşa eşîra Lor ê mezin(Bextiyarî)...	58
Rewşa Bextiyarî.....	63
Femandariya Çiharleng - Lane.....	65
Femandarê Heftleng.....	66
Lîsta eşîr û bavikên Lorê Biçûk.....	67
Femandariya Hîzan, Mikis, Îspayird.....	69
Femandarê Hîzan.....	69
Femandariya Miksê.....	72
Femandariya Îspayird.....	73
Femandariya Zirikan.....	74
Femandarê Tercîlê.....	75
Femandarê Hetaxê.....	76
Femandariya Derzînê.....	78
Femandariya Kurtika.....	79
Femandariya Millan li Wêran-şehir.....	81
Sûnda pismama.....	83

Xwîkîtî, yan Uxuwe-Biratî.....	83
Îbrahîm Begê Millî.....	84
Eyub Beg, kurê Îbrahîm Beg.....	85
Teymûr Beg.....	85
Mehmûd Beg, kurê Teymûr Beg.....	85
Îbrahîm Beg, kurê Mehmûd, kurê Teymûr.....	86
Şerê Îbrahîm Paşa û Azadîxwazan.....	90
Derebegîya Sason (Xerza).....	92
Fermandariya Mehmûdî.....	99
Fermandarên Kurdistana Îran	
Siyah Mensûr, Çeknî, Zengene, Pazokî.....	104
Fermandariya Siyah Mensûr.....	105
Fermandariya Çeknî.....	108
Fermandariya Zengene.....	108
Fermandariya Eşîra Pazokî.....	109
Fermandariya Silîvan (Farqîn), Qulp û Batman.....	112
Fermandariya Farqîn.....	115
Fermandariya Qulp û Batman.....	116
Fermandariya Farqîn.....	117
Fermandariya Biradost.....	120
Fermandariya Siwêrek (Siweydî).....	124
Fermandariya Bane.....	129
Fermandariya Gelpaxî.....	130
Fermandariya Mirdasî.....	132
Fermandariya Palo (Pehlew).....	135
Fermandariya Çermûk.....	139
Fermandariya Kelhor.....	140
Fermandariya Pilingan.....	140
Fermandariya Derteng.....	141
Fermandariya Mahîdeşt.....	142
Fermandariya Çimişkizik.....	143
Hindama Mecenkurd.....	146
Pertik, Seqmana.....	147
Fermandariya Şêrwan.....	150
Fermandarên Gurnî.....	153
Fermandariya Erûn.....	153
Ji tarîxa navdarên Kurd:	
Huseyn, Husnî Mukriyanî.....	154
Fermandariya Eşîra Mukrî.....	168
Dewleta Erdelan.....	173
Cografiya Erdelan.....	229
Eşîrên Kurdistan.....	230
Çemên navdar.....	230
Mizgeftên Welatê Erdelan.....	233
Bajarên Erdelan.....	233
Hozan û Torevanên Erdelan.....	241

tên sînordaşên(hevsînorên) xwe û bi xurtî leşkerê dijmin şikandin.

Mirovekî Erebî û di şera de gelek hişk bû û ji milliyeta xwe re gelek çavdêr bû û nedixwest Ereb dev ji rewşa xwe ya koçerî berdin û bikevin nav bajara û avaniya û digot : Zarokên xwe hînî siwarî, şûrbazî û avjenî bikin, ji Quran û ristên erebî pêve nedixwest ko tiştêkî dî bixwînin û xercê ji erebên bindest nedîstand û ereb di ser her milletî re didîn. Lê gelek mêr û zana û hişk bû.

4- OSMAN, KURÊ EFFAN Ê EMEWÎ

Ji sala 644 ta bi sala 656 fermandarî kiriye, li ser destê Muhemedê kurê Ebûbekir hate kuştin û Elî, Ebû Talib kete şûna wî. Tenê fermandarên Misr, Îraq, Sûriye ji ber ko mirovên Osman bûn mezinahiya Elî nexwestin û şerê wî kirin û Muawiye kirin padîşa û ji nûve padîşahiya Emewiya ve gerandin meydanê.

5- ELÎ, KURÊ EBÎ TALÎB:

Mirovekî pêzan û xwendewar bû, wî destûra zimanê Erebî daniye. Lê di meydana rêzanî, siyasî de ne weke meydana xwendewarî bû. Mêrekî navdar bû, gelek dibiwara wî de pesnê mêraniya wî gotine, pismam û zavayê Muhemed peyxamber bû, Fatima, keça Muhemed jina wî bû. Hesên û Huseyn ji Fatima bûn. Jina Hesên jehr dayê û Huseyn bi destê Emewiyan hate kuştin.

Elî bi destê veşartiyekî hate kuştin û bi kuştina wî fermandarî(padîşahî) ji Hicazê derket û kete Şam-Dimîşq.

DEWLETA İSLAMÊ LI DIMİŞQ

1- MUAWIYE, KURÊ EBÛSUFYAN:

Ji sala 661 ta bi sala 680 fermandarî kiriye, serpêhati yê wî digel Elî navdarin.

Ev Muawiye nivisvanê Muhemed peyxamber bû û di çaxê Osman de bû walî, fermandarê Dimîşq û Cizîr û Azerbaycan . Kurdistan jî ketin bin destê wî, Muhemed kurê Merwanê Emewî ji ber we fermandarê van hindaman bû û Umer kurê Asê Emewî fermandarê welatê Misrê bû.

Çawa Osman hate kuştin van fermanbaran Miawiye kirin pa dîşah û bihev re şerê Cemhuriyeta Hicazê dikirin û dawî zo ra Elî birin û çawa Elî hate kuştin Muawiye xwe eşkera kir û bû padîşah û zariwên Elî dane kuştin.

Daxwaza Emewiyan vejandina padîşahiya kevnare bû, Lê İslam ji xwe re dikirin Nerdewan û bi navê islamê xwe berjêr

dibirin. Lê hevalbendên Elî derwêş bûn û ev tişt nizani -
bûn.

2- YEZÎD, KURÊ MUAWIYE:

Ji sala 680 ta bi sala 683 fermandarî kiriye. Di çaxê wî de Huseynê kurê Elî û bi zar û zêçên xwe ve hatin kuş -
tin û pêzanê Îslamê di biwara vî mirovî de bûne du perçe .
Hin dijûnên nebak jê re dibêjin û hin dibêjin gereke em
xwe têkeli vî mirovî nekin.

Mela Xelîlê Sêrtî dibêjî: Yezîdê mirî lanetê lê meke

Xebîse, pelîde xwe têkel meke.

Lê şêx Ebdurehmanê Axtepi dibêjî: Sed hezar lanet miqat

Şibhê barana şedîd

Her zeman ev layenqetî ê
bî

Ew li ser rehê yezîd

Her wekû kurd ji kevnara de bûne du perçe; Yezîdî û Hu-
seynî û bi sed hezaran li ser vê dubendiyê mêr ji hev kuş-
tine.

Lê bi rastî gelek tarîxzan dibêjin ev yezîdiyên kurd
yezdî ne, ne ko Yezîdîne, Zardeştîne, ne ko hevalbendê yezî-
dê kurê Muawiye ne. Tenê hin jî dibêjin, ko li ser oîa Îs-
lamê ne, yezîdî ne, ne Zardeştî ne.

3- MIAWIYE, KURÊ YEZÎD:

Di sala 64 koçî de bûye fermandar, lê ji ber ko nexweş
bû siparte Merwan, kurê Hekem ê Emewî û li mala xwe rûnişt.

4- MERWAN, KURÊ HEKEM:

Ji sala 64(683) destpêkir û heta sala 65(685) maye.

5- EBDULMELÎK, KURÊ MERWAN:

Ji sala 65(685) ta bi sala 86(705) fermandarî kiriye.

6- WELÎD, KURÊ EBDULMELÎK:

Ji sala 86(705) ta bi sala 96(715) fermandarî kiriye.

7- SULEYMAN, KURÊ EBDULMELÎK:

Ji sala 96(715) ta bi sala 99(717) fermandarî kiriye.

8- UMER, KURÊ EBDULEZÎZÊ EMEWÎ:

Ji sala 99(717) ta bi sala 101(730) fermandarî kiriye.

9- YEZÎD, KURÊ EBDULMELÎK:

Ji 101(730) ta bi sala 105(724) fermandarî kiriye.

10-HÎŞAM, KURÊ EBDULMELÎK:

Ji sala 105(724) ta bi sala 125(743) fermandarî kiriye.

11-YEZÎD, KURÊ YEZID, KURÊ EBDULMELÎK:

12-YEZÎD, KURÊ WELÎD, KURÊ YEZÎD, KURÊ EBDULMELIK:

13-ÎBRAHÎM, KURÊ WELÎD, KURÊ YEZÎD, KURÊ EBDULMELİK:

Van her sê mirovan ji sala 125(743) ta bi sala 127(745) fermandarî kirine.

14-MERWAN, KURÊ MUHEMED, KURÊ MERWANÊ EMEWÎ:

Ji 127(745) ta bi sala 132(750) fermandarî kiriye. Diya wî keça fermandarekî kurde, ko navê wî Mîr Ehmede. Ev Merwan berî hingî fermandarê Kurdistan, Cizîr, Azerbaycan û li bajarê Heran rûdinişt û ji bavê xwe vegirtibû. Li welatê Misrê hate kuştin û bi kuştina wî padîşahî ji Emewiya derket û kete destê Ebbasiyên û ji Şam derket û kete Bexda yan jî ji destê Ereb derket û kete destê Ecem.

DEWLETA EBBASIYA LI BEXDA

Vê malbatê ji sala 132(750) ta bi sala 656(1258) ferman darî(peyrewî) kirine. Lê heta sala 1517 z. li welatê Misrê mane. Xurtiya wan ji sala 132(750) ta bi sala 247(861) maye.

1- EBDELAHÊ, ŞEFFAH, KURÊ MÎHEMED, KURÊ EBDELAH, KURÊ EB-BAS: Çar sal û heşt mehan maye.

2- EBÛCAFER MENSÛR, KURÊ MÎHEMED: Bîst û yek sal û yazde mehan maye.

3- MÎHDÎ, KURÊ MENSÛR: Deh sal û mehek maye.

4- HADÎ, KURÊ MÎHDÎ: Salek û sê mehan maye.

5- HARÛN, KURÊ MÎHDÎ, KURÊ MENSÛR: Bîst û sê sal û du mehan maye.

6- EMÎN, KURÊ HARÛN: Çar sal û heşt mehan maye.

7- MAMÛN, KURÊ HARÛN: Bîst û du sal maye.

8- MÛTESÎM, KURÊ HARÛN: Heşt sal û heşt mehan maye.

9- WASÎQ, KURÊ MÛTESÎM: Pênc sal û neh mehan maye.

10-MUTEWEKÎL, KURÊ MÛTESÎM: Çarde sal û neh mehan maye.

11-MUNTESÎR, KURÊ MUTEWEKÎL: Şeş mehan maye.

12-MUSTEÎN, KURÊ MÛTESÎM: Sê sal û heşt mehan maye.

13-MÛTEZ, KURÊ MUTEWEKÎL: Sê sal û şeş mehan maye.

14-MUHTEDÎ, KURÊ WASÎQ: Şalek maye.

15-MÛTEMÎD, KURÊ MUTEWEKÎL: Bîst û du sal û yazde mehan ma

ye.

- 16-MÛTEDÎD, KURÊ MUWEFEQ: Deh sal û neh mehan maye.
- 17-MUKTEFÎ, KURÊ MUTEDÎD: Şeş sal û mehek maye.
- 18-MUQTEDÎR, KURÊ MÛTEDÎD: Çar mehan maye.
- 19-EBDULAH, KURÊ MÛTEZ: Heşt mehan maye.
- 20-QAHÎR, KURÊ MÛTEDÎD: Bîst û çar sal maye.
- 21-MUQTEDÎR, KURÊ MÛTEDÎD: Salek û şeş mehan maye.
- 22-QAHÎR, KURÊ MÛTEDÎD(cara diwem): Şeş sal û deh mehan ma
ye.
- 23-RADÎ, KURÊ MUQTEDÎR: Şeş sal û deh mehan maye.
- 24-MUQTEFÎ, KURÊ MUQTEDÎR: Sê sal û yazde mehan maye.
- 25-MUSTEKFÎ, KURÊ MUKTEFÎ: Salek û çar mehan maye.
- 26-MUTÎ-Ê, KURÊ MUQTEDÎR: Bîst û neh sal û çar mehan maye.
- 27-TA-Î-Ê, KURÊ MUTÎ-Ê: Hivde sal û neh mehan maye.
- 28-ÎSHAQ, KURÊ MUQTEDÎR: Çil û yek sal û sê mehan maye
- 29-QA-ÎM, KURÊ QADÎR: Çil û çar sal û heşt mehan maye.
- 30-MUQTEDÎ, KURÊ ZEXÎRE: Bîst û pênc sal û sê mehan maye.
- 31-MUSTEZHÎR, KURÊ QAÎM: Hivde sal û şeş mehan maye.
- 32-MÛSTERŞÎD, KURÊ MUSTEZHÎR: Salek maye.
- 33-RAŞÎD, KURÊ MUSTERŞÎD Salek maye.
- 34-MUQTEFÎ, KURÊ MUSTEZHÎR: Bîst û çar sal û sê meha maye.
- 35-MUSTENCÎD, KURÊ MUQTEFÎ: Yazde sal û mehek maye.
- 36-MUSTEDÎ, KURÊ MUSTENCÎD: Deh sal maye.
- 37-NASÎR, KURÊ MUSTEDÎ: Çil û şeş sal û deh meha maye.
- 38-ZAHÎR, KURÊ NASÎR: neh meha maye.
- 39-MUSTENSÎR, KURÊ ZAHÎR: Hivde sala maye.
- 40-MUSTASÎM, KURÊ MUSTENSÎR: Pazde sal û heft meha maye.

Ev hemî Ebbasiyên, ko li Bexdayê padîşahî û peyrewî kirine. Lê nêzîkî 140 salî bi padîşahî mane û paşê bi peyrewî qedandine. Mala Biweyhê Deylemî padîşahî ji xwe re ji wan sitandine.

Li Swêd min di nivîşteke tarîxê de diye, dibêjî mala Biweyhê Deylemî kurdin.

DEWLETA EBÛMİSLİMÊ XERESANÎ YAN DEWLETA KURDÎ YA PÊŞÎ

Navê wî Ebdurrehman, kurê Mislime, ji xelkê Azerbaycanê ye, ji Êla Rawendî ye, ko bi xwe jî mezinê Êl û eşîrên kur distanê ye û ji mirovên mezin weke Silahidîn û Merziban û Neysem û Ebûmislim ji xwe deranîne.

Major Rawlensen dibêjî: Pirê xelkê hindama Rewandiz ji eşîra Rawendî ne û hejmara xelkê vê eşîrê diwazde(12) hezar mirovin û hindama Sîdikan, ko di kevîçiyê çil gundên wê hene û hejmara xelkê van gundan nêzîkî hezar(1000) malî ye û bi xwe ji eşîra Rewandik têne jimartin. Pîresorî, Balekî, Rîsorî, Şerwanî pênc bavikin. Majorê navdar pêde diçî û dibêjî; ji van eşîrên vê hindamê tevan mezintir Balek ji ber ko hejmara wan deh hezar male û cihê wan hindameke çiya, dijwar û asê ye. Dikevî pişt çiyayê Qendîl û di sîno rên Sora bi zor xistibûn bindestê xwe, lê piştî herivandina derebegiya Soran ev eşîr ser bi xwe na û mezinê wê di îro de Ezîz Bege.

Major Rawlensen, pêde diçî û dibêjî; ev eşîra Rawendî diwazde perçene. Mamgurd, Mamsal, Mamsîl, Mamxal, Mambal, Mamlîs, Mameyîl, Memkal, Mamiskî, Mamsam, Pêrbal, û Gelo, û hin eşîrên dîjî têkelî wan bûne. Weke, Şêxab, Malyas, Nûrik, Hinarey, Xêlanî, Kasan, Şêx Mehmûdî, Bamamî, Dirêjîkî Sêkeyî, Herîrî, Şîkelî, Mendikî, Pirhacî, Bamar.

Ebû Mislîm, li cem Îsa û Idrîs herdû kurên Meqel, ko fermandarê Ristaq-Faiq bûn, ko dikevî hindama Kurdistana Azerbaycan, mezin û xwedî bûye û di nav zariwên wan de mezin bûye û xwendîye û mirovekî hozan û jîr û gernas jê derketiye.

Ev Îsa û Idrîs Fermandarê Ristaq-Faiq bûn û deynê dewletê li ser milên wan giran bûbûn û hew karibûn bidin û Xalid, kurê Ebdulahê Qisrî walî û fermandarê Îraqê ji ber Emewîyan ve li Kûfa rûniştî bû û doza salyana dewletê li wan dikir û serkarekî wî li Esfehnan hebû, ko ji Xalid re şand û got:

Îsa û Idrîs, salyanê xwe nadin û Xalid mirovek ji cem xwe rêkir û ji Azerbaycanê herdû bira girtin û li Kûfa xistin zindanê, lê berî bêne girtin Ebû Mislîm şandibûn Ristaq-Faiq, ko salyana gundiyan bicivînî û ji wan re bînî, ko bidin serkarê Xalid.

Lê çawa Îsa û Idrîs hatin girtin Ebû Mislîm ew perên ko dabûn hev bi xwe re birin û çû cem wan û li nev eşîra Benî icil rûnişt û carcaran diçû cem wan û hin pere didane wan.

Herwekû Asim, kurê Yûnisê İclî berî wan ketibû zindanê û bi xwe jî hevalbendê Mihemed, kurê Elî, kurê Ebdulah, kurê Ebbas bû û dixwest Mihemed bikin peyrew. Lê çawa tê xuyakirin Îsa û birayê xwe jî ji hevalbendê Mihemed bûn û dijminahiya Emewîyan dikirin.

Rojekê çend hevalbendê Mihemed ji Xerasan dihatin û li Kûfa çûne zindanê ko Asim û Îsa û Idrîs bibênin û di wê çaxê de Ebû Mislîm li zindanê li cem Asim û Îsa û Idrîs rûniştî bû û çawa mêvana jîrekî û hozaniya Ebû Mislîm dîtin xwestin, ko wî jî bikin hevalbendê xwe û di zindanê de Ebdurehman, Ebû Mislîm bû hevalê wan û ew bi xwe re birin cem Mihemed û gelek pê dilxweş bû û li cem xwe hişt û rojekê xelkê Xerasanê mirovekî gernas û zana ji Mihemed xwestin û Ebû Mislîm da wan û bi wan re çû Xerasanê bû serkarê hevalbendê Mihemed.

Di sala 129 de Ebû Mislîm xwe li bajarê Merwe eşkere kir û li ber Emewîyan rabû û doza fermandarî û padîşahî kir û serê xwe hilda û bi mêranî êriş kire leşkerê Emewîyan.

Ji rexê Merwanê, kurê Mihemedê kurê Merwanê Emewî ve Nesir, kurê Seyyarê Leysî fermandarê Xerasan bû û dijminê Merwan ji hawîr ve serê xwe hildabûn û leşkerê Merwan li Cizîrê bi dijmin ve mabû.

Ji lawra Ebdurehman Ebûmislîm zû berepêş gavên xwe avêtin û zora dijminê xwe bir û Nesir ji ber bazda û li Sawe, hêla Hemedan û di sala 131 de serê xwe danî û di sala 132

de Ebû Mislîm, kurê Kermanî li bajarê Nîabûr-Nûsabûr girt
û xiste zindanê û dawî kuşt û bû padîşahê Xerasanê.

Di wê çaxê de Mihemed serê xwe danîbû û Ebdulah kurê Mi
hemed xwe veşartibû, lê Ebû Mislîm di welatê xwe de xutbê
li ser navê wî da xwendin û leşkerekî giran bi xwe re hila
nî û hate ser Merwan û Ebdulah hê ji nû xwe li Kûfa eşkera
kir û Ebû Mislîm ew kire peyrewê Îslamê û leşkerê xwe bi
serdariya Ebdulah, kurê Elî, apê Ebdulah kurê Mihemed şan-
de ser Emewîyan û li ser çemê Zab, li Keşaf li hev rasha
tin û Xerasaniya zora Şamiyan birin û Merwan reviya û çû
Şam, Tenê leşkerê Xerasan da ser şopa wî û nehiştin ko li
Şam cî bigrî û li welatê Misrê, li gundê Bûseyr-Feyum Mer-
wan kuştin û bi carek Emewî ji meydanê winda bûn û meydan
ji Ebbasiyan re vala ma. Tenê mirovê me Ebû Mislîm gelek
ji ser xwe çû û kes diser xwe re nedî û neditirsiya, ko
hin hene dikarin wî ji meydanê bavêjin û serê wî biperçiqê
nin. Herdem di civatan de ev rista jêrî ji xelkê re digot:

Bi xurtî û bi dizî gihame
Cîkî ko padîşahên Merwanî-Emewî
Nîkaribûn bi leşkerên xwe bighênê

Min dixwest wan biherivênim
Lê ew di xew de razabûn, bêhay bûn

Ta wekû bi şûr min li serê wan da
Bi xwe şiyar bûn ji xewa ko hêj
Berî wan kes tê de raneza bû

Ew kesê pezê xwe li hindameke bi şêr
Biçêrênî û razî wê şêr bibin Şivanê wî pezî.

Bêgomane, ko tenê ev ristik bese ji bo kuştina wî, ji a
lîkî dîve didî zanîn, ko ne mirovekî gelek zana bû, tenê
tê xuyakirin, ko gelek gernas û mêr bû û ji kesî paxav ne-
dikir

Lê ji ber ko em ne di çaxê wî de ne, nikarin baş rewşa
wî û çax û demên wî nasbikin. Gelek diriste ko baweriya wî
ya olperestî ew xapandibî û xwe bi carek sipardibî mala Eb
bas û ne dihate bîra wî ko wê rojekê wî bikujin, ji ber ko
gelek qencî ji wan re kirin û dewleta wan bû her wekû miro
vekî gelek bi tirs û saw bû herkesî nîkaribû dijminahiya
wî bikî.

Lê eger wilo bawer kiribî jî ev yek ji kêmasiyên wîne ,

ko li bextê mirovê mezin ewle bûye, lê her wekû mirov ba la xwe didî ristika wî mirov dizanî ko gelek ji ser xwe çû bû û paxav ji kesî ne dikirin.

Di çaxê Sefah de Ebû Mislîm her tişt bû, tenê navê peyrewî ji Ebdulah re bû û dewlet û welat bi carek di destê wî de bû û welatê Îslamê bi carek ji dijminê Ebbasiya paqij kirbû û kesî ko karibî lep hilênî li meydanê ne

Le çawa di sala 136 de Ebdulah li Kûfa serê xwe danî û birayê wî Ebû Cafer Mensûr kete şûna wî, çavên xwe berdane kuştina wî û tirsê Ebû Mislîm di dilê wî de cîkî mezin gir tibû. Jiber:

1- Doza Ebbasîtiyê dikir û digot: Ez ji zariwên Selîtê kurê Ebdulahê kurê Ebbasîm.

2- Herwekû çavên xwe berdabûn ko xuşkaka Mihemed, Asya me-liyetika Ebû Cafer Mensûr mar bikî û bivî rengî karibî doza peyrewî bikî.

3- Çawa ko di serê nivîsarên xwe de navê xwe berî navê Sefah û Mensûr datanî.

4- Lê ya mezin ewe ko wî apê Mensûr, Ebdulah kurê Elî kuştibû, ji ber van hemiwan Mensûr çavên xwe berdane kuştina wî û rojekê Mensûr hate eywana Kesra û şande cem Ebû Mislîm ko dixwazim te bibênim û sed mirovên di çeka de rapêçayî gernas di çend odan de vaşartibûn ko kengî destê xwe li hev bidî derkevin û bê yefş wî bidin ber xencera û bikujin.

Çawa Ebû Mislîm kete hindirû Mensûr şûrê wî jê xwest û got: Dixwazim li şûrê te binêrim, lê çawa şûrê xwe da destê wî Mensûr dest bi gazina kir û got: Te Ebdulah bi vî şûrî kuştiye?.

Ebû Mislîm got: Belê ya Emîrilmûminîn, min dijminê te bi vî şûrî kuşt. Mensûr got: Ditirsim ko tu min jî bi vî şûrî bikujî. Ebû Mislîm, nû bixwe şiyar bû ko dixwazî wî bikujî, lê çûbû ji destê wî derketibû. Hew karibû tiştêkî bikî. Ji lewra dixwest ko bi lavav xwe ji nav destê wî derxî. Lê Mensûr yefş nedayê û destê xwe li hev xistin û sed peyayên bi çek derketin û bi xencera dirêjî Ebû Mislîm kirin û Mensûr nav di wandida û digot, bikujin, bikujin, bikujin.

Dibêjin ko Ebû Mislîm destê Mensûr maçdikirin û digot :

Ya Emîrilmûminîn min ji dijminê xwe re bihêle. Lê Mensûr , jê re got: Kurê pîsê eger kolake reş bûna wêbinavê me ev karê ko te kiriye ji me re bikira ma ne tu bû ko navê xwe berî navê me di serê nivîsara de datanî?

Ma ne tu bû ko dixwest Asya, metika min mar bikî? Ma ne tu bû ko doza Ebbasîtiyê dikir û digot: Ez ji zariwên Selîtm? Bi xwedêkim tu gelek berjor hilkişiyaye.

Lê Ebû Mislîm destê wî maç dikir û digot: Ey mezinê Îslamê min ji dijminê xwe re bihêle. Tenê Mensûr di bersiva wî de got, ma te ji xwe pêve ji min re dijmin hiştine? Xwe de min bikujî eger te nekujim wilo got û destên xwe lihev dan û peyayên wî derketin û dane ber xencera û Mensûr li wan diqîriya û digot: Bikujin, bikujin.

Bi vî rengî ev kurdê gernas hate kuştin û serê wî jêkirin û avêtin nav leşkerê wî ji Êla Rawendîbûn û xwestin ko lephilênin lê Mensûr zêr li nav wan reşandin û got: Peyrewê Îslamê ew kuştiye, kes berê tevnexurcilî û kurdên Rawendî vegeriyan mala xwe û çîrok derbas bû.

Ebû Mislîm Ebdurehman di sala 100 de li gundê Mawît çêbûye û di sala 136 de li Xerasan bûye padîşah û di sala 137 de li Eywana Kesra bi destê Mensûr hatiye kuştin û jîna wî 37 sal û heşt meh bûn û şazde sala padîşahî kiriye û gelek pesnê mezin jêre hatine gotin..

Mamûn gotiye, padîşahên mezin û navdar di cihanê de sê mirovin: 1- Îskender, 2- Erdeşêr, 3- Ebû Mislîm e.

Medainî dibêjî mirovekî kin û gûngenim û şêrîn bû. Çavreş, enîpan û riha wî gelek ciwan û xweşik bû. Lingên wî û laşê wî bilind bû, gelek ristên ciwan û hêja jiber kiribûn. Kesî nediye ko keniyaye û bi kesî re henek nekirine, dengê xwe bilind nedikir, bi Farisî û Erebi baş zanibû. Mirovekî hozan û hişyar bû. Gelek bîrewer bû. Bi xurtî û mêraniya xwe dilxweş nedibû, ji tengasiyê nedixeyidî. Salê carek diçû nivîna jina xwe û digot: Çûna cem jinê dînîtiye ma nebase ji salê carekê mirov xwe dîn bikî.

Lê nedixwest kes jina wî nas bikî yan bibênî û nedihîşt kes herî rexê jina, aliyê malê. Ew hêstira ko jina wî lê siwar kiribûn kuşt û zînê wê şewitand, da weko kes li şûna wê siwar nebî.

Kurê Şebre me dibêjî: Rojekê min jê pirsî û got, xwedê padîşah bi parêzî kî di cihanê de mêrtire gernastire. Di bersiva min de got, di serê pêşî ji serxwebûna miletan de her milet mêr û gernase.

Ne dilbijekê malê dinyayê bû. Gelek dest vekirî û merd bû. Carekê çû hecê û gazîkir û got: Bextê min ne ji wî mirovî re bîko agirê xwarinê bikî û bi carek xwarin û vexwarina hecacê wê salê li ser xwe va birî û da wan.

Ji Ebdulahê kurê Mubarek pirsîn: Aya Ebû Mislîm başe yan Hecac? Ebdulah li wan vegerand û got: nikarim bêjim ko Ebû Mislîm ji kesî çêtire, lê hecac ji Ebû Mislîm pîstire.

Lê piştî kuştina wî Ebûdelame ristevanê Ebbasiya navê
wî kire Ebûmicrim û bi rist êrîşî wî kiriye:

Ya Ebûmicrim, xwedê qencyên xwe
Naguherî ta wekû kole xwe neguherî
Te dixwest bêbextiyê li Mensûr bikî
Raste bav û kalên te yên kurd bêbextin
Te ez bi kuştinê ditirsandim, lê şerê
Mezin tu di nav lepê xwe de perçiqandî.

Di vê ristê de gelek tişt têne ber çavê mirov:

- 1- Yek jê ewe ko Ebû Mislim kurde.
- 2- Yek jê ewe ko Ebû Mislim çavên xwe berdabûn kuştina Men
sûr.
- 3- Yek jê ewe ko dixwest Ebûdelame jî bikujî.

Lê çawa ji gotinê Mensûr hate xuyakirin ko Ebû Mislim
dixwest xwe bighênî ser Ebbasiya û doza peyrewî bikî û şa-
şiya mezin ji xwe ev bû ko Asya mar bikî û mezinahiya İsla
mê ji xwe re bihêlî.

Çend kurdên mezin û hêja ji bû jina hatin kuştin, yan
dewletê kurd liser destê jina hilweşiyane. Weke, Ebû Mis -
lim, Caferêbermekî, Mala Eyûb, Mala Merwan û dewleta Erde-
lan.

Medain, paytexta Kurdistan û Îran bû. Eywan bi kurdiye.
Mala Sasan kurdin. Ev Medain neh(9) bajar bûn, du bajar ji
wan kurda ava kiribûn û navê wan Kurdabad bû. Her wekû di
îro de jî navê du tarên Bexdayê Kerade ne. Çawa ko Enbar
navekî kurdiye, cihê barxana leşker û malêye li ser çemê
Ferat mala Kesra ava kirine.

16.2.1966

Musa Hesên-Cigerxwîn

DEWLETA DEYLEMÎ

Deylem navekî cografî ye, dikevîî rajorê Qezwîn û welatê Geylan di rajorê Deylem de ye her wekû Mazenderan Tîbristan dikevin rexê rojhilat û di rexê rojava de Azerbaycā ne.

Her wekû navê miletekî kodi vê hindamê de rûniştiye bûye Deylem û gelek mirovên navdar ji vî miletî rabûne û hin jî dibêjin kurdin û dimbilî ne.

1- NASÎRÎDÎN:

Dibêjin ko ev malbat digihêne ser zariwên Elî, kurê Ebîtalib. Di serê pêşî de û di welatê "Deylem" de ev Nasir, bûye padîşah û welatê Mazenderan-Tîbristan jî bi ser welatê xwe ve berdane. Lê gelek nemaye serê xwe daniye.

2- EBÛLHUSEYN, KURÊ NASÎR:

Çawa bavê wî serê xwe danî ew kete şûna bavê xwe û Serxab kurê Wahozan serdarê leşkerê wî bû û vî serxabî gelek şerên xwîndar bi Seîrnesir padîşahê Xerasanê rê kirine û dawî serê xwe daniye û birayê wî yan pismamê wî Makaan, kurê Kalî bû serdarê leşkerê Ebûhuseyn.

3- MERDAWÎC:

Ev Merdawîc ne ji mala Ebûlhuseyne, lê bi zorê bû padîşahê Deylem û leşkerê Ebûhuseyn şikand û Biweyh kurê Fenasro yek ji serdarê wî leşkerê Merdawîc bû û kurê wî Îmadedewle fermandarê Kurdistan bû û li bajarê Kerec rûdinişt lê dawî bû fermandarê Şîraz û li hev rashatinê gelek alîka-

rîpê re kiriye.

Dibêjin ko carekê li ser nivînê xwe paldayî bû û dî ko marek ji jorê xanî di nav beşta ve dikevî qula xwe. Ji tir sa gazî kire hosta û got: Dixwazim niha van beştan rakin û vî marî bikujin. Lê çawa beşt rakirin dîn ko serdabek heye û çar sindoqên tijî zêr diwê serdabê de veşartine. Herwekû rojekê rêkire pey berberê padîşah ko serê wî kur bikî lê çawa berber kete hindirû got: Min mekuje bi xwedêkim çi li cem min heye ezê bêjim û Îmadidewl dengê xwe lê hilda û got: Eger rast bêjî ez te nakujim. Berber lê veğerand û got: Bi berê padîşah ji çar sindoqa pêve li nik min dananî ne û Îmadidewle leşkerê xwe şand û anîn û tijî gewher bûn. Di sala 338-339 de serê xwe daniye û kordûnde çûye. Ji lew ra biraziyê wî Edudidewle, kurê Riknidewle li şûna apê xwe rûnişt.

2- RÎKNÎDEWLE HESEN, KURÊ BÎWEYH, KURÊ FENAXESRO:

Serê pêşî fermandarê bajarê Rey-Taran bû. Herwekû Esfehan, Hemedan, Kurdistan, Îraqa Ecemî jî di bin destê wî de bûn û sê kurên wî hebûn. 1-Edudidewle, 2- Mueydidewle, 3-Fexridewle Elî.

Herwekû Ebûfedil Emîd, wezîrê Riknidewle bû û piştî ko Emîd serê xwe danî kurê wî Ebûfetih Elî kurê Emîd bû wezîr çawa ko Sahib kurê Îbad wezîrê kurê wî Mueydidewle bû û piştî mirina Mueydidewle bû wezîrê kurê wî Fexridewle.

Ev Riknidewle di sala 366 de serê xwe danî û çil û çar salan fermandarî kiriye. Li bajarê Rey-Taran hate veşartin gelek serpêhatiyên wî bi kurd ve girêdayî hene

3- MUZÎDEWLE EHMED, KURÊ BÎWEYH, KURÊ FENAXESRO:

Padîşahê Ehwez û Îraq bû destê çepê û hin ji tiliyên destê rastê li ser destê kurda hatibûn jêkirin.

Dibêjin çawa bû fermandarê Ehwez û Kerman kurdên wan na va jêre rêkirin û gotin, em bixwe naçin dîwanxanên padîşahan. Tenê em bêşa xwe ji wan re rêdikin û di serê pêşîde qîma xwe wilo anî. Lê paşê ji nişkave rojekê bi ser kurdan de girt û kurda berê karê xwe kiribûn û nijde xistibûn rîya wî û çawa hate ser wan ji nişkave ew dane ber şûra û destê wî û hin ji tiliyên wî jêkirin û gelek ji leşkerê wî kuştin û bipaş ve şikandin. Di sala 303 de çêbûye û di sala 334 de bi zor Bexda girtiye û di sala 356 de serê xwe daniye. Bi xwe di çaxê peyrew Mustekfî de bû.

4- ÎZZÎDEWLE BEXTÎYAR, KURÊ MUZÎDEWLE EHMED:

Di sala 356 de bû padîşah û di sala 364 de peyrew Tai'ê keça wî Şahzeman markir.

Ev İzzidewle Bextiyar mirovekî bi hêrz û weş bû, bi qilochê ga digirt û sitiwê wan dişkand. Gelek şer di navbera wî û pismamê wî Edididewle de çêbûn û di sala 367 de hate kuştin û serê wî jêkirin û xistin teştê û li ber Edididewle danîn. Desmala xwe da ber çavên xwe û hêstirên xwe malîştin.

5- EDÎDÎDEWLE ALPARSLAN FENAXESRO, KURÊ RÎKNÎDEWLE:

Di sala 338-339 de kete şûna apê xwe İmadidewle Elî, ku rê Biweyh kurê Fenaxesro û bû padîşahê welatê Faris. Lê dî çaxekî hindik de welatê İraq û Kurdistan jî bi ser welatê xwe veberdan û welatê Mûsil û Cizîrê jî xistin bin siya dewleta xwe.

Ev padîşahê pêşîye ko di islamê de navê wî di xutbe û pera de bi padîşah hatiye nivîsandin û xwendin. Di serê pêşî de nevdengê wî Tacilmile bû û Ebûişaqê Sabî ko bixwê ristevan bû navê nivîşt xwe Tacî li ser navê vî padîşahî danîbû. Çawa ko wî bixwe tarîxa mala Biweyh civandiye.

Gelek ristevan û dengbêjan pesnê vî padîşahê mezin dane ji wan Mutenebî û Selamî ne. Çawa kobi xweji ristevan bû. Li Bexda û di sala 372 de serê xwe danî û li Kûfa li nik Elî veşartin. Çil û heft sala sax maye û dînxanak li Bexda avakiriye. Herwekû kunbedeke mezin li ser gorna Elî çêkiriye. Kurd û Kurdistan gelek sergêjî ji destê vî malbatê dîtine û hinjî dibêjin Deylem kurdin. Sê kur jê man. 1- Semsamidewle, 2- Şerefidewle, 3- Bihaidewle.

6- EBÛKALÎCAR SEMSAMÎDEWLE, KURÊ EDÎDÎDEWLE:

Di çaxê wî de Baz Ebûşecca-ê kurê Dostikê Humeydî kurdî û birayê xwe Ebûfewaris Huseyn kurê Dostik bûne mezin û fermandarên Mûsil-Cizîre-Farqîn-Amed-Xelat û Kurdistana rojava bicarek xistin bindestên xwe. Her çiqas Semsamidewle çend caran leşkerê xwe şande ser wan lê zora wan nebîr û herdû bira ji di nav şerde hatin kuştin û xwerziyê wan Ebûelî Hesên, kurê Merwan, kurê Kesra şûna xalê xwe sitand û jina wî ya Deylemî li Heskîfê markir û bû padîşah û li Farqîn rûnişt. Çawa ko di tarîxa wan de bi dirêjahî hatiye gotin.

Tenê Şerefidewle sala 376 Semsamidewle girt û xiste zin danê lê di çaxê Bihaidewle de hate berdan û kurê wî Mueyîdidewle di sala 377 de serê xwe danî û Tai-ê du caran çû serdana wî û Semsamidewle bixwe di sala 388 de serê xwe danî û li Şîrazê hate veşartin û hate kuştin.

7- ŞEREFÎDEWLE EBÛLFEWARIS ŞERZÎL, KURÊ EDÎDÎDEWLE:

Di sala 376 de bû padîşah û birayê xwe Semsamidewle xis

te zindanê û di sala 378-379 de serê xwe danî û Bihaidewle kete şûna wî.

8- BÎHAÎDEWLE XAŞAD, YAN FEYRÛZ, KURÊ EDÎDÎDEWLE

Di sala 379 de bû padîşah û birayê xwe Semsamidewle ji zindanê deranî û rojhilat bi carek xiste binstê xwe û 24 sala padîşahî kiriye û di sala 403 de li Ercan ko bajarekî Kurdîstane serê xwe danî û li Kûfa veşartin.

Kurê wî Ebûmensûr Biweyh di sala 399 de serê xwe danî û Ta-i neçû serdana wî ji lewra Bihaidewle peyrew perçeperçe kir û dawî kuşt.

9- CELALÎDEWLE, KURÊ BÎHAÎDEWLE:

Celalidewle Feyrûz Xesro piştî mirina bavê xwebû padîşah û lî xerasan rûnişt û Sultanidewle bû padîşahê Îraq û li Bexda rûnişt û Ehwez û Ercan û Faris ji ber xweve kurê xwe Ebûkalîcar Merziban kire padîşahê Îraq û kurê xwe Şerefidewle Fenaxesro kire padîşahê welatê Rey-Taran û Esfehan.

Celalidewle di sala 422 de serê xwe danî û kurê wî Ezîzidewle ji Ehwez hat û kete şûna bavê xwe.

10- EZÎZÎDEWLE, KURÊ CELALÎDEWLE:

Piştî mirina bavê xwe bû padîşahê Îraq. Lê piştî çend rojan Fermandarê leşker ko bicarek turk bûn ew avêtin û Ezîzidewle reviya û çû Farqîn û li cem Ehmedşahê kurê Merwan rûnişt û di sala 441 de li Farqîn serê xwe danî û kurek bi navê Melikilezîz jê maye.

11- MUEYDÎDEWLE EBÛKALÎCAR MERZÎBAN, KURÊ SULTANÎDEWLE, KURÊ BÎHAÎDEWLE, KURÊ EDÎDÎDEWLE, KURÊ RÎKNÎDEWLE, KURÊ BÎWEYH, KURÊ FENAXESRO :

Jiber ko serpehatiyên wî bi destê me neketine em nika - rindi dabaşa wî detiştêkî bêjin. Tenê di sala 440 de serê xwe daniye û kurê wî Melikirehîm ketiye şûna wî.

12- MELİKİREHÎM, KURÊ MERZÎBAN:

Di çaxê wîde Tuxrul Şahê Selçuqîdi rojhilatê navîn de serê xwe hilda û dirêjî Iraqê kir û Melikirehîm bidîlî girt û xiste zindanê di keleha Sêrwan de ko yek ji kelehên Kurdistanê ye ew hişt ta wekû di sala 450 de divê kelehê de serê xwe danî û bi mirina wî dewleta Mala Biweyh konê xwe pêça û dawiya vê malbatê hat. 125 sal padîşahî kirine.

14.2.1966
Mûsa Hesên Cigerxwîn

BI KURTÎ TARÎXA SELÇOQIYA

Ji vê malbatê ê ko cara pêşî padîşahî kiriye Ebû Talib Muhemed Tuxrul Şah, kurê Mîkaîl, kurê Selçuq, kurê Deqaqê turke ko berî hingî li Buxara rûniştî bûn.

Êl û eşîrên Selcoqî-Turkî nayêne jimartin û xwe nexisti ne bin darî kesî û serbixwe bûn û di çaxê Mehmûd Şahê Xeznewî de ev Selcoqî hatin Xerasan û du hezar mal ji wan çûne cem Bihaiddewle yê Deylemî kurê Edudidewle kurê Biweyhê Deylemî û li Kerman, welatê Faris rûniştin. Lê piştî mirina wî çûne Esfehan cem Elaiddewle kurê Kako û paşê Ela-i-dewle ew talankirin û gelek ji wan kuştin û bermayê wan hatin Azerbaycan.

Lê piştî mirina Mehmûd Şah careke dî Mesûd Şah kurê Mehmûd ew vegerandin cem xwe û Selçuqîyan mayîn ko di welatê xwe de mabûn bicarek hatin cem Mesûd Şah û di çaxekî hinde bipêşve çûn û li welatê Xerasan nav û deng biwan ketin.

Mesûd Şah di sala 429 koçî de welatê Tûs xiste bindestê wan û Toxrol û Dawid herdû bira bûne mezinê Selcoqîya û paşê welat û hindama Rey Taran jî xistin destê xwe. Nîsabûr biser welatê xwe ve berdan.

Berî hingî xutbe li ser navê Mesûd Şah dihate xwendin . Lê paşê peyrewê Bexda Eliyê Mawerdî şande cem wan û Toxrol Şah anî Bexda û di sala 447 de kire padîşahê Iraq û Toxrol di sala 455 de keça peyrewê Bexda markir û di vê salê bi xwe de Toxrol Şah li bajarê Rey Taran serê xwe danî.

2- EDUDİDEWLE RUKNİDİN ALPARSLAN , KURÊ DAWİD:

Ji ber ko Toxrol Şah kurdûnde çû padîşahî da destê bira zayê xwe Suleyman Şah, kurê Dawid lê Alparslanm û apê xwe Outluk- Qutulmuş padîşahî bizzor sitandin.

Eliberselan, welatê bindestê Selcoqîyan gelek fireh kir û bajarê Heleb ji Mîr Mehmûd kurê Mîr Nesir kurê Mîr Salih kurê Mirdas Kulabî bi haştî sitand û gelek ji Kurdistana jorhilat û rajêr jî xiste bindestê xwe û bêtîr ji dused hezar leşker di bindestê Edudidewle Alparslan de çekdar û li kar bûn û di sala 456 de bi destê Mîr Yusif ê Xwarzemî hate kuştin.

3- QUTÛMUŞ, KURÊ MÎKAİL, KURÊ SELCOQ, KURÊ DEQQAQ:

Şihabidîn Qutulmuş di sala 456 de bi destê birazayê xwe Edudidewle Arslan Şah hate kuştin. Lê kurê wî Suleyman Şah kete şûna bavê xwe û li Kurdistan bû fermanîdar û rûnişt.

4- MELEK ŞAH, KURÊ EDUDİDEWLE ALPARSLAN :

Dema bavê wî hate kuştin ev Melekşah di gel bavê xwe bû lê çawa veşerîya apê wî serê xwe rakirin û doza padîşahî ji xwe re kirin. Lê piştî çend şerên dijwar zora teva bir û apê xwe kuşt û serbixwe bû padîşah.

Celalidewle Melekşah di sala 480 de keça xwe li peyrewê Bexda Muqtedî markir û di 485 de li Bexda serê xwe danî û li Esfehnan hate veşartin û di sala 447 de çêbûye.

5- EBÛŞÛCA-E MİHEMED, KURÊ MELEKŞAH:

Berî ko Melekşah serê xwe deynî welatê xwe li zariwên xwe parve kir. Lê Berkjaruk kurê Melekşah welat bicarek xiste destê xwe û herdû bira Mihemed Şah û Sencer Şah weke du serdaran pêre digeriyan lê dawî navbera wan nexweş ket û Mihemed û Sencer hatin Bexda û peyrew Mustezheh Mihemed Şah kire padîşah û gelek diyarî û perwa dane wan û xutbe li ser navê Mihemed Şah hate xwendin û di sala 492 de bû padîşah.

6- BERKYARUK , KURÊ MELEKŞAH:

Mihemed bû padîşah û leşkerê Berkjaruk gelek berdîberdan dinav welêt de çêkirin û sergêjî di riwê wan de afirandin û xutbe anîn ser navê Berkjarukq û di sala 498 de serê xwe danî.

Lê kurê Ezreq dibêjî: Berkjarukq di sala 493 de serê xwe daniye û Muqtedî peyrewê Bexda. Muqtedî di sala 531 de Fatime, keça Mihemed Şah markir û dibêjin, jineka gelek jîr û zana bû, xwendewar bû.

7- EBELQASİM MEHMÛD ŞAH, KURÊ MÎHEMED ŞAH, KURÊ MELEK ŞAH:

Di sala 512 de xutbe li ser navê wî hate xwendin û di çaxê Mustezhir de bû û du keçên apê xwe Sencer Şah markirine û di çaxê wî de dewlet ber bi newala mirinê ve digindirî û di sala 525 de serê xwe danî û kurê Ezreq dibêjî: Di sala 524 de miriye.

8- TUXRUL ŞAH, KURÊ MÎHEMED ŞAH, KURÊ MELEK ŞAH:

Piştî birayê xwe re bû padîşah lê gelek nema û di sala 527 de serê xwe daniye.

9- EBÛ FETEĤ MESÛD ŞAH, KURÊ MÎHEMED ŞAH, KURÊ MELEK ŞAH:

Di sala 528 de bû padîşah û herdû peyrewên Bexda Muster şid û Raşid li ser destê wî hatin kuştin û di sala 547 de serê xwe danî û li Esfehanê hate veşartin.

10- SENCER ŞAH, KURÊ MELİKŞAH:

Padîşahê Xerasan bû û xezne û maveraunnehîr bin destê wî de bûn û xutbe di welatê islamê de li ser navê wî dihatin xwendin û jêre digotin Ebûlmuzefer, padîşahê mezin, Sencer Şah.

Gelek dewlemend û navdar bû. Hezar û sîh rital gewherên wî hebûn û gelek destvekirî bû. Di sala 552 de serê xwe danî.

1- TACÎDEWLE TUTUŞ, KURÊ EDÎDÎDEWLE ARSLAN ŞAH:

Di sala 471 de bajarê Dimişq ji Atsiz Enerê xwarzemî sitand û bi bêbextî ew kuşt û di sala 478 de bajarê Heleb ji kolê bavê xwe Aksungur, kalikê fermanदारên Mûsil, Atabeg Zengî sitand û bajarê Riha ji destê Mîr Bozan Yazan sitand û ev herdû fermanदार kuştin û hate Nisêbîn û Farqîn û çend mîrekên ereb di gel Mîr Huseynê Merwanî kurdî fermanदारê Cizîrabota kuştin û vegeriya Heran û li wir Muhyidewle kurê Esed, wezîrê Nesridewle Mensûr kurê Nesrûdewle Nizami - dîn kurê Ehmedxan serjêkir.

Ev wezîrê navdar û mezin rîstevan û hezaneke mezin bû û di sala 497 de di şerê Berkjaruk de bi destê kolekî Mîr Bozan ew hate kuştin û du kur Deqqaq, Ridwan bi şûn xwe ve hiştin.

2- DEQQAQ, KURÊ TACÎDEWLE, KURÊ ALPARSLAN :

Şemsidewle Deqqaq, kurê Tacidewle Tutuş kurê Alparslan Şah piştî mirina bavê xwe bû padîşah. Dimişq û Kurdistan Diyarbekir di bindestê wî debûn û bi ser welatê Şam ve berdabûn û Ridwan ji berve di bajarê Heleb de rûniştibû lê Ridwan di sala 507 de serê xwe danî û di sala 497 de Frangan bajarê Entakya jê sitand.

Herwekû Deqqaq di sala 497 de serê xwe danî û diya wî piştî mirina wî kolê mêrê xwe Daxtekîn markir. Lê hin dibêjin vê jinêkê kurê xwe kuştiye, jehr daye û ji wê rojêde ferdandariya Dimişqê-Şamê ji destê Selcoqîyan derket û kete destê kolên wan.

1- ZEHÎRÎDÎN TEXTEKÎN :

Ev malbat ne ji Selcoqîya ye. Lê ji ber ko ji kolê waye û piştî wan ferdandarî li Şam kirine, dixwazim di nav wa de bibêjim.

Ev Zehîridîn Textekîn di sala 497 de û piştî mirina Deqqaq bû padîşahê welatê Şam û jina Tacidewle markir û di sala 522 de li Dimişqê serê xwe danî.

2- TACÎLMÎLÛK BÛRÎ, KURÊ ZEHÎRÎDÎN TEXTEKÎN:

Piştî mirina bavê xwe bû padîşahê Dimişq-Şam û di sala 526 de serê xwe danî û Şemsilmilûk Îsmâil kete şûna wî.

3- ŞEMSÎLMÎLÛK ÎSMÂÎL, KURÊ TACÎLMÎLÛK BÛRÎ:

Piştî mirina bavê xwe bû padîşahê Şam-Dimîşq û bi destê kolê xwe Alteqîş hate kuştin.

4- CEMALÎDÎN MÎHEMED, KURÊ ZEHÎRÎDÎN TEXTEKÎN:

Piştî mirina birazayê xwe bû ferdandar û di sala 534 de serê xwe danî û kurê wî Mucîridîn kete şûna wî.

5- MUCÎRÎDÎN ABAQ, KURÊ CEMALÎDÎN MÎHEMED:

Piştî mirina bavê xwe bû ferdandar û Nûridîn Mehmûd kurê Îmadidîn Zengî ferdandarê Heleb û Cizîrê welatê Şam ji destê wî deranî û di sala 564 de li Bexda serê xwe danî.

SELÇOQIYÊN QONYA

1- QUTU IMUŞ, KURÊ MÎKAÎL, KURÊ SELCOQ, KURÊ DEQQAQ:

Di sala 456 de li ser destê Edudidewle Alparslanın, kurê Dawid, kurê Mîkaîl, kurê Selcoq, kurê Deqqaq di bajarê Rey Taran de hate kuştin û kurê wî Suleyman Şah kete şûna bavê xwe û li Kurdkoh-Kurdistan rûnişt, lê de çaxê Melek Şah de bi leşkerekî giran ve şande ser welatê Rom û Sewas û Qonya girtin û ji wê rojê de ev mal Ferdandar û padîşahê welatê Rome.

2- SULEYMAN ŞAH, KURÊ QUTUIMUŞ :

Me da zanîn ko çawa bûye ferdandarê welatê Rom û di sala 477 de bajarê Entakya ji Frengan sitand û di sala 358

de ketibû bindestê Fereng û ji Ridwan, kurê Tutuş ferman-
rê Heleb hatibû sitandin û di sala 478 de Şerefîdewle Mus-
lim kurê Qureys, kurê Bedranê Uqeylî fermanarê Mûsil li
ser bajarê Heleb kuşt û Heleb jî xistê destê xwe û ev Su-
leyman Şah bixwe di sala 479 de li ser bajarê Heleb bi des-
tê Tacîdewle Tutuş hate kuştin.

3- QİLÎÇARSLAN , KURÊ SULEYMAN ŞAH :

Çawa di sala 497 de Deqqaq, kurê Tacîdewle li Heleb se-
rê xwe danî wezîrê wî Mîr Mihemedê Duweynî ko ji berve li
Farqîn û Amed bû welatê Kurdistan. Farqîn û Amed sipardin
Qilîçarslan û bixwe di wezaretê de ma û Qilîç bixwe hate
Farqîn û fermanarên wa nava bicarek hatin cem û gerdana
xwe jêre xwar kirin û di cihê xwe de rûniştin. İbrahim, ku-
rê Yenal ji Amed û Şêrêsor ji Sêrtê û Segman, kurê Artuk
ji Heskîf û Şahrox ji Hênê û Hisamidîn Gumuçtekîn ji Bed-
lîs, ko bicarek Turkman bûn û teva gerdana xwe jêra xwar
kirin û di wê çaxê de ev fermanarên ha bicarek ji ber Sel-
coqîya ve fermanarê Kurdistana Amed(Diyarbakir) bûn û wi-
zîrê navdar Mîr Mihemedê Duweynî, Mihemedê Ecemî mezinê te-
va bû. Lê Qilîçarslan ev wezîrê kurd bi xwe re bire Me-
letya û bajarê Elbîstanji bo xwarina wî dayê û paşê Qilîç
leşkerekî giran bixwere anî û hate ser bajarê Mûsil û Caw-
lîseqaw fermanarê Mûsil ew şikand û Qilîç di çemê Xabûr
de fetisî û li Farqîn hate veşartin ev serpêhatî di sala
499 de bûye.

4- MESÛD ŞAH, KURÊ QİLÎÇARSLAN :

Di sala 502 de welatê kurd Farqîn û Amed, Xelat, Bedlîs ,
Cizîr bicarek ketin bindestê kolekî Turkman ko navê wî Seg-
manê Qutbî bû û li bajarê Xelat rûnişt û bû Şahermen û di
çaxê wî de Farqîn kete destê Esîridewle Ebûlfitûh û Fexri-
dîn Umer ji Cizîrê anîn û kirin qadiyê Farqîn û Xezexilî
fermandarekî turk kirin dizdal û serdarê leşker. Lê di sa-
la 504 de Segman li ser bajarê Riha serê xwe danî û di sa-
la 508 de welatê Farqîn careke dî û li ser destê Qeraça
fermandarê Mûsil vegeriya bindestê Mihemed Şah, kurê Melek
Şah ê Selcoqî, fermanarê İraq û İnan û Kurdistan û Ciyûş
Beg bû fermanarê Farqîn û ji ber xwe ve Zir Beg di welêt
de hişt û çû Mûsil û di wê çaxê de welatê Farqîn berbi win
dabûnê ve çûbû û welat ji hev perçe bûbû. Bi ser hindamên
dî ve hate berdan. ÛMardîn û Heskîf berepêş gavên xwe ra-
dan. Lê paşê Amed(Diyarbakir) zora teva bir û bû kargeha
welêt.

Di çaxê Mesûd Şah de Seyidkalîcar Elî di sala 538 de hate Farqîn û laşê Qilîçarşan derxist û bire Diyarbekir lê carekê dî vegerande Farqîn.

5- İZİDÎN QİLÎÇ KURÊ MESÛD ŞAH:

Piştî mirina bavê xwe bû padîşahê welatê Rom û Meletya ji kurê Danişmend sitand û kurê Danişmend hate Şam cem Nûridîn Mehmûd û Nûridîn hevî ji İzidîn Qelîç kir ko Meletya li xwediye wê vegerên lê İzidîn guh neda gotina wî û naçare bi leşkerekî giran ve çû ser welatê İzidîn û bajarên Meleş, Merziban, Keysûn xistin bindestê xwe û naçara İzidîn pê re lihevhat û bajarê Sêwas ji ber Meletya ve da kurê Danişmend ev serpêhatî di sala 568 de bû.

Lê piştî mirina Nûridîn Mehmûd Împeratorê kurd Yûsifşah Silahidîn hate welatê Şam û İzidîn dostaniya xwe jêre pêşkêş kir û jêre got: Ko di sala 538 de Nûridîn Mehmûd çend bajarên biçûk ji welatê min xistibûn bindestê xwe û niha dixwazim vegerênim. Lê Yûsif Şah, wezîrê wî tirsand û got: Eger İzidîn ji vê rê venegerî ezê welatê wî bicarek jê bistênim.

Lê İzidîn guh li gotina wî nekir û bîst hezar leşker rê kirin ser wan bajarên û Yûsif Şah birazayê xwe Teqîyidîn Umer, kurê Şehin Şah bi hezar siwarîve şande şerê wî û Teqîyidîn ew bîst hezar leşker bi hezar siwarî şikandin û talanê wan anî û vegeriya.

İzidîn Qilîç, keça xwe dabû fermandarê Heskîf Nûridîn Mihemed, kurê Qere Arslan û Nûridîn ji xwe re jineke dengbêj ji Bexda anîbû ser keça wî û keça wî gilî û gazine xwe pê kirin û İzidîn bi leşkerek ve hate ser welatê wî Amed xiste destê xwe û Nûridîn Mihemed han û hewar ji Yûsif Şah xwest û Yûsif Şah bi leşkerekî giran ve hate hana Nûridîn û xêrxwaz ketin wê navê û lihevanîn û şer nebû û bajar û kelehên Nûridîn lê vegerandin û Nûridîn jinika dengbêj berda.

6- RİKNİDÎN SULEYMAN, KURÊ İZİDÎN QİLÎÇ :

Piştî mirina bavê xwe bû padîşahê welatê Rom û birayê xwe bi du kurên wîve di Ankeraya de kuştin û di çaxê wî de di welatê Efdelşah Kurê Yûsif Şah Silahidîn Şemîşat de xutbe li ser navê Riknidîn da xwendin û di sala 660 de serê xwe danî.

7- İZİDÎN QELÎÇ, KURÊ RİKNİDÎN SULEYMAN :

Piştî mirina bavê xwe bû padîşah. Lê jiber ko gelek zarobû Xiyasidîn Keyxesro kete şûna wî û di sala 661 de bû padîşah!

8- XIYASÎDÎN KEYXESRO, KURÊ ÎZÎDÎN QELIÇ :

Di sala 661 de fermanarî ji birazayê xwe sitand û bû padîşah. Lê dawî ji ber birayê xwe bazda û hate cem Adil Şah, padîşahê kurd, dawî çû cem padîşahê Bizantî û li Qostan tînîye rûnişt. Lê divê tarîxê de zora birayê xwe bir û di sala 605 de bû padîşah.

Herwekû di sala 605 de bi leşkerekî giran ve hate ser bajarê Mereş û dixwest êrîşî welatê Ermen bikî, lê Zahir Şah, kurê Yûsif Şah Silahidîn bi serdariya Selfidîn, kurê Elemidîn û Îzidîn begefes leşkerek rêkire ser welatê Ermen, kurê Lêvon û gelek kuştin û talanî bi wan de barandin û keleh û bajarên Ermena wêran kirin.

Herwekû di sala 606 de Zahir Şah li ber apê xwe asê bû û ev û Xiyasidîn û fermanarên Mûsil û Mardîn bi wan re di xwestî ko şerê Adilşahê kurd padîşahê islamê bikin û divê tevgerê de birayê Xiyasidîn bi navê Muxîsidîn Tuxrul fermanarê Erzerom jî pêre bû û Xiyasidîn di sala 609 de serê xwe danî.

9- ÎZÎDÎN KEYKAWIS, KURÊ XIYASÎDÎN KEYXESRO, KURÊ ÎZÎDÎN QÎLÎÇ

Di sala 609 de bû padîşah û divê salê bixwe de apê wî ji Erzerom hate ser û di bajarê Sêwasê de xiste asêgehê û kurê Lêvonê Ermenî di hana Tuxrul Şah hate şerê Îzidîn.

Lê Eşrefxanê kurê Adilşah hate hewara Îzidîn lê berî bighê şer Tuxrul ji ser Sêwazê vegeriya û birayê Îzidînkeykawis, Keyqubad di bajarê Ankara de li ber asê bû û Keykawis bi leşkerekî ve çû ser û Keyqubad Eleidîn han û hewar ji Zahir Şah kurê Silahidîn xwest. Lê Zahir Şah dixwest wan lihev bînî û bi destê wî ve nehat û Keykawis Keyqubad girt û xiste zindanê û gelek ji serdar û fermanarên wî kuştin.

Herwekû di sala 611 de Keykawis Eşkerî, leşkerî padîşahê Rom ko berî hingî bavê wî kuştibû girt û gelek û çend keleh jê sitandin û bi ser welatê xweve berdan û paşê ew berda û nekuşt.

Çawa ko di sala 610 de Keykawis apê xwe Toxrol fermanarê Erzerom jî kuştibû û di sala 612 de bajarê Entakya jî Fereng û Ermena sitand û keleha Lulu ji welatê Ermen sitand û bi ser welatê xweve berda û Belat ji welatê Heleb talan kir û gelek ji Ermena kuştin. Û di sala 613 de Zahir Şah kurê Yûsif Şah fermanarê Heleb serê xwe danî û Keykawis çavên xwe berdane welatê Heleb û ji bo vê yekê Keykawis Efdel Şah kurê Yûsif Şah fermanarê Şemîşat kire heval

û dostê xwe û bihev re peymanek girêdan ko:

1- Bajarê Heleb ji Efdel Şah re bî û Cizîr ji Keykawis re bî.

2- Ê xutbe li ser navê Keykawis bêne xwendin.

Ê Efdela Şah hate xapandin û çawa bajarê Tilbaşir girtin û Îzidîn Keykawis fermandarê xwe têde danî hate bîra Efdelşah ko hatiye xapandin û gelek poşman bû û hew zor dida şer û nedixwest zora biraza û pismamên wî herî. Lê Eşrefxan kurê Adilşah bi leşkerekî giranve hate hana şerê Keykawis û bi gernasî ew şikand û welat bicarek xiste bindestê xwe û Keykawis û Efdel bi şûnde şikestin û Efdel di sala 622 de serê xwe danî.

Lê Eşrefxan ew bajar û kelehên ko ji Keykawis sitandin, bicarek sipardin Silahidîn Ehmed kurê Zahir Şah, birazayê Efdel.

10-RÎKNÎDÎN, KURÊ KEYKAWIS :

Di çaxê wîde Tatar ketin welatê Rom û ev Riknidîn bi destê Tetera hate kuştin û birayê wî Îzidîn reviya û çû Qostantînê û kurê wî Xiyasidîn di bindestê Tetera de dîl û gerdanxwar rûnişt û perwana serdarekî tetera bi navê wî li welêt fermandarî dikir û nizanim paşê çi pêhat

12.2.1962 Dimişq

Mûsa Hesên Cigerxwîn

DEWLET Û FERMANDARIYA HEZBANÎ

Di rajorê rojhilatê Mûsil de eşîrên Hekarî, Humeydî, Hezbanî navdar û bideng bûn û di nav rûpelên tarîxê de nav darîn. Ko van sê eşîrên mezin dewlet û fermandarîdi vê hînda Kurdistanê deli dar xistine.

Lê mixabin zencîra kok û binyada van sê eşîran yan van dewletan fermandariyan di gelek cihan de hatiye şikandin û xwe biheve nagrî. Her çîqa me xwest ko nêzîkî hev bikin lê me nikanibû rast bikin. Ji ber ko xwendevan û hozanê kurd di berî niha de niviştên pak û hêja di vê babetê de çênekirine ko em karibin di îro de jê kar bikin û biguhêzin niviştta xwe.

Lê çawa hebî em dixwazin gavekê berepêş bavêjin û her nebî, bi kurdî (Kurmançî) bidin ber çavê mîlet û xortê nûhatî ko karibin gaveke mezintir piştî mere bavêjin.

1- MÎR MIHEMEDÊ HEZBANÎ, KURÊ MÎR BICAL :

Weke ko ji tarîxa islamê tê xuyakirin, ko gelê kurd bicarek xwe nespertiye ola islamê û herdem xwestiye şorişên xwîndar û mezin di riwê reban de bi afirênin û çend çaran lephîlanîne mezin di Kurdistanê de çêbûne û mirovên we ke Ebû Mîslim, Cafer Mihemedê kurê Bilalê Hezbanî û Şedadê Kurd ji vî gelî rabûne û liber peyrewên islamê (Ereb) rabûne.

Eger çendan ev karên giran nebirine serîjê lê di navrûpelên tarîxê de bi gernasî navê xwe ji me re hiştine. Ji wan mirovan Mîr Mihemedê kurê Bilalê Hezbanî ye ko dixwa -

zin dabaşa wî bikin.

Mîr Mihemed di sala 293 koçî de êrîş kire ser welatê Mûsil û Ebû Heyca Emîr Ebdulah, Hemdanê Telebî waliyê Mûsil bi leşkerekî giran ve çû şerê kurdên Hezebanî. Lê piştî şerêkî xwîndar û mezin leşkerê Ereb şikest û bi paş de vege^rî ya.

Tenê Ebûlheyca ranewesta û leşkerekî mezinda hev û care ke dî vege^rîya meydana şer. Pênc hezar mal bi Mîr Mihemedê kurd re li ser çemê Xabûrê Huseynî yê danîbûn û şer vê care li gundê Marûba çêbû. Lê çawa Mîr Mihemed dî ko vê care ni karî şer bi dijminê xwe re bikî, dest bi dan û sitandinê kir û xwest ko xwe bi hostayî ji şerêkî dijwar biparêzî û bi vî rengî dijminê xwe xapand û bi şev barkirin û çûne Azerbaycanê. Lê dawî li hev hatin û vege^rîyan cihê xwe.

Bi vê lihevhatinê kurdên Hekarî, Hemîdî, Dasinî, Mihra nî jî ketin nav vê lihevhatinê û dostaniyê û bi vê lihevhatinê welatê Mûsil, Xelkê çiya haşt bûn û sergêjî hatin rawestan û xêr û xweşî kete nav welêt.

Her wekû di sala 337 ê koçî de Nasiridewle Hesên, kurê Ebûheyca yê Hemdanî çû ser welatê Azerbaycan û ev êla Hezebanî kurdî pêre bû, lê mexabin ko heta niha ez nizanîm mezinê vê êlê di vî şerî de kîbû.

2- MÎR REBÎBÎDEWLE :

Her çiqas me lêkolaye ko zanibim ev Rebîbidewle kurê kêye ez negihame tişteki hêja. Lê tenê di dabaşa kurê wêde min navê Rebîbidewle nas kiriye ko di tarîxan de navê Ebûlheyca, kurê Rebîbidewle hatiye gotin û hatiye zanîn ko jî kurdên Hezebanî ye û mezinê welatê Erbîl (Hewlêr) bû.

Her wekû tê ber çavê mirov ko gereke di sedê çarê koçî, yan di serê pêncî koçî de bî. Lêkolînek jêre divê.

3- EBÛLHEYCA, KURÊ REBÎBÎDEWLE YÊ HEZEBANÎ YEKEM :

Di sala 420 ê koçî de vî mirovê mezin digel fermandarê Azerbaycan Wahoza ê Rewadî kurdî peymanek çêkirine û bi hev re şerê Turkên Xez setemkar, xwînxwar kirine. Di wê çaxê de welatê Erbîl û Ormîyedi bin destê vî Ebûlheyca yê de bûn.

Di sala 420 koçî de Mesûd Şah, kurê Mehmûdşahê Xeznewî bê jimar ji turkên Xez kuştin û ji hev perçe kirin û bi çola xistin. Ji wan Xezan hin hatin Kurdistana (Çiya) û hin ketin Kurdistana Azerbaycan. Fermandar û serdarê wan xezên, ko çûne Azerbaycan. Koktaş û Boqa, Mensûr û Dana bûn û Wahsozanê padîşahê kurd li Azerbaycan gelek rûmeta wan girt û jin bihev guhartin û bûne mirovên hev û Wahsozan dixwest bi alîkariya wan Xezan welatê xwe ji destê Şah Mesûd biparê-

zî. Lê gomana padîşahê kurd çewt û şaş derket û Xezan dest bi sergêjiyan kir û kuştin û talan dinav welêt de barandin û di sala 429 ê koçî de ketin nav bajarê Merexe, paytexta Kurdistanê Azerbaycan û mizgevt şewitandin û gelek ji wan kuştin, çawa ko ji kurdên Hezebanî jî bi destê wan Xezan gelek hatin kuştin û talankirin.

Ji lewra û naçare Ebûlheyca, kurê Rabîbidewle yê Hezebanî ko di wê çaxê de li bajarê Ormiyê rûniştîbû û Wahsozanê Rewadî padîşah û fermandarê Azerbaycan ko li Merexe rûniştîbû bihev re peymanek çêkirin ko bihev re şerê Xezan bikin û liser vê peymanê bihev re berê xwe dane şerê dijminê xwînxwar û talanker û mêrkuj û dijminê xwe bicamêrî şikandin û kirin du perçe:

1- Perçakî bi serdariya Boka(Boqa) berê xwe dane bajarê Rey-Tarana îro. 2- Perçê dî bi serdariya Mensûr û Koktaş berê xwe dane Hemedan.

Ebû Kalîcar, kurê Ela-Îdewle di bajarê Hemedanê de bû û şer destpêkir û gelek ji herdû rexan hatin kuştin. Lê çawa Ebû Kalîcar dî ko nikarî şerê dijminê xwe bikî, biwan re lihev hat jindane hev û bûne mirovên hev.

Lê ew Xezên ko çûne ser bajarê Rey-Taran ko Ela-Îdewle bixwe di nav bajêr de bû û Fenaxesro, kurê Mezdîowleyê Biweyhî û Gamir û fermandarê Sawa ê Deylemî ji tirsan hati-bûn han û hewara Mîr Ela-Îdewle û piştî çend şerên mezin û xwîndar Ela-Îdewle bajar ji wan re berda û çû bajarê Esfahan û leşkerê xwînxwarê Xez kete nav bajêr û bi hovî dirêjî jin û mêran kir û talan û berdîberdane û hemî karên nebaş dinav bajêr de kirin. Kuştin, talan, jin revandin, şewat kirin.

Dibêjin ji tirsan jin diketin mizgevtê û di hindir wê wan de bazdidane ser wan û karênbê rê dikirin û hin ji wan Xezan dane pey şopa Mîr Ela-Îdewle. Lê negirtin û bajarê Kerec ji Kurdistanê talan kirin.

Çawa ko hin ji wan bi serdariya nasixlî çûne ser bajarê Qezwîn û xelkê bajêr ji tirsê heft hezar dînar danê û ew kirin mezinê xwe û di bajêr de rûniştin.

Herwekû hin ji wan ji bajarê Ormiyê bê rê xwe dane welatê Ermenistan û berdîberdan û talan û kuştin biser wan de barandin û jina ciwan bi 50 dînarî difirotin hev û zor û setema van Xezên xwînxwer nayê jimartin û nivîsandin.

Paşê hin ji wan ketin welatê Ebûlheyca yê kurê Rebîbidewleyê Hezebanî, fermandarê Erbil û Ormiyê û şerên xwîndar dinav wan de destpêkirin. Lê Xezan welatê kurd talan kirin û gelek ji kurd kuştin û xwînrêjî û berdîberdan biser wan de barandin.

Herwekû di sala 430 ê koçî de careke dî Xez çûne ser ba jarê Hemedanê, lê vê carê Ebûkalîcar, kurê Ele-idewle jî ber wan reviya û kete bajarê Kengûr Kurdistanê û Xezan bajarê Hemedan talan kir û xwîn bê jimar hate rijandin û berê xwe dane welatê Dînewer, Kurdistan. Lê Ebûlfeteh, kurê Ebûşewk, padîşahê kurd Koli, bajarê Helwan rûdinişt di wan derket û gelek ji wan kuştin û gelek dîl kirin. Lê paşê li hevhatin û dîl berdan.

Çawa ko Ela-idewle hate Esfehan û gelek ji Xezan kuştin û bajarê Esfehan xiste destê xwe û di sala 432 ê koçî de Wahsozan, padîşahê Azerbaycan ko li Meraxe rûdinişt xwarinek ji Xezan re çêkir û gelek ji mezinên wan di ser xwarinê de girtin û ji wan 30 serdar bûn û naçare ew Xezên mayîn ji tirsan ji hêla Ormiyê reviyar û berê xwe dane hêla welatê Hekariyan. Lê kurdên hekarî gelek ji wan kuştin. Lê dawî kurd ji ber dijminê xwe şikestin û xezan ew talan kirin û jin û zarokên wa ji xwe re revandin û kurd biserê çiya ketin û di şax û çiyar de asê bûn. Tenê Xezan wilo dev ji wan bernedan û li pey wan ketin serê çiya û çûne şerê wan. Lê kurdên hekarî vê carê ew xerab şikandin û hezar û pêsed siwar ji wan dîl girtin û kuştin û bê jimar ji wan dîl girtin. Di nav dîlan de heft fermanदार û serdar bûn. 1500 ji wan kuştin û di nav kuştîyan de 7 serdar bûn.

Herwekû bêjimar ji dijminê xwe bi dîlî girtin û ji dîlan 100 ji mezin û serdarê wan bûn û çek û sewal û jin û zarokên xwe ji wan sitandin û Xezên mayî şerpeze ji hevketî bi çolan ketin û çawa Ebûlheyca, kurê Rebîbidewleyê Hezebanî kurdî ev bihîst da ser şopa wan û bicarek girtin û kuştin.

3- MÎR MÛSA YÊ HEZEBANÎ :

Ji ber ko tenê navê Mûsik li pey navê zariwên wî, Ebûhesen û Ebû Elî hatiye em nikarin tiştêkî hêja di biwara wî de bidin xuyakirin. Tenê herwekû tê xuyakirin gereke Mûsik kurê Mûsa yê Hezebanî bî û sê kurê Mûsik Ebûhesen, Ebû Elî û Salar hebûn.

4- EBÛHESEN, KURÊ MÛSİK Ê HEZEBANÎ :

Di sala 440 ê koçî de ev Ebûhesen fermanदारê Erbîl û kurdên hezebanî bû û welatê Erbîl bicarek di bin destê wî de bû. Tenê birayê wî Ebû Elî, kurê Mûsik herdem li ber ra di bû û doza femandariya welêt dikir. Lê Ebûhesen, kurê Îskanê Hemîdî mezin û fermanदारê Akre û şeş hevalbendê Ebû Elî bû. Çawa ko fermanदारê Mûsil Qerwaş hevalbend û dilxwazê Ebûhesenê kurê Mûsikê Hezebanî bû. Lê bi alîkariya Ebûhesenê kurê ÎskanêHumeydî Ebû Elî zora birayê xwe bir û

xiste zindanê û serbixwe bû fermandarê Erbîl û Hezebaniya, tenê ev karê ha ne bi dilê Qerwaş bû, lê nikaribû dengê xwe bikî.

5- MÎR EBÛ ELÎ, MÛSİK Ê HEZEBANÎ :

Me da zanîn, ko çawa bi alîkariya fermandarê Akrê, bira yê xwe avêt û xiste zindanê û ev serpêhatî gelek ne bi dilê Qerwaş, fermandarê Mûsil bû.

Di vê navê de padîşahê kurd li Farqîn û Amed bûbû dijmi nê Qerwaş û herdû dewletan leşkerê xwe kişandin ber hev û Qerwaş han û hewara xwe bire herdû mîrekên Hezebanî û Humeydî û herdû fermandarên kurd bi şeref çûne hana wî, lê di wê navê de herdû dewlet bi haştî ji ber hev rabûn û li hev hatin.

Di vir de Qerwaş, ji xwe re fersende dît û dest danî ser herdû mîrên kurd û got: "Eger win Ebûhesenê kurê Mûsik bernedin û nekin fermandarê welêt ez we herdiwan bernadim û ezê we bixim zindanê.

Naçare herdû kurdên sermezin jêre soz dan û herdû kurên mîr Ebûhesenê Humeydî girav li cem Qerwaş hiştin û bi hev re çûne Erbîlê û bi rê de ji hev re gotin, emê Ebûhesen berdîn û bêne cem Qerwaş û zariwên xwe ji nav lepê wî derxin, û dawî em zanin çi bikin.

Bi hev re vegeriyane cem Qerwaş û gotin: "Ha waye me Ebûhesen berdan û kirin fermandarê Erbîl û dixwazim zariwê min azad bikî û Qerwaş zarokên wî berdan û bi hev re careke dî vegeriyan Erbîl ko kelehên mayîn bidin destê Ebûhesen. Lê bi rê de Ebûhesenê Humeydî gote Ebûelî, ha vaye min zariwên xwe ji nav lepê Qerwaş derxistin û ka were emê careke dî Ebûhesen bigrin û bixin zindanê. Lê Ebûhesen bi vî lika wan agahdar bû û ji pey wan bi paşde vegeriya Mûsil û hin mirovên xwe bi wan re şandin ko keleh û cihên stratejîkî bixin destê xwe, lê bi rê de herdû hevalbenda leşkerê Ebûhesen talan kirin û careke dî Ebûelî bû fermandarê Erbîl û Ebûhesen û Salar mane li Mûsil û li nik Qerwaş rûniştin.

6- EBÛHEYCA YÊ HEZEBANÎ :

Bi rastî di vî navî de gelek diware, ko mirov karibî ji hev bidî alî û vewejêrî ji ber ko 3-4 nav bi vî navî hatine xuyakirin. Ebûheyca, kurê Rebîbidewle Hezebanî, Ebûheyca yê Rewadî, ko li Farqîn rûniştibû, Ebûheyca yê Hezebanî, Ebûheyca yê Qelew. Lê weke tê xuyakirin ev Ebûheyca, ko di vê malbatê de navdare. Di sala 499 ê koçî de bû, ko di gel Cigermij ê fermandarê Mûsil şerê Cawlîseqaw kiriye û di sala 500 ê koçî de ko Cawlîseqaw, Cigermij kuşt û kurê

Ebûheyca, Mîr Fedil dîl girt, lê Ebûheyca ew kurê xwe berda û Cawlî haşt kir.

Ev Cawlîseqaw, serdarê leşkerê Mihemedşahê kurê Melekşahê Selcoqî bû ko şandibû ser Mûsil.

Herwekû di sala 502 ê koçî de ev Ebûheyca di gel Mîr Nesir, kurê Ebûşewk, fermanarê kurd li welatê Helwan hate ser Mûsil û herdû fermanarên kurd di nav leşkerê Mesûdşahê Selcoqî da bûn.

Herwekû di sala 505 ê koçî de di gel padîşahê Meraxe Mîr Ehmedîlê kurê Salar, kurê Wahsozan bi du leşkerên kurd ve di nav leşkerê Mihemedşahê kurê Melekşahê Selcoqî de hatin ser welatê Sûriya û di sala 512 ê koçî de Ciyûş Beg, fermanarê Mûsil çû şerê Dubeys, kurê Sedeqe, fermanarê welatê Hulle û leşkerê kurd bi serdariya Ebûheyca yê Hezebanî fermanarê Erbîl di nav leşkerê Ciyûş Beg de bû.

7- MÎR FEDİL Û MÎR EBÛELÎ, KURÊN EBÛHEYCA :

Di sala 502 ê koçî de Bersiqî, fermanarê Mûsil bi destê Batiniya hate kuştin û kurê wî Îzidîn Mesûd kete şûna bavê xwe û bajarê Erbîl ji bêgana sitand û careke dî sipar de destê Mîr Fedil û Mîr Ebûelî, kurên Ebûheyca û tişteki dî ji van herdû mîran heta niha neketiye destê me.

Welatê Erbîl di sala 517 ê koçî de ji destê vê malbata kurd derketibû. Lê nizanîm kê derxistibû. Tenê kurê Esîr dibêjî: " Di sala 527 ê koçî de Îzidîn Mesûd kurê Bersiqî, fermanarê Mûsil, welatê Erbîl careke dî sipar de herdû kurên Ebûheyca Mîr Fedil û Mîr Ebûelî, çawa ko me derbaskirî ye.

8- MÎR EBÛHEYCAYÊ SEMÎN QELEW :

Mexabin, ko navê wî mîrê mezin û bavê wî baş nehatiye zanîn. Tenê di nav dewleta Eyûbî kurdî de padîşahên Misr û Şam û Kurdistan de hatiye xuyakirin, ko di sala 564 ê koçî de li Misrê serdarê leşkerê kurd bû. Herwekû wê ji paşve bê zanîn.

Gelek diriste, ko ev camêr kurê Ebûelî yan Fedil kurên Mîr Ebûheyca yê mezin ê pêşî bî û navê wî Salar bî. Û nav û dengê wî Hisamidîn bû.

Çawa di sala 564 ê koçî de şorişa Kola li Misrê di riwê dewleta Yusif Silahidîn de çêbû, ko bi navtêdan û serdariya Muteminidewle bû. Yusif Şah Silahidîn, ev Hisamidîn Ebûheyca yê Hezebanî kire serdarê leşker û şande şerê kolê Sûdanî, ko bi kolê qesrê navdar bûn û bi carek kuştin û taxawan şewitandin. Lê birakî wî di nav şer de hate kuştin û heta sala 586 ê koçî jî fermanar û serdarê leşkerê kurdên Eyûbî û pêşîwayê kurd bû û di bajarê Eka de fermanar

û parêzkarê leşkerê ko di bajêr de şer dikirin bû û şerê Firinga bi xurtî û camêrî dikirin.

Tenê piştî pêlakê bi 60 serdarî ve ji kelehê derketin û Mîr Seyfidîn Elî, kurê Meştûbê Hekarî bi 20 serdarên kurd ve ketin şûna wan.

Herwekû di sala 588 ê koçî de Yûsif Silahidîn Şah serdar û fermandarên xwe li hev civandin û ji wan re got: "Em dixwazin bajarê Qudsê gelek asê bikin û tê de şer bikin û bi hesanî nedin destê dijmina, lê piştî civat belav bû serdar tev li cem Ebûheyca kom bûn û gotin:

"Em nikarin weke bajarê Eka li xwe bikin, xwe bi dîlî bixin nav destê dijmin. Lê eger padîşah dixwazî bi xwe yan yekî ji kurên xwe di bajêr de di nav me de bihêlî, emê bikin.

Û li ser vê daxwazê Mîr Ebûheyca nivîsarek ji padîşah re rê kir û got:

"Serdar tev piştî ko ji cem te rabûn wilo dibêjin, ji lewra ez dibênim ko leşkerê kurd li derê bajêr şerê dijminê xwe bikin. Ca eger me zora dijmina bir ji xwe pir başe, lê eger dijmin zora me bir ya baş ewe ko leşkerê kurd bi dîlî nekevî destê dijmin û ji şerekî dî re bihêlin. Û padîşah Yûsif Silahidîn ev gotina wî xiste serê xwe.

Herwekû di çaxê Adilşah de bi serdariya Ebûheyca çend serdar û fermandarên leşker û kurd ji nav leşkerê Osmanşah kurê Silahidîn veqetiyar û hatin nav leşkerê Adilşah û Hisamidîn Ebûheyca bû fermandarê bajarê Qudsê.

Lê çawa li hev hatin û Osmanşah veqetiyarê Qudsê Hisamidîn bê şer bajar da destê wî û berê xwe da Bexdayê û çû cem peyrewê Ebbasî û bû serdarê leşkerê wî û peyrevê Bexda ew rêkire ser welatê Kurdistan û Îran. Lê paşê ew ji serdarî û fermandarî danî û Ebûheyca li bajarê Dedûqa rûnişt û di sala 592 ê koçî de li bajarê Dedûqa serê xwe danî û tarîxbêj gelek pesnê wî didin.

8- QUTBÎDÎN XESRO, KURÊ TELÎLÊ HEZEBANÎ :

Ev fermandarê mezin yek ji wan serdar û fermanbaran bû, ko di gel serdar Şerkoh çûne welatê Misrê û bûne sebebê pa dîşahiya Yûsif Şah Silahidîn. Herwekû yek ji wan mirovan bû, ko dixwestin bixwe bikevin şûna Şerkoh. Lê bi hozaniya Fegîh, diya İddim İsa yê Hekarîye. Tev ji Yûsifşah re gerdexwar bûne. Herwekû wê di cihê wê de bê gotin.

Herwekû hatiye xuyakirin ev Qutbidîn Xesro birazayê Ebûheyca yê Hezebanî û kurê Telîle, lê tarîxbêj bi ser ve dirêj dikî û dibêjî: Ji bav û kalê xwe de ev malbat mezin û xwedanê welatê Erbîl bûn û ji kevnare de ev welat di des

tê wî û zariwên wî de bû. Yanê di destê mala Ebûheyca de bû. Lê herwekû me derbas kir, ko birakî Ebûheyca di şerê kolên qesrê Sûdaniya de hate kuştin, lê nabêjî ka navê wî çiyê. Ji lewra gelek diriste, ko Telîl bavê Qutbidîn Xesro bî.

9- MÎR HÎSAMÎDÎN, KURÊ MÎR EBÛ ELÎ :

Di sala 637 ê koçî de ev Hisamidîn Mihemed, kurê Ebû Elî yê Hezebanî di nav leşkerê Salihşahê Eyûbî de mirovekî mezin û navdar bû. Lê çawa Salih Şah li Kerek bi dîlî kete destê pismamê xwe ev mîr Hisamidîn Mihemed vegeberiya cem melek Îsmâil û li Dimişqê rûnişt.

Lê Îsmâil ew xiste zindanê û di sala 640 ê koçî de ji zindanê derket. Çawa, ko kurê wî Mîr Seyfidîn Ebû Elî, kurê Mîr Hisamidîn Mihemed di sala 646 ê koçî de li bajarê Himis kete zindanê. Û hin dibêjin: Di sala 640 ê koçî de hate berdan û hin dibêjin di zindanê de serê xwe daniye. Mîr Seyfidîn Ebû Elî, kurê Mîr Hisamidîn Mihemed, kurê Ebû Elî, kurê Mûsikê Hezebanî ye.

Herwekû di sala 646 ê koçî de Mîr Hisamidîn Mihemed, kurê Mîr Ebû Elî hate Dimişqê û bajarê Salihiyê, li jorê Dimişqê di berpala çiyayê Qasyûn de avakir û navê wî gundî kire Salihiyê ko îro jê re dibêjin Salihiyê (Taxa kurdan).

Mîr Hisamidîn Mihemed ev gund ji xwe re kire ordîgeha leşker û tê de rûnişt. Berî hingîjî qûnax û koçikên Salih Şah di vê hindamê de hebûn û bixwe bû fermandarê welatê Şam. Tenê piştî çend salan careke dî vegeberiya welatê Misrê û bû fermandarê Qahire. Herwekû di piştî mirina Necmidîn Salih Şah re lîzeke mezin gerand û di sala 651 ê koçî de ji fermandarî hate avêtin û bi rev xwe gihande Dimişq û pa dîşahê kurd Nasirşah Mûçakî bi sed siwarî jê re vebirî û li Dimişq paşê serê xwe danî.

HOZANÊN HEWLÊRÊ

1- SEDRÎDÎN EBDÎLMELÎK, KURÊ DERBASÊ HEZEBANÎ :

Di sala 516 ê koçî de çêbûye û di sala 566 ê koçî de buyu Qadîlqadat û di dewleta kurdî-Îslamî de û li Misrê rûniştiye. Herwekû di sala 605 ê koçî de li Misrê serê xwe daniye.

2- EBÛLEBBAS XÎDÎR, KURÊ NESRÊ ERBÎLÎ :

Di sala 478 ê koçî de çêbûye û di sala 576 ê koçî de serê xwe daniye.

3- REDÎYÎDÎN YÛNÎS, KURÊ MÎHEMEDÊ ERBÎLÎ :

Di sala 508 ê koçî de çêbûye û di 576 ê koçî de serê xwe daniye.

4- MUWEFÎQÎDÎN, KURÊ YÛSÎFÊ ERBÎLÎ :

Di sala 585 ê koçî de serê xwe daniye. Lê nehatiye xuya kirin ko kengî hatiye cihanê.

5- ÎZZÎDÎN NESÎR, KURÊ UQEYLÊ ERBÎLÎ :

Di sala 534 ê koçî de çêbûye û di sala 619 ê koçî de serê xwe daniye.

6- ÎMADÎDÎN, KURÊ YÛNISÊ ERBÎLÎ :

Di sala 535 ê koçî de çêbûye û di sala 608 ê koçî de serê xwe daniye.

7- ŞEREFÎDÎN, KURÊ EHMED, KURÊ MÎSTEWÎ :

Di sala 564 ê koçî de çêbûye û di sala 638 ê koçî de serê xwe daniye.

8- SÎLAHÎDÎN EHMED, KURÊ EBDÎSEYÎDYÊ ERBÎLÎ :

Di sala 572 ê koçî de çêbûye û di sala 631 ê koçî de serê xwe daniye.

9- ŞEREFÎDÎN, KURÊ ÎZÎDÎN NESÎR, KURÊ UQEYLÊ ERBÎLÎ :

Di sala 572 ê koçî de çêbûye û di sala 633 ê koçî de serê xwe daniye.

10-EHMED, KURÊ MÛSA, KURÊ YÛNISÊ ERBÎLÎ :

Di sala 675 ê koçî de çêbûye û di sala 622 ê koçî de serê xwe daniye.

11-ÎSA, KURÊ SENCER, KURÊ BEHRAMÊ ERBÎLÎ :

Di sala 582 ê koçî de çêbûye û di sala 632 ê koçî de serê xwe daniye.

12-YÛSÎF, KURÊ NEFÎS :

Di sala 586 ê koçî de çêbûye û di sala 638 ê koçî de serê xwe daniye.

13-TACÎDÎN, KURÊ EBDIREHÎM, KURÊ MÎHEMED, KURÊ ÎMADÎDÎN :

Di 598 ê koçî de çêbûye û di sala 670 ê koçî de serê xwe daniye.

14-ŞEMSÎDÎN EHMED, KURÊ MÎHEMED, KURÊ ÎBRAHÎM ÎBNÎXELÎKAN :

Di sala 608 ê koçî de çêbûye.

15-DÎYAÎDÎN OSMAN, KURÊ ÎSAYÊ HEZEBANÎ MARANÎ :

Di sala 602 ê koçî de li Qahire serê xwe daniye.

16-FEXRÎDÎN MESÛD, KURÊ ELÎ, KURÊ ZAFERANÎ :

Ko bixwe yek ji serdar û fermandarê padîşahê Mûsil, ma-

la Etabegê Turkmanî bû. Herwekû tê xuyakirin, ko bixwe ji Keleha Zaferane, ko dikevî hindama Erbîl. Lê ev navê Zafe-ran li Bexdayê jî navê taxekê ye. Herwekû li hindama Mar - dîn jî navê gundekî ye, ko dêreke mezin û navdar têde ha-tiye avakirin. Lê gelek diriste, ko ev camêr ji xelkê Zafe-rana bindestê Erbîl bî. Ji ber, ko serdar û fermandarên dewleta mala Etabegê Mûsil pirê wan ji kurdên rajorê Mûsil bûn.

1971. 6. 24

Cigerxwîn

FERMANDARIYA HUMEYDÎ

Eşîra Humeydî, ji kevnare de di rajorê rojhilatê Mûsil de xwedî nav û nîşan bû. Kelehên Akrê, Şoş, Bîrewe, Necme û Barzan di bin destê wan de bûn.

Navê herî kevnare Mazencan bû, ko di welatê Kurdistanê de navdare. Lê pir cihê axîne, ko em nikarin tarîxa fermandarên vê eşîra mezin bi hevê bidin girêdan û bi ser hevê binivîsin, ji ber, ko tarîxa kurd bicarek bihev re nehatiye nivîsandin û naçare ji nav tarîxên erebî, farisî turkî perçe perçe, ji nav toz û tirabêlka neguhdanê didin hev û divir de dinivîsin.

Kurê Ezreqê Farqînî dibêjî: Di sala 376 koçî de dewlete ke bi navê Humeydî li ser destê herdû kurên Destikê Hemîdî Ebûlfewaris Huseyn û Ebûşeca Baz li hindama Farqîn û Diyarbekir, Cizîr, Bedlîs, Xelat û Riha û Heran li darket û paytexta wan bajarê Farqîn bû. Mîr Huseyn Ebûlfewaris li Farqîn rûnişt û Ebûşeca Baz li keleha Heskîf serdariya leşker dikir. Van herdû bira çavên xwe berdabûn imparatoriyeke mezin. Lê bi wan re neçû serî û herdû bira bi gernasî di meydana şer de hatin kuştin. Baz di 380 koçî de hate kuştin û berî hingî neb bi gelekî mîr Huseyn di çûla Nisêbînê de hate kuştin û herdû bira şeş sala tenê fermandarî kirine û dewlet kete destê xwarziyê wan Ebû Elî Hesen, kurê Merwan.

Mala Merwan 130 salî li ser hev fermandarî kirine û navê Mîr Ebûlfewaris Huseyn, kurê Dostikê Humîdî bi çend ciya li ser bedena Farqînê hatiye xuyakirin û Baz-Bad Ebûşe-

ca birayê wiye.

1- MÎR HUSEYN EBÛLFEWARÎS, KURÊ DOSTIKÊ HUMEYDÎ :

Huseyn û Baz herdû kurên Dostikê Humeydî di serê pêşî de hindama maden, Hîzan, Ercîş, xistin bin destê xwe û paşê û di sala 376 koçî de weLatê Diyarbekir, Farqîn, Cizîr, Bedlîs, XeLat, Urfa, Heran, Nisêbîn ji mala Hemdanê Mele - kên Heleb sitandin û bûne melekên vê hindamê. Ji Kurdistanê û Farqîn kirin paytext û barxan û bargiraniyên xwe xistin keleha Heskîfê û Baz Ebûlşeca li Heskîf rûnişt û çavên xwe berdane padîşahiya Îslamê û ketin Mûsil û dixwestin Bexdad jî ji Deylemiyan bistênin. Lê Mîr Huseyn li deşta Nisêbînê hate kuştin û li Farqînê veşardin û ji gornistana ko têde hatiye veşardinjêradibêjin qubênebûlfewaris.

Ebûlfewaris, di van herdû salan de gelek ji bedena Farqînê ava kiriye û navê wî li ser wan cihên nûjenkirî hatiye nivîsandin û di sala 378 koçî de hatiye kuştin.

2- BAZ EBÛŞECA, KURÊ DOSTIKÊ HUMEYDÎ :

Piştî birayê xwe bû fermanîdar û serdarê leşkerê kurd û çend şerên mezin û xurt û xwîndar bi Deylemiya re kirine û herdem rûsipî û bi xurtî zora dijminê xwe dibir û leşkerê dijmin pozşikestî bi paşde vedigerandin.

Lê ev pêşveçûna kurê Dostik bi Semsamidewle nexweş dihat û dikete nav tirs û sawîran û naçare leşkerekî giran bi serdariya Ebûsad Behram, kurê Erdeşêr şande ser Baz, pa dîşahê Deylemî û piştî çend şerên mezin leşkerê kurd zora dijminê xwe bir û Deylemî şikandin û talan kirin û gelek ji wan kuştin û dîl girtin û çend serdarê navdarên Deylemî xistin zindanê.

Tenê Semsamidewle li ser vê şikestinê ranewestiya û xwe xwe ve nebir û bi serdariya Mihemed, kurê Hacib Ebûlqa - sim Sad, kurê Mihemed, kurê Hacib leşkerekî dî rêkire ser kurdên Hemîdî û li Bacelaya ko li ser çemê Xabûrê Huseyniyê dikeví û nêzîkî keleha Kewaşî ye şer di navbera herdû leşkerên giran de destpêkir û leşkerê kurdên Becnewî jî di nav leşkerê Baz de bû û gelek xwînrejî û kuştin ji herdû rexan çêbûn. Lê dawî leşkerê kurd Hemîdî û Becnewî zora dijminê xwe birin û gelek ji wan kuştin û talanekî mezin ji wan sitandin.

Li ser vî şerî hozanê kurd, Huseynê Becnewî bi rist û helbestê ev serpêhatî bi darve kiriye. Lê bi Erebi gotiye û kurê Dostik li wir ranewesta û li pey dijminê xwe çû û kete Mûsil û têde rûnişt. Herwekû xelkê bajêr bi xwe jî alîkariya kurdên Hemîdî dikirin û Deylemî dikuştin.

Tenê Baz Ebûşeca ê kurd li ser vê pîrozexurtiyê rûnişt

û karê xwe û girtina Bexdayê dikir û dixwest bi carek roj-hilat ji destê Deylemiyên derxî û ji bo vî awayî karê xwe dikir û ji hawîr leşker li xwe kom dikir.

Lê Semsamidewle jî ev tişt dabû ber çavê xwe û zanibû, ko jê re wilo naçî serî. Ji lewra karê xwe û şerekî giran û dijwar dikir û leşkerekî giranda hev û bi serdariya Ziyar, kurê Şêrkohê Deylemî rêkire ser Mûsil û herdû leşker bi gernasî raperikîne hev û êrîşî hev kirin.

Tenê Deylemiya vê carê dijminê xwe bi gernasî şikandin û bajar ji wan sitandin û leşkerê kurd şerpaze jihevdaye-tî berê xwe dane çiyayê kurdistanê û gelek ji serdar û navdarên kurd bi dîlî ketin destê dijminê xwe.

Ziyar, leşkerê xwe kire du perçe û yek di riya Cizîrê ve û yek di Nisêbînê ve şandin şerê kurd. Lê herdû perça jî bi gotin û fermana serdarê xwe nekirin û neçûn û naçare Ziyar vegeriya Bexda û Sadê kurê Mihemed, kurê Hacib ji ber xwe ve di Mûsil de hişt û dostanî kete navbera Sad û Baz û li hev hatin û Baz hin ji çiyayê Torê da Sad û bi ser Mûsil ve berda û di sala 377 de di navbera xwe de peymanek çêkirin û herdû alî di cihên xwede rûniştin.

Lê di sala 378 de Şerefidewle Ebûlfewaris birayê xwe Sembamidewle xiste zindanê û Sadê kurê Mihemed kurê Hacib ji ferdariya Mûsil avêt û Ebûnesir Xaşad kire ferdarê Mûsil.

Ji lewra Baz Ebûşeca ê kurd careke dî leşkerê xwe kişan de ser Mûsil û Xaşad hewar ji erebên Benîuqeyl û Benînu-meyr xwest û bajar û hindamên Cizîrê li wan parvekirin. û bihev re Mûsil parastin û çawa şer destpêkir Erebi bi siwarî di çem derbas bûn û ji paşve dirêjî leşkerê kurd kirin û kurd şerpeze şikandin.

Baz mirovekî bi goşt û giran bû. Hespekê nikaribû wî heta dawî hilgirî. Ji lewra du hesp bi xwe re digerrandin û hengî yek diwestiya xwe tavête ser ya dî.

Lê vê carê çawa xwe avêt ser hespê xwe neda ber û kete ser qadê û piştê wî şekest û xwarziyê wî Ebû Elî Hesên kurê Merwan li ser laşê wî peya bû û got: Xalo, rabe ez te li ber xwe kim û te ji nav destê dijminê derxim. Lê Baz lê vegerand û got: Nema hêjaye. Ez çûme. Nema karim tevbigêrim. Naha dimrim xwe ji destê dijminê biparêze û leşkerê xwe bighêne çiyê û hay ji xwe hebin.

Belam kurê Ezreq dibêjî: Ev Xaşad kurê Edididewle ye û navê Şerefidewle Şarzebîle. Du sal û heşt mehan padîşahî kiriye û 28(bîst û heşt) salan berxwedar maye û ev leşkerê Deylemiya bi serdariya wezîr Ebûl Hesên Elî, kurê Huseynê Mexrebî bû, ko paşê kurê wî bûye wezîrê Farqînê.

Herwekû kurê Ezraq li şûna Baz-Bad dinivîsî, kurê Ezreq pêde diçî û dibêjî: lê nikaribû zora Bad bibî û naçe vege-riya û ji nûve Sad, kurê Mihemed, kurê Sadan li Mûsil hişt û şer di nav wan de destpêkir û navbera Bad û kurê Sadan gelek xweşbû. Heta carekê kurdên Hekarî çûne ser Mûsil û kurê Sadan hewar ji Bad re şand û Bad hate hewara wî û ge-lek ji kurdên Hekarî ya kuştin û talanê wan ji xwe re anî û ji ber vê yekê xelkê Mûsil gelek dilxwazê Bad bûn.

Herwekû kurê Ezreq dibêjî: Ew leşkerê, ko Mîr Huseyn E-bûlfewaris kuştin, bi serdariya Serîr, kurê Taş bû, ko bi-xwe nivîsyanê dewleta Deylemî bû. Lê Mihemed Emîn Zekî Beg dibêjî: Baz Ebûşaca ê kurd hevalbendê Edididewle bû û di şerê Mûsil de alîkariya wî dikir û çawa hate Mûsil Baz Ebû şaca ê kurd hate dîtina wî û gerdana xwe jê re xwar kir û di civata wî de rûnişt. Lê çawa ji civatê rabû Edididewle ji dostekî xwere got: Ev mirovên wilo bi saw, ji xwe hej-kiñ nabî, ko di welatê me de hebin. Evê ji me re gelek ser gêjiya bi afirenî û çavên xwe berdane girtin û kuştina wî. Lê Baz zû tê derxist û xwe parast û bi dizî revî çû mala xwe û çavnêriya dem û çaxên xwe kir û çawa di sala 372-373 de Edididewle serê xwe danî. Baz Ebûşaca ê kurd bajarê Nisê bîn ji Biweyhiya sitand û paşê Semsamidewle ev şerên ha pê re kirin.

Çawa Mîr Huseyn di van şeran de hate kuştin Baz kete şû na birayê xwe û bû fermandarê dewletê û serdarê leşkerê kurd û li keleha Heskîfê rûdinişt. Lê gelek neçû herdû ku-rên Nasiridewle Ebûtahir û Ebûebdilah bûne fermandarên Mûsil û leşkerên kurd û ereb li ser Mûsil ketin pêxîra hev û Benîuqeyl û Benînumeyr di hana Hemdaniya hatin û Baz di şe-rê van de hate kuştin û serê wî jêkirin û laşê wî bi bede-na Mûsil ve bi dar vekirin û serê wî bi xwe re birin û çûne ser bajarên Farqîn û Amed (Diyarbekir). Lê Ebû Elî Hesen ku-rê Merwan, ko li şûna xalê xwe bûbû fermandar û jina wîya deylemî mar kiribû. Zora dijminê xwe bir û Ebûebdilah bi dîlî girt û nexiste zindanê û bi diyarî û perwa ve ji bira-yê wî re rêkir û got: Bere Mûsil ji were bî û ji waletê kurd derkevin. Lê Ebûtahir careke dî birayê xwe bi leşkerekî ve şande ser Farqîn û ew bi xwe li ser Amed (Diyarbekir) bû û careke dî kurê Merwan Ebûebdilah girt û leşkerê dij-min şikand.

Ev Ebûebdilah, di zindana kurê Merwan de ma heta, ko me-lekê Misrê, peyrewê islamê jê hêvî kir û berda û şande Mis-rê û paşê ev Ebûebdilah ji ber misriya ve bû fermandarê He-leb.

Herwekû Ebûtahir reviya û hate Nisêbînê nik Mihemedê,

kurê Museyebê Uqeylî û Mihemed ew û kurê wî û serdarekî pê re di mala xwe de kuştin û çû ser Mûsil û ji xwe re girt.

3- MÎR ÎSAYÊ HUMEYDÎ :

Herwekû tê xuyakirin Humeydiya piştî kuştina herdû bira destê xwe ji Mûsil û Diyarbekir kişandine û careke dî li ferdandariya xwe ya kevnere, ferdandariya Akrê vegeyriyane. Lê em nizanin ev Mîr Îsa, kurê kêye û çend sala ferdandarî kiriye.

4- EBÛHESEN, KURÊ MÎR ÎSA :

Di sala çarsed û çilî(440) de navbera Mîr Qerwaş, fermandarê Mûsil û herdû eşîrên kurd Hezebanî, Humeydî nexweş ket û sebebê vê nexweşiyê ew bû, ko Bedran, kurê Muqelê Uqeylî, birayê Mîr Qerwaş dixwest kelehên kurda ji wan bistênî û bixî bindestê xwe.

Di wê çaxê de ferdandarê Hezebanî Ebûhesen, kurê Mûsa bû û ferdandarê Hemîdîya Ebûhesen, kurê Mîr Îsa bû ferdandarê Hemîdî di keleha Akrê de bû û çend helekên dîjî di bin destê wî debûn û ferdandarê hezebanî di keleha Erbîl de rûniştîbû û çend kelehên dî jî di bin destê wî de bûn.

Ebû Elî, kurê Mîr Mûsa li ber birayê xwe radibû û ev Ebûhesen, kurê Mîr Mûsayê hemîdî hevalbendê wî bû û herdiwa bihev re Ebûhesen, kurê Mîr Mûsa girtin û xistin zindanê û Ebû Elî bû ferdandarê Erbîl û paşê birayê xwe berda.

Tenê ev hevalbendîya van herdû mîrên kurd û girtina Ebûhesen ne bi dilê Qerwaş bû, lê nikaribû dengê xwe bikî. Di wê navê de dilsarî kete navbera kurê Merwan, ferdandarê Farqîn û Qerwaş, ferdandarê Mûsil û Qerwaş han û hewara xwe bire ji herdû mîrekên kurd re û Ebûhesenê hemîdî bi leşkerê xwe ve û Ebûhesenê hezebanî ji ber birayê xwe ve çûne hana Qerwaş û kurd û ereb li hev hatin û şer di nav wan de çênebû.

Lê Qerwaş, ev ji xwe re fersende dî û dest danî ser Ebûhesen û got: Dixwazim Ebûhesenê hezebanî vegeyri cihê xwe û bibî mezinê Erbîl û herdû kurên Ebûhesenê hemîdî li cem xwe giraw girtin û Ebûhesen şande Erbîl û Ebû Elî bixwe re anî û hatin cem dostê xwe û Ebû Elî ji birayê xwe re gerda na xwe xwar kir û ferdandarî da destê wî û herdû kurên Ebûhesenê Hemîdî ji girawê derxistin û hersê bihev re vegeyriyane Erbîl û birê de Ebûhesenê Hemîdî gote Ebû Elî; Vaye min herdû kurên xwe ji girawê derxistin. De ka were emê careke dî Ebûhesenê birayê te bigrin û bixin zindanê. Lê Ebûhesenê Hezebanî bi vê vîlikê agah bû û ji nivê rê vegeyriya û hin ji leşkerê xwe biwan re şande bajêr û herdû mîran leşkerê wî tankirin û serdarê wî girtin û xistin zindanê û

ji wê rojê de navbera Qerwaş û van herdû mîrekên kurd ne-xweş bû.

Herwekû di sala 441 koçî de navbera Zeîmidewle, kurê Muqeledê Uqeylî û Mûtemedidewle Qerwaş, fermandarê Mûsil ne-xweş ket û Zeîmidewle reviya û hate cem Suleyman Ebûlherb, kurê Ehmedxanê Merwanî, ko ji ber bavê xweve fermandarê Cîzîra Bota bû û li cem rûnişt. Ehmedxan, ji kurê xwe re şand û leşkerê giran dahev û çûne ser Mûsil û leşkerê Hemîdî bi serdariya Ebûhesen, kurê Mîr Îsa yê Hemîdî di nav vî leşkerê mezin de bû.

Tenê Hamîş Jimar-1 dibêjî: Li gora tarîxa Kamil İbnile-sîr dibêjî, dilsarî kete navbera Zeîmidewle Ebûlkamil û Qerwaş û kurê di hana Zeîmidewle çûne ser Mûsil û hindik mabû, ko Qerwaş xwe bidî destê dijmin, lê Zeîmidewle bazda û çû nik birayê xwe. Ji ber, ko ditirsiya, ko kurd welat bicarek bixin bin destê xwe û serdarê leşkerê Merwanî Suleyman Ebûlherb bû. Herwekû serdarê leşkerê Hemîdî Ebûhesen, kurê Îsa yê Hemîdî bû û piştî Zeîmidewle çû Mûsil û gerdena xwe ji birayê xwe re danî. Ev leşkerên kurd vege-riyan malên xwe. C-9-r(260)

5- MÎR ÎSA, KURÊ EBÛHESEN Ê HEMÎDÎ :

Di sala 528 koçî de li Mûsil serê xwe danî û di Tîltoq de hate veşartin. Herwekû di vê salê bixwe de Etabegzengî fermandarê Mûsil, kelehên Hemîdî: Akrê, Şoş û kelehên mayîn ji Mîr Îsa bi zor sitandin û anî cem xwe û li Mûsil danî.

Ji ber, ko berîhingî ev keleh ji Mîr Îsa sitandibûn û careke dî dabûn destê wî, lê di vê salê de peyrewê Bexda Musterşid hate ser Mûsil û Mîr Îsa bi leşkerê xweve hate hana peyrew û dixwest şerê Zengî bikî. Lê çawa peyrew ji ser Mûsil rabû û çû mala xwe. Careke dî Zengî ev kelehên ha bicarek ji Mîr Îsa sitandin û ew li cem xwe giraw hişt û divê salê de serê xwe danî. Ji wê rojê de ev hindam kete bin destê Turkmana û Nesîridîn Çeqer ji ber Etabegên Mûsil ve bû fermandarê vê hindamê û kurdên Hemîdî, Hekarî, Mihra nî bicarek xistin bin destê xwe.

Ev Çeqer mirovekî gelek xwînrêj û setemkar bû, gelek ji kurda kuştin û bêbextî li wan kir. Di piştî wî re ev hindamên kurd ketin destê Zeynidîn Elîkuçuk û ji ber mala Etabeg ve bû fermandarê van hindaman û ji ber xwe ve hin ferman-dar têde rakirin. Tenê paşê kor bû û bajarê Erbil tenê ji xwe re hişt û mala xwe têde danî û ev hindamên mayîn da-ne destê Qutbidîn, fermandarê Mûsil, kurê İmadidînzengî.

Herwekû di 576 koçî de Seyfidînxazî, fermandarê Mûsil hindama Akrê siparde kurê xwe Nasiridîn Kesek û di sala 581 de Yûsif Silahidîn, padîşahê kurd hate ser Mûsil û kur-

ên Hemîdî û Hekarî şandin ser kelehên vê hindamê û girtin. Çawa, ko ji tarîxa Mûsil tê xuyakirin, ko fermanîdar û serdarên vê dewleta Etabegî Turkmanî pirên wan kurd bûn, weke: Hemîdî, Hekarî, Mihranî, Baensî, Hezebanî, Merwanî, Danînî, Zaferanî, Ergeşî, Eyyubî.

Herwekû dawî ev malbat û eşîrên navdar bi carek çûne cem mala Eyub û li Şam û Misrê rûniştin. Ûgelek ji wan bûne Erebb û hin ji wan vegehiyane welatê xwe.

6- MÎR NESÎRÎDÎN Ê HEMÎDÎ :

7- MÎR ÊDXEMÎŞÊ HEMÎDÎ :

Herwekû di tarîxa Mufericilkirûb û tarîxa Fethilqisî de hatiye gotin. Ev herdu gernasên Hemîdî ji mezin û serdarên leşkerê kurd bûn û di nav leşkerê dewleta Eyubî de bi nav û deng bûn û di sala 586 koçî de di meydana şer de bi gernasî hatine kuştin.

8- MÎR HEKENDÎRÎ HEMÎDÎ :

Ji mezintirê serdarê leşkerê Hemîdî bû û di nav leşkerê Melikiezîz Osman, kurê Yûsif Şah, melekê Misrê de bû. Çawa fermanîdar û serdarên Osman lihev kom bûn û gotin: Em dixwazîn herin nik Adil Şah, apê Osman Şah. Lê ev Hekendîrî jî pişt Osman Şah venegeriya û jêre ev vîlik eşkere kir û got lê di Hamîş de dibêjî, min ev nav di nav tarîxa Hemîdî û Eyubî de nebihîstîye. Herwekû ez bixwe dibêjim gelek diris te, ko ev nav şaş û çewt hatibî gotin. Ji ber, ko Hekendîrî Merwaniye.

Herwekû di sala 914 koçî de xwediyê subhilaşî ji nivîştata Mesail-ul ebsar Tesqîfê diguhêzî û dibêjî Akre, Şoş, Bîrewê, Necme û welatê Beranî(Berzanî) di destê eşîra Mazencan de ne, ko ev eşîr ji eşîra Hemîdî tê jimartin. Şerve-nên wa 500 mirovin û dibêjin, em Mihemedîne, ev eşîr dibin destê Kek Mubarizidîn de ne, ko navê wî di nivîsarên kevna re de heye û bi ser navê wî ve Hemîdî hatiye danîn(Kek Mubarizidîn ê Hemîdî).

Ji dîwana peyrewê Bexda ev navê Mubarizidîn jêre hatiye dayîn û bi xwe yek ji fermanîdar û serdarên dewleta Ebasî bû. Mirovekî olperest û xwedênas bû. Xelkê jêre gelek diyarî tanîn û bi qasî wan diyariya ji malê xwe dananî ser û li belengazan belav dikir. Herwekû dabaşa wî di nivîştata Tarîfê de jî hatiye kirin û di dewleta Hilake de cihê wî gelek bilind bû û hêj bîst salî bûye fermanîdar û heftê sal di fermanîdarî de derbas kirine û paşê serê xwe danî.

9- MÎR KEKMUBARÎZÎDÎN :

Herwekû me derbas kir, yek ji fermanîdar û serdarên Ebbâ

siya bû û di nav dewleta Hûlagûxan de xwedî rûmet û payebi lind bû û heftê salî di fermandarî de bi kamîranî û serfî-razî maye û gelek olperest û xwedênas û comerd bû.

10-MÎR ÎZÎDÎN, KURÊ MÎR MUBARÎZÎDÎNKEK :

Piştî mirina bavê xwe bû fermandarê hindama Ekre, Şoş û eşîrên Hemîdî. Bi camêrî lihevgerîtin û weke bavê xwe çû û li cem padîşahên Tetera gelek bi pêşve çû û paşê serê xwe danî.

11-MÎR NECMÎDÎN XÎDÎR, KURÊ MÎR MUBARÎZÎDÎNKEK :

Piştî mirina birayê xwe ev Mîr Necmidîn Xidir bû fermandarê eşîrê kurdên Hemîdî û wîjî da ser şop û rêça bav û birayê xwe. Nivîsarên wî dihatin Misrê û gelek bilind bûn lê gelek neçû serê xwe danî û kurê wî kete şûna bavê xwe.

12-KURÊ NECMÎDÎN XÎDÎR :

Xwedyê Subhilaşî, nav û nîşanê wî nabêjî, tenê dibêjî : Piştî Mîr Necmidîn Xidir, kurê wî kete şûna bavê xwe û wîjî da ser rêçika bav û kalên xwe û fermandarî di destê wan de ma û ji fermandarê vê hindamêre dibêjin xwedyê Akre û Şoş û ji padîşahên Misrê re dinivîsîn Subhilaşî, sala 814 rûpel 373-379.

COGRAFIYA WELATÊ HUMEYDÎ

Herwekû tê xuyakirin li rojhilatê vê derebegiyê, derebegiya Erbîl û li rexê jorî derebegiya Hekarî û li rojava Hekarî û li jêr derebegiya Mûsil bûn. Kelehên Akrê, Şoş, Necme, Bîrewê, Barzan di nav vî welatî de bûn û pirê caran serbixwe bûn.

Ko îro hindama Akrê, Şêxan, Barzan di nav xwe de digrî û 500 şervanên vê derebegiyê hebûn û fermandarê wan serbi-xwe bû.

FERMANDARÊN HEMÎDÎ

1- EBÛLFEWARÎS HUSEYN, KURÊ DOSTÎKÊ HEMÎDÎ : 376

2- BAZEBÛŞECAD, KURÊ DOSTÎKÊ HEMÎDÎ : 380

3- MÎR ÎSA YÊ HEMÎDÎ : 400

4- MÎR EBÛHESEN, KURÊ MÎR ÎSA : 440

5- EMÎR ÎSA, KURÊ EBÛHESEN, KURÊ ÎSA : 528

6- NESÎRÎDÎN : 586

7- ÊDXEMÎŞ : 586

8- HEKENDRÎ : 591

9- MUBARİZİDÎNKEK

10-İZİDÎN BEG

11-NECMİDÎN BEG

12-KURÊ NECMİDÎN

Mala Mubariziddîn 147 sala fermandarî kirne. Gereke ev malbat di serê tarîxa Hemîdî de bê nivîsandin û di nêzikî sala 800 ê koçî de ji destê wan fermandarî derxistine.

Van herçar mirovan 147 salan fermandarî kirine û di nêzikî heştê de mala mîrekên Badînan ji wan si - tandibin.

ZIRZARÎ

Zirzarî yan Zirwarî, eşîreke mezin û navdar û bi denge. Dinav dewleta Eyubî-kurdî de yek ji çar perçê leşkerê dewletê bûn. Hekarî, Hemîdî, Mihranî, Zirzarî.

Îmadidînê Esfehanî di Fethilqisî de û kurê Wasil di Mufericîlkirûb de gelek caran bi qencî dabaşa Zirzariyan kirine û di meydana şer de bi gernasî dane xuyakirin. Welatê gawira wêran bû û tije kurd û Turk û Ereb bû û di cîkî dî de dibêjî, gernasê welatê heyca gelek hêja û Hemîdî ditirse de gernas û di şeran de mêrxas û Hekarî di şeran de weke keleh û rîman di şeran de di kilênin û Zirzarî li şêra dizûrin û di ser laşan ve dibûrin.

Herwekû di cîkî dî de dibêjin, di milê çepê şer de Hekarî, Mihranî, Hemîdî û Zirzarî bûn. Çawa, ko kurê Xilikan dibêjî, Melek Adil, kurê Salarê Zirzarî dinav dabaşeke mezin de tênî û Şerefxan di Şerefnamê de dibêjî, welatê Laccan jî di destê Zirzariyan de bû. Lê Pîrbedaq, Mîrê Baban, bi zor ji wan sitand. Herwekû xwediye Subhilaşa, ji Mesalikilebsar diguhêzî û dibêjî, Mazkurd û Ristaqên wê û çiyayên Cencerîn di destê Zirzariyan de bûn. Ev çiyayê Cencerîn ji rexê rastê ve raserîbajarê Şîno(Eşno) dikevî û dibêjin, ev Zirzarî di kok û binyada xwe de Ecemin. Lê di nav kurd de hatine pişavtin. Pênc(5) hezar çekhilgirê wan hene. Çiyayên wan gelek bilind û asê ne. Berf û serma di vî welatî de gelek dijwarin, pirê wan axa û dewlemendin, sê kevirîn bilind di serê çiyê de hene, ko baca rê li ber wan

ji rêwîyan distênin. Her yek ji wan keviran 10 mitir dirêj û 3 metir firehin. Li ser wan kevirana hin nivîsandin heye ko bi derbasbûna tarîxê hatiye windakirin. Û dibêjin, ev kevir hatine danîn, ko tarîxa wan mirovên, ko di nav berf û sermayê de dimirin, li ser wan binivîsin û bidin zanîn, ko di zivistananê de derbasbûna di vê hindamê ve gelek dij ware û gelek bi tirs û sawe.

Masalikilebsar, pêde diçî û dibêjî, Di îro de fermandarê wan Mîr Necmidîn Başak Başke û di piştî wîre kurê wî Mîr Cîde, li şûna bavê xwe rûniştiye û Mîr Ebdulah, kurê Cîde li cihê bavê xwe bûye fermandar:

- 1- Mîr Necmidîn Başûk-Başak
- 2- Mîr Cîde, kurê Mîr Başak-Başok
- 3- Mîr Ebdulah, kurê Mîr Cîde.

Herweha Mesalikilebsar pêde diçî û dibêjî û hin fermandarên dîjî di nav wan de hene. Weke Mîr Hisamidîn şêrê biçûk û piştî wîre kurê wî Mîr Başak-Başok bûye fermandar û li pey wî Mîr Îsmâil bûye fermandar û dipeyre de Mîr Heneş kurê Mîr Îsmâil, fermandarê Zirzara ye.

- 1- Mîr Hisamidîn şêrê biçûk
- 2- Mîr Başak, kurê Hisamidîn şêrê biçûk
- 3- Mîr Îsmâil, kurê Mîr Başok
- 4- Mîr Heneş, kurê Îsmâil.

1-MÎR SALARÊ ZIRZARÎ

Kurê Xelikan di wefiyatilayan de dibêjî, ev salar yek ji serdar û fermandarê leşkerê Mîr Artûqê Turkmanî, fermandarê welatê Qudsê bû. Lê çawa Artuq serê xwe danî û kurên wî Segman û Necmidînêlxazî û Behram ketin şûna bavê xwe. Lê Emîrilciyûş Melikil Efdel bi leşkerê Misrê ve hat û bajarê Qudsê ji wan sitand û ev Mîr Salarê Zirzarî bixwe re bire Qahîre û kurê Salar Adil xiste nav zarokên Qesrê û xwedîkir. Zarokên qesrê zariwên fermandar û serdarê leşkerê Misrê bûn, ko dixistin xwendegeha qesrê û didane xwendin û paşê ew dikirin fermandar û serdar.

Mexabin, ko ji mere nehatiye xuyakirin, ko ev Mîr Salar kengî çêbûye û kengî hatiye û kengî serê xwe daniye?

2-MELEK ADİL KURÊ MÎR SALARÊ ZIRZARÎ

Adil, ji nav zarokên qesrê baş derket û hafiz, peyrewê Misrê ew kire fermandarê Îskenderiyê û li wir gelek navdar bû û deng pêket û gavên xwe bi pêşde avêtin

Adil, li Îskerdiriye zanîngehek ji pêzanê kurd Hafiz E-bûtahir Seleve re avakir û gelek rûmeta wî girt. Çawa, ko çend mizgevt û xwendegêhên mezin li Qahîre û Bîtliis jî ava kirine û di sala 543 koçî de hate Qahîre û bû wezîrê peyrew Zafirê Ebîdî û Zafir navê wî kire Emîrilciyûş Melikil-adil.

Tenê ev awa bi dijminê wî xweş nehat û kurê Messal çend şerên dijwar pêre kirin, lê herdem xurtî di rexê Adil de bû û bi gernasî zora dijminê xwe dibir û naçare kurê Messal dakete rajêrê Cîze û leşkerê giran dahev û hate ser dijminê xwe, lê careke di kurdê Zirzarî zora dijminê xwe bir û kurê Messal di nav şer de kuşt û serê wî bixwe re birê Qahîre û ji wê rojê de Adil gerdanazad, serbixwe, berxwedar bû padîşahê welatê Misrê û bi serbilindî ev welat xiste bindestê xwe.

Tenê Adil şaşiyeke mezin kir, ko Bellare, Dayika Ebbas, kurê Yehya, kurê Temîm, kurê Muiz, kurê Badîsê Senhacî ew jinbiya ciwan û navdar markir û kurê wê Ebbas kire yek ji serdarê leşkerê xwe û kurê Ebbas Nesir di nav mala xwe de xwedîkir û dawî hersiya bihev re Adil dinav nivînê wî de kuştin.

Kurdmanca ji berê de gotine, çêliyên maran bê jehir nabin. Adil di sala 543 koçî de bû padîşah û di sala 548 koçî de di nav nivîna de bi destê kurê jina xwe hate kuştin.

ZIRZARÎ DI NAV LEŞKERÊ EYYÛBÎ KURDÎ DE

1- CEMALÎDÎN ŞERWÎNÊ ZIRZARÎ :

Ev Cemalidîn, kurê Hesênê Zirzarî yek ji serdarên navdarên leşkerê Yûsif Şah Silahidîn bû. Li ser bajarê Qudsê hârê kuştin.

Kurê Wesil û Îmadidînê Esfehanî dibêjin, leşkerê kurd dijmin bicarek di nav bajarê Qudsê de xiste asêgehê û hawîr bajarê Qudsê girtin. Lê gelek caran dijmina li dervê bajêr şerê leşkerê kurd dikirin û gelek ji hev dikuştin. Ú carêkê ev Mîr Cemalidîn bi hin siwarên xwe ve diçûn. Şerên dijmin û bi rê ve li kemîneke neyaran rashatin û piştî şerêkî xwîndar gelek ji herdû rexan hatin kuştin. Lê ev Mîr Cemalidîn ji rexê misilmana ve hate kuştin û kurd û Misilman gelek berdiketin.

2- MÎR NUŞÎREWÂNÎ ZIRZARÎ :

Hêj padîşah nemiribû, fermanदार û serdarên dewletê gi-hanhev û gotin, gereke berî padîşah serê xwe deynî em me-

lik Efdel li şûna wî rakîn û di nav van serdar û mezinan de çendek kurd hebûn, ko ji wan Xweştirînêhekarî, Neşîre - wanê Zirzarî û Elikan û Mengelan bûn.

Herwekû di şerê mezin de leşkerê Zirzarî bi hevalên xwe kurdên mayîn re di milê çepê de bûn. Hekarî, Mihranî, Hemî dî, Zirzarî û kurdên mayîn.

Lê bigir di sedê heştê koçî de xwediyê Subhilaşî ji Me-sail-ul ebsar diguhêzî û dibêjî: welatê Mazkurd û ristaqên wî jî, di destê kurdên Zirzarî de ne. Herwekû çiyayê Cence rîn, ko ji rexê rastê ve raserî bajarê Eşno(Şîno) dikevî dibindestê van Zirzariyan de ye. Herwekû me di pêş de der-bas kiriye.

Herwekû di sedê hezarê koçî de Şerefexan Beg di Şerefna-mê de dabaşa wan kiriye û gotiye: Watê lacan-Lahîcan, di bin destê Zirzariyan de bû lê Pîrbodaq, fermandarê Baban ji destê wan derxist û bi ser welatê xwe ve berda.

Tenê di hindameke dî de dibêjî, Suleyman Begê Sorî bi sêzde(13) hezar siwar û peyave çûne ser Zirzariya û 350 ji mezin û serdarên wan kuştin. Mîrlîwa yê wan jî, di nav vî şerî de hate kuştin.

Lê mixabin, ko heta navê Mîr Liwayê wan jî, nadî xuyaki rin. Herwekû bixwe dijminahiya wan dikî, ji ber, ko di des pêka nivîšta xwe de navê wan tênî. Lê di derebegên Kurdis-tanê de dabaşa derebegiya Zirzarî bicarek naniye.

Ca nizanim ne ji wan nexweşe, yan tiştê di biwara wan de bi destê Mîrê Bedlîsê neketiye. Tenê dibêjî, fermanda - rên mayîn çûne nik padîşahê Turk Selîm Xan, gilî û gazine xwe kirine, lê padîşahê dijmin guh li gilî û gazine wa ne kirye. Ji ber, ko berî hingî Suleyman Begê Sorî li talanê kurdên Îran xistibû û gelek diyarî û tiştên giranbiha ji wî talanî ji padîşah re şandibûn.

Herwekû kurê Xelikan Dabaşa Bedridîn Yûsif, kurê Hesên, kurê Elîyê Zirzarî kiriye û dibêjî, di sala 578 koçî de çê bûye û di sala 663 koçî de li Qahîre serê xwe daniye û bi-xwe li welatê Misrê Qadîlqudat bû. 1966-2-3

Mûsahesen-Cigerxwîn

DEWLETA ERTUQÎ LI HESKÎF

Kurê Ezreq dibêjî: Segman, kurê Ertuqê Turkmanî bajarê Heskîf xiste destê xwe û ji destê Mûsayê Turkmanî derxist û Mûsa kuşt û Segman di sala 498 de serê xwe danî.

1- SEGMAN, KURÊ ERTUQ :

Ertuq li bajarê Qudsê di sala 491 de serê xwe danî û Necmidîn Elxazî û Segman û Behram, hersê kurên Ertuq çawa Efdel Emîrilciyûş welatê Qudsê ji wan di sala 491 de sitand hatin cem Mihemed Şah, kurê Melek Şahê Selcoqî, padîşahê Bexda û Kurdistan û Îran û li Bexdad rûnişt.

Mihemed Şah Necmidîn, birayê mezin kire şehne-fermandarê pûlîs û Segman di sala 495 de keleha Heskîf bizzor ji Mûsayê Turkman sitand û Mûsa kuşt û di sala 498 de bi Cigermij re çûne şerê Firing û di vê salê bixwe de serê xwe danî.

2- İBRAHÎM, KURÊ SEGMAN, KURÊ ERTUQ :

Piştî mirina bavê xwe bû fermandarê Heskîf û ji sala 498 ta bi sala 502 koçî fermandarî kiriye û di çaxê wî de İmadidîn Zengî çû ser Bexda û ev İbrahîm di hana peyrewê Bexda çû ser bajarê Nisêbîn. Lê di Hamiş -1 de dibêjî, ji sala 498-502 fermandarî kiriye. Tenê kurê Wasil dibêjî, di sala 527 de İmadidîn çûye ser Bexda û ev herdû gotin lihev dernakevin.

Ji lewra diriste, ko di çaxê Mîr Dawid de bî, neko di çaxê Mîr İbrahîm de bî, yan yek ji herdiwan nerast dibêjî.

3- MÎR DAWÎD, KURÊ MÎR SEGMAN :

Piştî mirina birayê xwe bû fermanदार û di çaxê wîde li ser Amed şer di navbera wî û Îmadidîn Zengî û Hisamidîn Te mirtaş de çêbû û Dawid leşkerê xwe kişand û hate mala xwe.

Herwekû di sala 535 de li ser bajarê Behmed-Behmurd-Ba-kern çêbû û bajar kete destê leşkerê Îmadidîn çawa, ko di sala 537 de Îmadidîn bajarên Tenz, Sêrt. Maden, Hîzan, Zewq, Bedlîs xistin destê xwe û Banasa û Zulqirneyn ji we-latê Amed û Cebîlîn û Mozer ji Mardîn Şebextan girtin, lê nikaribû Amed, Hênê bixî bindestê xwe. Mîr Dawid di sala 539 de serê xwe danîye.

4- QEREERSELAN, KURÊ DAWÎD :

Piştî mirina bavê xwe bû fermanदारê Heskîf û Qutbidîn fermanदारê Mûsil keleha Hêtmê(Heysem) da destê wî, ji bo, ko alîkariya wî bikî û bihev re herin şerê Nûridîn Mehmûd û di sala 558 de leşkerê Fexridîn Qerearslan çû hana Nûri dîn Mehmûd û şerê Firinga kirin û di sala 562 de Fexridîn Qerearslan serê xwe danî.

5- NÛRIDÎN MIHEMED, KURÊ FEXRIDÎN QEREARSLAN. :

Di sala 562 de bû fermanदार û di sala 581 de serê xwe danî. Herwekû di sala 566 de çû hana Nûridîn Mehmûd û baja rê Şengalê ji fermanदारê Mûsil sitandin û di vê salê de we-latê Çiya-Azerbaycan di bin destê Êldeniz, fermanदारê Turk manî kole de bûn.

Nûridîn Mihemed, keça Qilîçarlan, padîşahê Rom mar kiribû û jineke dengbêj ji Bexda anîbû ser jina xwe û ji bô vê jinekê şer di navbera wan de çêbû û Silahidîn di hana Nûridîn Mihemed hat û dawî li hevanîn û Nûridîn jinika dengbêj berda. û ji wê rojê de Cizîr û Heskîf ketin bin siya dewleta kurd û xutbe li ser navê Împeratorê kurd Silahidîn hatin xwendin û di sala 578 de Nûridîn bicarek xwe siparde dewleta kurd û bû fermanदारê dewletê û di sala 581 de serê xwe danî. Wê di tarîxa Împeratoriya Kurdî-Îslamêde ev dabaş bê gotin.

6- QUTBIDÎN SEGMAN, KURÊ NÛRIDÎN MIHEMED :

Piştî mirina bavê xwe bû fermanदार û leşkerê Heskîf bi serdariya birayê xwe Îmadidîn rêkire hana Silahidîn û di sala 581 de li Farqîn hate cem Silahidîn û wezîrê wî Qewamidîn Ebûebdilâh Mihemed pêre bû û ev wezîr divê salê de bi dizî hate kuştin.

Herwekû divê salê de xutbe û pere di welatê Mûsil, Cî - zîre, Mardîn û Kurdistanê bicarek hatin ser navê Silahidîn û di sala 584 de leşkerê Diyarbekir bi serdariya Qutbidîn,

li ser bajarê Eka di nav leşkerê kurd de şerê dijminê Îslamê dikir.

7- MELEKİSALİH MİHEMED, KURÊ NÛRÎDÎN MİHEMED :

Di şerê Şengalê de leşkerê Heskîf û Amed bi serdariya Salih Mehmûd hate hana Adilşah, kurê Eyyûb û bi hev re çûne ser Şengalê û Adilşah gundê Qeradî ji hindama Mardîn da Salih.

8- RİKNÎDÎN MESÛD, KURÊ MELEKİSALİH :

Di sala 629 de Kamilşah, kurê Adilşah, padîşahê kurd li Kurdistan-Şam-Misirê ev hindama Heskîfê ji Mesûd sitand û bixwe re bire Misrê û kurê xwe Necmidîn Eyyûb xiste şûna wî û kire fermanarê Kurdistan, Amed, Cizîr, Farqîn, Xelat.

Dimişq 1971-1-9

Mûsahesen-Cigerxwîn

DEWLETA TURKMANÊ ERTUQÎ LI MARDÎN

Herwekû me di dabaşa dewleta Ertuqî li Heskîf derbaskir ko Ertuq li bajarê Qudsê serê xwe danî û Efdel Melikilci - yûş ji welatê Mîsrê hat û welatê Felestîn ji zariwên Ertuq sitand û Necmîdîn Êlxazî bi herdû birayên xwe ve çûne cem Mihemed Şah, kurê Melekşahê Selcoqî û li Bexda rûniştin û di sala 501 de ji ber Selcoqiya ve bû fermandarê Mardîn.

1- NECMÎDÎN ÊLXAZÎ, KURÊ ERTUQ :

Di sala 501 de bû fermandarê Mardîn û bajarên Dara û Ni sêbîn. Ji padîşahê Mûsil, Aqsenqerebersiqî sitandin. Her wekû Farqîn û Amed jî û hêla van herdû hindaman bicarek xistin bindestê xwe û di sala 516 de serê xwe danî.

2- HÛSAMÎDÎN TEMÛRTAŞ, KURÊ ÊLXAZÎ, KURÊ ERTUQ :

Piştî mirina bavê xwe bû fermandarê Mardîn û li şûna bavê xwe rûnişt û di sala 530 de keleha Hetax ji Mîr Îsa, kurê Mîr Ehmed, kurê Mîr Nisamidîn, kurê Ehmedxanê kurd sitand û di sala 528 de ev Mîr Hisamidîn digel Mîr Îmadidîn, fermandarê Mûsil bi du leşkerên giran ve çûne ser bajarê Amed. Lê Sadidewle Îkildî, kurê Fexridewle Îbrahîm, kurê Yênal hana xwe bire Mîr Nûridîn Riknidîn Dawid, fermandarê Heskîf û hana Dawid jêre hat, lê piştî sê mehan şer, leşkerê Dawid vejeriya mala xwe û leşkerê Mûsil û Mardîn naçare ji ser bajêr rabûn.

Lê Îmadidîn paşê keleha Sitewrê ji Hisamidîn sitand çawa, ko di sala 533 de Îmadidîn hate ser keleha Darê, lê leşkerê Mardîn bi mêranî liber xwe dan û keleh bi destê ve bernedan..

Çawa, ko di sala 544 de Seyfidîn Xazî, fermandarê Mûsil hate ser Mardîn û keleha Darê sitand, lê Hisamidîn keça xwe dayê û ji ser welatê xwe vejerand, lê çawa bûk gihandin Mûsil, Seyfidîn serê xwe danî û Qutbidîn, birayê wî ew jî markir û bû fermandarê Mûsil û Xatûn bû xatûna welêt û Hisamidîn di sala 548 de serê xwe danî.

3- NECMÎDÎN ALPARSLAN , KURÊ HÛSAMÎDÎN TÛMURTAŞ :

Piştî mirina bavê xwe bû fermandarê Mardîn û kete bin siya dewleta Mûsil, çawa, ko leşkerê Mardîn di sala 558 de di nav leşkerê Nûridîn Mehmûd, padîşahê Şam û Cizîrê de bû, ko diçû ser bajarê Harem û bihev re şerê dijminê Îslamê di kirin.

4- QUTBÎDÎN ÊLXAZÎ, KURÊ NECMÎDÎN ALPARSLAN :

Di sala 578 de bû hevalbendê Îzidîn, fermandarê Mûsil û bihev re çûne şerê imperatorê kurd Yûsifşah Silahidîn û pozşikestî bi paş de vegeyriyan û şikestin û Yûsifşah bajarê Herzem ji hindama Mardîn sitand û Qutbidîn di sala 580 de serê xwe danî.

5- HÎSAMÎDÎN YÛLÎQ, KURÊ QUTBÎDÎN ÊLXAZÎ :

Piştî mirina bavê xwe bû fermandarê Mardîn û Nizamîdîn Beqîş bû wezîrê wî. Ew Beqîş kolê Qutbidîn bû û di sala 601 de li ser destê Nasirîdîn Ertuq hate kuştin.

Nizamîdîn, Mardîn da Adilşah imperatorê kurd, padîşahê Şam û Misr û Cizîrê Kurdistan lê çawa leşkerê Adilşah di çemê Ferat derbas bû Nizamîdîn tirsîya û bajar û keleh asê kirin û piştî şerekî xwîndar û dijwar Adilşah bajar girt û talankir, lê kele di asêgehê de ma û di sala 595 de Adilşah bajar bicî hişt û vegeyriya Şam û kurê xwe Kamil Şah Mihemed li ser bajêr hişt û çû. Lê Efdilşah Elî, kurê Yûsifşah, fermandarê Şemîşat û fermandarê Mûsil, Şengal bihev re hatin ser Kamilşah û naçare Kamilşah bajardi cî de hişt û çû Farqîn û vegeyriya Heran.

Herwekû di sala 599 de Eşrefşah, kurê Adilşah, kurê Ey-yub hate ser bajarê Mardîn û li Herzem jêrê çiyê peya bû û paşê li ser destê Zahirşah, kurê Yûsifşah li hevhatin.

a- Fermandarê Mardîn wê 150 hezar dînarî bidî Adilşah.

b- Xutbe û pere gereke li ser navê imperatorê kurd Adilşah bin.

c- Leşkerê Mardîn wê herdem di hana û hewara dewleta kurd de bî.

d- Fermandarê Mardîn wê yek ji fermandarên dewleta kurd bî.

e- Wê dewleta kurd alîkariya fermandarê Mardîn di hember dijminê wî debikî û biparêzî.

f- Deh hezar dînar û gundê Qidarî ji welatê Mardîn ji Za - hirşah re bidî.

6- NASÎRÎDÎN ERTUQ, KURÊ QUTBÎDÎN :

Piştî mirina birayê xwe bû fermandarê Mardîn û wezîrê xwe Beqîş Nizamîdîn kuşt û dawiya dewleta Mardîn bi mirina vî hat.

Lê Mihemed Emîn Zekî dibêjî; di sala 811 de li ser destê Qereqoyunludawiya vê dewletê hatiye. Ca eger ev rast bî 310 sala fermandarî kirine. Me navê wê kiriye dewlet, ji ber, ko gelek caran serbixwe fermandarî kirine û heta Heleb û Xelat xistine bin destê xwe.

1966/2/14

Dimişq Mûsahesen-Cigerxwîn

FERMANDARÎ Û REWŞA EŞÎRA LOR Ê MEZÎN (BEXTIYARÎ)

Major Rawlinson dibêjî: Di sala 1836 z. de Êlîxan û fermandarê vê eşîrê Mihemed Teqî Xan bû, ko ji neviyên Elî Muradxan e û ji eşîra Canîkî ye. Kalikê wî Elî Muradxan piştî mirina Nadîrşah Îran bicarek xistibû bin destê xwe.

Lê Mihemed Teqî Xan xwendevanekî mezin û zana û gernasekî navdar e di nav miletê xwe de gelek bi rûmet û pîroze di karî diwazde(12) hezar mirov bixî bin çeka û bajoyî meydana şer. Welatê wî gelek avadan û dewlemend e, herwekû eşîrên wî gelek zeviyên pir mezin û hêja di hindama Erîdon de girtine û dest bi avanî û cîyên girtinê dikin û gelek gundên hêja têde avakirine.

Tenê sergêjî û berberî pirê carandi navbera Heftleng û Çarleng de peyda dibin. Bi kurtî rewşa civakiya vê eşîrê ji rewş û pergala Lorê biçûk gelek çêtir û xweştir e. Şîweyê zimanê vê eşîrê kurdiye, tenê gelek dûrî zimanê kurdî bûye, bêtir di peyv û gotinê de dûr ketiye, lê bi rastî her eşîreke kurd di çiyayê Zagros de ji xwere şîwekî serbi xwe çêkiriye. Herwekû ev eşîra kurd gelek mêr û gernas û hişk û dijware.

Major Rawlinson, bi navên bavikê Bextiyarî çêkiriye û jimara wan têde daye xuyakirin, ko dixwazin di vir de tiştek bidin xuyakirin.

<u>EŞİRA MEZİN</u>	<u>BAVİKÊN EŞİRE</u>	<u>JİMARA MALA</u>	<u>JİMARA TEYAYÎ</u>
Heftleng	Olakî, Maleh	400	
	medî, Bextiyar-	600	
	wend, Rûdkî, Sa-	4000	
	lakî	2000	
		<u>7000</u>	7000
Çiharleng	Kenorsî	1000	
	Sehonî	1500	
	Mihemedsale	1000	
	Mûkî	500	
	Memewendî	4000	
	Zalakî		
	Bawapî	3000	
	Oral, Şalowe	2500	
	<u>13500</u>	13500	
Xwepêgirtî	Canokî		
	Germesîr	4000	
	Xanokî		
	Serdesî	2000	
	Gundizlu	1500	
	<u>7500</u>	7500	
	Tevayî		<u>28000</u>

Bîst û heşt hezar malin û sed û çil hezar mirovin. Ji Zihaw ta Xuzistan rûpel 103.

Lê qeymeqam Sir Arnold Wilson, di sala 1926 z. de nivîsarek di kovara civata Asya navîn de belav kiriye û dibê - jî; fermanîdar Êlîxan di îro de Xwedakeremxane, kurê Elîxan kurê Mihemed Tekî Xan kurê Hesexan, kurê Fetah Elîxan, kurê Hesexan, kurê Zemanxan Keyarese keyar yek ji çar bavikên Çiharmehele. Mezawic, Lar, Keyar. Çirokên wa dibêjin: Ev Zemanxan ji neviyên padîşahê navdarê Îran, Cemşîdê navdare.

Mihemed Teqî Xan, ala serxwebûnê hilda û dewleta Îran leşkerekî Îran rêkire ser û naçare bazda û çû cem şêxê eşîra Benîkab, Şêx Tamir û şêxê navdar ew da destê dewletê û di zindana Taran de serê xwe danî û Axacan, kurê Mihemedteqîxan bû fermanîdar, lê di dawiya jîna wî de fermanîdarî ketê destê Heftleng (Heftlanc).

Herwekû di çaxê Sir Wilson de fermanîdarê Bextiyarî yek ji neviyên Heyderkorbû. Piştî Heyderkor, kurê wî Xalibxan, bûye fermanîdar û Salihxan, ji neviyên Xalibxane, ko di şe-

rê Hindê de bi Nadîrşah re bû û piştî çend bavika Cafer Qulîxan bûye fermandar. Ev Cafer Qulîxan, kurê Esedxane, ko herdû malbat lê digihêne hev. Û piştî Cafer Qulîxan, kurê wî Esfendiyarxan bûye fermandar û piştî wîre birayê wî Mihemed Huseyn Xan bûye fermandar. Esfendiyar Xan, di sala 1903z. de serê xwe daniye û Mihemed Huseyn Xan piştî wî bi du sala serê xwe daniye.

Herwekû Rawlinson di cîkî dî de dibêjî, jimara malên Pêşkoh çil(40.000) hezar male û jimara Piştkoh pazde(15.000) hezar male û jimara eşîrên xwe pêgirtî pênc(5000) hezar male, ko bihev re dikin şêst(60.000) hezar mal.

Rawlinson pêde diçî û dibêjî; mezinê Lorê biçûk ne mirovekî tenêye, belkî Toşmal Keye-Ketxuda mezinê bavika karê millet û welêt dikin. Weke fêderasyon bihev re radibiwêrin.

Di vê hindamê de jin karê mêra dikin, tenê mêr dara dibirin, komerê çêdikin û pez û sewalê xwe diçêrênin. Ji Zihaw ta bi Xuzistan rûpel 110.

Di tarîxa Guzîde de hatiye, ko Lor du perçe û heşt bavikin û ji wan pêve hijde(18) eşîrên ko xwe bi wa girtine hene. Herwekû eşîrên Sahî, Arsan, Arikî, Bîhî, ko bi Lorî di peyivin, lê di koka xwe de ne Lorî ne.

Tenê di îro de Lor çar perçene: Mamesanî, Kohgiloyî, Bextiyarî, Lorê kevnare. Ji ber, ko gelek nêzîkî farisî bûne zimanê wan jî pir nêzîkî zimanê farisî bûye. Lê digelvî qa sî jî hêj gelek bi kurdîtîya xwe ve girêdayî mane, ji van bavika teva mezintir Mamesanî ye, ko ew jî çar bavikin; Bagaşî, Cawîdî, Dijminzarî, Rustemî. Lê kohgiloyî sê perçene; Axacarî, Pawî, Çikî û her yek ji van bavikan jî dibin çend perçe, herwekû Axacarî bûne neh(9) perçe, ko çar ji wan bi xwe Turkmanin û di nav kurdan de hatine pişavtin û xwe win da kirine. Herwekû Bextiyarî jî bûne du perçe; Çarleng, Heftleng û Heftleng gelek mezine.

Çiharleng di hindama Birocird(Birogird) û Gulpaykan de rûniştîne û cî girtine. Rojhilatzan Rose dibêjî; Warên eşîrên Bextiyarî Serzekoh, Zerdekoh, Şoştir, Esfehnan, Kermanşahin û jimara wa sed(100) hezar male, ya sêsed(300) hezar mirove, nivişta kurdler.

Lorê kevnare, ya Lorê bingehîn çar perçene; Terxan, Delefan, Selsele, Balagêrwa. Lê ev bavikê paşî Lorê herî kevnare ne. Ji ber, ko ji mezinê xwe re dibêjin Mîrê Mîran, ev nav ne kevnare.

Herwekû çend bavikên dî ji Balagêrwa derketine, Derîgewend, Segewend û herwekû tê xuyakirin ev bavikê Derîgewend mezintir û kevnaretirê eşîrên Lorin. Ji ber, ko Mîrê Mîran

ji mezinê wa ra tê gotin.

Fîlî, Lorê bingehî di Loristan de rûniştîne. Cotkar û karkerin û ji pêncî(50) hezar ta bi heştê(80) hezar mirov hene. Ew jî du perçene; Pêşkoh û Piştcoh û her yek ji wan bûye hivde(17) eşîr; Ebdelawend, Şexawend, Keysawend, Gero sî, Remziyar, Jerhrawend, Bacilawend, Cîlîwend, Kelhor, Mafî, Qerezencîrî, Zengene, Sadewend, Kakawend.

Herwekû Lek jî ji Lor û kurdên sade ne. Çawa, ko di Daîretul Mearîful İslamîye de rûpel 11-12 de dibêjî; ev eşîra Lek berî hingî sed hezar mirov bû, ji ber, ko bi zimanê Farisî jî se de hezar lêşker re dibêjin, lek, tenê ev lek bi şîwakî dipeyivin, ko nêzîkî li şîwe(zarawê) Kelhor dikî û eşîra Mahîkî, ko li nêzîkî Kermaşah rûdinî, bi zarav û şîwê Lek dipeyivî, tenê eşîra Şohan, ko dikevî jêrê Piştcoh, bi Kurmancî dipeyivî.

Rojhilatzan Şînler dibêjî; Kerîmxanê Zend ji vê eşîra mezin û ji gundê Parya, ko îro jêre dibêjin Parê, derketiye, ko ev gund bi sîh(30) kîlometir dûrî dewleta Bade. Û li ser riya Sultanabade. Ev eşîrên kurd, ko îro di jêrê Loristan de rûniştîne xuyaye, ko ji rajor hatine vê hindamê û Mosyo Rabîno dibêjî; di çaxê Şah Ebbas de anîne vê hindamê. Ji bo, ko nehêlî Huseyn Xan' lingê xwe bêtir bi pêşda bavêjî. Herwekû Mosyo Rabîno pêde diçî û dibêjî; Kurdên Selsele, Delefan, Bacilan, Zend, Mafî, Zendewkale ji eşîra Lek tene jimartin, û Kerîmxanê Zend ji kurdên Babiranewende. Birne Şîraz û li cem xwe hiştine û vê êlê û êla Bacilan gelek alîkariya Mihemedxanê Zend kirine, ko di sala 1312 z de dixwest dewleta Zend nûjen bikî û ji bo wilo ev êl û gelek êlên dîjî ji kurdên Lek hatine eşandin û perçekirin. Qacariyan gelek zor û setem bi ser wan de barandine û pir hindik mabû, ko eşîra Zend bicarek bêwindakirin, ji ber ko ji wanên, ko xwe dinav eşîra Bacilan de veşardibûn pêve kes nehate parastin, hin ji Zend di îro de dihindama Dor û ferman de rûniştîne. Herwekû hin ji wan li jêrê rojhilatê Kermaşah rûniştîne û eşîra Mafî di hindama Taran, Qezwîn de cîgirtine. Herwekû di hindama Waramîn de jî hene.

Li ser gotina O Man û Rabîno, eşîrên Lek, ko îro di Loristan de ne çend perçene. Selsele nehhezar(9000) malin. Delefan 1470 malin, Tîrxan-Merayî 1582 malin, Dalewend hezar(1000) malin, ko bicarek dikin 19000 mal.

Dalewend, ko perçak ji Babiranewende li rojhilatê Xurem abad rûniştîne, Selsele Delefan li deşta Eleştar cî girtine û li Xawe jî hene. Terhan-Terxan li milê cepê çemê saymara-Semîre rûniştîne.

Bi kurtî eşîrên Lek, li rajorê rojhilatê Loristan cîgir

tine û ji vê hindamê re dibêjin Lekistan, di îro de sala 1914 z de Elînezexan, fermandarê Eşîrên selsele û Delefan û Tîrhane. Herwekû herdiwên dawîn ji Alêheq-Rafidiyîn têne jimartin. Gurzon, di Daîretûl Meariful Îslamîye de dibêjî ; Di sala 1298 koçî de, ya 1881 z. de jimara xelkê Loristan, bîst û yek hezar û nehsed û not û neh(21.999) mirov bûn û 17 hezar Bextyarî ne û çarde(14) hezar Kohgilowî ne û Fîlî dused hezar mirovîn

Di sala 1914 z. de Mosyo Rabîno dibêjî; Pêşkoh sed û sîh hezar û piştcoh pêncîhezarin û Rabîno pêde diçî û dibêjî; Loristan bi awayê zimanê xwe du perçene. Lorê mezin, Ma mesanî, Kohgiloyî, Bextiyarî û Lorê biçûk Fîlî ne. U Mihe - med Emîn Zekî Beg dibêjî; Hin dibêjin, ko zimanê Loristan, şîwak ji zimanê Farisîye. Ji ber, ko gelek nêzîkî Farisîye û xwe pêgirên paşiya gotinê di herdû zimana de weke hev tîn. Herwekû di peyvê de jî weke hevin. Lê birastî ev bawerî gelek weza û sefile. Divê mirov kûr û dûr lê binerî, jî ber, ko bêgoman şîweyên van herdû perçên Lor jî nêzîktirê zimanê kurdî ne. Ji ber, ko Kurd û Lor ji hev fam dikin. Lê Faris û Lor ji hev fam nakin.

REWŞA BEXTIYARÎ

Karilton-Kon, di nivîştta Kerwan de dibêjî, Bextiyarî di havîna de, di newala Tarûn ê jêrî de dijîn û li ser wan çemên biçûk, ko jê vedikevin belav dibin. Herwekû di serê avê de, ko jêre dibêjin Avdiz, gelek ji wan rûdinin.

Li vir çiyayê Zagros dibî du zencîr. Yek di hindirû de û yek ji derveye, çend newalên kûr wan ji hev cuda dikin. Ev newalên ha jî gelek kûr û ciyayên wa gelek bilindin, di navbera 7-8 hezar pêde hene.

Çawa, ko zencîra derve hin newalên dijwar têde peyda di bin, ko hin avên xurt û bi şek di wan ve berjêr dibin û di çin ser çemê Qarûnê, mezinê jêrî, ko di deşta Ahwazê-Î Ama kevnare ve derbas dibî û diçî Şetê Ereb.

Hawîrê wan newalan bicarek ji darên Sindiyan(Berû) hati ne dagirtin. Çawa, ko darên Xox, Hirmî, Kerez, Behîv, Gu hîj, Guyîz di van newalan de bi pirî peyda dibin. Bi kurtî ev newal û hawîr wan têr dar û ber û rêl û daristan û şîna hî ne û beriwên şêrîn di nav wa daran de gelek têne dîtî û xelkê welêt ji xwere didin hev û dixun. Birastî weke bihiştta riwê cihanê ye.

Ev Bextiyarî, ko divê bihiştê de dijîn, bûne du perçe, Heftlane(heftling) û Çarlane(Çarling). Dibêjin, du bavikin ji du bira veketine. Ji yekî heft û ji yekî çar kur mane û her eşîrek çend bavikin û her bavik jî çend malin û ev çend mal bihev re digerin û bihev re warên xwe digrin û bi hev re datênin û li ser hev dixeyidin û her bavikek Ketxû dakî wan heye, ko em jêre dibêjin Keye-Keyxwe, ko ji Ketxû da hatiye.

Ev Ketxuda, ji sergêjî û karê bavikê xwe berpisyare û tê vebijardin. Lê hin dixwazin bikin vegirtin. Bêwekû kur li şûna bavê xwe rûnî û nayê vebijartin.

Di barkirinê de ev Ketxuda çavdêrê bavikê xwe ye û pêwanîyê li wan dikî û li wandibî xwedî û di bermirovên xwe de didêrî û ji wan re war û elaxan dibênî û nahêlî kes pîsitû riya li wan bikî û wan ji ser hev didîalî.

Li ser her êlekê Xanek heye. Xan, ji turkî hatiye û şûna axa(mezin) girtiye. Belkî ji axa jî mezintir bî, lê Xan bi vegirtine kur ji bav vedigrî û li şûna wî rûdinî, bê ko wî vejêrin. Xan di ser Ketxuda re ye û Ketxuda ji ber ve karê bavikê xwe dikî û ji xan mezintir Elîxane. Êl- eşîre û

Xan mezinê eşîrê ye û êlbeğ ji ber êlîxan ve karê eşîrê di kî û herdû jî têne vebijartin, tenê ji malmezina vedibijêrin û Şah baweriya xwe pê tînî, û fermanekê jêre dinivîsî û dikarî wî ji cîkî bibî cîkî dî.

Heta îrojî êlîxan û êlbeğ ji eşîra Heftlancin û ji kevnarede di destê wan de bûn. Lê rojêke Çarlancjî hebû, ko gelek mezin bûn, zariwên malmezina li Taran dixwênin û diçin derve.

Imperatore Sureya, ji malbata Êlîxane, navê paytexta wan Şalmazar e, gundeke hezar û çarsed mirov têde hene. Herwekû bazar û çarşiya wî gundîjî heye û xelkê vî gundî cotkar û karkerin û secada jî çêdikin. Di nêzîkî vî gundî de beşçakî Êlîxan heye.

Herwekû di wargehê havînîdejî paytexteke wan heye, ko jê re dibêjin Çarmehel, lê pirê xelkê vî gundî Ermen û Gurcin.

Li Şalmazar salê carekê derê fermangehê tê vekirin û Êlîxan du carên dîjî li fermangehê rûdinî, carek li Erdul û carek li Oraxan rûdinî û xelkê ji ser hev didî alî.

Ev Or-Axûn gelek bi tirs û sawe. Kevnarakî mezin di rewşa wê de tê dîtin. Kevirekî pîroz têde heye, ko padîşahên, kevnare şop û bermayên xwe li ser nivîsîne. Êlîxan li ser vî kevirî rûdinî weke kursiyê fermanrewaye. Kengî bixwazî, du mirovan, du eşîran ji ser hev bidî alî li ser vî kevirî rûdinî, li nik Êlîxan xelkê eşîrê hemî weke hevîn û kesî di ser kesî re nagrî û bi dilovanî û wekhevî di nav wan de dipeyvî û ferman dikî.

Bextiyarî weke yek eşîrê bihev re digerin û bihev re bardikin, bihev re datênin tenê Lor(Fîlî) ne wilone, her eşîrek ya her bavîkek ji hev cuda digerin û mezinê her bavîkek, her eşîrek cudaye û çend fermandarên wan hene.

Lê Bextiyarî di salê de du caran bihev re diçin koçeriyê û ji ber, ko tenê yek rê heye, ko têre derbasbin ji lewra bihev re diçin û bihev re tên.

Çiyayên bilind û ava çemê Qarûn gelek dijwariya dixin devê riya wan. Ji ber, ko çiya bicarek ji berfê kilisandî ne û gereke bi kelekâ di ser ava çemê Qarûn ve derbasbin û ji bo wilo divê, ko bihev re herin û bihev re veşerin û gelek birist û li peyhev derbasdibin. Gelek caran tevlihev dibin û dibî berdîberdan(Xurûşe) û lihev dikevin û hev berdidin.

Bi kurtî gelek dijwarî dibênin ta, ko digihên warên xwe hatin û abora Bextiyariya ji pez, sewal û hinek çandiniye. Gundêndî bin destên wan de çandiniyê dikin, ne tenê di Çi - harmehel de, belkî jî di warên zivistanê de jî, ko jêre dibê

jin gemesîr, herwekû di serdesîr de jî hinek dexil diçênin û berê daran dicivênin gundên nêzîkî wan di havîna de difroşin wan, lê di zivistanê de her tiştên xwe ji bajaran di kirin. Kerwan-310.

Ev nivîšta ha li Bêrûtê di sala 1959 z. de hatiye çapkirin. Burhaneddîn Dicarî guhaztiye zimanê Erebfî, jimara wê 9627 e.

FERMANDARIYA ÇIHARLENG-LANE

1- ZEMANXAN :

Bawer dikin, ko ji neviyên padîşahê Îranê navdar Cemşîd e, pêlake dûr û dirêj bi gerdenezadî fermandarî kiriye û paşê serê xwe daniye.

2- HESENXAN, KURÊ ZEMANXAN :

Piştî mirina bavê xwe bû fermandarê Bextiyarî û pêleke baş bi xweş û bêş û serfirazî kamîraniye, rabiwardye û paşê serê xwe daniye.

3- FETEH ELÎXAN KURÊ HESENXAN :

Pêlake dûr û dirêj, bi xweşî û serbilindî û camêrî fermandarî kiriye û eşîr û welatê xwe lihev ragirtiye û paşê serê xwe danî.

4- HESENXAN, KURÊ FETEH ELÎXAN :

Pêlakê di cihê bav û kalê xwe de bi gernasî û camêrî fermandarî kiriye û êl û eşîr û gundên xwe li hev ragirtine û paşê serê xwe daniye û koça xwe ji cihanê barkir û çû ye.

5- MIHEMED TEQÎXAN KURÊ HESENXAN :

Di sala 1836 z. de Major Rawlînsan, lê rasthatiye, ko fermandar û mezinê Bextiyar bû û dibêjî; Mihemed Teqî Xan mirovekî xwenda û jîr û zana bû. Herwekû mêrxas û gernas û fermandar bû.

Di nav miletê xwe de gelek pîroz û bi rûmet bû, dikarî bû diwazdehezar mirov bixî bin çeka û bajoyî meydana şer. Herwekû welatê wî gelek şên û ava û dewlemend bû û eşîren wî zeviyeke mezin û hêja li hindama Ferîdon xistibûn destê xwe û gelek gundên hêja û mezin têde avakiribûn û tûtina Xuzistan bicarek ji vê hindamê derdikevî.

Lê herdem sergêjî û dubendî di navbera Heftlanc û Çarlanc de destpêdikir û jikevnare de hebûn. Lê bi kurtî rewşa civakiya vê eşîrê (Lorê mezin), ji rewş û pergala Lorê biçûk (Fîlî) çêtir û xweştire û bêtir bi pêşve çûye.

6- ELÎXAN, KURÊ TEQÎXAN :

Pêlake dûr û dirêj bi serbilindî û xweşî ferdandariya xwe kiriye û di cihê bavê xwe de rûniştiye û paşê serê xwe danî.

7- XWEDAKEREMXAN, KURÊ TEQÎXAN :

Di çaxê Sir Arnold Wilson 1926 z. de lêrast hatiye û di kovara Civata Asyanavîn de nivîsarek belavkiriye û gotiye ferdandarê Bextiyarî di îro de Xwedakaramxan. kurê Elîxan, kurê Mihemedteqîxan û dibêjî çîrokên vî welatî dibêjin Teqîxan ala serxwebûnê hilda û dewleta Îran leşkerekî giran şandîye ser û naçare bazda û çûye nik Şextamir, şêxê eşîra Benî, lê şêxê Ereb, ew da destê dijmin û di zindana Taran de serê xwe danî û di sala 1841 z. de serê xwe danîye.

8- MÎRZA AXA CAN, KURÊ TEQÎXAN :

Di çaxê wî de ferdandarî gelek weza û sêfil bû û di dawiya jîna wî de ferdandarî bicarek ji destê vê malbatê derket û kete destê Heftleng-lanc.

FERMANDARÊ HEFTLANC-HEFTLENG

1- HEYDERKOR :

Di çaxê Mîrza Axa Can, kurê Teqîxan de, ko piştî birayê xwe Xwedakeremxan bû ferdandarê Bextiyarî û bixwe mirovekî sêfil û weza bû li ser destê Heyderkor ferdandarî ji destê wan derket û Heyderkor bû ferdandarê welêt û ji eşîra Heftlanc û ji bavikê Papî ye û bi kamîranî û gerdenazadî pêlakê maye û paşê serê xwe danî.

2- XALÎBXAN, KURÊ HEYDERKOR :

Piştî mirina bavê xwe bû ferdandarê Bextiyarî. Êl û eşîr û welat bicamêrî li hevra girtin û gelek qencî bi millet û xelkê welêt kirin û bi pêşde birin û paşê serê xwe danî.

3- AZADXAN, KURÊ XALÎBXAN :

Pir cihê axîne, ko em bi tiştêkî ji ferdandarî û jîngariya vî camêrî nizanin. Lê piştî bavê wî serê xwe danî kurê wî Salihxan kete şûna bavê xwe û bû ferdandarê Bextiyarî.

4- SALÎHXAN, KURÊ AZADXAN :

Ev Salihxan di şerê Hindê de bi Nadirşah re çûbû û di nav şer de gelek gernasî û pehlewani dane nîşandan û nav û deng pêket.

5- AZADXAN(ESEDXAN), KURÊ SALÎHXAN :

Piştî mirina bavê xwe bû fermandarê Bextyarî û pêlake dûr û dirêj li vî welatî fermandarî bi serbilindî û gerden azadî kir û serê xwe danî û koça xwe ji cihanê barkir û çû ye.

6- CAFERQULÎXAN, KURÊ ESEDXAN :

Piştî mirina bavê xwe bû fermandar û pêlakê bi şanzî û serfirazî rabiward û paşê serê xwe danî.

7- HUSEYNQULÎXAN, KURÊ CAFERQULÎXAN :

8- ÎMAMQULÎXAN, KURÊ CAFERQULÎXAN :

Herdû bira bi camêrî pêlake dirêj bihev re fermandarî li welatê xwe kirine û paşê herdû bira li pey hev serê xwe danîne.

9- ESFENDIYARXAN, KURÊ HUSEYNQULÎXAN :

Pêlakê wî û pismamê xwe Mihemed Huseynxan bihev re fermandarî bi kamîranî kirin. Lê dawî serê xwe danî û hevsarê fermandariyê bi destê pismamê xwe ve berda û serê xwe danî.

10-MIHEMED HUSEYNXAN, KURÊ ÎMAMQULÎXAN :

Çawa Esfendiyarxan, kurê Huseynqulîxan di sala 1903 z. de serê xwe danî, fermandarî bicarek kete destê Mihemed Huseynxan. Lê gelek neçû û di sala 1905 z. de serê xwe danî. Bi kurtî Kurd û Kurdistan, r. 458-464, c.-1.

LISTA EŞÎR Û BAVIKÊN LORÊ BIÇÛK

EŞÎRÊN MEZÎN :	PERÇÊN EŞÎRÊ :	BAVIKÊN BIÇÛK :	JÎMARA MALA :
-----	-----	-----	-----
Eşîra Pêşkoh	Dilfon	Kakewend Awetîwend Mûminewend Reîsewend Becnewend Cewarî	15.000
	Sîasîla	Hesenewend Qulîwend Yûsifwend	15.000

	Balagîrewe	Reşî Sakî Papî <u>Dêrîkewend</u>	6.000
	Amîle	Koşkî Ziyuhdar Umerayî Mîraxur Qatirçî Xulam Tûtmiyad <u>Zole</u>	2.000
Piştîkoh	Fîlî	Kurd Şahen Mehakî Çiharsitûn <u>Dînarewend</u>	12.000
Xwepêgirên eşîrê	Bacilan	Delanewend <u>Segewend</u>	2.000
	Babîranewend	Eliwend <u>Deşwend</u>	2.500
	Helêlan	Osmanewend Celalewend Daciyewend Balawend Serxe <u>Merî</u>	1.500
			<u>56.000</u>

Pêncî û şeş hezar malin.

ji zihaw ta xuzistan r. 105 - 110

Cigerxwîn 1971.4.3.

FERMANDARIYA HÎZAN, MIKIS, İSPAYIRD

Şerefxanbeg dibêjî: Del û Bel, Belîc sê bira bûn, di serê pêşî de keleha Bilêcan xistibûn destê xwe û paşê keleha Hîzan jî ji xwe re girtin û welatê Hîzan bicarek xistin bin destê xwe.

Birayê mezin Del bû fermandarê Hîzan û birayê navîn Bel bû fermandarê Mikis û birayê biçûk Belîc bû fermandarê İspayird. Ji lewra bi sê perça hatine danîn.

1-FERMANDARÊ HÎZAN

Şerefxan bi navê Hêzan dinivîsîy û dibêjî, Hêzan bi Farisî navê meha payîzê ye û bi Kurdî navê kuflete û Xêzan bi daxwaza reben, belengaze û Şerefxan dibêjî Seherxêzan, bi Farisî ewê ko bi şev ranakevî, xew nakî, yan jî reben hatiye.

Lê Mihemed Elî Ewnî, ko Şerefname tercume kiriye dibêjî ji Hîzan hatiye, ko bi daxwaza pûşte.

Şerefxan dibêjî, li ser zimanê xelkê wê hindamê hatiye, ko dibêjin ev keleh li ser destê mîrê Meraxê hatiye avakirin û dibêjin diriste, ko Xwace Nesridînê Tûsî avakiribî. Hin sitûn ji darê şîlan dihindir wê kelehê de hene, ko li vî welatî peyda nabin. Çawa, ko di nav kelehê de hin avanî ji qermît û çamor hene, ko weke rengê resedxana hatine avakirin.

Herwekû Hîzan bi gulşen û mêrg û bax û bustanê xwe navdar û weke bihiştê ye gelek ber û şînahî yên, ko li Îran hene li vê hindamê peyda dibin. Weke tiriyî-kîşmiş.

Lê av û bayên wê gelek nexweş û herdem nexweşî konê xwe di nav wan de vegirtiye û hêlîna xwe di nav wan de çêkiriye. Melarya ta dev ji wan bernadî. Dibêjin, ji ber, ko bin deq hene ji lewra ev nexweşî peyda dibin.

Ji eşîrên vê hindamê re dibêjin nemêran(nemîran), bi vî navî deng dane. Padîşahên mezin, ko Kurdistan bîzor xistine bin destên xwe zor û setem li xelkê vê hindamê nekirine û fermanarên vê hindamê bi dijminê xwe re dost û heval bûn.

Ebdurzaq Semerqendî, di nivîšta Metle-Îsedeyn de dibêjî di sala 824 ê koçî de Şahrux, Teymurxan hate Azerbaycan ko şerê zariwên Qere Yûsif bikî. Suleyman Beg, mîrê Hîzan, ku rê xwe digel mîrî Bedlîsê şande cem Şahrux û bi xweşî û serfirazî vegeriya mala xwe.

1- MÎR SULEYMAN :

2- KURÊ MÎR SULEYMAN :

3- MÎR MELEK BEG :

Ev mirovê pîşîne, ko nav daye û piştî bavê xwe bûye fermandar. Lê gelek nemaye û serê xwe daniye.

4- MÎR DAWÎD, KURÊ MÎR MELEK :

Sîh û neh salan fermanarî kiriye, lê mirovekî serxweş û zarokperest bû. Tenê tevî vîqasî jî gelek dostê pêzan û xwendewaran bû. Wî xwendegeha Dawidiyê avakiriye.

Piştî mirina wî sê kur jê mane. Ehmed, Suleyman û Hesen.

5- SULTAN EHMED, KURÊ MÎR DAWÎD :

Piştî mirina bavê xwe bû fermanarê Hîzan û di şerê Bexda de gelek gernasî û pehewanî nîşandan û Suleymanxan welatê Hîzan bicarek û bi sûnd û peyman girêdayî jêre berda û xiste destê wî û ji wê rojê de gotina Cenab bi ser navê wî ve hate berdan û ji vê malbatê re bûye nav û nîşan û ketin rêza fermanarên Kurdistan û bi fermanarên Hîzan hatin bankirin û nivîsandin.

Lê çawaUlema BegêTiklewî ji Îran bazda û hate nav Osmanîyan(Turkan) ev Sultan Ehmed bû neyarê fermanarê Bedlîsê û bi Ulema Begê re hate ser Şerefîxanê Pêşî û piştî, ko Şerefîxan di şerê ser keleha Tatîk hate kuştin, Sultan Ehmed jî gelek nema û serê xwe danî û pênc(5) kur bi şûn xwe ve hiştin. Mihemed, Yûsif, Xelîl, Melek, Mehmûd.

6- MÎR MEHMÛDXAN, KURÊ SULTAN EHMED :

Piştî mirina bavê xwe bû fermanarê Hîzan, lê Suleymanxanê Qanûnî ev welat kire du perçe. Perçak xiste bin destê

Mîr Mihemedbeg û yek xiste bin destê Melek Xelîl.

Piştî salekî Mîr Mihemed serê xwe danî û sê kur, Miste-
fa, Dawid, Zeynel bi şûn xwe ve hiştin û Melek Xelîl bi
fermaneke padîşah herdû perçe xistin bin destê xwe û bica-
mêrî gerandin û lihev ragirtin. Lê Mistefabeg, kurê Mihe-
medbeg bi alîkariya xalê xwe Behaedîn Beg, fermandarê Hezo
çû dergehê bilind û perçê bavê xwe bi fermaneke hemayûnî
sitand û hat, lê piştî şeş(6) salan laşê wî li çolê, kuştî
hate xuyakirin û naçare birayê wî Dawidbeg kete şûna wî.
Lê wî jî piştî salekê serê xwe danî û Zeynelbeg kete şûna
wî.

7- MÎR MELEK XELÎL, KURÊ SULTAN EHMED, KURÊ MÎR DAWÎD :

Berî niha gelek caran nivê welêt dikete destê wî û car-
na welat bicarek dikete bin darê wî û bi vî rengî ma, ta
wekû bira û birazî bicarek ji ber ketin û serê xwe danîn.
Bi alîkariya Mihemed Paşa, wezîrê mezin û bi fermaneke Se-
lîmxanê diwem bû fermandarê welatê Hîzan û welat bicarek
li ser navê xwe tapo kir. Bîst û du(22) sal bi fermandarî
rabiwardin. Lê hevsarê fermandarî xistibû destê İbdal Axa
yê Belîlanî û welat bi dest ve berda bû. Tenê nav jêre ma-
bû. Lê tevlî vîqasî jî gelek pîroz û bi rûmet bû.

Di sala 991 ê koçî de serê xwe danî û kurek bi navê He-
sen Beg jê ma.

8- MÎR MIHEMED BEG, KURÊ SULTAN EHMED BEG :

Mirovekî jîr û jêhatî bû. Welat weke gustîlekê xistibû
tilya xwe û bi mêranî û hostayî lihev radigirt û bi ferma-
neke Muradxan femandariya Hîzan li xwe pîroz kir û di sa-
la 992 ê koçî de bi Osman Paşa re çû şerê Ecem, welatê Teb-
rîzê û di şerê Sadabad de bi destê Qizilbaşê hate kuştin û
du kur, Sultan Ehmed û Mîr Mihemed bi şûn xwe ve hiştin.

9- MÎR HESEN BEG, KURÊ MÎR MELEK XELÎL BEG :

Li ser yektiya eşîrên nemêran û bi fermaneke Muradxan
bû fermandarê Hîzan û li cihê apê xwe rûnişt. Tevlî ko hêj
zaro bû jî lê Yûsif Beg, kurê Sultan Ehmed Beg, apê wî çû
İstanbulê û femandariya welêt ji xwe re bi fermaneke padî-
şah pîroz kir û hat. Tenê eşîrên nemêran guh lênekirin û
baweriya xwe pê nanîn û naçare berê xwe da bajarê Tebrîzê
û çû nav Ecem û Cafer Paşa ew kire mîrê Hîzan û leşkerek
dayê û şande ser welatê Hîzan, ko bîzor wî bikin femandar
lê careke dî kesî guh nedayê, lê xêrxwazan di navbera wan
de lihevhatinek çêkirin û hindama nemêran bi senceqî dane
Yûsif Beg û pêlakê wilo lihev rûniştin. Lê dawî careke dî
Yûsif Beg doza mîrîtiyê kir û Hesên Beg bi alîkariya Şer-

wan, leşkerekî mezin bire ser û di keleha Az de asê kir. Lê leşkerê Yûsif Beg şer nekir û şikest û Yûsif Beg di avdesxanê de hate kuştin.

Tenê her çiqas Hesên Beg malê xwe dixiste devê karbides tên dewletê jî, lê careke dî yek ji mala wan bi navê Hacî Beg liber rakirin, lê dawî lihev hatin û xwarina wî ji hatina hindama Edwanan dane Hacî Beg û li cem hev rûniştin û bi vî rengî heta sala 1005 ê koçî jî bi haştî bihev re bûn.

2 FERMANDARIYA MIKSÊ

Herwekû Şerefhan Beg dibêjî, ev malbat ji zariwê Bel ve ketîne. Lê ji wan ewê navdare Mîr Îbdalê û piştî mirina wî du kur jê mane. Ehmed Beg û Hesên Beg.

1- EHMED BEG, KURÊ MÎR ÎBDAL :

Piştî mirina bavê xwe bû fermandarê welatê Miksê. Lê Zeynel Begê Hekarî, Hesên Beg, birayê wî li ber rakir û bi xwe re bire cem padîşah û jêre hindama Karkar bi fermanekê Suleymanxan sitand û bi vî rengî herdu bira sê salî bihev re fermandarî kirine û piştî, ko Ehmed Beg serê xwe danî du kur Îbdal Beg û Îmadidîn Beg hiştin.

2- ÎBDAL BEG, KURÊ EHMED BEG :

Bi fermaneke Suleymanxan femandariya Miksê kete destê wî û li şûna bavê xwe rûnişt. Di wê navê de Hesên Beg serê xwe danî û Îbdal Beg keça Zeynel Begê Hekarî ji xwe re anî û bi alîkariya xezûrê xwe û bi fermaneke Hemayûnê hindama Karkar jî biserxwe ve berda û bicarek welat xiste bindestê xwe. Lê Rustem Beg, kurê Hesên Beg çû Karkar ji xwe re sitand û gelek şer û sergêjî di nav wan de rûdan.

Di sala 1005 ê koçî de Îbdal Beg serê xwe danî. Mirovekî serxweş bû û di kelehê wer bû û du kur bi şûn xewe hiştin û çû. Mihîmed Beg û Ehmed Beg jê man.

3- RUSTEM BEG, KURÊ HESEN BEG :

Keça Hesên Begê Mehmûdî ji xwe ra anî û bi alîkariya xezûrê xwe û Serdar Mistefa Paşa mîrêmîranê Amed(Diyarbakir) Karkar ji Îbdal Beg sitand û paşê serê xwe danî û Hesên Begê kurê wî şûna bavê xwe sitand. Lê çawa Îbdal Beg serê xwe danî. Bi alîkariya Sinan Paşa mîrêmîranê Wan û sê sed siwar û peya pêre ajote ser Miksê, Lê Mîr Ehmed, kurê Mîr Îbdal bû fermandarê Miksê.

4- MÎR EHMED, KURÊ MÎR ÎBDAL :

Çawa Hesên Beg bi sê sed siwar û peya ve ajote ser Mik-sê Mîr Ehmed naçare êl û eşîrên xwe civandin û ji derve şer destpêkir û Hesên Beg di nav şer da hate kuştin û bi-carek welat kete bindestê Ehmed Beg û heta sala 1005 ê koçî jî di destê wî de bû.

3 - FERMANDARIYA ÎSPAYIRD

Ji zariwên Belîc veketine. Di çaxê, ko Kurdistan kete bindestê dewleta Osmanî, Mihemed Beg fermandarê Îspayird bû.

1- MÎHEMED BEG :

Pêlakê bi fermandarî û serfirazî ma û serê xwe danî û kurê wî Sultan Îbrahîm kete şûna wî.

2- SULTAN ÎBRAHÎM, KURÊ MÎHEMED BEG :

Bi fermana Selîmxañê yekem bû fermandarê welêt û li ser keleha Wanê bi destê Ecem hate kuştin û di nav leşkerê Ferhad Paşa de bû.

3- MÎHEMED BEG, KURÊ SULTAN ÎBRAHÎM :

Piştî kuştina bavê xwe bû fermandarê welêt û piştî pêla kê serê xwe danî û çar kur, Eyyub Beg, Xalid Beg, weys Beg û Sultan Îbrahîm bi şûn xwe ve hiştin.

4- EYYUB BEG, KURÊ MÎHEMED BEG :

Li şûna bavê xwe rûnişt û ev sala 1005 ê koçîye, ko 20 sale fermandare.

5- MÎR ŞEREF BEG, KURÊ MÎHEMED BEG :

Hindama Axakîş bi fermaneke hemayûnî kete destê wî û piştî mirina wî du kur jê man. Lê ji ber, ko bikêrî fermandarî nedihatîn hindama Axakîş kete destê tirkan û bi ser wane ve hate berdan û kurê wî Orgemez bi dînîti serê xwe danî û kurê dî Biha-idîn Beg çû welatê Erebia Hesa û Besra.

FERMANDARIYA ZIRIKAN

Şerefxan dibêjî; Şêx Hesên, kurê Şêx Ebdurehman ji Şam hatiye hêla Mardîn û xelkê wê navê baweriya xwe pê anîn û bûne mirîdên wî û padîşahê Mardîn keça xwe lê markir û zariwên wî bûne fermandarên wa navan û Şex Hesên paşê kete şûna padîşahê welêt.

Herwekû cenabê Şerefxan Beg di cîkî dî de dibêjî, digihê ser Hensen, kurê Elî û çîroka wî bi awakî dî ji me re bi davedikî. Şêx Hesên hate hêla Mardîn û li Hetax-Îtaq rûnişt û di çaxê wî de Ertuq ji ber Selcoqiya ve fermandarê Mardîn bû û keçeke Ertuq dîn hebû, ko li ser destê şêx sax bû û Ertuq keça xwe da kurê şêx, ko navê wî Ehmed e.

Herwekû Şerefxan navê Şêx Hesên û kurên wî Ehmed û Süleyman û Qasim, Yûsif, Huseyn li pey hev tînî û dibêjî, ko li pey hev van çend mirovan di destpêkê de nehatine gotin. Û dabaşa wan nehatiye kirin, tenê nîvê rûpel sipî maye.

Çawa, ko navê Habîl û Qabîl li keleha Dêrzînî tînî meydana û dibêjî, ew kesê, ko cara pêşî, ko li Dêrzînê ferman darî kiriye navê wî Mîr Hemzaye û kurê Mîr Xaziye.

Ca nizanîm, ne sûcê Şerefxane, yan sûcê Tercumane. Tenê ev gotinê Şerefxan weke çîrokê têne ber çavê mirov. Ji ber ko Ehmed, kurê Yûsif, kurê Elî, kurê Hesenezreq bixwe tarî xek li ser dewleta Mêrwanê kurdî, padîşahê Farqîn û Amed çêkiriye û navê kalikê xwe Elî Ebû Hesên çend cara aniyê û dibêjî kalikê min serok Elî, kurê Ezreq ji ber mala Merwan ve dizdar û fermandarê Heskîfê bû û bicarek barxane û mal

û cewahirên wan li cem wî bûn.

Çawa, ko di femandariya kurê Cuheyrê Musilî de ev Ebû Hesên Elî, kurê Ezreq di Heskîfê de bû herwekû Ehmed, kurê Yûsif, kurê Elî, kurê Ezreq bixwe li bajarê Farqîn û di sala 510 de çêbûye û çûye Şam, Heleb, Bexdad û Gurcistan, ko tê xuyakirin ev mirov hin delametên mezin di destê wîde he bûn û gelek diriste, ko zariwê Ehmed yan birazayê wî bûbin femandarê Zirikan.

Di tarîxa Merwanîyên Farqînê de winê navê Ebû Hesên Elî kurê Ezreq gelek caran bibênin. Zirikan bûne çar perçe Ter cîlî, Dêrzîni, Kurtikî, Hetaxî.

1-FERMANDARÊ TERCÎLÊ

Tercîl keleheke nêzîkî bajarê Amed(Diyarbakir) dikevî. Du kelehê wê hene, Tercîl û Darîn. Herwekû Hetax bixwe nêzîkî Tercîle, lê Dêrzîn û Kurtika li nav Xerza ne û ji fermanderê Tedcîl û Hetax veketîne. Şerefxan dibêjî, Ehmed, kurê Seyid Hesên û Suleyman û Yûsif û Qasim lipeyhev fermandarî li Tercîlê kirine. Lê ew mirovê, ko navdare Umer, kurê Hesên Beg e.

1- UMER BEG, KURÊ HESEN BEG :

Çawa bavê wî serê xwe danî Umer Beg kete şûna bavê xwe û êl û eşîr bicarek lixwe gihandin hev û di çaxê Hesendi - rêj de, ko ji wan re dibêjin Pezgewra(Aqqoyunlu)Hesendirêj, keça vî Umer Begî mar kiriye û hindama Mihranî û Noşad biser Tercîl û Hetax ve berdane, lê piştî ko kurek ji keça Umer Beg ji Hesendirêj re çêbûye Hesên, kurê xwe kire fermandarê Tercîl û Hetax û Bedlîs da xezûrê xwe.

2- BODAQ BEG, KURÊ UMER BEG :

Piştî, ko Umer Beg serê xwe danî Hesendirêj Bedlîs xiste destê Bodaq Beg, kurê Umer Beg. Lê çawa Yaqûb Beg, kurê Hesendirêj bû femandarê Kurdistan û Îran careke dî welatê Tercîl û Hetax dane destê xalê xwe û di sala 888 de Bodaq Beg bû femandarê welatê bav û kalê xwe û di sala 911'ê ko çî de Bodaq Beg serê xwe danî.

3- EHMED BEG, KURÊ BODAQ BEG :

Piştî mirina bavê xwe bû femandarê welêt û di sala 913 de bi destê Qizilbaşê li ser Diyarbakir hate kuştin.

4- ELÎ BEG, KURÊ BODAQ BEG :

Piştî kuştina birayê wî bû femandarê welêt. Lê piştî du salan serê xwe danî.

5- ŞEMSÎ BEG :

Piştî, ko leşkerê Turk û Kurd, leşkerê Îran şikandin û Diyarbekir ji destê Qizilbaşê derxistin Selîmxanê yekem we latê Zirikan bi fermanekê xiste destê Şemsî Beg yek ji vê malbatê.

6- HEYDER BEG, KURÊ ŞEMSÎ BEG :

Bi fermaneke Suleymanxan, welatê Tercîl kete bindestê Heyder Beg, kurê Şemsî Beg. Lê di şerê Çaldêran de hate kuştin.

7- BODAQ BEG , KURÊ HEYDER BEG :

Bi alîkariya Mustefa Paşa, serdar femandariya Tercîl kete destê Bodak Beg û pazde sala di welatê xwe de bi femandarî û kamîranî rabiwardin û paşê serê xwe danî.

8- HUSEYN BEG, KURÊ BODAQ BEG :

Heşt meha piştî bavê xwe femandarî kir û serê xwe danî.

9- İSMAÎL BEG, KURÊ BODAQ BEG :

Çar sala bi femandarî û kamîranî derbas kirin û serê xwe danî.

10-UMER BEG, KURÊ HEYDER BEG :

Bi fermaneke Muradxan bû femandarê Tercîl. Mirovekî jîr û zana û hêja bû. Mîrê Mîranê Diyarbekir girtin û berdane femandarên Kurdistana Diyarbekir xistibûn destê wî û heta sala 1005 'ê koçî jî berxwedar û femandarê welêt bû.

2-FERMANDARÊ HETAX

Ehmed Beg, kurê Mîr Mihemedbegê Zirikî, femandarê yeke me, ko li Hetax nav daye. Mirovekî mezin û hêjaye û di çaxê Şah İsmailê Sefewî de keleha Hetax ji destê Ehmed Beg hate derxistin û yekî Qacarî li şûna wî rûnişt.

Eşîrên Zirikî bazdan û bi çola ketin û serê xwe ji dijmin re pêl û xwar nekirin û heta, ko leşkerê Kurd û Türk welatê Kurdistan ji destê Qizilbaşê derxistin û leşkerê E-cem li Çaldêran şikandin. Ehmed Beg jî welatê xwe bîzor ji wan sitand û xiste bindestê xwe û Zirikî şerekî dijwar û xwîndar bi dijmin re kirin û bi werîsa bi şev bi kelehê de hilkişiyar û bicarek pêwanê kelehê kuştin û Ehmed Beg kirin femandarê welêt û dawî bi fermaneke Selîmxan lê hate pîrozkirin û piştî mirina wî sê(3) kur bi şûn xwe ve hiştin. Yûsif Beg, Şahem Beg, Mihemed Beg. Lê hersê bira li hev nekirin û naçare çûne berdestê padîşah û gelek ji wela

tê xwe dane xezîna dewletê û ê mayin li wan hate parveki -
rin.

1- ŞAHM BEG, KURÊ EHMED BEG :

Farqîn, Rebet, Hebke gihane padîşah û zeametek bi 60 hezar aqçe giha Mihemed Beg û zeametek bi 100 hezar aqçe giha destê Yûsif Beg û zeametek bi dused hezar aqçe giha Şahem Beg.

Ev nîşana windabûn û korocaxîye, ko nikaribin lihev bikin û herin welatê xwe bidin destê dijmin û nikaribin dinav xwe de yekî ji xwe bikin mezin û welat li xwe par bikin û hetta îro jî axa û begên Kurdistanê li ser vê yekê diçin û welatê xwe dixin bindest û lingê dijmin.

Piştî, ko Mihemed Beg serê xwe danî zeameta wî kete destê Qubad Beg Remdanlû û di çaxê wezarata Rustem Paşa de gîlî li Şahem Beg hate kirin û hate kuştin û 20 salan Hetax, di destê bêgana de ma.

2- YÛSÎF BEG, KURÊ EHMED BEG :

Lê paşê bi fermaneke Suleymanxan Hetax careke dî vegeriya destê Yûsif Beg, kurê Ehmed Beg. Lê keleh wêran kir û bi senceqî pêlakê li Hetaxê fermandarî kir. Tenê piştî mirina wî careke dî kete bindestê fermandarkî turk bi navê Ehmed Beg, kurê Hacî Beg.

3- HESEN BEG, KURÊ YÛSÎF BEG :

Piştî du salan senceqa Hetax careke dî bi fermaneke Selîmhanê diwem vegeriya destê Hesen Beg, kurê Yûsif Beg û çawa serê xwe danî du kur bi şûn xwe ve hiştin. Yûsif Beg û Welî Beg.

4- YÛSÎF BEG, KURÊ HESEN BEG :

Yûsif Beg gelek nema û zû serê xwe danî û Welî Beg kete şûna wî.

5- WELÎ BEG, KURÊ HESEN BEG :

Cihanşah Beg, pismamekî wî kete riya wî û berberî pêre kir û bi fermaneke padîşah welat bicarek xiste bindestê xwe û 20 hezar zêr bertîl dane waliyê Diyarbekir, lê çawa Welî beg pê agah bû wî ev bîst hezar zêr dane dîwana Diyarbekir û di cihê xwe de rûnişt. Daxwaza turka serkarên dewletê ev bû, ko pera ji wan bixun û herçî pera nedî yan bêgirtin û yan bê kuştin.

Çawa İbrahîm Paşayê zorker ala serbilindî û berxwedari, hilda û Kurdistan xiste bindestê xwe Hetax bi senceqî da

Zulfeqar Beg, kurê Şahem Beg û çil hezar zêrên osmanlî jê sitandin. Lê çawa li Yedîqule hate kuştin. Careke dî Welî Beg bi fermana Mihemedxan welatê xwe vegerande bin destê xwe û heta sala 1005 koçî jî fermandarê Hetax bû.

3-FERMANDARIYA DERZÎNÊ

Dêrzîn keleheke di hindir wê de dêreke mezin heye, ko berê jêre digotin Dêrzêw, lê Elî Ewnî dibêjî, Dêrdîz û Dêrzîr.

Gelek diriste, ko Dêrzêrîn bî yan Dêrzîn bî. Dêrizbîn li nav Mihelmiyan heye dikevî jêrê Kercewa. Mala Mîrê Zîrav, Mîrê Mihelmiya têde rûdiniştin û di îro de li Kefirhe wal rûdinin, di bin welayeta Mardîn û Heskîfa kevnare de dimênî, lê Kurtika li nav Xerza dikevî. Çawa, ko Dêrzîr jî li nav Xerza heye.

Mîn dixwest li ser Dêrisbîn bi mîrê Mihelmiyan re bipeyivim lê bi destê min neket.

1- MÎR HEMZA, KURÊ MÎR XELÎL, KURÊ MÎR XAZÎ :

Pêlakê fermandarî li Dêrzînê kir û di sala 900'ê koçî de Şah Îsmâil Mîr Hemza kire fermandarê Dêrzîn.

2- MÎR MÎHEMED, KURÊ MÎR HEMZA :

Piştî mirina bavê xwe û şikestina leşkerê Îran li Çaldêran bi fermaneke Selîmxanê yekem welatê Dêrzîn kete destê Mihemed Beg û piştî pêlakê serê xwe danî û çar kur bi şûn xwe ve hiştin. Elî Beg, Şahqulî Beg, Yaqûb Beg, Cihanşah Beg.

3- ELÎ BEG, KURÊ MÎHEMED BEG :

Her çendan birayên wî şûr di riwê wî de kişandin jî, lê bi mêranî fermandarî xiste destê xwe û bi gernasî çend salan fermandarî kir û paşê serê xwe danî.

4- ŞAHQULÎ BEG, KURÊ MÎHEMED BEG :

Di sala 941 de bû fermandarê Dêrzîn û cihê birayê xwe sitand û fermandarî bi fermaneke Suleymanxanê Qanûnî li xwe pîroz kir û piştî heşt salan bi destê Nasir Begê Kurtîkî li bajarê Belî hate kuştin.

5- YAQÛB BEG, KURÊ MÎHEMED BEG :

Piştî Şahqulî Beg bicarek welatê Dêrzîn xiste destê xwe û bû mezin û fermandarê welatê Zirika.

Mirovekî gelek zana û bîrewer bû û rîstevanekî mezin bû rîstê xwe bi kurdî çêkiribûn. Di vê meydanê de gelek pehlewana û jîr bû. Sed mixabin, ko kurdê bextreş jivê dîwana

ristevan û hozanê xwe bê par û pişk man û ev dîwan bicarek winda bû.

Di saxiya xwe de femandariya Zirika bi destê kurê xwe Dûman Beg ve berda, lê ristevanê navdar hêj sax bû kurê wî Dûman Beg di şerê Çaldêran de hate kuştin û Yaqûb Beg hoza nê mezin piştî salekê serê xwe danî. Lê du kur ji Dûmanbeg mabûn. Mihemed Beg û Elî Beg.

6- MIHEMED BEG, KURÊ DÛMAN BEG :

Di sala 986 koçî de Dûman Beg hate kuştin û Mihemed Beg li şûna bavê xwe rûnişt û hêj kalikê wî sax bû tevlî, ko hêj salên wî di pazdeha derbas nebûbûn jî lê salekê bi alî kariya kalikê xwe ê hozan û jîr derbaskir û piştî mirîna xwe bi gernasî û camêrî û payedarî femandariya xwe dikir.

Lê bi navtêdana Ketxuda Şemsidîn, Ketxudayê Hezo Mihe - med Begê Kurtikî herdem pêre dijminayî û berberî dikir û ê rîşî nav gundên Dêrzîniya dikir û talan û şewat û zor û se tem bi ser wan de dirijandin û naçare Mihemedbegê Dêrzîni, mirov û peyayên xwe rojekê xistin riya wî û piştî şerêkî dijwar Mihemedbegê Kurtikî birîn bû û bîzor gihandin keleha Kurtikan û serê xwe danî û Mîr Mihemedbegê Dêrzîni wela tê Zirikan bicarek xiste bin destê xwe û gelek ji dijminê xwe kuştin û serbilind, payedar ta bi sala 1005'ê koçî jî fermanदार û berxwedar bû.

4- FERMANDARIYA KURTİKA

1- NASİR BEG :

Ev Nasir Beg ê pêşîne, ko hatiye xuyakirin û deng daye. Di navbera mîrekê Dêrzîni û Kurtikan de herdem sergêjî û dijminayî bû û li ser gundê Minar gelek şer û pevçûn çêdibûn û gelek mêr ji herdû rexan dihatin kuştin, lê Şahqulîbeg, fermanदारê Dêrzîni bi fermaneke Suleymanxan gundê Minar xiste nav derebegiya xwe û bicarek ji Kurtikan sitand, lê çawa Nasirbegê Kurtikî ev bihîst, çend peya bixwe re birin û kete devê riya Şahqulîbeg û li bajarê Bolî, welatê turka li hev rasthatin û şer dinavbera herdû pismama de destpêkir û Şahqulîbeg hate kuştin. Lê waliyê Bolî bi leşker û xelkê bajêr ve li Nasirbeg û hevalên wî civiyan û Nasirbeg tevlî sîh(30) siwarî girtin û li ser devê rê bidarvekirin.

2- MIHEMED BEG, KURÊ NASİR BEG :

Piştî bavê xwe bû fermanदारê Kurtikan û di gel Şemsidîn axa, ketxudayê Hezo û Zeynelbegê Şêrwî êrîşî welatê Dêrzî-

nî kirin. Lê di şer de birîndar bû û li kêleha kurtikan se
rê xwe danî.

3- NASÎR BEG, KURÊ MÎHEMED BEG :

Di çaxê wî de li ser destê Şemsidînaxa, ketxudayê Hezo
û Zeynelbegê Şêrwî bi mîr Mihemedbegê Dêrzînî re lihev ha-
tin û gundê Minar di ber xwîna bavê wî de dane Nasirbeg û
Mehmûdbegê Zirikî. Ketxudayê Dêzîne ji cem Mihemedbegê Dêr-
zînî derxistin, ji ber, ko wî Mihemedbegê kurtikî kuştibû.

Ev Mehmûdbeg, li Bedlîsê û bi destê hevalên wî bi bêbex-
tî hate kuştin. Lê dibêjin, ko Şemsidînaxa, ketxudayê Hezo
ew daye kuştin.

Herwekû mîr Nasir li nêçîrê bi destê qeşmerê xwe, Çem -
ber hate kuştin. Lê xistin sitiwê mîr Xelîl, ko çend caran
bûbû fermanarê kurtikan(Gurdika) û ji ber, ko pîr bûbû li
cem mîr Nasir rûniştibû û ji bo vê yekê ev mîr Xelîl jî ha-
te kuştin.

4- MÎR MÎHEMED BEG, KURÊ NASÎR BEG :

Piştî mirina bavê xwe bi fermaneke hemayûnî di sala
1005 'ê koçî de bû fermanarê Kurtika û birayê wî Ebûbekir,
pêre bû.

1966.3.18

Mûsa Hesên Cigerxwîn

FERMANDARIYA MİLAN Lİ WÊRAN-ŞEHİR

Milan di hindame Mardînê de du perçene. 1- Milanê Xidir
2- Milanê Paşê. Lê ev dabaşa me li ser milanê paşê ye, yan
bixwe li ser mala paşê bixwe ye.

Herwekû ev minê(Milan) bixwe sê perçene. Paşê Mila, Mî-
rê Mila, Axê Milan. Paşê Mila di Wêran-Şehrê de rûniştîne
û Mîrê Mila di hindirwê bajarê Mardînê de ne. Lê mala Xi-
diraxa di nav êla Mila, ko dikevî jêrê Amûdê xwedî gund û
bi nav û dengin.

Niha dabaşa me li ser mala Zengozêrîn, paşayê Milaye.
Em dixwazin hinekî ji mila û mala paşê Mila bipeyivin û bi
vî rengî karekî ji gelê xwe û tarîxê re bikin.

Mala Zengozêrîn ji kevnare de çend paşa û mirovên mezin
ji wan rabûne, ko serê gelê kurd ji ber wan bilind dibî.

1- KELEŞEBDÎ :

Mexabin, ko em tiştêkî hêja ji tarîxa Keleşebdî niza -
nin. Tenê tiştê, ko navdare ewe, ko Keleşebdî mirovekî ke-
leş û rêgir bû û karê wî talan û kuştin û rêgirtin bû.

Bi vî awayî deng daye, lê mêrik bi mêranî xwe kiriye me
zinê Mila û êla Mila. Xwe daye ber siya wî lê mixabin em
nizanin kengî serê xwe daniye.

2- BIŞAR PAŞA :

Pir cihê keser û axîne, ko em nizanin ev camêr kurê kê-
ye û di kîjan salê de hatiye cihanê û di kîjan salê de se-
rê xwe daniye.

Tenê dibêjin, Ebdulahê Îso, axê Şikaka ji ber dewletê
reviya bû û xwe li Bişar Paşa girtibû û her çend caran ji
Bişarpaşa hate xwestin jî lê paşê neda destê dewletê heta,
ko Bişar Paşa xwestinbajarê Rihayê û serê wî jêkirin. Lê
di kuştinê de jê pirsîn:

- Ma tu tişteki naxwazi?

Paşê got: Belê wele dixwazim ji xwere dengê bistirênim, civat hemî kenîyan û dilê xwe de digotin Paşê Milan li ber mirinê ji hişê xwe çûye. Lê paşê destê xwe xiste bin guhê xwe û dest pêkir û got:

Lolo....

Lolo siwaro! hake bi mi hake!

Tê herî konê Ebdilê-Îso, axayê Şikaka

Bêje mêr ew mêr bû, ko soza xwe bire serî

Heta xwîna Bişar Paşa herikî li şikaka!

Paşê wilo digot û berê xwe dabû xortekî bi şûr û mertal û jêre digot, xortê milî jî zû daxwaza paşê naskir û li hespê xwe siwar bû û ji bajêr derket û berê xwe da konê Ebdilê-Îso û çawa rûnişt axê jê pirsî û got: Lawo hela te çi li bajarê Rihayê bihîtiye? ji mere bêje.

Xortê Milî jêre ta bi derziyê vekir û got: Wele paşa kuştin û sitrana paşê jêre bidarvekir û got; Ebdilê-Îso go bese lawo te her tişt da zanîn, de rabe here xwedê bi tere bî.

Axê gazî kire geregerê xwe û çîrok ji wan re got û ji wan re go:

- De rabin konê xwe barkin û bi şev ji nav mila birevin Lê bi xwedê eger bi kuştina Bişar Paşa agah bibin yekî ji me bernadin.

Êvarê Şikaka konê xwe barkirin û sibê Mila dane ser şopa wan û gelek ji wan kuştin û ji rojêde Şikaka ji vî welatî çûn û hew vegeriyane Cizîrê. Lê ev bi çîrokî min bihîtiye.

3- TEMÎRPAŞA ZENGOZÊRÎN :

Dewleta Osmanî welatê Mardîn bi ser Bexdayê ve berda bû û xelkê hindama Mardîn sê perçe bûn. Kurd, Ereb, Turkman bûn. Belam Kurd ji tevan bêtir û mezintir bûn û biger ev hindam bicarekdi bindestê kurd de bû. Ji ber, ko çiyayê Tûr-abidîn(Qerecedax) di bindestê kurd de bûn û gelek êl û eşîrên mezin û navdar, ko ji tevan mezintir eşîra Milan bû. Di hindir wê çola Mardînê de, di hember eşîrên Ereb de dijîn.

Herwekû hin turkman û hin eşîrên Ereb, ko ji tevan mezin tir eşîra Şemer, Enz, Tey bûn. Di wê çolê û li rexê jêrê Cizîrê pezê xwe biharan diçêrandin.

Lê tevlî eşîrên kurd ne yek perçe bûn jî, lê di hember dijmin de naçare xwe digihandin hev û tenê pirê caran xwe bixwe şerê hev dikirin û dibûn hevalên dijmin û xwe bi dijminê xwe digirtin.

Çawa, ko hin eşîrên Ereb jî, wilo dibûn hevalê Kurd û şerê milletê xwe dikirin. Ji lewra pirê caran Cizîr dibû du bendî û şerê hev dikirin, talanê hev dibirin..

SÛNDA PISMAMA

Ev sûnda pismama, yan Helfulêmama weke, ko ereb dibêjin bicarek eşîrên Cizîrê Kurd û Ereb bihev re dijminahiya Ere bên Şemer, Enz ji ber, ko ev herdû eşîrên mezin û xwînrij, ne tenê dijminê kurd bûn, belkî jî dijminê herkesî bûn û karê wan tenê talan û kuştin bû.

Ji ber, ko ev herdû eşîr ji derve dihatin û eşîrên Cizîrê ji wan gelek ditirsiyan û xwe li ber wan, ko nebûna yek nedigirtin û nikaribûn yek-yek li ber wan destê xwe bilind bikin, yan serê xwe rakin.

Ji eşîrên, ko divê peymanê de bihev re sûnd xwarîbûn ji kurd Milanê Paşê, Milanê Xidir, Kîka, Xeleca, Deqorya û ji Ereban Tey, Cibûr, Beqqar û hin eşîrên biçûk xwe bi wan girtibûn.

Ji ber, ko Şemer ji Îraqê dihate Cizîrê û Enz ji Şam yan ji Şamîye rojavayê Ferat dihatin Cizîrê û xelkê welêt xwe didane hev û jihev re sûnd dixwarin, ko bihev re şerê wan herdû eşîran bikin û bivî rengî xwe û mal û sewalên xwe ji dijmina diparastin. Şemer xwîkîtî ji kurd û erebên Cizîrê distandin.

XWÎKÎTÎ - YAN - UXWE - BIRATÎ

Ji ber, ko Şemer pir û xurt û şerxwaz bûn herdem talan û kuştin û sergêjî di nav eşîrên Cizîrê de bi awakî berdî - berdan dikin û herkes ji wan ditirsiya û mal, pere, pez, dext didane wan, ko diziya wan nekin, talanê wan nebin, mêrê wan nekujin.

Di serê pêşî de Uxwe bi daxwaza Biratî bû, lê dawî kirin bêş û bîzor ji kurd û erebên cizîrê distandin. Lê bivê sûndê gelek caran kurd û ereb bihev re şerê Şemer û Enz di kirin û zora wan dibirin û mêrê wan dukuştin û talanê wan ji xwe re tanîn. Tenê her û her tirsê Şemer û Enz di dilê xelkê Cizîrê de çêkirî mezin girtibû.

Di vê çaxê bixwe de Zortemirpaşa (Zengozêrîn) di Enedolê de qelabend û dest li ser bû û eşîrên kurd û ereb çiqas gîlî û gazine xwedikirin jî, lê kes nebû, ko li ber barê wan rabî.

Ji lewra paşê Mila ji Îstanbulê bazda û xwe gihande nav Mila û dest bi karê xwe û fermandariyeke mezin kir û êl û eşîrên kurd û erebên Cizîrê lixwe civandin û leşkerekî me-

zin ji xwe re pêkanî û ji nû ve dest bi talan û sergêjîyê kir û berdî-berdan bicarek xiste nav welatê Cizîrê.

Navbera Diyarbekir-Riha-Mûsil-Heleb bicarek xiste bin destê xwe û di nav talan û sergêjîyan de wêran û sitem bar hişt. Ji lewra waliyên Heleb, Diyarbekir, Bexdad ketin nav tirs û sawîran. Lê çiqas xwestin, ko Zortemirpaşa serwest bikin, nikaribûn bikin.

Naçare leşkerekî mezin bi serdariya Suleyman Paşa, waliyê Bexda û Êzin Îbrahîm Paşa û Reşwanzade Umer Paşa, waliyê Meletya bi leşkerên xwe ve dinav vî leşkerî hatin.

Suleyman Paşa, ev leşkerê giran ajote ser Zortemir Paşa û ji ber, ko nikaribû şerê vî leşkerê mezin bikî, keleha Bûk, ko paytexta wî bû ji dijmin re berda û berê xwe da welatê Helebê û Suleyman Paşa ev sela tirafa germ bi ser serê eşîrên kurd ve berda û zor û setemeke bê pîvan li Kurd û Milan kir. Fermandarê Mardîn avêt û gelek ji mezinên Mila kuştin.

Ji wan mirovên navdar, ko hatin kuştin, bi dar vekirin. Sadûn Beg (birayê Temir Paşa), Mehmûd Beg (Pismamê Temir Paşa).

Lê Suleyman Paşa, Îbrahîm Beg, birayê Temir Paşa kire mezinê Milan û vegeriya Bexdad. (Tarîxa Cewdet, rûpel 340, perçê 5).

Ji ber, ko turkan dixwest kurd perçeperçe dûrî hev bikî welatê Mardîn, ko dibin siya Diyarbekir de bû bi ser Bexda ve berda bûn, ko hezar kîlometir dûrî Mardîne. Herwekû ber tîlxwer û çilek û diz bêjimar ketibûn nav dewlet û welêt berdîberdan di welêt de afirandibûn (Şarê bêpirsiyan bû) ke sî gul li ferman û gotinê karbidestê dewletê nedkir.

Herwekû rista derebegî her û her nexwendin, nezanî, karê xweş û mezin kuştin û talan û berdîberdan bûn.

Suleyman Paşa bê, ko bighê armanca xwe destevala vegeriya Bexdad û Teymûr Paşa sê sala der bi der li çola ma û di sala 1209 h (1794 z. de) bi lingê xwe û ji nişkave çû Bexdad doz û hêviya gerdenazadiya xwe li Suleyman Paşa kir. Û di sala 1215 (1800 z.) de Teymûr Paşa bû waliyê bajarê Reqa lê nikaribû, yan nizanibû vî barê giran bibî serî. Ji ber, ko dijminê wî pir bûn û gelek sergêjî diketin devê riya wî ji lewra ew ji wir rakirin û birin Sêwasê kirin walî. Di sala 1218 k (1803 z.) de Teymûr Paşa çû Sêwasê û bû walî.

4-İBRAHİM BEGÊ MİLLÎ

Me derbas kir, ko çawa leşkerê Suleyman Paşa, waliyê Bexda û ji hawîrve leşkerê tirka êrîş kirin welatê Milan û

çawa berdîberdan, kuştin, talan bi darvekirin, çêkirin û çawa paşayê navdar İbrahîm Beg, birayê Teymûr Paşa kire mezinê welatê Mila.

Ji wê rojê de İbrahîm Beg, bi camêrî karê welat û milet û eşîra Milan û kurd û erebên xwe pêgirtî bi pêşve dibirin û xweş li hev radigirtin û pêşve dibirin. Herwekû bi dewletê re herdem bi xweş û bêş çax û demên xwe derbasdikirin. Sînorên derebegiya xwe ji destê dijmina diparastin, lê dawî serê xwe danî û koça xwe ji vê cihanê barkir û çû.

5 - EYYÛB BEG KURÊ İBRAHÎM BEG

Fermandarî û derebegiya vî camêrî gelek dirêj kir û pêlake xweş bi gernasî, mêranî, comerdî di welatê xwe de fermandarî kiriye û heta dewleta Osmanlî jî nikaribû nêzîkî welatê wî bibî. Ji ber, ko serbixwe û gerdenezad di Wêranşar de jîneke bi kamîranî radibiward.

Lê ji nişkave leşkerekî Osmanlî êrîş kire ser welatê Milan û çend şerên dijwar û xwîndar di navbera Kurd û Tirkê de çêbûn. Tenê dawî Eyyûb Beg bi dîlî kete destê dijmin û li Diyarbekir xistin zindanê û tê de ma heta, ko serê xwe danî.

6 - TEYMÛR BEG

Ev Teymûr Beg neviyê Teymûr Paşa ye. Di şerê navbera dewleta Osmanlî û İbrahîm Paşayê Misrî de, ko bixwe ji ber bavê xwe ve leşkerê Misrê tajote ser Diyarbekir û Kurdistanê Teymûr Beg di çaxekî hin de welatê Cizîrê û beriya Mardîn bicarek xiste bin destê xwe.

Tenê gelek neçû ev gernasê kurd di şerekî de hate kuştin û leşkerê Misrê vegeriya welatê xwe û careke dî dewleta Osmanlî destê xwe dirêjkire vê hindamê û ji ber, ko Milan mezinê xwe winda kiribûn gelek dijwarî dîtin û zor û setem bi ser welatê wan de hatin rijandin.

Herwekû eşîrên ereb Şemer, Tey gelek ji gund û êlaxên kurdan ji xwere girtibûn û bê pîvan zor û setem bi serxelkê vê hindamê de barandin

7 - MEHMÛD BEG, KURÊ TEYMÛR BEG

Mehmûd Beg, çawa çavên xwe vekirin dî, ko çawa zor û setem bi sermilet û welatê wî de dibarin, ji lewra ji rêve dest bi daneheva dost û mirov û gernasên eşîr û kurdên hawîr xwe kir û bi vî rengî leşkerekî mezin ji xwe re pêkanî û kurd û ereb li xwe civandin.

Herwekû di vê babetê de waliyê Şam gelek alîkariya wî kir û hin leşker xiste bin destê wî heta, ko xwe tekûz kir û pêkanî.

Ji nû ve paşê Milan gund û êlaxên kurd ji destê şemer û Tey deranîn û bajarê Wêranşar ji xwe re kire paytext û ke-leheke mezin têde avakir. Lê gelek neçû Umer Paşa, waliyê Diyarbekir hate ser û girt û di keleha Diyarbekir de xiste zindanê.

8- İBRAHİM BEG, KURÊ MEHMÛD, KURÊ TEYMÛR BEG

İbrahim Beg piştî, ko bavê wî xistin zindanê, hevsarê fermandariya Wêranşar, welatê Milan xiste destê xwe û bica mêrî welatê xwe ji dijmina parast û berê xwe da welatê Mîs rê, ko bavê xwe bidî berdan, lê tiştek bi destê wîve nehat û naçare berê xwe da İstanbulê û bi alîkariya Xidewî İsmail Paşa fermanek ji padîşah Abdulezîz Xan sitand û bixwe re anî û hate Diyarbekir û bavê xwe berda.

Lê mexabin gelek nema û serê xwe danî û ji cihanê koça xwe barkir û çû. Lê çawa Mehmûd Beg serê xwe danî İbrahim Beg destê xwe bi nav eşîran de dirêjkir û dest bi sergêjî û berdîberdanê kir û gelek neçû padîşahê turk, Abdilhemîdê diwem ew kire paşa û welat bicarek xiste bin darê wî. Herwekû eşîrên kurd û ereb di Cizîrê de carek xwe dane ber siya dewleta wî û nav û dengê wî bi cihanê de belav bûn. Riya navbera Heleb, Mûsil, Mardîn bicarek hatibû girtin û di bin destê wî de bûn. Kesî nikaribû bê xwîkîtî di van riyan re derbas bî. Ji lewra dewleta Osmanî naçare leşkerek rê-kire ser paşê û girtin û birin Sêwasê, qelebend kirin dest li ser danîn. Tenê piştî çaxeke dirêj paşê bazda û hate welatê xwe û bi hezar dijwarî xwe gihande Wêranşar, lê gelek derbas nebû Abdilhemîdxan leşkerê siwarî binavê xwe saz kir û İbrahim Paşa dinav vî leşkerî de bû mîrêmîra Paşa.

Abdilhemîdxan, ev leşkerê ha bi navê Leşkerê Hemîdî ji kurd çêkir, ji ber, ko kurd derebeg û nezan û hov û paşde-may bûn û dikaribûn xwe di ber padîşahekî ji hevdeketî, kevnepêrest de bidin kuştin.

İbrahim Paşa bi vî rengî hawîr pejên xwe berdan û ne tene kurd, belkî hin eşîrên ereb jî bi xweve girêdan û xistin bin darê xwe û gavên xwe fireh avêtin.

Di sala 1322 k.(1904 z.) de İbrahim Paşa eşîra Qeregêç şikand û bîzor xiste bin darê xwe. Dibêjin Dirê-î Paşa me-

zinê êla Qeregêç çû İstanbûlê goya, ko giliyê İbrahîm Paşa bikî, lê çawa padîşah dî, berî her tiştî ji Dirê-î pirsî û got:

- Gelo kurê min, İbrahîm çawaye?

Ji lewra Dirê-î Paşa gelek bi camêrî pesnê paşê da û vege-riya û hate mala paşê û got:

- Bavo ! Ez kêmê te ! Ma kî ji me dikarî li ber kurê Abdil hemîdxan dest hilênî?

Lê çend şerên mezin di navbera Mila û Şemer de çêbûn.

1- ŞERÊ PÊŞÎ YAN SEWLA EBDÏLKERÎM :

Divî şerî de Şemer hatin ser Milan û navê wî Sola-bû Ab dîlkerîme. Dibêjin, ko Şemer çar-çar li deva siwar bûn û koçemal berê xwe dabûn ser welatê Wêranşarê.

Herwekû netenê eşîrên ereb, belkî hin eşîrên kurdjî da-bûn hêl û tengala xwe, di baweriya Şemer de, ko wê Wêranşar kavil û wêran bihêlin û bicarek Milan talan û berbad bikin. Lê weke, ko bawer dikirin derneket.

Hin kurd hebûn, ko di dilê xwe de dijminê Şemer bûn. Ji İbrahîm Paşa re şandin, ko Şemer koçemal hatiye ser te, karê xwe baş bike, em nehatine şerê te bikin, lê ji tirsê em bi Şemera re hatine.

Paşê jî kozik û çeperên xwe çê-asê kirin û tivingên mewzer di destê leşkerê wî de bûn. Ji lewra ji ereban paxav ne dikirin û di şeva dawî de, ko wê şer sibê destpêbikî leşkerê Milan ji nişkave bi ser konê Şemera de girtin û êrîşî nav mala kirin

Çawa deva dengê tivinga kirin bi şûnde bazdan û zar û zêçên ereba di nav lingên deva de pirê wan perçiqîn. Naçare ereb şikestin û bi şûnde reviyên, lê rev hew bi destê dijmin diket. Her çiqas Şemer mêr û şervanin jî lê xwe li ber tivinga(Mewzera) negirtin û leşkerê kurd da ser şopa wan û gelek ji wan kuştin. Çawa, ko gelek ji wan bi dest girtin.

Mihemedaxayê Deqorî(Takorî) bi dest di binê konê xwe de hate girtin, lê paşê ew nekuşt û perwa pêvekir û şande mala wî û jêre got :

- Ez dizanim, ko win ne dostê Şemera ne, ji tirsê hatine şerê min. Û Şemer pozşikestî, perîşan, ji hevdeketî vege-riyane(Şemrane) welatê xwe, vege-riyane İraqê û kurd û erebên Cizîrê ji zor û setema wan hatin parastin.

Şemera gelek çavsorî û pîsitûrî li kurd û erebên Cizîrê dikirin. Malê wan dixwarin, mêrên wan dikuştin. Xwêkîtî ji wan distandin, dext û şînkayî di dane ber û nigên sewal û deva û diçêrandin. Bi rastî nexweşiyê mezin û bê derman

bû, kesî nikaribû li ber şivanê wan destê xwe hildî, bi do qika mirov dikuştin.

2- ŞERÊ DÎWEM :

Vêcarê paşa çû ser Şemera û navê vî şerî şerê Hilko ye .
Li jêrê bajarê Nisêbîn çêbûye, eşîrên ereb Şemer, Tey, Ci-
bûr û koçerê Mîran(Mîhran) ê kurd jî wan re bûn.

Konê paşê li diyarê Hilko danî bûn û konê dijminê wî li
hember wî li zenda vegirtibûn. Lê xwedîxêr di navbera wan
de çûn û hatin û dixwestin wan bê şer ji ber hev rakin. Te
nê paşê li ser wan vebirî, ko:

1- Gereke civînek li binê konê paşê çêbibî.

2- Ya dî ewe, ko gotina dawî wê di destê paşê de bî.

Abdîtaxa, mezinê Aliyan ê kurd di nav bazarê de bû û ev
serpêhatî ji min re dûr û dirêj bidarvekir û digot:

-Piştî dan û sitandineke dûr û dirêj şêxê Teya dey li paşê
kir û got; Ê paşa ka bêje tu çawa dixwazî? Paşê dengê xwe
bilind kir û got:

- Eger winê bi gotina min bikin, ezê bêjim?

- Ma kî heye bi gotina te nekî? Ka bêje !

Paşê got:

- Gelî mezinê eşîran, em hemî dizanin, ko ji bav û kalê
xwe de şêxê Teya mezinê Cizîrê ye û hindama Nisêbîn di ber
çera Sewalê teya de ye. Ez dixwazim îşev konê xwe barkî û
herî jorê Nisêbînê, belê herçîka êla Cibûrê paytexta wan
girê Tabane, dixwazim îşev konê xwe barkin û herin Taban
ser çerdên xwe deynin.

Lê heçî mala Mihemedin ew ji berê de xûkê Milane, dixwa
zim îşev konê xwe barkin û bêne nav konê Milan. Paşê wilo
got û dabaşa mala Asî nekir û pêjinî û hew dengê xwe kir,
ji lewra Asî bixwe dengê xwe hilda û got:

- Paşa te em nanîne meydanê, xêre?

Paşê go:

- Win ne xelkê Cizîrê ne, wîn Îraqî ne, konê xwe barkin û
herin welatê Îraqê.

Lê Asî bersiva wî de û got:

- Paşa, qoçanê me di Hilko de hene, em çawa ne ji xelkê Ci-
zîrêne?

Lê paşê di bersiva wî de got:

- Ca eger wilo ye, ezê siba li qoçanê te binêrim.

Şêxê Teya go :

- Î- bileh xweş heçî? û em tev bi vê gotinê razîne. Tiştê,
ko te gotiye kes jê dernakevî.

Îbrahîm Paşa, berê xwe da Abdilkerîm Beg û bi xeyd jêre
got:

- Birazê, hela ev ciwanmêr hatine şerê min, ko kurda pîs bikin, lê nizamim tu çima hatiye şerê apê xwe?

Abdilkerîm Beg, dengê xwe nekir, lê paşê li xwe vege - rand û got :

- Ez niha dikarim guhê te jêkim, lê xelkê bêjin, İbrahîm , nikaribû dijminê xwe çû ji hemîwan guhê mêrikê kurd jêkir. Tenê Abdilkerîm Beg dengê xwe nekir û civat li ser vê destûrê jihev bela bû.

Abdîaxa dibêjî; Piştî şîvê em tevde çûne binê konê Asî û me ev dabaş ji nûve vekir û Hadî, kurê Asî ji me re got:

- De rabin ji niha de konê xwe barkin, lê bi xwedê, ko paşa bi me şiyarbî yekî ji me li ser linga nahêlî. Mêrik hevalê me ji me dizîn û hew şer dikin.

Axa dibêjî, bi rastî gotina Hadî di cihê xwe de bû. Te-ya di wê rojê de barkirin û çûne jorê bajêr. Herwekû Mihemed, kurê Abdilkerîm barkir û çû nav Milan danî û bû hevalê paşê û ji tirsê Cibûrya barkirin û çûne ser Xabûr. Her tenê em heftê siwar kurd bi Hadî re man û ji nivê şevê pêde leşkerê paşê ajote ser konê me û deve hin barkirî û hin wilo bi çola ketin û reviyar û siwarê paşê dane ser piştê me û talan û berdîberdanê destpêkir. Tenê Hadî weke şêrê birîndar, bi siwarî û bi tena darê rimê ew koç û mal diparastin û di berve şer dikir. Çawa li siwara dizîvirî tîşt-tîşt didane ber xwe lê weke lehiyeke mezin dîsa dighan hev û tajotin ser talanê me. Lê Hadî carekê berê xwe da me û got:

- Gellî camêra ! Eger we îro ev boşê deva ji mere vegerand herwekû we talanê Şemer tevde vegerandibî.

Boşek devên sipî weke berfê piştê xwe dane me û berê xwe dane siwarê paşê û bi lok dibezin û diçin. Ev deve naqin, ko pîrek û keçikê mala şêxê Şemer li wan siwar dibin. Ji lewra li ber dilê şêx Hadî wilo şêrîn û bi rûmet û giranbiha têne xuyakirin.

Em her heftê siwarên kurd pey wan deva ketin, lê Mexabin me nikaribû vegeřenin. Ji lewra şêx Hadî li me vege-riya û got:

- Berdin. Sitêra vî mêrikî li ezmana geş bûye. Bi xwedê eger em bi lingê mehînen xwe xelas bin em gelek xwedî bext û gernasîn.

Me deve berdan û berepaş şikestin û berbi Dêrûnê ve reviyar. Me xwe dabû qelaça, ko siwarê paşê nikaribûn me bi dest bigrin. Li nêzîkî Dêrûnê şêx Mihemed, xuşka xwe dinav jinê peya de dî, ko li serê xwe dixî û digrî û dibêjî:

- Wawêl ya Mihemed ! Herwekû ev ji şêxê Şemera re tiştêkî gelek kêmanî ye. Ji lewra şêx Mihemed şûrê xwe tazî kir û

ajote ser xuška xwe.

Lê paşê ew vegerand û ji siwarên xwe re got:

- Vegerin ! Vegerin ! Bese me Şemer şikandin, bere xatirê Şêx Mihemed bin îdî me cilik di bin wan de ne hişt.

Axa pêde diçî û dibêjî; Em bi vî rengî şerpaze, şikestî ketin, sînorê Îraqê û paşa ji pey me vegeriya.

ŞERÊ İBRAHİM PAŞA Û AZADÎXWAZAN

Çawa azadîxwazên tirk zor dane Abdilhemîdxan, padîşahê kevnepereşt han û hawara xwe bire çend paşayên Kurdistanê.

İbrahîm Paşa, Seyfidîn Paşa, Mistefa Paşa, Kor Huseyn Paşa tenê ji tevan bêtir bawerîya wî bi kurê wî İbrahîm Paşa dihat û paşa xwest, ko di pingava sipî ve herî Asitanê û padîşahê Îslamê ji tengasiyê xelaskî, lê negiha daxwaza xwe û hêj li Şam bû azadîxwazan Abdilhemîdxan girtin û xistin zindanê. Hindik mabû, ko İbrahîm Paşa, li Şam bigrin, lê Abdirehman Paşa yê Kurd, paşa bire mala xwe û şivek dayê û çîrok jêre got û paşa leşkerê xwe ji nav bajêr derxist û çûne derê bajêr û bişev ji Dimişqê bazdan û berê xwe dane welatê Cizîrê, li rê çî gund û bajarên, ko ketin riya wan talankirin û leşkerê tirk ji Heleb, Reqa, Mardîn, Mûsil derketin û hatin pêrgî paşê Mila û şer hawîr destpêkir û paşa bi siwarî bi leşkerê xwe vedi ava çemê Ferat derbas bûn û yek siwar tenê di avê de mir û ên mayîn bi lingê hespa xwe gihandin Wêranşarê, paytexta Milan, lê hew ji lewra naçare koçmal berê xwe dane Çiyayê Şengalê Sencar.

Lê eşîra Şemer ji pêşve di riwê wan de rawesta û ne hişt ko derbas bin, naçare paşê Mila konê xwe danîn û li hindama Sifeya karê xwe û şerekî mezin kirin, lê paşa weke, ko ji Şemera ditirsiya, wilo ji leşkerê tirka paxav nedkir.

Lê pir cihê axîne, ko paşê mezin li Sifiyya serê xwe danî û li ber mirinê ji zariwên xwe re got:

- Vaye Şemer ketiye riya we û leşkerê tirka hawîr we girtiye û ez vame dimrim. Tenê mirina min eşkere mekin û zû herin Nibêbînê xwe bidin destê leşkerê tirk, çawa hebî we te va nakujin, bere we bigrin û Riha bikin, dinya dirêje.

Piştî mirina paşê zariwên wî ew di girê Sifeyya de veşartin û xwe dane destê tirka û berî Şemer bizanibin ew gi hane bajarê Nisêbînê. Zariwên paşê hin girtin û hin Riha kirin û bi mirina paşê vî gernasî, vî kurdê navdar, İbrahîm Paşa bi ser hevde hate pêçandin û hew vegeriya nav Mi-

la. Bi mirina İbrahîm Paşa ev derebegiya Milan dawî hat.

Ji wê rojê de nehiştin zarokên paşê bêne axa Kurdistana nê, nehiştin bêne welatê xwe Wêranşar. Lê piştî şerê Şêx Seîd Efendî, yanî piştî sala 1925 gelek ji wan reviyana û daketina Sûriya. Li serê kaniyê rûniştin, lê ev heye çend sal, ko dewleta Sûrî qad û zevî ji destê wan sitandine û bê rûmet mane. Tenê zarokê wan di xwendegêha de dixwênin û gavên xwe berêş tavêjin.

Lê mixabin, ko zarokê wan pirê wan dibêjin; Em ne kur - din, belkî em erêbê Riwela ne.

Ji zariwên paşê ên, ko min bixwe dîne û ez biwan re rûniştine:

Mehmûd Beg (Mamû), Xelîl Beg, Temir Beg, İsmâil Beg, Abdirehman Beg. Û ez bi wan re rûniştine û zariwên Xelîl Beg jî hin ji wan dîne.

Zariwên Şêx Hadî, Dehham (Şêx Dehham), Paşa, Feze, herwekû ji zariwên Şêx Mihemed, Ebdilkerîm û Meyzer, kurê wî, herwekû Mişel Paşa ji mala cerba û hin dî jî ji wan min dîne û bi wan re rûniştine.

Tenê Şêx Dehham, gelek dijminahiya kurd dida ber çavên xwe û her tim şerê me dikir. Tenê bi rastî mirovekî mezine

ne. Eger ne Haco Axa mezinê Hevêrka bûna, kesî xwe li ber bigrî di nav me de nebû. Lê gelek caran Haco Axa zora wî dibir û mezinahiya Cizîrê bi destê wî ve bernedida û herdem, axê xwe dida pêş û zora Şêxê Şemara dibir. Lê di îro de de rebeg, şêx û axa, kurd û erêb bicarek bê rûmet mane û bî dijwarî liber xwe didin.

Ji tarîxa Kurd û Kurdistan, ko wezîrê pir jîr Mihemed E mîn Zekî Beg çêkiriye hatiye guhaztin û min bi ser ve dirêj kiriye.

Rûpel 270

Cigerxwîn

Sal 1970 z. Dimişq

DEREBEGIYA SASON (XARZA)

Ji Şerefnamê diguhêzim.

Şerefxan dibêjî; Ev malbat pismamê fermandarê Bedlîsê ne û ji mala Kesra Sasanîne. Du bira bi navê Îzidîn, Diyidîn ji bajarê Xelatê, li ser destê eşîrên Rojka hatine û ev Îzidîn bûye fermandarê Sasûn û Hezo, ko ji destê padîşa hê Gurcistan Dawîd derxistine û çend eşîr ji Rojkan li vê hindamê li nik Mîr Îzidîn rûniştine, ko Şêrwî, Babosî, Timoqî, Sosanî bi Mîr Îzidîn re mane.

Lê Mîr Diyaidîn li Bedlîs rûniştiye û pirê eşîrên Rojkan pêre mane. Lê çawa mîrekên Hezo-Sasûn bajarê Erzen xistine bindestê xwe çend eşîrên kurd Xalidî, Dermixarî, Ezîzan ji kurdên hêla Heskîf bi ser xweve berdane. Vê malbatê di çaxê Pezgewr û Sefewiya û Osmaniya de jî bi camêrî wela tê xwe parastine û biwan re bê sergêjî û bi dostanî çax û demên xwe rabiwardine. Ji wan ê navdar:

1- MÎR EBÛBEKÎR :

Pêlake dûr û dirêj bi kamîranî û serbilindî fermandarî kir û paşê serê xwe danî û kurê wî Xidir Beg kete şûna wî.

2- XÎDÎR BEG, KURÊ EBÛBEKÎR BEG :

Piştî mirina bavê xwe Mîr Xidir Beg bi camêrî walê xwe li hevragirt û êl û eşîrên xwe li hawîr xwe civandin û pêlakê bi camêrî derbas kir û serê xwe danî û birayê wî li şûna wî rûnişt.

3- MÎR ELÎ BEG, KURÊ MÎR XÎDÎR BEG :

Piştî mirina birayê xwe bû fermandar û serdarê welatê Xerza. Lê mirovekî serxweş û tolaz û zarokperest bû û jîna xwe bicarek di vexwarin, tolazî, saz û lîz û dîlanê de rabîward. Di çaxê Şah Îsmâîlê Sefewî de, ko Kurdistan bîzor xistibû bin destê xwe û diwazde mîrekên Kurdistan xistin zindanê. Ev Elî Beg bû dostê Şah û şev û roj pêre vedixwar û rûdinişt û li ber dilê Şah gelek payedar û şêrîn û serfî raz bû. Xweşka xwe dabû Mîr Şeref Begê Bedlîsî.

Lê piştî jîndariyeke dirêj serê xwe danî û sê kur bişûn xwe ve hiştin. Mihem Beg, Xidir, Şahwelî.

4- XÎDÎR BEG, KURÊ ELÎ BEG :

Mîr Elî Beg, li Tebrîzê û di sera şah de serê xwe danî û şahê navdar bi fermanekê welatê Xerza da destê Mihemed Beg. Lê eşîrên Xerza Xidir Beg kirin fermandar û li hawîr wî gihanhev û Mihemed Beg ji welatê Îran bazda û vegeyriya Kurdistan bindestê turka û di wê çaxê de padîşah Selîm Xan diçû ser welatê Misrê û Mihemed Beg di şerê Çirkesa de birin, çend caran gernasî nîşan da û bi mêranî deng pêket û bi bindarîdu rojandi nav kuştiyan de ma, Iê li ser kîsê padîşah hate dermankirin û welatê Xerza xiste bindestê wî û bajarê Erzen ji derebegiya Heskîf biser welatê wî ve beda û çawa Mihemed Beg hate welêt, birayê wî Xidir Beg gerdana xwe jêre xwar kir û fermandarî bi destê wî veberda û di bin fermandariya wî de li bajarê Hezo rûnişt. Lê gelek neçû Xidir Beg serê xwe danî û çar kur Mehmûd, Ehmed, Yaqûb, Mihe medbi şûn xwe ve hiştin. Lê Mehmûd biciwanî serê xwe danî û Yaqûb di şerê Gurcistanê de hate kuştin.

5- MÎR MIHEMED BEG, KURÊ MÎR ELÎ BEG, KURÊ MÎR XÎDÎR BEG :

Çawa hate Sasûn bi serbilindî û bê hemta di welatê xwe de rûnişt. Tenê Mîr Melek Xelîlê Heskîfî bajarê Erzen bi hêsan bi destê wî ve berneda û leşkerê xwe kişandin berhev û piştî şerekî xwîndar û bi arîkariya Şeref Begê Bedlîsî, Elî Begê Botî bajarê Erzen bi zorobi ser xwe ve berda û pa şê serê xwe danî û koça xwe ji vê cihana jîndar barkir û çû. Şeş kur bi şûn xwe vehiştin. Suleyman, Bihaidîn, Sarû - xan, Xanbodaq, Huseyn, Elî.

Ji Bodaq Beg, Murad Beg ma û di şerê Gurcistanê de hate kuştin û du kur bi şûn xwe ve hiştin. Bihaidîn, Bodaq. Lê ji Huseyn Beg kurek bi navê Hesen Beg ma û li ser destê pismamê xwe Mihemed Beg bi sê kurên xwe ve hatin kuştin. Çawa, ko Elî Beg bi civanî serê xwe danî tenê Suleyman Beg, Bihaidîn Beg, Saruxan Beg li pey hev fermandarî kirin.

6- SULEYMAN BEG, KURÊ MÎHEMED BEG :

Bi fermaneke padîşah, Suleymanxanê turk bû fermandarê welêt û li cihê bavê xwe rûnişt. Di sala 927 ê koçî de bû fermandar û birayê xwe Bihaidîn Beg xiste bajarê Erzen.

Mirovekî gelek zana bû. Wî nehişt, ko Şemsidîn Begê Bed lîsî herî welatê Meletya, lê herdem serxweş û dilgeş, dostê mûsîqa û sitiran û dîlan û saz û keçika bû.

7- MÎR BÎHAÎDÎN BEG, KURÊ MÎR MÎHEMED BEG :

Bi fermaneke padîşah, Suleymanxanê turk bû fermandarê welêt û di çaxê wî de navê vê derebegiyê bû Derebegiya Hezo.

Mirovekî derwêş û olperest û xwedênas bû, lê gelek gernas û mêr û jêhatî bû. Sedhezar aqça zêrê osmanlî salyan û hatina welatê wî bûn. Yazde salan di nav berdevk û serka - rên sera padîşah de rabiwardine. Padîşah gelek jê xweş bû. Dilxwaz û dostê padîşah bû û herdem pêre digeriya û jêre digotin Delûbihaidîn (Bihaidînê Dîn). Bixwe Mîr-liwa bû û çend caran bûye muteserif û gelek navdar û comerd bû. Nan û gak li cem weke hev bûn. Heftê hezar filorîli xwarina xelkê didan û piştî mirina wî bi sîh hezar filorîrî deyndar bû û sîh sal fermandarî kiriye. Pênc kur bi şûn xwe ve hiştin, lê her pênc ne sezayê fermandarîbûn û kordûnde çûn.

8- SARÛXAN BEG, KURÊ MÎHEMED BEG :

Di çaxê femandariya mîr Bihaidîn Beg de hijde salan der bider, perîşan li çolan digeriya, geh li Barkêr û geh li Kêsan û geh li Şêrwan û Mûş û Siwêrek bi senceqî dima û carna der bider bê nan û xercî li çola di ma.

Lê piştî, ko Delû Bihaidîn serê xwe danî li ser destê Mihemed Paşa, wezîrê mezin bû fermandarê Hezo û her çiqas Huseyn Paşa, kurê Mihemed Paşa, wezîrê mezin, ko bixwe mîrê mîranê Diyarbekir bû xwest, ko Suleyman Beg, kurê Bihaidîn Beg bixî şûna bavê wî, lê bavê wî bi gotina kurê xwe nekîr û Sarûxan Beg kire fermandar û ev mîrê mezin, ko bixwe di şerê Gurcistan û Şêrwan de serdarê leşkerê Kurdis - tan û serdarê pêşingê leşkerê serdar Mistefa Paşa û li Çal dêran rûniştî bû û ji nişkave leşkerê Ecembi ser degirt û bi gernasîdi nav şer dehate kuştin. Lê gelek efyûnkêş bû û herdem nexweş bû.

9- MÎHEMED BEG, KURÊ SARÛXAN BEG :

Dema bavê wî hate kuştin bi bavê xwe re bû û bi gernasî xwe ji nav destê dijminê dijwar parast û di sala 986 ê koçî de li şûn û cihê bavê xwe rûnişt.

Mirovekî zana û bîrewer bû. Dûrîrêçika bay û kalê xwe diçû û di xwarin û vexwarin û rabûn û rûniştina xwe de ke-ke romiya bû û kincê xwe weke wan werdigirtin û bi mezina-hî hînî xwendinê bûye. Bi Farişî û nivîsandina Şikeste baş zanibû û gelek xweş dinivîsî. Di vê meydanê de navdar bû. Herwekû di gelek meydanê dî de di pêşiya hemçaxên xwe de bû. Di sala hezar û yekê koçî de berê xwe da welatê Hicazê û çû hecê.

Hevsarê derebegî-fermandarî bi destê Şemsidîn Axa, kurê Ferîdon Axa ve berda bû û nikaribû dînarekî bê wî xerc bikî û dost û mirovên xwe ji Şemsidîn Axa ji xwe dîr xistibûn û piştî, ko Hesexan û kurê wî Xazanxan kuştin jina Xazan Xan, ko xuşka wî bû, keça Xazanxan bihev re di şevê de li Axê mar kirin, gelek ji ser xwe çûbû û herdem bi sî-nordaşên xwe re di şer û sergêjîya de bû û weke padîşahekî mezin li xwe dinerî û di sala 1004 ê koçî de serê xwe danî.

10-EHMED BEG, KURÊ XIDÎR BEG :

Çawa Mihemed Beg, kurê Sarûxan Beg serê xwe danî, Ketxu da Şemsidîn Axa, kurê Ferîdon Axa Ehmed Beg, kurê Xidirbeg xiste şûna wî û bi carek êl û eşîran xwe dane hêla Ehmed - beg.

Lê birayê wî Mihemed Beg, kurê Xidir Beg, ko bi xwe li Sêrtê fermandar bû, lê çawa Şemsidîn Axa bû ketxuda ev Mihemed Beg ji ber Mîr Mihemed Beg, kurê Sarûxan Beg reviya û çû nav Bota. Herwekû Bihaidîn Beg, kurê Mirad Beg û çend mezinê eşîran weke Şah Murad Axa û Huseyn Axayê Sosanî û Behram Axa, ko bicarek reviya bûn û li Bedlîs û Şêrwan rû-diniştin tev li hev civiyan û destê xwe dane hev û berê xwe dane Hezo.

Şemsidîn Axa, ji nû ve kete nav tirs û sawîran û gote Ehmed Beg gere tû birayê xwe, Mihemed Beg bikujî. Lê Mihemed Beg bi vîlika axê zû agah bû û tevlî mezinên Sosaniya çûne keleha Sasûn û xelkê kelehê bi dilxweşî hatin pêrgî mêva - nê xwe. Tenê Şemsidîn Axa xeyidî û Ehmed Beg xiste zindanê. Û Bihaidîn Beg kire fermandarê welêt.

11-BİHAÏDÎN BEG, KURÊ MURAD BEG :

Piştî, ko Ehmed Beg, kurê Xidir Beg kete zindanê û birayê wî Mihemed Beg kete keleha Sasûnê û Şemsidîn Axa, Bihai dîn Beg kire fermandar û leşkerekî mezin dahev, ko ji Bota û Şerwa û Zirika siwar û peya bihev re gihandin hev û çû ser keleha Sasûn.

Lê ji ber, ko keleh gelek asê bû û leşkerê Bedlîşê hatibû han û hewara Mihemed Beg naçara Şemsidîn Axa vegeriya

û kete kelha Hezo û di sala 1004 ê koçî de Mihemed Beg bi leşkerêxwe ve, ko bi serdariya Elaidîn Axayê Bilbasî û Elwend Axayê Qewalîsî û eşîra Modika û Zeydanî bi wan re bi-carek dane ser şopa dijminê xwe û hevalbendê Şemsidîn Axa ji hev belav bûn û naçare Axê zarokên xwe birin û çû cem Zeynel Begê Şerwî rûnişt û kurê xwe Huseyn Axa rêkire serê keleha Hezo, ko Ehmed Begê bikujî û Bihaidîn Beg bixwe re birevênî. Lê Bihaidîn Beg, Ehmed Beg ji zindanê deranî û bihev re kurê Şemsidîn Axa, Huseyn Axa girtin û xistin zindanê û çûne pêrgî Mihemed Beg, kurê Xidir Beg û gerdena xwe jêre xwar kirin û ew kirin fermandarê welêt.

12-MÎR MÎHEMED BEG, KURÊ XÎDÎR BEG :

Piştî vê serpêhatiya ha Mihemed Beg bi fermaneke padîşah Mihemedxanê Siyem bû fermandarê Hezo(Xerza) û êl û eşîran bi carek dane hêla wî.

Lê Şemsidîn Axa ji cem Zeynel Begê Şerwî çû nik Mîr Şeref Begê Botî û dest bi vîlik û dolaba kir û berî hertiştî ji Mîr Şeref Beg hêvîkir, ko ji cem xwe mirovekî rêkî Hezo û hêviya berdana kurê wî bikî û Mîr Şeref Beg ev gotin xis te serê xwe û yek ji cem xwe rêkire nik Mihemed Begê û jê hêvîkir, ko Huseyn Axa, kurê Şemsidîn Axa berdî. Lê berî, ko peyayê Mîr Şeref Beg bighê Hezo Huseyn Axa di zindanê de hatibû kuştin û bi vî rengî Mîr Şeref Beg gelek xeyidî û dixwest Mîr Mihemed Beg ji ferdandariya Xerza bavêjî.

Şemsidîn Axa, ew mirovê dolabgerîn hero di guhê Mîr Şeref Beg de digot:

- Mîrim, ji mere îro mizgîneke xweş hatiye, ko xelkê Xerza ji Mîr Mihemed Beg xeyidîne û dixwazin wî bavêjin, lê mirovekî mezin weke te nîne, ko piştî wan bigrî, alîkariya wan bikî. Dixwazin careke dî vegerim cihê xwe û yekî li ser destê xwe bikim fermandarê welêt.

Bivî rengî Şeref Beg hate xapandin û pênc hezar şervan ji Botan û Şêrwan û Zirikan gihande hev û şande ser keleha Hezo, lê berî bigihê Sêrtê fermandarên Hezo çûne pêrgî Mîr Şeref û gotin :

- Tu çawa ferman dikî em ji gotina te dernakevin û xêrxwaz ketin wê navê û nehiştin şer destpêbikî û vegerandin Bedlîsê û Mîr Şerefhanê Bedlîsî û Mîr Şeref Begê Botî bihev şewirîn û ev soza paşî dan:

- 1- Gereke Şemsidîn Axa vegerî nik Mîr Mihemed Beg û weke berê serkarê dewletê bî.
 - 2- Mîr Mihemed Beg fermandar û her tişt dibin fermana wî de bî.
- Şemsidîn Axa herdû birayên Mîr Şeref Beg, Xan Evdal û

Xelef Beg bi xwe re birin û çû Hezo.

Lê Şemsidîn Axa dixwest weke berê bikî, her tiştî bixî destê xwe. Tenê vê carê jê re neçû serî û bi destê wî ve nehat. Ji ber, ko mîrek û êl û eşîr bi hev re jê nexweş bûn û xelkê êrîş birin ser, ko bikujin, lê ji nav lepê wan reviya.

Lê çawa Mîr Şeref Begê Botî(Cizîrî), ev bihîst, hate bî ra wî, ko hatiye xapandin û xelkê welatê Xerzan ji Şemsidîn Axa xwî dikin û nexweşin. Ji lewra vegeriya mala xwe û dengê xwe nekir.

Di sala 1004 ê koçî de Mîr Şeref Beg vegeriya Cizîrê lê careke dî Şemsidîn Axa çû cem û Mîr Mihemed Beg bû ferman-dar û bi vî rengî pêlakê Dêwê dijminahî serê xwe xiste xew û çavên xwe dane hev û raza.

Tenê di wê navê de Elî Paşa, waliyê Mûsil, ko berî hingî arîkariya Mihemed Beg kiribû, bi mêvanî hate mala wî û mîrê Xerza gelek rûmeta wî girt. Tenê weke, ko paşê dixwest, diyariyên giranbiha û mezin jêre pêşkêş nekirin û kîsên zê ran nedanê.

Ji lewra dilnexweş ji Hezo çû Mûsil, lê piştî pêlakê ji walîtî ket û li Cizîrê rûnişt û dostanî di navberawî û Şemsidîn Axa de gelek xurt bû û bi hev re vîlik dibiwara Mîr Mihemed Beg de gerandin.

Fermanek bi derew(sexte) nivîsîn û mirovek rêkirin Hezo û got:

- Ehmed Beg, li şûna birayê xwe Mihemed Beg bûye ferman-dar.

Bi vî rengî Ehmed Beg hate xapandin û ji Hezo bazda û ha te Cizîrê û Elî Paşa û Şemsidîn Axa çûne pêrgî wî û bixwe re birin nik Mîr Şeref û careke dî Mîr Şeref Beg leşkerê xwe bi serdariya birayê xwe Şah Elî Beg û Şemsidîn Axa û Elî Paşa û Ehmed Beg pêre şandin ser welatê Xerzan.

Eşîrên kurd, Sosanî, Xalidî û ji wanpêve jî bi carekli-hev civiyan û gotin:

- Qey raste Mihemed Beg bikêrî mîrîtiyê nayê? û ji bo xatî rê çavê wî emê hergav bikevin bin destê Mîrê Bota. Ya baş ewe, ko em bixwe mîrê xwe deynin û yêdî rakin û bihev re hatin ber derê mîr Mihemed û xwestin, ko bikujin û Bihai - dîn Beg bikin mîrê Xerza.

Lê Mihemed Beg ji ber, ko gelek zana û hosta bû sînga xwe li ber wan vala kir û got:

- Naxwazim mîrekî bê êl û eşîr bim. Eger wê millet ji min nexweş bî, ez bi dilxweşî ji pismamê xwe re femandariyê berdidim û li mala xwe rûdinim.

Mîrê zana xwe bi vî rengî ji nav pencê mirinê parast û

çû nav êla Xalida rûnişt.

Lê Şemsidîn Axa ji Bihaidîn Beg re şand û got:

- Eger dixwazî mîrê Xerza bî, Mihemed Beg, ko kurê min kuş tiye bide destê min, berî, ko ez bighême cem te.

Lê careke dî Mihemed Begê zana ji pismamê xwe re got:

- Ez mirov û pismamê te me. Ji namûs û şerefa dewleta te re netiştêkî hêjaye, ko min bidî destê dijmina, lê eger di xwazî min bikujî, bere kuştina min bi destê tebî çêtire, ko min bidî destê Şemsidîn Axa.

Careke dî Mîr Mihemed Beg xwe bi hostayî parast û çû ke leha Sasûn. Xelkê kelehê derê kelehê jê re vekirin û bûnê hevalê wî û naçare tevli Şah Murad Axayê Sûsanî di 24 ê me ha remadanê de sala 1004 koçî çûne bajarê Bedlîsê û Ehmed Beg, careke dî kete şûna Bihaidîn Beg û bû mîrê Xerza û Şemsidîn Axa bû ketxuda (serkarê dewletî).

Lê piştî, ko Bihaidîn Beg yazde rojan li Bedlîsê ma jê-re mizgînek hat, ko bi alîkariya Mihemed Begê Zirikî eşîrên Xerza careke dî Ehmed Beg û Şemsidîn Axa ji welêt derxistin û Bihaidîn Beg kirin fermanarê welêt û careke dî Bihaidîn Beg vegeriya Hezo, lê hêj negihabû pira xatûnê jê re gotin, ko Şemsidîn Axa hatiye kuştin û Ehmed Beg ji mîrîrîtî xistin û Mihemed Beg kirin mîrê welêt û Elî Paşa û hevalên xwe xistine zindanê.

Di vir de Bihaidîn Beg, tirsîya û çû cem Mîrê Cizîrê û rûnişt û ji hatina Sêrtê mûçak jêre vebirîn û wê çaxê Sêrt di destê Mîrê Bota de bû û kurê Mîr Şeref, Mihemed Beg têde bû.

Herwekû Ehmed Beg jî hate kuştin û heta sala 1005 koçî welatê Xerza Hezo di bin femandariya Mîr Mihemed Beg de bû.

Pir cihê Axîne, ko min nikaribû ji nivişta Şerefname pê ve tiştêkî dî dibiwara vê derebegiyê de peydakim. Herwekû, min nikaribû bihin pêzan û kalemêran vê malbatê re bicivim ji lewra eger kê mî hatibî nivîsandin ne sêcê mine.

1970

Mûsa Hesên Cigerxwîn

FERMANDARIYA MEHMÛDÎ

Deng daye, ko fermandarên Mehmûdî ji mala Merwanê padî-
şahê Amed(Diyarbakir)in û hin dibêjin ji fermandarên Cizî-
rabota ne.

Lê çawa dibê bere bibî mirovek bi navê Şêx Mehmûd, ko
hin dibêjin, ji Şam û hin dibêjin, ji Cizîrabota bi êl û e
şîrên xwe ve hatiye cem dewleta turkmanê Qereqonlû(Pezreş)
û Qere Yûsif keleha Aşût daye destê wî û Şêx Mehmûd ji wê
rojê de kete nav serdar û fermandarên wê dewletê, lê çawa
di çend ciyan de damarên mêranî, mezinahiyê lê xuyabûn Qere
Yûsif hindama Xoşab jî bi ser hindama Aşût vejê re berdan û
ji wê rojê de navê wê derebegiyê bûye Mehmûdî.

1- ŞÊX MEHMÛD :

2- MÎR HUSEYN, KURÊ ŞÊX MEHMÛD :

Ev Mîr Huseyn gelek bi pêşve çû û turkmanê Pezreş, ke-
le ha Elbaq ji Hekarya sitandin û bi ser derebegiya Mehmûdî ve
berdan û çend caran zora Ezdînsêrê Hekarî birin û paşê we-
latê Hekarî bi carek bi ser welatê Mehmûdî ve hate berdan û
Ezdînsêr hate cem fermandarê Bedlîs û Mîrê Bedlîsê leşkere
kî giran bi serdariya Şêx Bilbasê(Şêx Emîrê Bilbasî) pêre
şande ser Huseyn Begê Mehmûdî û Mîr Huseyn Beg di nav şer
de, li ser çemê Xoşabê hate kuştin.

3- MÎR HAMÎD, KURÊ MÎR HUSEYN, KURÊ ŞÊX MEHMÛD :

Weke bavê xwe kete nav dewleta qizilbaş û gelek nema
serê xwe danî û piştî mirina wî, kurê wî Ewed Beg kete şû-
na bavê xwe.

4- EWED BEG, KURÊ HAMÎD BEG, KURÊ HUSEYİN BEG :

Piştî mirina bavê xwe bû mîr li Wayê, êla Xoşab û serda rê eşîra Mehmûdî, lê paşê di gel Orgemez, ko ji rexê Şah İsmail ve fermandarê Wan û Westan bû, bû dijmin û navbera wan nexweş ket û paşê Orgemez, Ewed Beg girt û xiste zinda nê.

Her çiqas Şerefxan, fermandarê Bedlîsê jê hêvî kir, ko berdî, lê Orgemez guh neda hêviya mîrê Bedlîsê û Ewed Beg, berneda, Naçare Şerefxan Beg êrîş berdane hindama Wan û Westan û sergêjî di rivê Orgemez de afirandin û naçare Orgemez sultan Ewed Beg berda û da destê Mîr Şerefxan Beg.

Lê dawî Ewed Beg, kete nav serdarên leşkerê Şah Tahmasb û şah hindama Elbaq jî, bi ser Xoşab ve berda û bi camêrî pêlake dirêj welatê xwe lihev ragirt û dawî pênc kur, Huseynqulî, Şahelî, Mîr Hemze, Mîr Hesên, Mîr Bodaq bi şûn xwe ve hiştin û serê xwe danî û koça xwe ji vê cihana jîn - dar barkir û çû.

5- MÎR ŞAHELÎ BEG, KURÊ EWED BEG :

Mîr Huseynqulî bû fermandarê Karçîka, lê paşê jê hate sitandin û naçare çû Diyarbekir û serê xwe danî û kurek bi navê Bayendûr Beg bi şûn xwe ve hişt.

Ev Bayendûr Beg bû fermandarê keleha Teran, ji welatê Xoy û heta bi sala 1005 koçî jî dibin destê wî de bû. Lê Şah Elî Beg, bi fermaneke Şah Tahmasb bû fermandarê Mehmûdiya û dawî bi destê Huseyn Beg, kurê Erîre Beg, fermandarê Elbaq hate kuştin û kurek bi navê Xalid Beg jê ma û hindama Coris bi senceqî kete destê wî û heta sala 1005 koçî jî ev hindam di bindestê wî de bû.

6- HEMZE BEG, KURÊ EWED BEG :

Hin ji eşîrên Mehmûdî xwe dabûne ber siya Delepîrî Beg, ko Şah Tahmasb ew kiribû fermandarê Mehmûdiya, lê paşê Mehmûdiyan ev Delepîrî kuştin û Hemze Beg kirin fermandarê wê lêt.

Tenê gelek neçû Şah Tahmasb ev Hemze Beg girt û di keleha Wan de xiste zindanê û dawî ew berda û eşîrên Mehmûdî, bi carek xistin bindestê Hacî Beg Dinbilî û Hemze Beg û çend fermandarê Dinbil bi destê Hacî Beg hatin kuştin û Şah Tahmasb femandariya Mehmûdî xiste bindestê Xan Mihe - med, kurê Mîr Şemsidîn, kurê Mîr Hamid. Lê piştî pêlakê Şah Elî Sultan Huseyn, fermandarê Wan ev Xan Mihemed girt û di keleha Wanê de xiste zindanê û careke dî femandariya Mehmûdiya siparde Dinbilan, ko hin ji wan di Aqçeqe de bûn û hin ji wan di Xoşab de rûniştî bûn û navê wan Mamere şan bû, lê bicarek di bindestê Hacî Begê Dinbilî de bûn û

Hacî Beg bi xwe fermandarê hindama welatê Xoy bû û Dinbilan bi carek di bindestê wî de bûn.

Lê di wê navê de Xan Mihemed Begê Mehmûdî ji zindana Wanê derket û hate nav eşîra Mamereşan, ko di Aqçeqe de bûn û çawa eşîrên Mehmûdî ev mizgîn bihîstin bi carek hatin cem û bi şev bi serkeleha Aşût de girtin û di wê rojê de Hacî Begê Dinbilî mewanê wê kelehê bû û Mehmûdiyan ew birîndar kirin û gelek ji Dinbila kuştin û Hacî Beg, bi hezar dijwarî xwe gihande bajarê Xoy û dawî ji rexê Şah Tahmasb ve ev Xan Mihemed Beg bû fermandarê Mehmûdiyan.

7- HESEN BEG, KURÊ EWED BEG :

Hate derbaskirin, ko Şah-tehmaseb, Xan Mihemed Beg kiribû fermandarê Mehmûdiyan. Lê gelek neçû Şah, femandariya, Mehmûdiya da destê Hesen Beg, kurê Ewed Beg û Xan Mihemed Beg kire fermandarê Aqçeqela û hero sed Aqçe ji dîwana Diyarbekir distand û bixwe li Wan rûdinişt û jîneke dûr û di rêj rabiward. Gelek mêr û gernas û pehewan bû, di sînorê Ecem de gelek tiştên hêja û payedar jê hatine dîtin. Sê kurên camêr Melek Xelîl, Mîr Şemsidîn, Seyid Mihemed bi şûn xwe ve hiştin û di Aqçeqela de serê xwe danî û çû.

8- EMÎRE BEG, KURÊ EMÎR HAMÎD, KURÊ MÎR HUSEYN, KURÊ ŞÊX MEHMÛD :

Di şerê Mîr Şerefexan Begê Bedlîsî û Ulema Begê turkmanî de ev Emîre Beg, hevalê dijminê kurd bû û careke dî xwe da rexê Ecem û çawa Suleymanxan ji Bexda vegeriya û hate şerê Tebrîzê ev Emîre Beg ji deşta Oçan hat, ko xwe bavêjî ber lingê padîşah. Lê çawa Suleymanxan, serdarekî xwe şande cem, ko wî bênî, Emîre Beg tirsiya û serdarê padîşah kuşt û şer di nav ordiya mezin de destpêkir û hevalên Emîre Beg bicarek hatin kuştin û Emîre Beg û çend hevalên xwe hatin girtin û bi fermana Suleymanxan tev hatin kuştin û du kurên biçûk Mensûr Beg, Zeynel Beg bi şûn xwe ve hiştin û bi kuştin çû.

Lê piştî, ko mezin bûn, çûne cem Şah Tahmasb û hindama Segmenabad bi senceqî da Mensûr Beg û Zeynel Beg xiste nav serdarên leşkerê Şahînşah û gelek rûmeta herdû biran girt û bi vî rengî man ta, ko Şah Îsmailê diwem bû padîşahê Îran Mensûr Beg çû dîwana wî û bi payedarî û serbilindî vegeriya mala xwe.

Tenê piştî, ko Şah Îsmailê diwem serê xwe danî û Îran kete nav berdîberdanê ev Mensûr Beg hate Wan û bi alîkariya mîrêmîran Xesro Paşa (Barkêr) bi senceqî kete destê wî û ji hindama Mûşê çend perçe ji zeviyên baş ji bo xwarina wî

bi ser ve berdan û zeametek li wan hindaman dane Zeynel Beg.

Lê piştî Mensûr Beg serê xwe danî, herdû kurên wî Hemze Beg û Qubad Beg bûne fermandarê hindama Seldûz û di sala 1002 koçî de li ser destê Şêx Heyder, kurê Nasir Begê Mukrî hatin kuştin.

9- HESEN BEG, KURÊ EWED BEG :

Li ser destê vî mirovî ola êzdî ji nav êla Mehmûdî koça xwe rakir û ola sinî kete şûna wê û zariwên xwe danîne ber xwendinê û mizgevt û xwendegeh di welatê xwe de avakirin.

Me derbas kirye, ko çawa femandariya Mehmûdî kete destê Xan Mihemed, lê çawa Hesên Beg ev bihîst berê xwe da welatê Îran û çû cem Şah Tahmasb û şahê navdar ji cem xwe femandariya mehmûdî xiste destê wî û keheha Xoşabbi ser ve berda û çawa Hesên Beg hate welêt Xan Mihemed Beg fermandarî bi destê wî ve berda û bû mîalahî û li Aqçeqla rûnişt.

Lê çawa Suleymanxan, padîşahê turk ji Bexda hate ser Azerbaycan, Hesên Beg hate cem û careke dî rûgeş û dilxweş vegeriya mala xwe û di şerê Hacî Begê Dinbilî de, ko Îskender Paşa çû şerê wî û Hacî Begdi vî şerî de hate kuştin.

Hesên Beg gelek mîranî û gernasî nîşan dan û Suleymanxan gelek perwa pêve kirin û gelek diyarî danê û şûrekî zêrîkirî avête milê wî û gelek gund û qada hemayûnî ji hindama Diyarbekir xistin destê wî û pezê Mehmûdiya ji salyanê azad kir û bêş ji ser wan rakirin. Sêzde hezar pezê Mehmûdiya hebûn.

Mîr Hesên Beg, gelek karên hêja ji Osmanliya re kirin û herdem bi kerayî di fermana turka de bû, xesma di çaxê Mûradxan de, ko çû şerê Îran û Hesên Beg gelek bi pêşve çû û payedar û serfiraz û bi rûmet bû û gelek Delamet û rûtbên mezin û bilind di dewleta Osmanlî de sitandin, ji Zeynelbegê Hekarî pêve ew di pêşiya femandarên kurd teva de bû.

Pêncî salî bi kamîranî û payedarî jîna xwe rabiward û di sala 993 koçî de, di şerê Sadabad de bi destê Eceman hate kuştin û piştî salekê laşê wî anîn û li Xoşabê di xwendegeha, ko bixwe avakiribû de veşartin.

Ewed Beg, Şêx Beg, Şêr Beg sê kur bi şûn xwe vehiştin. Ewed Beg di saxiya bavê xwe de di bajarê Mako de bi ocaxî rûnişt û kehehek têde avakir û di şerê Mukriyan de bi hin leşkerên Mehmûdî ve hatin kuştin.

Mako di welatê Nexciwan de ye û bi fermaneke padîşahê turk, Mako kete destê kurê wî Mustefa Beg û kurê wî Adî Elî Beg li Ordîbad ji welatê Nexciwan femandarî kiriye.

Mirovên mezin û serekên eşîra Mehmûdî bi saya serê He-

sen Beg gelek delemet û serkarî û karbidestî li welatê Azerbaycan û Ermenistan xistin destê xwe û gavên mezin di payedarî de avêtin û gelek berepêş çûn.

Ew gernasiyên, ko Hesên Beg ji turka re kiribûn bi carek civandin û xistin defterekê û serdar û fermandarên turk û kurd li ser mor kirin û şandin Asîtanê û padîşah Tırka xwe lê da û mor kir û dinav xelkê de xwe pê bipaye dikir û pesnê xwe pê ve dida

10-ŞÊR BEG, KURÊ HESEN BEG, KURÊ EWED BEG :

Di saxiya xwe de bavê wî femandariya Mehmûdî siparde destê wî, lê kurê wî Ewed Beg femandarê Mako bû û Şeref - xan Beg gelek pesnê Şêr Beg didî û dibêjî Şêr Beg mirovekî gelek hêja û zana û mezin bû. Çû hecê û ji xwendin û xwendevanan re gelek baş û destvekirî bû û di civata wan de rûdinişt û heta sala 1006 koçî jî ev Şêr Beg femandarê Xoşab û derebegiya Mehmûdî bû.

1966. 2. 20

Mûsa Hesên-Cigerxwîn

FERMANDARÊN KURDISTANA ÎRAN: SİYAH MENSÛR, ÇEKNÎ, ZENGENE, PAZOKÎ

Şerefxan dibêjî, deng daye, ko sê bira ji welatê Loris-tan û hin dibêjin ji welatê Goran û Erdelan çûne Îran û li cem padîşahê Îran gelek bi pêşve çûne û eşîrên kurd bere - bere li wan civiya ne.

Eşîrên kurd li Îran çawa, ko Şerefxan dibêjî, hijde(18) bavikin. Lek, Zend, Rozbihanî, Metîlic, Hesrî, Şehreyarî, Mizyarî, Kelanî, Emînlo, Keç, Giranî, Ziktî, Gelêrî, Pazokî, Cimişkezik, Erebkêrî ne.

Lê fermanदारên navdar ji van her çar eşîrên dawî Pazokî Cimişkezik, Erebkêrî hî rabûne û femandariya wan wergirti ne. Kur ji bav werdigrî.

Tenê bîst û çar (24) eşîrên dî li Qerebex, welatê Îran hene û di çaxê Şah Tehmaseb de femandarê van 24 eşîran Ehmed Beg Peralogal bû û bi sîh(30) hezar leşkerê kurd ve bi Şah re digeriyar.

Eşîrên kurd di Îranê de nayêne jimartin û Şerefxan dibê jî ez nikarim navê eşîrên kurd li Îranê di vê tarîxa xwe de binivîsim, ji ber, ko wê gelek dirêj bibî.

Eşîra Gîl, li Xerasanê heye, ko di çaxê Şah Tehmaseb de femandarê wan Şemsidîn Beg bû. Lê ji bo zanîn dikarim di vê tarîxa xwe de navê çend mirovên tarîxzan bidim xuyaki -

rin û bere dirêj bibî.

1- ÎSTEXERÎ

Ev seydayê mezin dibêjî, eşîrên kurd di Îran de di wela tê Faris de Kermanî, Ramanî, Mudesir, Mihemed Bişir, Biqey lî, Bendamehrî, Mihemed Îshaqî, Supahî, Îshaqî, Ederkanî , Şehrakî, Tehemdanî, Zibadî, Şehrewerî, Bendadkî, Xesroyî , Zengî, Sefrî, Şehyarî, Merakî, Mubarekî, Îştamehrî, Şahonî Selmonî, Mîrî, Azadduxtî, Birazaduxtî, Mutelebî, Memanî, Şahkanî, Keçtî, Celîlî. Sîh û sê(33) eşîrên.

Îstexerî navê van sîh û sê(33) eşîrin kurd dibêjî û pêde diçî û dibêjî, ev eşîr bicarek di kona de bûn û pênsed (500) hezar mal bûn. Pênsed hezar mal du milyon û nîv di-kin. Eger her malek ji pênc mirovan gihabî hev, lê malên kurdên kevnare ji pênc ta bi bîst mirovî dinav malê de bûn.

Ji lewra mirov dikarî bêjî, bi hindikî ji sê milyon mi-rov ne kêmtir bûn. Herwekû Îstexerî li welatê Faris navê pênc(5) rimûman didî zanîn û dibêjî:

1- Ramcan(Ramceloye), dikevî navbera Xûzistan û Esfehan.

2- Ram(Lîwalîcan), dikevî navbera Şîraz û xelîcê Farisî.

3- Ram Dêwan, dikevî navbera kûra Sabûr.

4- Ram(Şehreyar), dikevî teniştê Esfehan, herwekû jêre di-bêjin Bazencan jî. Ji vê eşîrê gelek ketine nav bajêr.

Lê seydayê Îstexerî, kurdên Loristan jî ji kurdên Îran dihejmêrî, ji kurdên Faris dihejmêrî.

2- SEYDAYÊ MÎQRÎZÎ :

Seydayê Mîqrîzî dibêjî, cihê kurdên welatê Faris nayêne jimartin, hingî, ko pirin. Lê xwezî wî jî weke Îstexerî ji me re navên hin eşîrên kurd li welatê Faris dûr û dirêj bi-dana xuyakirin û hin ji rewş û pergala wan jî bidana xuya-kirin.

1-FERMANDARÎYA SÎYAH MENSÛR

1- MÎR XELÎL XANÊ SÎYAH MENSÛR :

Di sala 960 ê koçî de Şah Tehmaseb Xelîl Beg, ko yek ji zariwê vê malbatê bû xiste nav pêwanê xwe û di nav mala xwe de xwedî kir û Xelîl Beg gavên xwe sivik bi pêşve avêtin û dawî Şah Tehmaseb navê Xan bi perwa pêve kir û navê wî ki-re Xelîl Xan û şahê dilxwaz ew kire fermandarên kurdên wela-tê Îran û jinû ve bû xanê xana û bicarek kurd ketin bin da-rê wî û ji eşîra Siyah Mensûr pêve jî bîst û çar(24) eşîrên kurd ketin bin fermana xanî kurd û Şah Tehmaseb welatê Sul-taniye Zencan Ebhur, Zerînkemer û çend hindamên dî jî bi ser

welatê wî ve berdan, ko ev hindam dikevin navbera Azerbaycan û Îraq û Xelîl Xan digel sê(3) hezar siwarên kurd bi Şah Tehmaseb re digeriyan û paşê li sînore jorê Îran, navbera Qezwîn û Tebrîz pêwanî dikir û diparastin.

Xelîl Xan, bi gernasî bivî karê giran radibû û ev barê giran hildabû ser milên xwe, milên kurd û di çaxekî hindik de kurdên wa nava ji hawîr lê gihane hev û kom bûn.

Tenê bi hatina van kurdên çilek û dizek hevsar ji destê xanê xanan derket û talan û rêgirî û sergêjî destpêkirin û gilî û gazine bê pîvan û jimar ji xanê kurd hatin kirin û na çare Şah Tehmaseb ew qad û zevî û hindam ji destê kurda derxistin û ji xanê kurd sitandin.

Lê ez dibêjim, Şah Tehmaseb ji kurd ditirsiya, ko serê xwe li ber rakin û serbixwe dewlatekê lidarxin, yan jî kurd, xanê xwe bikin padîşahê Îran. Ji lewra berî ji destê wî derkevî meydana ferdandariya xanê kurd teng hişt, ko nikaribî lingê xwe ji berîka xwe pêve radî û di riwê wî de sergêjiya biafirênî.

Herwekû Şahê Rêzan bivê yekêjî qîma xwe nanî û jêrê İraq tenê jê re hişt û Xelîl Xan û kurdên pêre şandin welatê Xerasan, lê çawa xanê kurd birêket, ji eşîra Siyah Mensûr pêve kes pêre neçû û kurdên mayin bicarek jê cuda bûn û ji hev belav bûn. Lê Xelîl Xan gelek nema û serê xwe danî û kurê wî Dewletyar Xan kete şûna wî.

2- DEWLETYAR XAN, KURÊ XELÎL XAN :

Bi fermaneke Şah Mihemed Xan, Sultan Mihemed bû ferdandarê Siyah Mensûr û navê Xan biser navê wî vehate berdan.

Lê çawa dewleta Osmanlî welatê Azerbaycan xiste bin destê xwe, şahê Îran, xanê kurd ji Xerasan anî û kire ferdandar û serdarê leşkerê sînore turk û xiste pêsîra dijminê xwe. Ji bo, ko dilxweş bibî gelek zevî û qad û hindamên mezin û hêja dane destê Dewletyar Xan. Weke: Zerînkemer, Gerşeb, Sicas, Zencan, Sorliq, Qeydar. Şebistan, Angoran, Qencoqa a jorî, Qencoqa jêrî.

Dewletyar ji nû ve ev hindam bicarek avakirin û kurd di wan de rûniştin û Dewletyar Xan Gerşeb ji xwe re kire fermange û peytext û tê derûnişt û gelek keleh û bajarên ciwan û xweş di van hindaman de avakirin û welat berepêş ajotin.

Tenê Dewletyar Xan bivî rengî dilxweş nedibû, çavên xwe berdabûn padîşahî û gerdenazadiyê û dawî li ber şahê Îran a sê bû û bixwe bû padîşah û navê xwe kire Şah Dewletyar Xan.

Lê Şah Mihemed Xan guhê xwe jê nebirîbû û herdem çavdêriya xanê kurd dikir û jê re her tişt kar kiribû û şahê navdar leşkerekî giran rêkire ser xanê kurd yan Dewletyar Xan.

Herwekû Şah Dewletyar Xan jî gelek li xwe miqate bû û çavnêriya dijminê xwe dikir û karê xwe û şerekî xwîndar û mezin kiribû û kelehên mezin û asê di welatê xwe de çêkiri-bûn. Herwekû kelehên Angoran, Şebistan ava yan nûjen kiri - bûn.

Lê Şah Mihemed Sultan perçak leşkerê dî jî bi serdariya Murşidqulî Xanê Şamle qizilbaş şande hana leşkerê xwe û piştî çend şerên mezin naçare Dewletyar Şah di keleha Dimdim de hate asêkirin, lê xanê kurd, ko bi çengzêrîn navdare şevêkî ji nişka ve bi qizbaşan derket û şeş(6) hezar siwarên dijmin ji ser keleha xwe bipaş de şikandin û perçe perçe bi çola xistin û talanê wan anî û gelek ji wan kuştin û mal û barxane û sazên Murşidqulî Xan bicarek xistin destê xwe.

Dibêjin, di vî şerî de diya Dewletyar Şah gelek gernas bû û ji leşkerê dijmin gelek kuştin û gelek barxane anîn û Murşidqulî Xan biçend siwarên xwe ve, ko ji ber lehiya şer hatibûn parastin, ji şerma hew çûne cem Şah Mihemed û li yek tûşê çûne welat û hinda Geylan û li nik Xan Ehmed rûniştin.

Lê çawa Şah Sultan Mihemed, ev bihîst şande cem Xan Ehmed û Murşidqulî Xan û hevalên wî anîn û li Qezwîn bi darvekirin û kuştin.

Dewletyar Şah, li ser vê yekê ranewestiya û destê xwe dirêjî welatê Îraqê jî kir û ji nû ve xanê çengzêrîn doza padîşahiya Îranê kir û xwest, ko welatê Sultaniye û Ebhur jî bixî bin destê xwe. Lê bextê wî ne sipî bû, ko di wê çaxê de Şah Ebbas hate ser textê Îran û bi serdariya Mihdîqulî Xan(Mihdîqulî Sultan) serdar û fermanarê eşîra Şamleyê qizilbaş rêkire ser xanê çengzêrîn. Mihdîqulî Sultan bi di zî û ji nişka ve bi ser dijminê xwe de girt, ko di wê çaxê de Dewletyar Xan(Dewletyar Şah) leşkerê xwe ji hev belav kiribû û kes pêre nema bû û haya wî ji vê êrîşê nebû, ji lewra û naçare di keleha xwe de asê bû û leşkerê dijmin bi ser hevde qalîn bû.

Tenê Şah Ebbas qîma xwe bi leşkerê pêşî, ko bi serdariya Mihdîqulî Sultan rêkiribû ser xanê kurd nanî û leşkerekî dî bixwe re hilanî û bixwe hate ser dijminê xwe, ser xanê çengzêrîn.

Çawa Şah Dewletyar hatina Şah Ebbas bihîst dar di destê wî de şikest û nema zanibû çî bikî û jinû ve hate bîra wî, ko nema dikarî şerê Şah Ebbas bikî, ji lewra hatina şah ji xwe re fersende dî û bê şer xwe siparde dijminê xwe û gerdana xwe danî ber şûrî şahê mêrkuj û xwînêj.

Şah Ebbas, Dewletyar û sêsed(300) gernasên kurd bi zen-

cîra girêdan û mal û jin û zar û zerç bicarek talan kirin
û dawî Dewletyar kuşt û ev malbat bicarek winda kir.

2 - FERMANDARIYA ÇEKNI

Ev eşîr di Kurdistanê de bi gernasî, pehlewani, şervani navdare. Lê ji ber, ko kesî fermanariyê li wan bikî di nav wan de nema bû perçe perçe, ji hev belav bûn û herdem karê wan talan û kuştin û keleşî bû. Welatê Îraq û Azerbaycan ji ber wan ketibûn nav tirs û lertz û sawîran û bê pergal û perîşan mabûn.

Naçare xelkê wan nava bêjimar gilî û gazin ji Şah Tehma seb re pêşkêş kirin û şah fermanek derxist, ko her kesê yekî ji vê eşî li ku bibênî gereke bikujî û ew kesê ji vê eşîrê li Îran bimênî gereke bê kuştin.

Naçare 500 ji gerek û mal mezinê vê eşîrê bihev re êl û koç û malên xwe barkirin û di riya Xerasan ve çûne welatê Hindê. Lê çawa gihane welatê Xerasanê Qezaqhanê tikloyî ko fermanarê Herat bû û ji Şah Ebbas dil bi tirs bû, li cem xwe hiştin û xistin nav leşkerê xwe û gelek rûmeta wan girt. Lê piştî, ko Qezaq Xan bi destê Masûm Begê Sefewî hate girtin ev eşîra kurdê Çeknî ji Xerasan rabûn û çûne Gewristan, welatê Xor û li wir gelek berepêş çûn.

Lê çawa Şah bihîst, yek ji wan bi navê Bodaq Beg, kire fermanar û hindameke mezin ji welatê Xerasan xiste bindestê wan û hê bêtir bi pêşve çûn û deng bi wan ket û welat bicarek xistin bindestê xwe.

Lê çawa di sala 1001 koçî de Abdulahxanê Ozbeg hate şerê Bodaq Beg, Şah Ebbas bixwe çû hana xanê kurd û Ebdulmomin Xan vegeriya mala xwe. Ji bo vê yekê Şah Ebbas gelek qencî bi Bodaq Beg kirin û 5 kurên wî kirin fermanar û hindamên hêja xistin bindestê wan û Bodaq Beg bû paşa, mîrê mîranê Xerasan xanê xana û heta sala 1005 koçîjî ev Bodaq Paşa fermanarê welatê Xerasan bû û serdarekî navdarê Îran bû.

3 - FERMANDARIYA ZENGENE

Di çaxê Şah Îsmailê Sefewî de ev eşîr gelek bi pêşve çû bû. Lê ji ber, ko kes di nav wan de nemabû, ko fermanariyê li wan bikî, ji hev belav bûn û ketin nav êlên qizilbaşan û di bindest û darê qizilbaşa de rûniştin û hin ji wan ketin nav pêwanê şah.

4-FERMANDARIYA EŞÎRA PAZOKÎ

Dibêjin, ko fermandarên Pazokî ji kurdên hêla Diyarbekir ji Siwêrek hatine, lê hin dibêjin ji kurdê Îranê ne û di çaxê padîşahiya Turkman û Qizilbaşan de welatê Kêvê, Erdîş Adilcewaz, Eleşkurd di destê wan de bûn.

Ev êl gelek dewlemend û xwedîpez û sewale û bixwe bê ole û kesî nizanibû li ser kîjan olê ne. Herwekû bixwe du perçene.

1- Xalidbegî

2- Şukurbegî.

Herwekû ji vê êlê ê, ko navdare Huseyn Elî Bege.

1- HUSEYN ELÎ BEG :

Pêlakê di nav hindaman de bi serbilindî û xêrxwazî fermandarî kir û paşê serê xwe danî û du kur bi şûn xwe ve hiştin û çû.

2- ŞAH SÎWAR BEG, KURÊ HUSEYN ELÎ BEG :

Piştî, ko dewleta Pezreşa konê xwe pêça û koça xwe bar kir û winda bû Şah Siwar Beg hate cem Şeref Beg, fermandarê Bedlîs û kurê wî Xalid Beg çû cem Şah Îsmailî Sefewî û di çend şeran de deng pêket û navdar bû û gelek gernasî û mêranî di çend şeran de nîşan dan û navê wî kiribûn Çolak Xalid(Xalidê dest pûç).

Şah Îsmail, hindama Xinûs, Melazgir xistin bin destê wî û birayê wî herwekû Oçan(Oçikan) jî biser welatê wan ve berda.

3- XALID BEG, KURÊ ŞAH SÎWAR BEG :

Ev Xalid Beg gelek bipeşve çû û zû kete çav xwe, heta rojekê neh(9) fermandarên kurd û ecem bi hev re kuştin û deh(10) di rojekê de kuştin û bihna padîşahî kete pozê wî û xwest, ko serbixwe û gerdenazad bibî padîşah.

Pere bi navê xwe derxistin û ala serxwebûnê hilda û doza padîşahiye kir, tenê şaşî kir, ko zû destê xwe ji dosta niya Ecem kişand û bû hevalbendê dewleta Osmanlî.

Herwekû, Selîm Xan ew bi xapandin û vîlika da kuştin û du kur Uweys Beg û Eled Beg bi şûn xwe ve hiştin. Herwekû, sê birayên wî jî bi navê Rustem Beg, Qubad Beg, Mihemed Beg hebûn.

Rustem Beg û çend gernasên Pazokî di şerê Şeref Begê Bedlîsî de hatin kuştin û Qubad Beg bi mirinê serê xwe danî, lê Mihemed Beg kurek bi navê Eslan Beg bi şûn xwe ve

hişt û serê xwe danî û ev Eslan Beg di nav pêwanê Şah Tehma seb de gelek bi pêş ve çû û deng pêket.

4- UWEYS BEG, KURÊ XALÎD BEG :

Piştî bavê wî bi destê Selîm Xanê turk hate kuştin Uweys Beg berê xwe da welatê Ecem û çû cem Şah Tehmaseb û şahê navdar bi fermaneke şahanî ew kire fermandarê Adilcewaz.

Tenê piştî sê salan dilsarî kete navbera wî û Mûsa Sultan Beg, fermandarê Tebrîz û careke dî vegeriya bin siya dewleta Osmanlî(turk) û li bajarê Kêvê rûnişt.

Lê Selîm Xan ferman da Durzî Dawid, ko herî şerê wî û dawî de Durzî bi dizî xwe gihande armancê û serê Uweys Beg û zar û zêrçên wî jêkirin û bi diyarî ji padîşahê xwîn xwar û mêrkuj re rêkirin, lê birayê wî Weled Beg û herdû kurên wî Xalid Beg û Elwend Beg û serê wan hatin birîn.

Tenê herdû kurên mayîn Qelîç Beg û Zulfeqar Beg reviyân û çûne nik Ehmed Begê Zîrikî, fermandarê keleha Hetax, lê piştî, ko mezin bûn bi mal û el û zar û zêrçên xwe ve çûne nav eceman û xwe dane destê Şah Tehmaseb.

5- QELÎÇ BEG, KURÊ UWEYS BEG :

Çawa giha dîwana Şah Tehmaseb, ew kire fermandarê Zekem ko ji welatê Gencê, Eran tê jimartin û piştî neh(9) sala bi kamîranî, biwartin serê xwe danî û kurekî biçûk bi navê Uweys Beg bi şûn xwe ve hişt û çû.

6- ZULFEQAR BEG, KURÊ UWEYS BEG :

Bi fermaneke şahanî bû fermandarê eşîra Pazokî, lê gelek nema û bi ciwanî serê xwe danî û bazê mirinê poncê xwe di nav dilê wî de çikandin û ji cihana jîndarî revand û bir.

7- UWEYS BEG, KURÊ QELÎÇ BEG :

Ji ber, ko Uweys Beg hêj biçûk bû Yadîgar Beg kirin ser karê dewlet û leşkerê Pazokî û çavdêrê Uweys Beg, lê dayîka Uweys Beg ji tirs û sawîran kurê xwe revand û hate Qezwîn û li cem Şah rûnişt û destê xwe bicarek ji fermandarî kişandin.

8- YADÎGAR BEG, KURÊ MENSÛR BEG, KURÊ ZEYNEL BEG, KURÊ HUSEYN ELÎ BEG :

Çawa xatûna mezin kurê xwe revand û çûne Qezwînê mezin û serekên Pazokî li hev kom bûn û bi fermaneke şah Yadîgar Beg kirin fermandarê xwe, fermandarê welatê Elacgir(Eleşgird) û di çaxê wî de eşîra Pazokî bi hezaran gund ji xwe re girtin û avakirin û gelek dewlemendbûn û piştî pazde salan serê xwe danî.

9- NİYAZ BEG, KURÊ YADÎGAR BEG :

Piştî mirina bavê wî Şah Tehmaseb bi fermanekê fermana riya êla Pazokî jêre pîroz kir û femandariya Elacgir sipardinê.

Niyaz Beg, weke bavê xwe bicarek xwe siparde ola qizilbaş a û şerê ola sinî kirin û tiştên nehêjadi nav êla Pazokî di biwara ola islamê de dihatin kirin û bavê xwe di vê babetê de bi şûn xwe ve hişt.

Lê fermanarên Osmanlî şandin cem Şah Tehmaseb û gotin: - Eger şêitî wilo bîem nikarin we ji misilmana bijimêrin û naçare Şah Tehmaseb fermanar û mezinên Pazokî Xunûslû, Çe muşgezîk bi carek civandin û bi carek avêtin Meqsûd Begê Xunûslû li keleha Elemût xiste zindanê û gelek ji wan kuştin û Niyaz Beg ji fermanarî avêtin û careke dî fermanarî da ne destê Uweys Beg, kurê Qelîç Beg û bi navê bavê wî bi nav kirin.

Niyaz Beg, wilo ma ta, ko Şah Tehmaseb serê xwe danî û Şah Mihemed Sultan kete şûna wî û eşîra Pazokan kirin du perçe. Şekir Begî sipardin Niyaz Beg û Xalid Begî sipardin Qelîç Beg û ji wê rojê de welatê Elacgirê bû du perçe.

Ev Niyaz Beg li ser ava çemê Qena, ko tê ser çemê Ker dişen de hate kuştin. Ev şer bi serdariya Emîre Xanê Ecem, û serdariya Lele Paşayê turk di nav leşkerên turk û ecem de çêbû û Niyaz Beg bû qurbana serê dijminê kurd.

Belam Uweys Beg, kurê Qelîç Beg, ko xanima diya wî revandibû û çûbûne Qezwîn di nav fermanar û serdarê leşkerê Şah de bi gernasî û mêranî deng pêket û gelek bi pêşve çû û piştî kuştina Niyaz Beg bû fermanar û serdarê êl û eşîra Pazokî û welatê Elacgirê kete destê wî. Lê vê carê Uweys Beg şerê wan tiştê bêolî dikir û kêmasiyê mayîn bicarek ji êl û welatê xwe rakirin û dîrxistin û kete riya baş û bi gernasî femandariya welatê xwe dikir.

Tenê careke dî şer di navbera turk û ecem de despêkir û welatê Elacgirê bicarek kivil û wêran ma û her eşîrek bi cîkî de çû û Qelîç Beg di hindama Nexciwan de hinek qad û zevî ji eşîra xwe re girtin û dibin siya serdarê Ecem Doqmaq Xan de, li Çeqersad rûnişt û paşê di şerê Senan Paşa de hate kuştin û Qoçî Beg, kurê Qulî Begê Belîlanî serê wî jêkir û bi diyarî ji Osman Paşa re pêşkêş kir.

Kurek bi navê Îmamqulî Beg bi şûn xwe ve hişt, lê Îmamqulî Beg kete nav serdarên qizilbaş a û li ber destê Zulfeqar Xan, fermanarê Erdebîl rûnişt, lê dawî di nav serdarê leşkerê Şah Ebbas de cihekî bilind ji xwe re girt.

Herwekû hin ji wan eşîrên kurd, Pazokî, Dinbilî li ser destê Ferhad Paşa ji Nexciwan hatin nik dewleta Osmanlî û

hinek ji hindama Elacgir dane wan û yek ji wan bi navê İbranî Beg kir mezinê wan, lê dawî avêtin ev eşîr ji hev belav bûn.

FERMANDARIYA SİLÎVAN (FARQÎN) , QULP Û BATMAN

Şerefxan dibêjî, ev malbat ji mala Emewiyê Erebin. Lê bixwe dibêjî ji mala Merwanê Emeyî ne.

Tenê gelek diriste, ko Şerefxan Beg divir de şaş çûbî û ev malbat ji mala Mervaniyê Kurd bin, ji ber, ko Mervani - yên Kurd li vê hindamê 130 salî serbixwe fermandarî kirine û paşê ji hev ketine û li ber destê fermandarên bêgane mane.

Ji ber wilo gereke em hinekî ji Merwaniyên Kurd bipeyivin. Di sala 380 koçî de Ebû Elî Hesên, kurê Merwanê Kurd, li şûna xalanê xwe bû fermandar(melekê) Farqîn, Diyarbekir Cizîrê, Xelat, Nisêbîn, Heran, Riha, Bedlîs û pênc mirovan ji vê malbatê li van hindaman fermandarî kirine.

- 1- Ebû Elî Hesên, kurê Merwan.
- 2- Mumehidîdewle Nesir, kurê Merwan.
- 3- Nesridewle Ehmed, kurê Merwan.
- 4- Nizamîdîn Nesir, kurê Nesir Ehmed, kurê Merwan.
- 5- Ebûl Muzefer Mensûr, kurê Nesir Nizamîdîn, kurê Ehmed , kurê Merwan.

Ji van pêve jî Ehmed, kurê Nizamîdîn û Behram, kurê Ehmed û İsa kurê Ehmed çend sala fermandarî li keleha Hetax, kirine. Herwekû Ehmed bi xwe çend sala fermandarî li hinda ma Tenzê jî kiriye û pêlakê li cem Mihemed Şah, kurê Melek Şahê Selçoqî jî maye û bi dîlî ketiye destê Firing û li nav wan jinek markiriye û kurek bi navê Mihemed jê re çêbûye û piştî bavê wî hatiye berdan û kurik mezin bûye hatiye keleha Hetax cem bavê xwe û jin aniye û sê kur jê re çêbûne û dawî xeyîdye û kes nizanî bi kuve çûye.

Di sala 530 koçî de Ehmed keleha Hetax daye Seîd Hisamî dîn, fermandarê Mardîn û ji wê çaxê de ev malbat bûne fermandar û di bindestê xelkê de kar kirine û rûniştine.

Tarîxa kurê Ezreq dûr û dirêj dabaşa wan dikî û dibêjî: Gelek ji wan li ber destê fermandarên Heskîf, Farqîn, Tenzê, Mardîn rûniştine û yek ji wan çûye welatê Misr û Şam û li cem Şêrkoh rûniştîye û paşê li cem Yûsif Şah Silahîdîn, maye.

Çawa, ko di tarîxa Mufericilkirûb de, kurê Wasil navê çend mirovên, ko weke navê Merwaniya nedidî xuyakirin, weke Mengelan, Mesûd, Merwan, Meclî, kurê Merwan.

Herwekû tê zanîn, ko tevlî femandariya Hetaxê vê malba tê sed û pêncê û şeş(156) salan femandarî kirine û Farqîn di sala 488 koçî de li ser destê Fexridewle, kurê Cuheyrê, Mûsilî, wezîrê dijwar hatiye sitandin û di 581 de li ser destê Yûsif Şah Silahidîn careke dî ketiye destê kurd, bêwekû 93 sala di bin destê dijmin de maye.

Şerefxan Beg dibêjî femandarên Erdelan ji mala Merwanê Diyarbekir veketine, lê çawa nizanî, ko femandarê Farqîn, ji malbata Merwanê Kurdin. Tenê tiştek heye, ko fermana rên Kurd dixwestin, ko xwe bighênin ser malbateke Ereb û xwe bivî awayîdi nav miletê kurdê nexwendî, nezan de pîroz û birûmet dikirin.

Not û sê sal ji malbatekê re negelekin, ko careke dî ve gerin ser femandariya xwe û eger nebûbin femandarên mezin, lê bi hindikî bûbin derebegên çend hindaman.

Herwekû di van çaxên, ko di bindestê dijmin de bûn jî gelek caran kurd femandarê van hindaman bûn. Di sala 478 koçî de Fexridewle, kurê Cuheyrê Musilî ji wan sitand û di 480 koçî de Qewamidîn, Emîdidewle Ebû Elîyê Belxî bû femandarê Farqîn. Çawa, ko di sala 482 koçî de Emîdidewle 8, kurê Fexridewle bû femandar û di sala 485 koçî de Kafî, kurê Fexridewle li şûna birayê xwe rûnişt.

Herwekû şeş mehadi wê navê re Nasiridewle Mensûr, kurê Nizamidîn, kurê Ehmed Xan bû padîşah û kurê Esed rîstevanê navdar bû wezîrê wî, lê piştî şeş mehan Tacidewle Tetuş padîşahê Şam û Heleb, Farqîn xiste bin destê xwe û Esed Muh-yidewle kuşt û di sala 486 koçî de Nasiridewle Mensûr Şah li Cizîrabota serê xwe danî. Di sala 486 koçî de Nasiridewle Mensûr Şah, kurê Nizamidîn, kurê Ehmed Xan, kurê Merwan li Cizîrabota di xaniyê yekî cihû de serê xwe danî û li Diyarbekir hate veşartin.

Mîr Mihemedê Duwînî bû femandarê Farqîn, lê ji ber, ko nikaribû serbixwe bimênî siparde Qelîç Erselan, padîşahê Qonya û di sala 498 de careke dî Qelîç Erselan ev Mîr Mihe med ji xwe ve kire femandarê Farqîn û paşê bire welatê rom.

Herwekû di sala 502 de Segmanê Qutbî, femandarê Xelat Farqîn xiste bin destê xwe û di sala 504 de Segman li ser bajarê Rihayê serê xwe danî û jina wî Xatûn û kurê wî İbrahîm hatin Farqîn û Muînîdewle û Sedîdidewle du bira ji xelkê Farqîn kirin femandarên welêt. Lê İbrahîm paşê Sedîdidewle kuşt û Muînîdewle serbixwe ala femandarî hilda û bû

fermandarê welêt û di sala 508 de Qeraça ji rexê Mihemed Şahê Selcoqî ve bû fermandarê Farqîn û Muînidewle bû wezîr lê paşê Qeraça ew bixwe re bir û çûne welatê Ecem û Qeraça li Esfehan bû fermandar û Muînidewle kire wezîrê xwe.

Di piştî wan re Ciyûş Beg ji ber Selcoqiyên ve ji Mûsil hate Farqîn û Zirbeg ji ber xwe ve di welêt de hişt û çû Mûsil û ji wê rojê de Farqîn di nav destê dijminên de winda bû û bê nav û deng ma.

Lê di sala 538 de Farqîn kete destê Îmadidîn Zengî, fermandarê Mûsil û Farqîn bû derebegiyêke biçûk û wilo ma, heta 581, ko Yûsif Şah Silahidîn ew girt û kurê xwe Îshaq tê de danî û keça Xatûn, mezina bajêr, ko bi xwe jina Qutbî dîn Êlxazî û keça Feridîn Qere Erselan bû li kurê xwe markir û bajarê Hetax ji ber Farqîn ve da Xatûn û kurê wê.

Ev keleha Hetaxê 51 salî di destê Ehmed, kurê Nizamidîn kurê Ehmed Xanê Merwanî û zariwên wî de ma. Herwekû Farqîn, heta sala 662 dibin destê kurdên Eyyubî de bû û di çaxê dewleta Eyyubî de fermandarên kurdên kevnare bicarek vegerîyan welatê xwe û bûne fermandar.

Tenê di sala 662 de Hulagûxan Farqîn ji kurda hate sitandin û serê Şihabidîn, kurê Adilşahê Eyyubî, fermandarê, Farqîn jêkirin û bixwe re birin welatê Şam û gelek ji mala Eyyubîyan li ser destê Tetera hatin kuştin. Û piştî dewleta Eyyubî ne tenê Farqîn belkî jî li hemî Kurdistan bûne derebegên biçûk û ketin bindestê Osmanlî (Turka) û Ecema û Pezreş û Pezsiyên turkmanî tenê careke di kurd derebegên welatê xwe bûn. Lê kêma û bindest bûn, meger çendekan ji wan çend caran doza serxwebûn û gerdenazadîjî kirine, lê nebirne serî û heta îro bindest, perçe perçe mane. Ev 150 salin, ko miletê kurd bicarek derebegî û fermandariya xwe winda kirye.

Lê baweriya min gelek xurte, ko vê carê ne derebegî belkî dewleteke serbixwe lidarxin û bixwe xêr û hatina welatê xwe bixun û bi dost û hevsînorên xwe re haşt û heval bin.

Piştî me bi kurtî û kêmasî rewş û tarîxa Farqîn da xuya kirin, niha dixwazin vegerin ser awira Şerefxan Beg û fermandariya Farqîn. Sêzdeh kelehên hindama Farqîn hene. Qulp Batman, Hebqe, Taş, Hisûlî, Bêdiyan, Karokan, Delkuloqya, Rebat, Cerîs Îdnik, Silîk, Kenc.

Herwekû heşt(8) eşîrên kurd divê hindamê de hene: Bano-kî, Hewêrî, Dilxêran, Bociyan, Zîlan, Bisyan, Ziksiyan, Berazî. Lê Berazî di îro de li sê ciyan peyda dibin. Beraziyên geliyê beraza li hindama Erzerom, ko Elîcan mezinê çetê navdar, ko di piştî kuştina Şêx Seîd di riwê dijmin de rabûn û Elîcan di şerekî de hate kuştin û Seyidxanê Seyidî

ko mezînekî Hesena bû bû serdarê vî çetê navdar û ew jî bi şer ji welatê jorî hatin Cizîrê û bi rêdali nav Sûrkiçiyîyan hate kuştin. Berazên hêla Kaniya Ereba, deşta Sirûcê, ko ji wan fermanzarekî wan heye, mala Şahîn Begê ji wan re di bêjin û zariwên wa niha li Kaniya Ereba rûniştîne, ji wan Mustefa Beg, Bozan Beg herdû kurên Şahîn Beg çend salên dûr û dirêj veşandiyên berazan di Berlemana Sûriya de rûniştîbûn û gelek dewlemend û navdar bûn. Ev beraza sî(30) hezar mirov hene û di îro de gereke şêst(60) hezar bin. E-ladînan, Gêtik, Şêxan, Pîjan, Şedad, Qx, Dîna û berazên He ma çend mirovên navdar ji wan derketine. Muhsin Beg, serêk wezirê Sûriye ê kevnare, ko li ser destê Henawî û bi Husnî Zeîm ra hate kuştin û Husnî Beg berazî, ko di çaxê Husnî Zeîm de ji vê fermanzare Helebê bû û heta niha jî ji dervê maye û Necîb Beg berazî û Mehmûd Beg berazî û Hirço, ko bi xwe Henawî li Bêrûtê kuşt û heyfa Muhsîn Beg hilanî.

1-FERMANDARÊN FARQÎN

1- MERWAN :

Bi alîkariya van eşîrên kurd pêlakê li keleh û hindaman fermandarî kir û dawî serê xwe danî.

2- MÎR BÎHAÏDÎN, KURÊ MERWAN :

Piştî mirina bavê xwe bû fermanzare vê hindamê û millet û gund û eşîrên xwe bicamêrî lihevragirtin û welatê xwe be repêş ajot û di meydana avanî, aborî, rêzanî de gelek bî pêşve bir û dawî serê xwe danî.

3- MÎR ÎZÏDDÎN, KURÊ MÎR BÎHAÏDDÎN :

Ev Mîr Îziddîn piştî bavê xwe re gelek nema û zû serê xwe danî. Kurek bi navê Îbrahîm bi şûn xwe ve hişt û koça xwe barkir û ji cihana jîndarî çû.

4- MÎR ÎBRAHÎM, KURÊ MÎR ÎZÏDDÎN :

Ji ber, ko nikaribû dibin vî barê giran de rabî û şûna bavê xwe bistenî eşîrên kurd Silîvan, Mîr Celaliddîn lu şûna wî rakirin, lê piştî mirina Celaliddîn careke dî bû fermandar û kete şûna apê xwe, lê gelek nema û serê xwe danî û du kur Diyaidîn, Şêx Ehmed bişûn xwe ve hiştin û çû.

5- MÎR DÏYAÏDÎN, KURÊ MÎR ÎBRAHÎM :

Çawa Şah Îsmâîlê Sefewî bû padîşahê Îran û bi zor Kurdistan xiste bin destê xwe Xan Mihemed Îstaclo kire Mîrêmîranê Diyarbekir û mîrêmîran keça mîr Diyaidîn mar kir, navê wê Bêkeysî Xanim bû.

Ji lewra gelek ji Mîr Diyaidîn re başket û gelek bi pêşve çû û nav û deng pêketin. Herwekû di wê navê de fermandarê hindama Mereş Elaidewle Zulqeder, birayê xwe Saroqeplan şande ser hindama Diyarbekir, şerê Xan Mihemed İstavle û di vî şerî de eşîrên Silîvan gelek mêranî, gernasî nîşandan û Şerefxan di pesnê wan de dibêjî Şerê Rustemê zal, li heftêxwehanê mazenderan û serpêhatiya Samê Nerîman ji ber vî şerî ve çîrok û efsane têne jimartin û gelek sêfil û weza têne xuyakirin.

Kurdên Silîvanî di navşer de Saroqeplan kuştin û serê wî bi diyarî ji zavayê xwe re rêkirin, lê gelek neçû Mîr Diyaidîn kordunde çû û fermandarî kete destê zariwên Şêx Ehmed, birayê wî. Zariwên Şêx Ehmed Şah Weled Beg, Behlûl Beg, Umer Şah Beg, Sosin Beg, Welî Xan Beg, Elwend Beg, Xelîl Beg, Ehmed Beg, Cihangîr Beg. Neh(9) kurên Şêx Ehmed hebûn.

Di saxiya Mîr Diyaidîn Beg de şer di navbera wî û biraziyên wî de çêbû û Umer Şah, Sosin û Cihangîr di şer de hatin kuştin. Lê Şah Weled Beg, reviya û çû Şam û Misrê û li cem padîşahên Çerkez rûnişt. Lê çawa Ecem ji Kurdistanê derxistin û li Çaldêran leşkerê kurd û turk leşkerê ecem şikandin yek ji eşîra Bisyan çû Misrê û Şah Weled Beg anî û Farqîn xiste destê wî.

Lê ji ber, ko eşîra Xaldî-êzîdî çend çawîşên dewletê kuştin ev serpêhatî kete gerdena Şah Weled Beg û mîrêmîranê Diyarbekir xwest, ko Şah Weled Beg bikujî, lê zû pê agah bû û reviya û kete keleha Qulpê û sêzde salan têde ma. Ji wê rojê de derebegî ji Farqîn derket û Qulp bû paytext.

2-FERMANDARÊN QULP Û BATMAN

1- ŞAH WELED BEG, KURÊ ŞÊX EHMED BEG, KURÊ İBRAHÎM BEG :
Hate zanîn, ko çawa çû Şam û Misrê û çawa hat û çawa bazda û kete keleha Qulpê û sêzde sala bi fermandarî ma û paşê serê xwe danî.

Şeş kur, Elîbeg, Diyaidînbeg, Weledbeg, Welîbeg, Cihangîrbeg, Yûsifbeg, Suleyman beg bi şûn xwe ve hiştin û çû.

2- MÎR ELÎBEG, KURÊ ŞAH WELED BEG :

Piştî mirina bavê xwe bû fermandarê Qulp û Batman û welat bicarek kete bin destê wî û çil salî bi gerdenazadî, dilşadî, rabiwardin û welatê xwe di meydana avanî û xweşiyê de gelek bi pêşve bir û eşîrên xwe bi zanîn û camêrî li

hevragirtin û serê xwe danî û du kur Sultanhuseyn, Welîxan Beg bi şûn xwe ve hiştin.

3- SULTANHUSEYN BEG, KURÊ ELÎBEG, KURÊ ŞAH WELED BEG :

Di sala 980 de bi fermaneke Selîmxanê turk femandariya Qulp û Batman lê hate pîrozkirin. Lê di çaxê Muradxanê turk de, ko bi serdariya Osmanpaşa leşkerê kurd û ordiya turk kişiyane ser Azerbaycan, Sultanhuseyn Beg di şerê Sa dabad de bi destê Ecema di sala 993 de hate kuştin û şeş kur bi şûn xwe ve hiştin. Qelîç Beg, Seyid Ehmed Beg, Zeynel Beg, Heyder Beg, Qasim Beg.

Seyid Ehmed Beg jî di wî şerî de bi dîlî kete destê dij mina û du sala di zindana Qehqehê de ma û paşê hate berdan û bi fermana Muradxan femandariya Qulp û Batman kete destê Zeynel Beg û Qelîç Beg, birayê mezin meger çendan mirovekî gewşek û bêkêr bû jî, lê bi alîkariya Mihemedbegê Xer zî xwe kire femandarê Qulp û Batman. Lê gelek nema û bî destê eşîrên kurd hate kuştin û Zeynel Beg careke dî bû femandar.

4- ZEYNEL BEG, KURÊ SULTANHUSEYN BEG :

Piştî, ko Qelîç Beg bi destê eşîrên kurd hate kuştin, serbixwe û gerdenazad bû femandar. Lê gelek neçû Ehmedbeg kurê Sultanhuseyn Beg femandariya welêt ji xwe re sitand.

5- EHMED BEG, KURÊ SULTANHUSEYN BEG :

Hate zanîn, ko di şerê Çaldêran de bi dîlî kete destê E cem û du salan di zindana Qehqehê de girtî ma û paşê hate berdan û çawa ji zindanê hate berdan çû cem Ferhad Paşa mîrêmîranê Erzerom û bi alîkariya wî û bi fermaneke padîşah bû femandarê Qulp û Batman û kete şûna bav û kalên xwe.

Tenê gelek neçû mîrêmîranê Amed(Diyarbakir) femandariya Qulp û Batman jê sitand û xiste destê yekî turk û Ehmed Beg çû İstanbulê û li wir di sala 1003 koçî de serê xwe da nî.

Careke dî femandariya Qulp û Batman kete destê Zeynel Beg û ta bi sala 1005 koçî jî femandariya Qulp û Batman di destê Zeynel Beg de bû.

FERMANDARIYA FARQÎN

Çawa me derbas kir, ko Mîr Diyaidîn kordunde serê xwe danî û femandarî kete destê birazayên wî, zariwên Şêx Ehmed Beg, ko neh mirov bûn û di şerê apê wan de sê ji wan hatin kuştin û Şah Weled Beg reviya û çû Şam û Misrê û çawa vegeriya û bû femandarê Farqîn û çawa ji mîrêmîranê Diyarbakir tirsiya û çû keleha Qulpê.

Lê di wê çaxê de Behlûl Beg, kurê Elwend Beg digel bira yê xwe Şah Umer Beg çûne cem Îskender Paşa, mîrêmîranê Diyarbekir û li ber destê wî rûniştin û çawa Îskender Paşa çû şerê Adilcewaz û keleşek bi navê xwe avakir û dizdariya wê da Behlûl Beg. Lê çawa dî, ko Behlûl Beg zana û gernas û hêjaye ji padîşah Selîmxanê diwem hêvî kir, ko fermandariya Farqîn bixî destê wî û padîşah bi fermaneke hemayûnî, fermandariya Farqîn li Behlûl Beg pîroz kir û careke dî Farqîn veşerîya bin destê xwediyên xwe.

1- BEHLÛL BEG, KURÊ ELWEND BEG, KURÊ ŞÊX EHMED BEG :

Hate zanîn, ko çawa Sultan Selîmxanê diwem, Farqîn xiste destê wî, lê salyanê, ko di gerdena Bisyan, Bociyan, Zîlan de mabûn dane ser milên Behlûl Beg, ko bîzor ji wan bîstênî û bidî dewletê. Ji ber, ko ne dibin destê wî de bûn û li jorê Kurdistanê cî girtibûn û bixwe xwedî fermandar bûn gelek li ser Behlûl Beg giran rûnişt.

Şehsiwaraxa, ko mezinê eşîra Bisyan bû bûbû fermandarê Bayezîdê û hezar mal ji eşîrên silîvanî lê civiya bûn û ne ma Behlûl Beg nas dikirin û hew guh lê dikirin. Naçare Behlûl Beg çû ser wan û xwest, ko bîzor ji wan bîstênî û jî wan xwest, ko veşerîyan welatê Farqîn lê ji ber, ko ji ber zor û setema turkan reviya bûn û ji xwe re cî girtibûn û zeviyên hêja ketibûn destê wan û Şehsiwar Beg bixwe bûbû fermandarê wan, mal nedane Behlûl Beg û şer di navwan de destpêkir û Behlûl Beg di vî şerî de hate kuştin û pênc kur bi şûn xwe ve hiştin. Mîrxan, Umer, Behlûl, Mehmûd, Osman.

2- MÎRXAN BEG, KURÊ BEHLÛL BEG :

Pîştî kuştina bavê xwe bû fermandar, lê ji ber, ko eşîrên Silîvanî li wan nava gelek keleşî dikirin û gelek gilî li wan dihate kirin. Fermanek derket, ko Mîrxan Beg naka gereke bêkuştin û piştî çend rojan hate kuştin.

3- UMER BEG, KURÊ BEHLÛL BEG :

Pîştî kuştina birayê wî fermandarî kete destê wî, lê ji ber, ko nikaribû çar kîs zêrên osmanlî bidî dewletê padîşah Mihemedxanê siyem fermandarî jê sitand û xiste destê Îbrahîm Beg, kurê Cihangîr Beg.

4- ÎBRAHÎM BEG, KURÊ CIHANGÎR BEG :

Çawa fermandarî ji destê Umer Beg derket reviya û çû Bedlîsê û pêlakê li hindama Mûşê rûnişt, lê dawîbû. Keleş û rêgir û cîlek li xwe gihandin hev û dest bi keleşiyê kirin û çend êrîş birin xelkê hindama Mûşê û Xînûs û Melazgir û paşê kerwan talan kirin û pir ji rêwî û bêgunehan ha

tin kuştin.

Ji lewra Elî Beg, Mîrlîwayê Xînûsê û Mihemed Begê xerzî çûne şerê wan keleşan û gelek ji hevalên wî kuştin ta bi sala 1005 koçî jî derbeder û bêdaxwaz li çûla xwînê weke dîza digeriya.

1966.3.9 Mûsahesen Cigerxwîn

FERMANDARIYA BİRADOST

Şerefxan dibêjî: Koka vê malbatê ji nav eşîra Goran der ketiye, lê Biradostî dibêjin, ji zariwê Mîr Bedir, kurê Hê senweyhê Berzikanî ne, ko padîşahê Dînewer û Şehrezûr bûn.

Piştî, ko Hilal di şerê Şemsidewle, padîşahê Biweyhî Dey lemî de hate kuştin, zariwên Hilal sê bira bi hev re parastin û yek ji wan li Şehrezûr li şûna bavê xwe rûnişt û yek bû fermandarê eşîra Ake û yek ji wan hate Xan Elmas, welatê Ormiye û bû fermandarê welêt, tenê xelkê welêt dibêjin, ji mala Bilalîn, lê bawerim Bilal ji Hilal derketiye. Lê diriste, ko jî Bilal bavê Mihemed bî.

Ew kesê navdar, ko ji vê malbatê derketiye navê wî Xazî qiran, kurê Sultan Ehmede, ko hezar mirov ji Qizilbaşa kuştine û bazor ji welatê Ormiyê derxistine, lê piştî, ko çû dîwanxana Şah Îsmail, padîşahê Îran gelek rûmeta wî girt û navê wî kir Xazîqiran û hindama Tergever û Somayî û Dol xistin bin destê wî.

Lê dawî Xazîqiran digel fermandarê Kurdistanê vegeriya bin siya dewleta Osmanlî û gerdena xwe ji Selîmxanê turk re xwar kir û gelek rûmeta wî hat girtin û dema padîşahê turk çû şerê welatê Îran, ev Xazîqiran pêre bû û şewirdar û berdevkê Selîmxan bû û bi şev û roj pêre bû, herwekû ji welatê Erbîl, Diyarbekir, Bexdad gelek hindam biser welatê wî ve hatin û piştî, ko serê xwe danî du kur Mîr Mihed, Elî Beg bişûn xwe ve hiştin.

2- MÎR ŞAH MİHEMED, KURÊ XAZÎQİRAN :

Piştî mirina bavê xwe bû fermandarê welatê Biradost û li Somayî li şûna bavê xwe rûnişt. Bi camêrî welat û êl û eşîrên xwe li hevragirtin û piştî, ko serê xwe danî çar kur Bodaq, Hesên, Îskender, Zeynel bişûn xwe ve hiştin.

3- MÎR BODAQ BEG, KURÊ ŞAH MİHEMED BEG :

Piştî mirina Şah Mihemed Beg, welatê Biradost bi ferma- neke Selîmxan kete destê Mîr Bodaq Beg û di welatê xwe de pêlake dûr û dirêj bi kamîranî û berxwedari ferman kir û piştî serê xwe danî çar kur Ewliya Beg, Şah Mihemed Beg, Şah Qulî Beg, Seydî Beg bi şûn xwe ve hiştin. Lê ji ber, ko biçûk bûn apê wan Hesên Beg kete şûna birayê xwe û bû fer- mandar.

4- HESEN BEG, KURÊ ŞAH MİHEMED BEG, KURÊ XAZÎQİRAN :

Ji ber, ko xwînxwar û mêrkuj bû dost û mirov û xelkê we lêt bicarek ji xwe dûr xistin û xeyidandin û gillî û gazine xwe bi alîkariya Zeynel Begê Hekarî ji padîşahê turk re pêşkêş kirin û bi fermaneke hemayûnî derket, ko mîrêmîranê wan lêbikolî û rast û xwariyê ji hev nas bikî û ji padîşah re bidî xuyakirin. Lê Huseyn Paşa, mîrêmîranê Wan, Hesên Beg xweste dîwana xwe û bi darvekir û laşê wî li berderê sera dewletê bidarvekirî ma û femandariya Biradost da des- tê Elî Beg, kurê Xazîqiran.

5- MÎR ELÎ BEG, KURÊ XAZÎQİRAN :

Li ser destê Huseyn Paşa, mîrêmîranê Wan bû fermandarê welêt û li Somayê li şûna birayê xwe rûnişt. Tenê gelek ne çû xelkê welêt çûne cem padîşah û Ewliya Beg kirin ferman- darê Biradost û Elî Beg kirin fermandarê Ormiyê û Elî Beg piştî salekê kordûnde serê xwe danî.

Herwekû Îskender Beg, ko berî hingî fermandarê Ormiyê bû çawa Elî Beg hate Ormiyê ew bû derwêş û destê xwe ji fermandarî kişandin û li mala xwe rûnişt.

6- EMÎREXANÊ BİRADOSTÎ, YAN XANÊ ÇENGZÊRÎN :

Ev emîrexan herwekû tê xuyakirin ne ji vê malbatê ye lê yek ji fermandarên navdarên vê eşîrê ye. Ji lewra em dixin nav wan.

Di şerê wî û Umer Begê Sorî de destekî Emîrexan hate bi- rîn û çawa Şah Ebas padîşahê Îran Azerbaycan xiste bindes- tê xwe ev Emîrebeg çû cem û gelek rûmeta wî girt û destek jêre ji zêr çêkir û Xan bi ser navê wî ve danî û ji wê ro- jê de navê wî bû Xanê Çengzêrîn û şah welatê Tergever, Mer- gever, Ormî, Şinew xistin bin destê wî û ew kire fermanda- rê eşîra Biradost.

Emîrexan yan Xanê Çengzêrîn çawa vegeriya mala xwe dest bi nûjenkirina keleha Dimdim kir û çavên xwe berdane padîşahî lê fermandarên Qizilbaş a zû daxwaza xanê kurd naskî - rin û ji şah re gotin û Şah Ebbas jê reşand, ko dev jê ber - dî, tenê xanê kurd guh neda fermana şah û pêde çû û keleha xwe ava kir.

Lê herwekû tê xuyakirin, ko divan çaxan de şahê Îran ge lek weza û sêfil mabûn û berdîberdan ketibû nav welêt û Xan Emîre dixwest ji van çax û deman kar bikî û serxwebûna xwe bidî eşkerakirin, çawa, ko tê xuyakirin Mîr Bodaq Xan, fermandarê Azerbaycan ji xwe ditirsiya, ko Emîrexan doza welatê Azerbaycan tev bikî, ji lewra gelek gilî û gazin ji xanê kurd dikirin û dixwest şah wî ji ber pozê xanê Qizilbaş dûr bikî û fermandarên qizilbaş bicarek jê nexweş bûn, ji ber, ko xanê kurd gelek bi pêşve diçû û dest bi avaniya keleha dikir.

Lê çawa eşîra Celalî, ko ji Kurdîstana bindestê turka reviyar û hatin cem Şahebas, şahê bîrewer ji xwe re fersen de dî û bi serdariya Hesexan leşkerek bi wan Celaliyan re şande cem Emîrexan Beg, ko wan li cem xwe bidî bicîkirin, lê xanê kurd fermana şah kişand û berda leşkerê şah û Celaliya û şer di nav wan de destpêkir.

Ev Celalî, bi serdariya Celalidîn Beg pêlakê bi keleşî di Kurdîstana bindestê turkan de kirin û leşkerê kurd û turk bi hev re dirêjî wan kirin û gelek ji wan kuştin û yê mayîn reviyar û hatin Îranê û ji ber, ko navê fermandarê wan Celalidîn Beg bû navê wan bû Celalî, herwekû tê xuyakirin ji kurdê hêla Farqîn hatine.

Leşkerê Şah bi serdariya Hesexan şikest û gelek ziyar gihane Qizilbaşan, lê Şah leşkerekî dî bi serdariya wezîrê mezin şande ser xanê çengzêrîn, Mûtemididewle wezîrê mezin hate ser xanê kurd û jê xwest, ko xwe bidî dest û Celaliyan li welatê xwe bicî bikî, lê Emîrexan careke dî fermana şah şikand û şer dîsa destpêkir û xanê kurd di keleha Dimdim da asê bû û wezîrê mezin hawîr kelehê girt.

Ev serpehatî di sala 1017(1608) de çêbûye, lê herwekû Îskendermenşî, ko bixwe di nav şer de bû dibêjî:

- Keleh gelek dijwar û asê bû, ji avê pêve tiştêk jê nekêmbû, ji ber, ko sehrîcek tenê ji bo dagirtina ava baranê tê de hebû, ko tijî berf dikirin, herwekû di nêzîkî kelehê de kaniyeke avê hebû û rê ji kelehê dibin qadê ve diçû ser avê.

Leşkerê Îranê, ko 23 caran ji leşkerê kurd bêtir bûn ewriya, ko diçû ser avê ji ber şervanê kelehê girtin û gelek ziya li ser danîn û piştî çend şerên dijwar û xwîndar, ko

çar mehan ajotin û gelek leşkerê Îranê hate kuştin. Kurdên serê kelehê bişev êrîşî dijminê xwe dikirin û gelek ji serdar û navdarên leşkerê îran kuştin.

Herwekû ew Celaliyên, ko ev şer li ser wan çêbû bere bere ji hev belav bûn û reviyane welatê xwe û gelek talan û pirtiyên xelkê bixwe re revandin û gelek ji qizilbaşu kuştin û malê wan birin û guh nedane şerê kelehê. Lê şervanên kelehê piştî, ko av ji ber wan hate girtin 21 rojan bi diwarî derbas kirin û ava genî vedixwarin û bi mêranî şer dikirin û bi gernasî li ber xwe didan, lê di serê zivistanê de baraneke xurt hat û sehrîcên avê hatin dagirtin, ko têra 6 mehan dikir.

Lê serdarê leşkerê îran ferman da leşkerê xwe û êrîş kirin ser bircên kelehê û piştî xwînrijandin û diwariyeye mezin bircek ji bedena kelehê xistin destê xwe û Qerebeg û peyayên wî, ko di wê bircê de bûn bicarek kuştin û kuştî ji leşkerê îran bê jimar bûn û wezîrê mezin Mûtemididewle, diwê navê de serê xwe danî û Şahebas, Mehmûd Begê yekdilî di şûna wî de kire serdarê leşkerê îran, ko li ser keleha Dimdim şer kirin û çawa Mehmûd Begê bêdilî giha cihê xwe leşkerê dijmin êrîşên xurt birin ser kelehê û hin bircên dîjî xistin bin destê xwe û herdû rexan bi hovî dirêjî hev kirin û kurdên şervan di van bircan de bi carek hatin kuştin û piştî pêlakê birceke dî, ko kurê Emîrexan têde bû ke te destê dijmin û berebere kurdên şervan di birca Emîrexan de gihane hev, ko navê wê Narîn bû û qesra Emîrxan têde bû lê dawî leşkerê kurd ji naçarî xwe sipardine dijmin û qizilbaşan dixwestin bi bêbextî wan bikujin. Ji lewra gernasên kurd careke dî şûr ji kalana kişandin û sînsing ketin pêşîra dijminê xwe û şer kirin, ta wekû bi carek hatin kuştin, lê kes nizanî ma çiqas ji dijmina hatin kuştin û weke gernasî dihindir wê kelehê de hatin veşartin.

Piştî şeş(6) salan careke dî kurdên ji Biradost ketin kelehê, lê berî, ko xwe ji bo şer kar bikin gelek ji serdar û fermandarê wan ketin ber şek û pekan û nikaribûn bihev re şerê dijminê xwe bikin. Vê carê Olex Beg, serdar û gernasê vê lephilanîne bû.

Şahebas, ev hindam tevli keleha Dimdim dabûn destê Mihe med Begê Bîdilî û birayê Mihemed Beg Qubad Beg ji ber vê di vê kelehê de rûniştibû û Olex Beg bi alîkariya kurdên di kelehê de şevê ketehindir wê kelehê û di wê şevê de Qubad Beg ji derve mabû û kurdên Biradostî pêwan û şervanê di kelehê de bicarek kuştin.

Lê çawa Aqasultan, fermandarê Meraxe ev serpêhatî bihîst bi leşkerkî giran ve çû ser kurdên Biradostî. Lê bi rê

de li hin kurdan rast hat û şikandin û xwe gihande Qubad Beg.

Herwekû Pîr Bodaq Xan, fermandarê Azerbaycan û Şêr Sultanê Mukrî di han û hewara Qubad Beg hatin û careke dî ke-leha Dimdim xistin asêgehê. Tenê ji bextreşiya Biradosta ew bû, ko çawa Olex Beg barûd li şervanê kelehê parvekir a gir bi barûdê ket û bi mîrê Biradosta de pijiqî û telî û çend hevalên xwe ên gernas birîndar bûn û kes di nav wan de nema, ko dolaba şer bigerênî û naçare Olex Beg ji kelehê derxistin û dane revandin û ji neh rojan pêve di kelehê de neman. Kurd û Kurdistan rûpel 200-206

Lê Major Rawlinson, ko di sala 1252(1836) de hatiye we-latê Şîno(Rewandiz) û xwestiye, ko paytexta Mîdiya nas bikî dibêjî, eşîra Biradost, ko di nav rûpelên tarîxê de navdar û xwedî şûne di hindama Kanîreşê de rûdinîne, ko ev hindam dikevî çiyayê Şîno û berî hingî femandariya Somayî Tergever di destê vê eşîrê de bû. Lê di îro de gelek sêfil û weza ye û nêzîkî sed gundî di bin destê wan de hene, ko çendsed mal di wan gundan de rûniştîne. Kurd û Kurdistan C-1. Rûpel 391.

FERMANDARIYA SIWÊREK(SIWEYDÎ)

Kok û binyada vê malbatê digihê ser mala Bermekiya. Herwekû Bermekî bixwe jî ji mala Sasan veketine.

Şerefxan dibêjî; Cafer hatiye cem padîşahekî Emewî û li civata wî rûniştiye û padîşah gotiye:

- Vî mirovî saxtî bikin jehir pêre heye.

Lê Cafer ji wan re gotiye:

- Belê raste qaşa gustîla min jehre, ji bo rojek bikevim tengasiyê ezê vexum û padîşah ew kiriye berdevkê xwe û pa-şê Xalidê kurê wî gelek bi pêş ve çûye û di nav Ebbasiya de cîkî mezin girtiye.

Lê di Temedinilislamî de dibêjî; Xalid di navleşkerê Ebû Mislimê Xerasanî de bû û çawa Ebû Mislim hate kuştin Ebû Cafer Mensûr ew xiste şûna Ebû Mislim.

1- XALÎD, KURÊ CAFER :

Çend caran vî Xalidî şorişên kurd vemirandine. Carek li Faris û carek du car li Cizîrê û çend caran bûye fermandarê Cizîr, Azerbaycan û gelek ji milletê xwe di ber dijmin de kuştine.

2- YEHYA, KURÊ XALÎD :

Yehya, mirovekî mezin û navdare. Di zindana bajarê Reqa de serê xwe danî, 190 koçî de daniye û li Herseme hate ve şartin.

3- CAFER, KURÊ YEHYA, KURÊ XALÎD :

Di nav serdar û wezîrên cihanê de hêj mirovên weke Cafer çênebûne. Mirovekî gelek navdar û bi denge, gelek ristên ciwan û bilind li ser hatine çêkirin û gotin û pesnê wî û malbata wî dane.

Lê herwekû ez li rewşa tarîxa mala Bermekî dinêrim ne gelek zana têne ber çavê min. Gereke wan zû Harûn, ji ber xwe bavêta û yekî weza ji mala Ebbasiya bikira peyrew û da wî peyrewî di destê xwe xista, yan weke Biweyhiya bikira.

Biweyhiya di serpêhatiya Bermekiya de gelek awir hatine lê ez dibêjim, ew awir hemîbi hev re civiyane û Harûn zû biwan vedaye û ji ber xwe kirine.

Gelek ji ser xwe çûbûn, paxav ji kesî nedikirin û xwe ji peyrew mezintir didîtin û neşiyarbûn, nîvê islamê, yan weke, ko dibêjin nîvê cihanê, rojhilat bicarek di destê Ca fer de bû û rojava di destê birayê wî Fedil de bû, karibûn her tiştî bikin.

Cafer di sala 187 koçî de hate kuştin û serê wî hate jêkirin û ferman li malbata wan rakirin.

4- FEDÎL, KURÊ YEHYA :

Ev berî Cafer wezîrê Harûn bû û diriste, ko birayê mezin bî. Gustîla wezaretê di tîlya wî de bû, lê Harûn ew ki re fermandarê Xerasan û gustîl xiste tiliya Cafer.

Diya Harûn Xeyzerane şîrê xwe dabû Fedil û diya wî Zubejde şîrê xwe dabû Harûn. Ji lewra Harûn ji Yehya re digot:

- Yabo û ji Fedil re digot keko, lê dawî yabô û keko gir - tin û xistin zindana Reqa û Cafer kuştin û ferman li Berme kiya rakirin û malê wan bicarek talan kirin û gelek ji wan kuştin û gelek xistin zindana û hin ji wan reviyên û ketin Kurdistanê.

Şerefxan dibêjî; sê zarokên Bermekiya reviyên û ketin çiyayên kurdistanê û ji xwe re hin derebegî li darxistin. Herwekû hin dibêjin; Mûsa û Mihemed herdû kurên Yehya ji hatine Kurdistanê.

Tenê Şerefxan dibêjî; li Xançûk, çiyayê Şiftelû, lî hêla Gencê rûniştin û paşê hatin nav eşîrên Siwêrek (Siweydî) rûniştin û ji wan Mîr Şihabîdîn navdare, ko bûye fermandarê Siwêrek.

1- MÎR ŞİHABİDÎN :

Piştî, ko bû mezinê eşîrên Siweydî kelehêk ava kir û bû fermandarê welêt û çawa serê xwe danî kurê wî kete şûna ba vê xwe

2- MÎR CELALÎDÎN, KURÊ MÎR ŞİHABİDÎN :

Li şûna bavê xwe bû fermandarê Siwêrek û eşîrên Siweydî bicarek xistin bin destê xwe û piştî pêlakê serê xwe danî.

3- MÎR MÎHEMED BEG, KURÊ MÎR CELALÎDÎN :

Piştî mirina bavê xwe bû fermandarê Siwêrek û pêlak bi fermandarî û serbilindî rabiward û serê xwe danî.

4- MÎR FEXRÎDÎN, KURÊ MÎR MÎHEMED :

Pêlakê welatê xwe bicamêrî le hev ragirt û paşê serê xwe danî.

5- MÎR HESEN, KURÊ MÎR FEXRÎDÎN :

Mirovekî mêrkuj û xwînxwar û talanker û dijwar bû. Di dawiya jîna xwe de kor bû û bi saxiya xwe fermandarî xiste destê kurê xwe û serê xwe danî.

6- MÎR FEXRÎDÎN, KURÊ MÎR HESEN :

Birayê wî, Mîr Mihemed çû Diyarbekir û ji cem Hesendi - rêj femandariya Xançûk, Cebeqçûr ji xwe re sitand û hat.

Lê Mîr Fexridîn tiştêk bi destê wîve berneda û şer di nav herdû bira de destpêkir û Mîr Mihemed di meydana şer de hate kuştin û fermandarî bê sergêjî di destê Mîr Fexridîn de ma.

7- MÎR ÎBDAL BEG, KURÊ MÎR MÎHEMED :

Cihê apê xwe sitand. Ji ber, ko hêj zarokên Mîr Fexridîn zarok bûn, ew kete şûna apê xwe.

Di çaxê wî de Îqotoxilî, ko ji ber qizilbaşa ve fermandarê Cebeqçûr bû hate ser Xançûk û di navbera Kurd û Ecem de şer destpêkir û dawî dijminê kurd şerpeze şikestin û kurda talanê wan ji xwe re anîn û gelek mirov û barxane girtin û ji wê rojê de û piştî Mîr Îbdal bi kamîranî, serbilindî di welatê xwe de rûnişt û piştî çend sala serê xwe danî û du kur Subhan Beg û Sultan Ehmed bi şûn xwe ve hiştin û serê xwe danî.

8- SUBHAN BEG, KURÊ ÎBDAL BEG :

Piştî, ko bavê wa serê danî Subhan Beg kete şûna bavê xwe û herdû bira bihev re rûgeş û dilxweş jîneke şahane derbas dikirin. Herwekû piştî mirina Xalid Begê pazokî hin dama Gencê jî biser welatê xwe ve berdand û piştî, ko Selîm Xan ji Çaldêran vegeriya Subhan Beg Cebeqçûr ji Îqotoxulû,

sitand û Aqçeçela ji Mensûrbegê Pazokî û hindama Zak û Me-
neşkurd ji destê Qadîrbegê qizilbaş bîzor derxistin û paşê
herdû bira welat li xwe parvekirin.

Cebeqçûr kete destê Subhan Beg û ên mayîn ketin destê
Sultan Ehmed û bi vî rengî çend salabî hev re bixweşî der-
bas kirin, lê dawî dijminahî kete nav herdû bira û Subhan
Beg ferman bi kuştina birayê xwe derxist û Sultan Ehmed ha-
te kuştin û welatê wan kete destê fermanarekî turk, kete
şûna wan, şûna Subhan Beg û li Cebeqçûr rûnişt, tenê kurek
bi navê Meqsûd Beg ji Subhan Beg ma.

9- SULTAN EHMED BEG, KURÊ ÎBDAL BEG :

Piştî kuştina Subhan Beg welat bicarek kete destê Sul-
tan Ehmed Beg û heta pêncî salî di destê wî dema û paşê se-
rê xwe danî û Murad Beg, Mihemed Beg du kur bi şûn xwe ve
hiştin û çû.

10-MEQSÛD BEG, KURÊ SUBHAN BEG :

Di çaxê kuştina bavê xwe de bi Suleymanxanê turk re di-
çûn şerê Nexciwan û li Arpeçayî bi leşkerê ecem re şerekî
dijwar û mezin kir û bi xurtî û gernasî zora dijminekî ji
xwe bêtir bir. Ji lewra Suleymanxan welatê Cebeqçûr bica-
rek xiste bin destê wî û bi serbilindî vegeriya welatê xwe
lê vê paşiyê Îskenderpaşayê Çirkes, mîrêmîranê Diyarbekir,
ev welat bîzor jê sitand û xiste bin destê fermanarekî
turk û Meqsûd Beg çû cem padîşah û heft sala li Asîtanê ma
û tiştêk bi destê wî neket û li wir serê xwe danî.

11-MURAD BEG, KURÊ SULTAN EHMED BEG :

Îskender Paşa, welat di navbera wî û birayê wî de parve
kir û keleha Xançûk da Murad Beg û Aqçeçela da Mihemed Beg
û şazde salabî vî awayî derbas kirin.

Murad Beg di saxiya xwe de para xwe da kurê xwe Suley-
man Beg û serê xwe danî û kurên wî ji Suleyman Beg pêve si-
yên dî jî hebûn. Elîxan, Hiloxan, Mistefexan.

Mistefa, li ser Tebrîzê hate kuştin û Elîxan di wî şerî
de bi dîlî kete destê qizilbaş û bi Murad Paşa re du sala
girtî ma, lê piştî, ko hate berdan û bi alîkariya Murad pa-
şa Cebeqçûr kete destê wî û Hiloxan di navderebegên Kurdiş-
tanê de li Diyarbekir bê delamet rûnişt.

Herwekû Ferhad Paşa Aqçeçela ji destê Mîr Mihemed der-
xist û xiste destê Suleyman Beg û piştî pêlakê serê xwe da
nî.

12-SULEYMAN BEG, KURÊ MURAD BEG :

Pêlakê derketî şerpaze li cem mîrêmîran li Diyarbekir (A-
med) û Bexda rûnişt û gelek dijwarî dîn û siwarî û leşerî,

ji turkan bêtir û çêtir hîn bû û dawî welatê xwe bicarek xiste bin destê xwe û di keleha Gencê de rûnişt.

Ev keleh di serê çiyakî bilind û raserî çemê Ferate. Da wî Suleyman Beg ev keleh wêran kir û bajerekî xweş li çolā Meneşkurd ava kir û mizgevteke mezin têde çêkir(lêkir) û heta sala 1005 koçî bi gerdenezadî û serbilindî jî ev welat dibin destê wî de bûn.

Suleyman Beg di şerên Şêrwan, Azerbaycan û bêtir di şerê Niyaz Begê Pazokî de, ko li talanê eşîrên Paloyî xistibû û li Çeqersad û Qereyazî bi mêranî talan ji dijmin sitand û payedar û serbilind vegeriya, gelek mêranî û gernasî nîşan dan.

Ji bo vê yekê Serdar Mistefa Paşa ev welat bicarek bi destê wî ve berda û kire fermandarê welêt.

1966.3.23 Mûsa Hesên Cigerxwîn

FERMANDARIYA BANE

Hindama Bane ji du kelehan gihayehev, pîroz û şêwe. Di-kevi navbera Erdelan, Baban, Mukrî û ji vê malbatê re dibêjin mala İxtiyaridîn. Ji wan ên, ko nav dane:

1- MÎRZA BEG, KURÊ MIHEMED BEG, KURÊ İXTIYARİDÎ :

Bû fermandarê vê hindamê û xuşka begêbegê fermandarê Erdelan mar kir û şer di navberawî û sultan Elî Beg de çêbû û Sultan Elî Beg zora wî bir û birayê xwe kire fermandarê Banê, lê dawî bi alîkariya Begêbegê Qantemiş birayê Elîbeg ji Banê derxistin û careke dî bû fermandarê welatê xwe û paşê serê xwe danî û pênc kur Bodaq Beg, Suleyman Beg, Xazî Xan Beg, Mîr Mihemed Beg, Axor Beg bi şûn xwe ve hiştin.

2- BODAQ BEG, KURÊ MÎRZA BEG :

Çend salan serbixwe, gerdenazad fermandarî li vê hindamê kir, lê dawî herdû birayên wî Mîr Mihemed û Axor Beg li ber pozê wî rabûn û zora wî birin û welat xistin bin destên xwe.

Naçare Qubad Beg, berê xwe da dîwana mezin û xwe avête ber dergahê bilind û çû nik Şahtehmaseb, lê gelek neçû li Qezwîn serê xwe danî û ji cihana jîndariyê koça xwe barkir û çû.

3- SULEYMAN BEG, KURÊ MÎRZA BEG :

Bi fermaneke Şahtehmaseb bû fermandarê Bane û şah ferman da fermandarê Meraxê, ko alîkariya Suleyman Beg bikî û bivî rengî bîst sala fermandarî li vê hindamê kir û berî ko serê xwe deynî, hevsarê femandariyê da destê birayê xwe û li mala xwe rûnişt û du caran çû hecê û keça xwe li birazayê xwe mar kir.

Tenê di caradiwem de ji hecê nehat û li ber gorna peyxamberê islamê rûnişt û fermandarî û welat bicarek bi şûn xwe ve hiştin.

4- BEDRÎ BEG, KURÊ BODAQ BEG :

Di saxiya apê xwe de keça wî mar kir û bû fermandar û serdarê vê hindamê û êl û eşîrên Bane bi camêrî lihevragirtin û welatê xwe xweş û ava kir. Mirovekî gernas, camêr û dewlemend bû, gelek xêrxwaz û dilovan bû.

Tenê Şerefşan negotiye di kîjan çaxê de bû.

FERMANDARIYA GELBAXÎ

Şerefxan dibêjî, koka vê malbatê ji eşîra Istaclo-Turkmaniye. Mirovek bi navê Ebbas Axa hatiye cem begêbeg, fermandarê Erdelan û keça Îlyas Axa, serekê eşîra Rengereş mar kiriye û li hindama Mehrewan(Merîwan) hinek qad, zevî ketiye destê wî.

Di fermandariya begêbeg de ev mirov gelek bi pêşve çûye û bûye serdarê diwazde(12) hezar siwar û seredarê Begêbeg. Lê paşê bira û mirovên xwe û eşîra xwe ya turkmanî jî anîne cem xwe û xuşkên xwe dane serdar û fermandarên eşîra rengereş û bi carek têkilî kurd bûne.

Lê paşê ji Begêbeg re hate gotin, ko Ebbas Axa dixwazî te bikujî û bikevî şûna te û çawa Ebbas Axa ev gotin bihîst bi xwarzêkê xwe ve, ko navê wî Yarila Beg bû bi roj ji bajarê Zelem derketin û çûne hindama Têlewer(Bilawer) ûtê de rûniştin û bûne dostê eşîrê. Lek Suleymanî, Marikî û Kelhorî û xwe nêzîkî Şahtehmaseb kirin û di şerê Ozbeg de li ser keleha Orkenc Ebbas Axa û Yarila Axa gernasiyên mezin nîşandan û bi destên xwe padîşahê Ozbeg û çend serdarên wî dîl girtin û bi diyarî ji şah re pêşkêş kirin û Şahtehma - seb ji bo vê gernasiyê welatê Têlewer û serdariya diwazde eşîrên kurd xistin bin destê wan û xal û xwarzî çend salan bi vî rengî bi hev re fermandarî kirin û paşê eşîrên Suleyma nî, Parikî, Kelhor, Ramziyar bûne hevalê wan û têkilî wan bûn û bicarek navê wan bû Gelbexî.

Çend caran Mihemed şer di navbera xwe û Ebbas Axa de gur kir, lê dawî keça xwe da kurê Yarila Axa(Mihemedqulî) û Ebbas Axa serê xwe danî û Elî Axa, kurê wî kete şûna bavê xwe û Yarila Axa ji ber, ko dewlemend bû bi malê xwe ve ma û guh neda fermandarî û dibêjin sêsed hespên wî hebûn û gelek diyarî dane Begêbeg û kurê Ebbas Axa, Elî Axa xiste şûna bavê wî.

Lê çawa Senan Paşa welatê Nehawend girt, ev Elî Axa hate cem û serê xwe jê re xwar kir û paşa ew şande cem padî - şah Suleyman Xan û bi fermaneke hemayûnî welatên Gerend, Şêxan, Çikran, Tifab, Xerxere, Tîrezan, Tepe bi senceqî xistin bin destê wî û kelehên Rengereşan, Sehpanan bi Feymarî xistin bin destê Yarila Axa.

1- ELÎ BEG, KURÊ EBBAS AXA :

Mirovekî gelek dewlemend û xwedî mirov û heval bû. Her sal ji Bêgebeg re diyarî rêdikirin û di navbera wî û Qubad Begê derteng de salê çend caran şer çêdibûn. Ji ber, ko Elî Beg her sal bixwe û eşîrên xwe vedi hindama Gerend ve

derbas dibûn û Qubad Beg ji wan heqçere distand û baca rê dixwest û gelbaxiyan nedixwestin baca rê bidin.

Lê naçare her sal gerekedî navwelatê Qubad Beg ve Derteng, Zihaw, Derne, Wehdan ve derbas bin û herin Gerend û li çûn û hatinê şer di navbera wan de despêdikir.

Elî Beg serê xwe danî û du kur Heyder û Keh bi şûn xweve hiştin. Çawa, ko diwê salê de Yarila Axa jî serê xwe danî û sê kur Mihemedqulî, Esed, Şaweş bi şûn xweve hiştin.

2- HEYDER BEG, KURÊ ELÎ BEG :

Di navbera wî û birayê wî Muhibidîn de şer çêbû û Heyder Beg zora Muhibidîn, serekê eşîreke Gelbaxî bir û dîl girt û nekuşt, lê sînda mezin li ber danî, ko hew vegerî nav eşîrê û Muhibidîn berê xwe da Asîtanê û hew hate welêt lê Heyder Beg mirovek şand û jêre got:

-Ko eşîr dixwazin, ko tu bê û bibî fermandarê wan û Muhibidîn ji ber sînda xwe ve hinek genim da û sivik hate welêt û nizanibû, ko hatiye xapandin. Lê çawa Heyder Beg bihîst ku rê xwe Serxab, ko bixwe xwarzayê Muhibidîn bû şande şerê xalê wî û bi tîreke jehrînî xalê xwe kuşt û bextê xwe reşkir û heta niha jî navdare bi kuştarê Muhibidîn û ji wê rojê de dijminahî kete nav eşîrên Gelbaxî û Heyder Beg û kurê xwe Serxab Beg bi leşkerekî giran ve çûne ser eşîra xalê xwe û gelek ji wan kuştin, lê herdû jî di kemînekê de hatin kuştin.

3- HUSEYN BEG :

Huseyn Beg û Muradxan Beg bi hev re fermandarî dikirin, lê Huseyn Beg keça Bêgem Begê Kelhor mar kir û fermandarî kete destê vê şêrejînê û Murad Beg da kuştin û herdû kurên Murad Beg çûne Bexda û mîrêmîran ferman da Qubad Beg, fermandarê Derteng û Derne û şande şerê Huseyn Beg û doza xwî na bavê herdû kuran lê kirin û çawa Huseyn Beg bihîst, ko leşkerê Qubad Beg kete welêt reviya û çû cem Hiloxan Beg fermandarê Erdelan û heta sala 1005 ê koçî jî Huseyn Beg li cem Hiloxan Beg bû.

Lê mexabin Şerefhan Beg nabêjî, piştî Huseyn Beg kî kete şûna wî û ev tarîxa vê malbatê weke çîrok û derew tê ber çavê min. Herwekû Elî Ewnî Beg, ko ev Şerefname tercu-me kiriye dibêjî:

-Dî Şerefname, ko li Rûsiya hatiye çapkirin vê derebegiyê, di navxwe de nagrî, lê ji ku hatiye nizanîm.

FERMANDARIYA MIRDASI

Herwekû Şerefşan Beg dibêjî, hatiye gotin, ko ev malbat ji Ebbasiya veketine û ew mirovê pîşî, ko hatiye nav Mirdasan, Pîr Mensûr, kurê seyid Huseynê Lenge, mirovekî olpe rest, derwêş û xwedênas bû. Li gora wê nivîsara, ko li nik wan heye li bavê 17 digihêne ser Elî, kurê Ebbdelah, kurê Ebbes, apê Mihemed peyxamber.

Lê ez, bixwe bawer nakim, ji ber, ko Qureyşî di ola islamê de gelek bi rûmet bûn û gereke fermandar ji Qureyşiya bûna. Ji lewra fermandarên ne erebe xwe digihandin ser yekî Qureyşî, ko fermandarî li wan pîroz bibî û millet xwe li wan bidin hev

Lê eger nikaribin binyadekî Qureyşî(erebî) ji xwe re peyda bikin, xwe dibirin ser milletên biyanî, ne kurd, ji ber, ko milletê kurd ne seza û angorê fermandarî û mezinahî bû. Ji ber, ko bê dewlet û ziman bûn, heta xwendewar û hozanên kurd jî şerm dikirin, ko bêjin em kurdin.

Eger wilo rast bî gereke nivê milletê kurd ji zarokên Hesen û Huseyn bin, ji ber, ko ji sedî heftê(% 70) dibêjin, em seyidin. Lê ne raste, ko em bêjin bêgane di nav milletê kurd de peyda nabin û seyid bi carek derewa dikin. Ji ber, ko gelek diriste ji wan gelek reviya bin û xwe di nav çiya û şaxên Kurdistanê de veşartibin û berebere bi alîkariya ola islamê bi pêş de çûbin û dinav kurdên nezan û reben de bûbin fermandar û xwedî gund û êlên kurd gerdena xwe ji wan re xwar kiribin.

Dibêjin, di serê pêşî de ev Pîr Mensûr li nav Hekarya rû niştiye û paşê hatiye welatê Egil û li gundê Pîran rûniştî ye, tekyexanak ava kiriye û nimêj û rojî gelek kirine û girtine û rêçika islamê rê kurdên hov û nezan daye û xelkê welêt pê hatine xapandin û li hawîr civiyane û hêviya qencyê jê kirine û li gora baweriya wê çaxê hin tiştên kesne dî jê dîne û dawî gelek dewlemend bûye û di nav wan kurdên reben û nezan de bûye fermandar.

Piştî mirina wî kurê mezin Pîr Mûsa ketiye şûna bavê xwe û tekyexanak li pîran ava kiriye û kurdên wan navan baweriya xwe pê anîne û bûne paşrewên wî. Êl û eşîrên kurd, Mirdasî û nemirdasî bicarek xwe dane ber siya wî û bûne peyayên wî û ji xwe re kirne mezin û pîr û ketine bin destê wî. û piştî mirina wî kurê mezin Pîr Bedir ketiye şûna bavê xwe û bi Êl û eşîrên xwe veçûye ser bajarê Egil û bîzor xistiye bin destê xwe û bûye fermandarê welêt.

Egil keleheke bilind û mezine, li ser lateke xwar û bilind hatiye avakirin, ko kes newêrî lê binêrî, weke Şeref-xan dibêjî bi turkî bi daxwaza Xwarbibe, serê xwe deyne.

Lê Mîr Şeref-xan dibêjî, navê Mirdasî ji Mirdas, kurê Îdrîs, kurê Nesîr, kurê Cemîl hatiye, ko bixwe ji eşîra Benî kilab be, ko berîhingî li hêla Heleb rûdiniştin û Salih, kurê Mirdas pêlakê fermandarî li Heleb kiriye. Tenê leşkerê Misrê di çaxê peyrewê Fatimî (Zahir) de hate ser Salih û li jêrê welatê Şam Salih û kurê xwe di sala 420 ê koçî de hatin kuştin.

Lê di Hamîş Reqem-1 de dibêjî Esedîdewle Salih, kurê Mirdas di şerê misriyan de li Urdin bi kurê xwe ve hatine kuştin, lê kurê wî Şiblîdewle Ebû Kamil Nesîr di sala 429 ê koçî de hatiye kuştin.

Herwekû Mihemed Emîn Zekî Beg ji kurê Esîr diguhêzî û dibêjî, kurê Etîr, serokê êla Benînumeyr di sala 416 ê koçî de bi hêvîkirina Salih, kurê Mirdas, fermandarê Heleb, bajarê Riha ji Ehmenxanê kurê Merwanê kurd, fermandarê Farqîn û Amed sitandîye.

1- PÎR BEDİR, KURÊ PÎR MÛSA, KURÊ PÎR MENSÛR :

Piştî, ko bajarê Egil xiste destê xwe, eşîrên kurd li xwe civandin û riya bav û kalên xwe berda û destê xwe dirêj kire darê fermandarî û mezinahiya wî welatî bicarek xiste destê xwe, Lê dema Selcoqiya û welatê Kurdistan xistin bin darê xwe Pîr Bedir ji welatê Egil bazda û bi çola ket û winda bû, lê dawî xwe avête padîşahê Farqîn, Hisamîdîn û di şerê Urtiqê Turkmanî de hate kuştin.

Ev Artuq, kurê Eksekê turkmanî, yek ji serdar û ferman-
darê Alparslan Edidiwdewle yê Selcoqî bû û ji ber vê li
hindama Amed(Diyarbakir) û Mardîn fermandarî dikir û nevi-
yên wî li Mardîn dewleteke turkmanî lidarxistiye. Herwekû,
Heskîf jî dibin destê neviyên wîde bû û li ser destê Hesên
dirêjê Bayendûrî dawiya vê malbatê hatiye.

Piştî Pîr Bedir Beg di vê malbatê de kes nema, kò karibî
fermandariyê bikî. Tenê jina Pîr Bedir Beg avis bû û kur-
dên Mirdasî çavnêr û çardêrê zikê vê jînikê bûn û paşê ku-
rek jêre bû û navê wî kirin Boldiq û ji vî mirovî ev mal-
bat veketiye.

Ji lewra ji wan re dibêjin Boldiqan, meger çendan diya
wî di ber zanê de serê xwe danîjî, lê Boldiq di nav destê E
şîrê de hate xwedîkirin û roj bi roj gavên xwe bi pêş de avê-
tin, heta, ko bû fermandarê welêt. Lê piştî, ko serê xwe
danî, kurê wî İbrahîm kete şûna wî.

3- MÎR İBRAHÎM, KURÊ BOLDIQ :

Li şûna bavê xwe bû fermandarê Egil, lê gelek nema û se-
rê xwe danî û kurê wî Mîr Mihemed kete şûna bavê xwe.

4- MÎR MİHEMED, KURÊ MÎR İBRAHÎM, KURÊ MÎR BOLDIQ :

Wî jî gelek dirêj nekir û serê xwe danî û sê kur İsa, Tey-
mûr, Huseynbi şûn xwe vehiştin. Teymûr di saxiya xwe de fer-
mandarê Baxen bû û bapîrê fermandarê Palew(Pehlew-Palo) yê.

Lê Mîr Huseyn, ko di saxiya bavê xwe de fermandarê keleş-
ha Berdenc bû û hindama Çermûk di destê wî de bû mîrêkên
Çermkê neviyên wî ne, lê hin dibêjin Mîr Huseyn ne kûrê,
Mîr Mihemedê, belkî jî mirovanê wî ye

5- MÎR İSA, KURÊ MÎR MİHEMED :

Piştî mirina bavê xwe bû fermandarê Egil û bicarek eşî-
rên Mirdasî lê gihane hev û bira û mirovên wî serê xwe jê-
re xwar kirin û bi xweş û bêş bi hev re derbas kirin, lê çar-
wa serê xwe danî, kurê wî Dewletşah kete şûna bavê xwe.

6- MÎR DEWLETŞAH BEG, KURÊ MÎR İSA :

Piştî mirina bavê bû fermandarê welêt û bicarek eşîrên,
Mirdasî lê gihane hev û bi dilovanî welat û mîlet û êl û
eşîrên xwe lihevragirtin û paşê serê xwe danî.

7- MÎR İSA, KURÊ DEWLETŞAH BEG :

Li şûna bavê xwe rûnişt û welat bicarek xiste bin destê
xwe û bi camêrî û dilpakî welatê xwe lihevragirt û paşê se-
rê xwe danî û koça xwe ji cihana jîndarî barkir û çû.

8- ŞAH MİHEMED, KURÊ MÎR İSA :

Kete şûna bavê xwe, lê gelek nema û serê xwe danî û

pênc kur Qasim Beg, Îsa Beg, Mensûr Beg, Esfehnan Beg, Emîr Beg bi şûn xwe vehiştin.

9- QASÎM BEG, KURÊ ŞAH MÎHEMED BEG :

Li şûna bavê xwe rûnişt û bi serbilindî welat xiste bin destê xwe û di Kurdistanê de gelek deng pêket. Di Çaxê Turkmanê Pezgewr de bû Etabegê yekî ji zariwên wa û jê re digotin Laleqasim û di sala 913 ê koçî de Şah Îsmailê Sefewî, Kurdistan bîzor xiste bin destê xwe û Laleqasim welatê xwe bi xweşî bi destê wî ve berneda û serê xwe jê re dananî, û Şah leşkêrekî giran bi serdariya Xan Mihemed Istaclû şan de ser keleha Egil û bîzor xiste bin destê xwe û sipardê serdarekî qizilbaş Mensûr Beg.

10-MÎR MURAD BEG, KURÊ MÎR ÎSA BEG :

Piştî mirina apê xwe bû fermandarê Egil û welat û mîlet lihevragirtin û eşîrên kurdên Mirdasî kirin dost û hevalên xwe bi dilovanî fermandarî dikir û di meydana avadanî de welatê xwe xwe bi pêş ve bir û gavên hêja avêtin û avaniyê ke mezin li cem gorna Qasim Beg ava kir û xanek û tewlak a va kirin û xwarin dida mêvana û av ji hinda bajarê Amed a-nî wê xanê, ko navê wê Xana Şerbetîn bû û dawî serê xwe danî û du kur Elîxan, Qasim Beg bi şûn xwe ve hiştin.

11-MÎR ELÎXAN, KURÊ MÎR MURAD BEG :

Li şûna bavê xwe rûnişt, lê bi ciwanî serê xwe danî û kordûnde çû.

12-QASÎM BEG :

Li cîhê birayê xwe rûnişt û bi fermana padîşah bû fermandarê welêt û heta sala 1005 ê koçî fermandarê welatê Egil bû û 25 sal di fermandarî de rabiwardine û nizanîm dawî çî pêhat û kî kete şûna wî.

2 - FERMANDARÎYA PALO-PEHLEW

Me derbas kir, ko ji zarokên Mîr Mihemed Teymûrtaş bûye fermandarê Pehlew û ev fermandarên, ko dabaşa wan bikin ji neviyên Teymûrtaşin.

1- TEYMÛRTAŞ, KURÊ MÎR MÎHEMED, KURÊ MÎR ÎBRAHÎM, KURÊ

BOLDÎQ :

Mirovekî zana û bîrewer û hêja bû. Çawa, ko bavê wî ew kire dizdarê keleha Pehlew, dest bi karên hêja û qenc kir û bi camêrî û serbilindî welatê xwe di meydana aborî, ava-

nî debi pêşve bir û çend salan bi kamîranî jîna xwe rabiward û serê xwe danî.

2- MÎR HEMZA, KURÊ MÎR TEYMÛRTAŞ :

Eşîrên kurd gotina xwe kirin yek û li gora daxwaza bavê wî ew kirin fermandar, lê gelek nema û koça xwe barkir û çû bin axa sar.

3- MÎR HUSEYN BEG, KURÊ MÎR HEMZA BEG :

Bicamêrî û gernasî şûna bavê xwe sitand û di çaxê wî de padîşahiya pezewra ber bimirinê ve digindirî û welatê Diyarbekir-Kurdistan kete nav sergêjî û berdîberdanê û Huseyn Beg bi leşkerekî kurd ve çû ser bajarê Erxen, ko ji Turkmana bistênî, lê berî bighê armancê serê xwe danî û fermandarî nebidilê xwe sipardin birazayên xwe Cemşîd Beg.

4- CEMŞÎD BEG, KURÊ RUSTEM BEG, KURÊ HEMZA BEG :

Piştî mirina apê xwe bi yektiya êl û eşîrên kurd bû fermandarê Pehlew. Lê di çaxê Şah Îsmâîlê Sefewî de qizilbaşan Kurdistan bicarek xistin destê xwe û turkman fermandarê welêt bûn û Ereşahê turkmanî ji rexê Şah ve bû fermandarê Pehlew, lê çawa fermandarên Kurdistanê bi alîkariya ordiya Selîm Xan welatê xwe ji destê qizilbaşan derxistin. Cemşîd Beg bi gernasî welatê Pehlew ji destê dijminê xwe derxist û di nav hogir û hevalên xwe de gelek bi rûmet û pa yedar bû. Padîşah û wezîra bê pîvan rûmeta wî digertin û çawa Selîm Xan hate Kurdistanê Cemşîd Beg bixwe re bire şerê Îranê û kire berdevk û şewirdar û bixwe re digerand.

Bê çiqas zana û jîrek û hozan bû, hewqas jî dewlemend û xanedan û têr mal û pez û sewal bû. Deh hezar pezê wî hebûn û salê sê hezar bizin li Helebê difirotin û her yek na lekî hespa bi serê wan ve dikir û di kêşanê de ev nal bêşa wî bû ji bazirgana di sitand

Ev hemî, ji bil Sewal û hesp, hêstir, ga, çêlek, gamêş û cot û cobarên wî bûn.

Bi rastî di çaxê wî de di Kurdistanê de kes weke wî dewlemend nebû. Herwekû gelek keleh û xwendegeh, mêvanxane li welatê xwe ava kiribûn.

Mêvanxanake mezin li Demirqabe ava kiribû, ko zivîstan û havîna kerwan û rêwingî lê dihêwirin û nan dixwarin. Ji sed salî bêtir jîndar ma û 60 salî bi fermandarî rabiward. Ji padîşah Suleyman Xan fermanek sitandibû, ko welatê wî her û her dibin destê wî û zaro û neviyên wî de bimênî û di saxiya xwe de welat bi destê kurê xweve berda û paşê serê xwe danî û pênc kur Huseyncan Beg, Hesen Beg, Hemza Beg Teymûr Beg, Dewletşah bi şûn xwe vehiştin.

Hemze Beg, di dîna Osmanlî de delametek danê û zeametek bi 40 hezar aqçe jêre vebirin, lê bavê wî ew ji pêsîra xwe avêt û ji malbata xwe dûr kir, ji ber, ko gelek tiştên bê-olî dikirin û her tiştên nepak jê çêdibûn û ji Hemza Beg, kurek ma, navê wî Rûstem Beg bû, di şerê Çaldêran de hate kuştin.

Teymûr Beg, di saxiya bavê xwe de bû dizdar û fermandarê Xerpûtê(Xertpirtê) û çawa serê xwe danî du kur Ellahver dî, Adil bi şûn ve man.

Dewletşah Beg, ji cem padîşah delametek kete destê wî û Zeametek bi 40 hezar aqçe jêre hate dayîn û piştî mirina wî du kur Ehmed Beg, Yûsif Beg jê man û çû.

5- HUSEYNCAN BEG, KURÊ CEMŞÎD BEG :

Çawa me derbas kir bavê wî di saxiya xwe de welat bi destê wî ve berda û bi fermaneke Suleymanxan lê pîroz bû û ne di Kurdistanê bi tenê de belkî di Hicaz û Îraqê de jî nav û dengê wî bi mêranî û comerdî û xêrxwazî belav bû û deng pêket û çawa serê xwe danî kurek bi navê Mihemed Beg, bi şûn xwe ve hişt. Lê ji ber, ko Mihemed Beg ne xercê dewletê bû êl û eşîr û gerekên welêt Hesen Beg kirin fermandarê welêt.

6- HESEN BEG, KURÊ CEMŞÎD BEG :

Bi fermaneke Muradxan bû fermandarê Palo(Pehlew) û bi alîkariya êl û eşîr û sermiyanên welêt çend salan bi kamîranî fermandarî kir û di sala 986 ê koçî de, ko ji şerê Şêrwan vegeyriyabi rê deserê xwe danî û du kur Suleymanbeg, Muzeferbeg bi şûn xwe ve hiştin.

7- SULEYMAN BEG, KURÊ HESEN BEG :

Lî ser destê Serdar Mustefa Paşa mîrêmîranê Diyarbekir, fermandariya hindama Pehlew kete wî, lê gelek neçû bi alîkariya wezîrê mezin Mihemed Paşa fermaneke hemayûnî bi fermandariya Pehlew ji Yûsif Beg re derket, ev Yûsif Beg, kurê Dewletşah, kurê Cemşîd Bege.

Lê ji ber, ko pirê eşîrên kurd û xelkê welêt bi Suleyman Beg re bûn her çiqas şer û kuştin çêbûn jî lê Yûsifbeg zora Suleyman Beg nebir û nikaribû bighê daxwaza xwe û paşê bi nexweşiyê ket û serê xwe danî.

Lê dijminê milletê kurd dixwestin wan berdî hev û tim ji wan kar bikin, dixwestin xwe bixwe hev bikujin û ji dûr velî wan temaşa bikin û careke dî ne xwestin welat bê berberî bimênî û bi fermaneke padîşah welatê Pehlew dane Ehmed Beg, birayê Yûsif Beg û careke dî sergêjiyê destpêkir.

Dilê dijminê kurd ji Ehmed Beg dixwarin û dixwestin Su-

leyman Beg bavêjin û welat bixin bin destê çawîşên turk lê
ji ber millet hevalbendê Suleyman Beg bû weke Suleyman bi
fermandarî rawesta û ji welatê xwe derneket. Lê Ehmed Beg
naçare, pozşikestî vegeriya ber destê dijmin û li ber der-
gahê padişahê bilind rûnişt û dawî bi nexweşiyê serê xwe
danî û welatê Pehlew ta bi sala 1005 ê koçî jî di destê Su
leyman Beg de bû, lê nizanim ka dawî çî pê hat.

FERMANDARIYA ÇERMÛK

Herwekû derbas bûye Mîr Mihemed Beg di saxiya xwe de ke leha Berdenc da kurê xwe Mîr Huseyn Beg û çawa me got, hiñ dibêjin ev Huseyn Beg ne kurê Mîr Mihemed Bege, belkî ji mirovanê wî ye lê her çawa dibî bere bibî tenê ev Mîr Huseyn Beg ji ber, ko mirovekî gelek jîr û zana bû herwekû gernas û comerd û dilovan bû bi camêrî pêlake dûr û dirêj bi fermandarî rabiward û paşê serê xwe danî

2- MÎR SEYFÎDÎN, KURÊ MÎR HUSEYN BEG :

Piştî mirina bavê xwe bû fermandarê Çermûkê, lê gelek neçû serê xwe danî.

3- ŞAH YÛSÎF, KURÊ MÎR SEYFÎDÎN BEG :

Gelek nema û serê xwe danî û Welat Beg kete şûna wî.

4- WELAT BEG, KURÊ ŞAH YÛSÎF :

Piştî mirina bavê xwe bû fermandarê Çermûkê û çend sal bi fermandarî biwartin û serê xwe danî.

5- ŞAH ELÎ BEG, KURÊ WELAT BEG :

Li şûna bavê xwe rûnişt, lê gelek nema û serê xwe danî.

6- ESFENDIYAR BEG, KURÊ ŞAH ELÎ BEG :

Bi daxwaza êl û eşîrên kurd li şûna bavê xwe rûnişt û pêlek rabiward û serê xwe danî

7- BAYENDÛR BEG, KURÊ ESFENDIYAR BEG :

Gelek nema û serê xwe danî û kurê wî Mihemed Beg kete şûna wî

8- MIHEMED BEG, KURÊ BAYENDÛR BEG :

Di çaxê wî de bi alîkariya ordiya turk û di çaxê Selîmxan, de welatê Çermûk jî ji qizilbaşan hate sitandin û Mihemed Beg bû fermandarê welatê bav û kalên xwe.

Mîr Mihemed Beg di çaxê Selîmxan û Suleymanxan de li ser hev, li pey hev du ferman jê rehatin nivîsandin û bi wan fermana bû fermandarê welêt, tenê salyana filehên welatê Çermûkê kete destê dewletê û bi ser Diyarbekir ve hatin berdan û Çermûk heta sala 1005 ê koçî jî di destê Mîr Mihe med Beg de bû.

FERMANDARIYA KELHOR

Şerefşan dibêjî, kok û bingehê vê malbatê ji mala Guh - derzê kurê Keyo ne, ko di dewleta Keyanî de fermandarê Babil bû û navê wî Reham bû, bi leşkerekî giran ve çûye ser welatê Şam û Felestîn û welatê Misrê û gelek talanî, wêranî û zor û setem bi ser van weleta de barandine û ji cihwa gelek kuştine.

Herwekû vê paşiyê li ser kevirê Behsitûn hatiye xuyakirin, ko raste Guhderz navê mirovekî ye û Şerefşan pêde diçî û dibêjî dawî ev Guhderz bûye padîşahê welatê Îran û ev eşîra Goran ji neviyên wî ne.

Kelhor jî sê(3) perçe ne. Pilingan, Derteng, Mahîdeşt.

1-FERMANDARIYA PILINGAN

Kelehên vê derebegiyê 8 keleh û bajin. Diyodiz(Tiyodiz) Dezman, Kuwahkor, Mor, Kelane, Nişûr, Merawîd, Becn. Pilingan paytexta wa ye. Ji fermandarê navdar:

1- XEYBÎLAH BEG :

Mirovekî xêrxwaz û olperest bû, di çaxê Şah Îsmâîlê Sefewî de ev Xeybilah Beg serê xwe jêre danî û hate cem û ke te nav imperatoriya Îran û xwe da ber siya Ecem.

Lê gelek neçû serê xwe danî û kurek bi navê Mihemed Beg

bi şûn xwe ve hişt û çû.

2- MÎR MIHEMED BEG, KURÊ MÎR XEYBÎLAH BEG :

Bi fermanekê Şahtehmaseb ew kire fermandarê Pilingan û şah xuşka wî mar kir û bi vî awayî Mîr Mihemed Beg gelek pa yedar bû û gavên xwe bi pêşde radan. Tenê bi saxiya xwe we lat li her çar kurên xwe Îskender Beg, Suleyman Beg, Sul-tan Huseyn Beg, Cemşîd Beg parve kir û Îskender Beg xiste şûna xwe.

3- ÎSKENDER BEG, KURÊ MÎR MIHEMED BEG :

Bi fermaneke Şahtehmaseb bû fermandarê Pilingan û di çaxê Şah Îsmailê diwem de Îskender Beg çû dîwana wî û ferman dariya xwe bi fermaneke Şahinşahî pîroz kir û bi serfirazî hate mala xwe.

Lê piştî bîst(20) sala serê xwe danî û Huseynxanê Tiklo fermandarê Dînewer, ko navdare bi Sulaxhuseyn, êrîşên xurt anîne ser pilingan û dawî bîzor xiste bin destê xwe û naçare Sultanhuseyn Muzefer, birayê Îskender Beg bazda û xwe a vête cem Mihemed Paşa, kurê Şemsidîn Paşa, fermandarê Şehrezûr û çawa Şah Îsmailê diwem serê xwe danî berdîberdan kete welêt û her femandarekî doza serxwebûnê kir.

Diwê çaxê de Welîxanê Tiklo, fermandarê Hemedan çavên xwe berdane hindama Dînewer, ji ber, ko Solaxhuseyn, kurê kolakî wî bû û li ber serê xwe hildabû û xwe nedixiste bin darê wî, ji rêv dest bi şerê wî kir û leşkerê Şehrezûr êrîşî keleha Dînewer kir û ji destê eceman derxist û kete destê turkan û kirin perçak ji qada Hemayûnî û kete bin destê femandarên bêgane.

2 - FERMANDARIYA DERTENG

Ji kevnare de navê vê hindamê Helwan bû û di çaxê leşkerê Îslamê kete Kurdistanê, kurdên bajarê Helwan bi lihevhatin xwe dane destê Ereba û paşê Celewla û Şehrezûr jî li gora peymanan navbera misilman û xelkê Helwan lihevhatin.

Heft keleh di binvê derebegiyê de hene. Bawe, Baske, Alan, Zencîre, Rewanser, Dodan, Zermangî û sê mirovên navdar li vê hindamê femandarî kirine.

1- SUHRAB BEG :

Mirovekî gernas û mêrxas û jîr û bîrewer bû û bi camêrî çend salan li serhevdi vê hindamê de femandarî kiriye û eşîr û gundên xwe bi hostayî lihevragirtine û paşê serê xwe daniye.

2- UMER BEG, KURÊ SUHRAB BEG :

Di serê pêşî de gelek xwînrêj û mêrkuj û serxweş bû, lê dawî vegeriya û bû mirovekî xêrxwaz û dilovan û olperest û dev ji Ecem berda û bû hevalbendê turkên Osmanlî û bi gerdexwarî hate nik padîşahê payedar û mezin Suleymanxan û bi fermaneke padîşah femandariya Derteng li xwe pîroz kir û bi kamîranî vegeriya welatê xwe û bi vî rengî çend salên dirêj bicamêrî û serfirazî di femandariya welatê Derteng de rabiwardin û paşê serê xwe danî û çû.

3- QUBAD BEG, KURÊ UMER BEG :

Xortekî ciwan û pehlean û jîr û zana û xêrxwaz û olperest bû. Herwekû gelek comerd û nandar bû, hindama Derteng di çaxê wî de gelek avdan û fireh bû. Ji sînorê Dînewer û ta bi sînorê Bexdadi bin destê wî de bû û gelek mal û heval û dewlet û leşkerê wî hebûn.

3 - F E R M A N D A R I Y A M A H Î D E Ş T

Mah bi daxwaza hindam hatiye, weke Mahsebzan, Mah-Kûfa, Mah-Besra, Mahîdeşt.

Herwekû deşt bi daxwaza Rast hatiye weke, Zardeşt, ko bi daxwaza Rastgo hatiye zar zimane û deşt raste. Şerefxan tiştekek di biwara vê hindamê de nedaye xuyakirin. Tenê dibê jî du bira bi navê Mensûr û Şahbaz femandarî li vê hindamê kirine û di sala 1002 ê koçî de Mensûr birayê xwe kuşt û serbixwe bû femandarê vê hindamê û carna birazayê wî Elqas Beg li ber apê xwe radibî, lê ap rê nadî birazayê xwe û salê salyana çil hezar pez didî waliyê Bexda, dewleta turkên Osmanlî, ji lewra li cem serkar û femandarên Bexda pir bi rûmet û gelek maldar û dewlemende.

Ta bi sala 1005 ê koçî jî di vê hindamê de bi serbilindî femandarî dikir.

1966.3.30 Cigerxwîn

F E R M A N D A R I Y A Ç I M İ Ş K I Z I K

Şerefxan dibêjî, ev malbat bawer dikim, ko bingehê wan diçî ser mala Ebbas, apê Mihemed Peyxamber. Lê hinek dibêjin ji zariwên Selîq, kurê Elî, kurê Qasim, kurê yekî Selcoqî ne, ko li Erzerom fermandarî dikirin û ev Selîq di sala 556 koçî de bi dîlî kete destê Gurca, lê xuşka wî, ko jina Şahermenê Xelatê bû ew da berdan û piştî wî re kurê wî Mihemed Şah bû fermandarê Erzerom û piştî wî neviyê wî Melekşah, kurê Melek Mihemed bû fermandar, lê ew jî bi destê Suleyman Şah, kurê Qelîç Erselan di sala 598 koçî de hate kuştin û ji wê rojê de Erzerom kete destê Selcoqiyên welatê Rom.

Şerefxan pêde liçî û dibêjî, gelek diriste, ko melkîşî ji melekşahî derketibî. Ji ber, ko kurd navên mezin kurt û serguherî hev dikin û dixwazin bi kurtî bibêjin. Lê her çawa bi berebî tenê 32 keleh di bin destê wande bûn, çawa, ko şazde hindam heta îro jî dibin fermandariya Cîmişkizikan de ne û ji vê malbatê re dibêjin Melkîşî (Melekşahî).

Di îro de bûne sê perçe û di Kurdistanê de weke wan xwedî mal, dewlemend, xwedî gund, têrmêr û keleh û leşker û berdestî û dandol peyda nabin û welatê wan bi Kurdistan navdare û gelek ji wan çûne welatê Îran û gelek serdar û fermandar di leşker û pêwanê şah de bipêş ve çûne û cihên bilind girtine û bûne fermandarên serbixwe (Xweser).

Lê tiştê pir hêja eve, ko kengî navê Kurdistan bê gotin daxwaz Cîmişkezike û ji roja, ko Melkîşîya ev 32 keleh û

16 hindam xistine bin destê xwe û heta îro jî zariwên Melkîş li van keleh û hindaman femandariyê dikin û heta di çaxê Cengîzخان de û di çaxê Teymûrxan de jî, çawa, ko di çaxê Şahrix û Qere Yûsif jî de ev welat bicarek di destê wan de bûn.

Tenê di çaxê Hesendirêj de Xerbendel û eşîreke turkmanî ev welat ji destê Mîr Şêx Hesênê Melkîşî derxistin, lê gelek neçû careke di Mîr Şêx Hesên vegehiya welatê xwe û bû femandarê Cimişkezîk û bi gernasî welatê xwe ji destê Xerbendel û wa derxist.

1- ŞÊX MÎR HESENÊ MELKÎŞÎ :

Piştî, ko welatê Îran kete destê Hesendirêj, padîşahê dewleta Bayendûrî zor da miletê kurd û hevalbendên Qere Yûsifê turkmanî, Pezreş û gelek li windabûna kurd digehiya û li girtina Kurdistan dikola û gelek ji femandarên Kurdistanê girtin û gelek ji mezinên kurd bi çola ketin û ji ber dijminê xwe bazdan û hina xwe bidizî veşartin û pêjin ji ser xwe winda kirin û çavnehiya çax û demên xwe dikirin.

Di wê çaxê de eşîra Xerbendelû turkmanî, Pezgewr welatê, Cimişkezîk ji destê Mîr Şêx Hesên derxistin û Mîr Şêx Hesên hêj biçûk bû lê kurda gelek jê xweş bûn û berebere lê kom bûn û piştî sitêra Pezgewra qurî ji Mîr Şêx Hesên bi gernasên kurd ve êriş kirin ser dijmina û bi mêranî welatê xwe ji dijmin sitandin û careke di bû femandarê welatê bav û kalên xwe.

2- SUHRAB BEG, KURÊ MÎR ŞÊX HESEN :

Piştî mirina bavê xwe bû femandarê welêt, lê mexabin, ko tişteki hêja ji serpehatiyên Suhrab Beg nehatiye xuyakirin, tenê pêlakê bûye femandar û paşê serê xwe daniye.

3- RUSTEM BEG, KURÊ SUHRAB BEG :

Di çaxê wî de Şah Îsmailê Sefewî bû padîşahê Îran û ji cem xwe Nûrelî Xelîfe, bi leşkerekî giran ve rêkire ser welatê Cimişkezîk, lê Hacî Rustem Beg, bê şer welatê xwe si-parde dijmin û çû ber lingê şah û gerdana xwe jê re xwarkir û şerpeze û ser di berde li dîwanxana şah rûnişt. Lê şahê navdar li şûna welatê wî çend hindam ji welatê Îraqê dane destê wî.

Nûrelî Xelîfe, bê pîvan, xwîn-xwar û talanker û setemparêz bû. Bê jimar şewat, talanî, berdîberdan bi ser welatê, Cimişkezîk de barandin û naçare xelkê welêt bicarek ketin nav sergêjî û şoriş û pevçûnê û serê xwe ji dijmin re xwar nekirin. Yek ji cem xwe şandin (rêkirin) welatê Ecem, cem Hacî Rustem Beg, ko ji Îraq û Esfehane bînin nav xwe, lê

di wê çaxê de bi leşkerê Îraq û Faris û Azerbaycan ve çû - bûn şerê ordiya turk û Hacî Rustem Beg nikaribû ji nav leşkerê şah derkevî.

Lê çawa ordiya türk zora leşkerê Îran bir û şikand û li Çaldêran ecem şerpeze kirin û Suleymanxan kete bajarê Tebrîz û Hacî Rustem Beg hate cem Suleymanxan û gerdana xwe jê rexwar kir, lê Selîmxan ew û neviyên wî û çil siwar pêre bi fermanekê dane kuştin.

Çawa Pîr Huseyn Beg, kurê Hacî Rustem Beg kuştina bavê xwe bihîst berê xwe da welatê Misrê û çû cem padîşahê Çirkes.

Tenê li bajarê Meletiya, ko wê çaxê di bindestê Misrê de bû, Memayî Beg, fermandarê Meletya jê re bi camêrî got: - A rast ewe, ko herî cem padîşahê turk Selîmxan û gerdana xwe jê re xwar bikî, ji ber, ko dewleta Çirkesî ber bimirî-nêve digindirî.

Naçare Mîr Huseyn bi dilekî xurt berê xwe da dîwana Selîmxan û gerdana xwe da ber şûrê padîşahê mezin û xwe si - parde bextê dijminê xwe, ko bavê wî berî pêlakê kuştiye.

Tenê Selîmxan gelek dilxweş bû û li şûna xwîna bavê wî welatê bav û kalên wî bi fermaneke padîşahî jê re pîroz kir û mîrêmîranê ji Meraş, Mihemed Paşa Biyîqlûbi leşkerekî mezin ve pêre rêkire ser welatê Cimişkezik.

Tenê Pîr Huseyn Beg, li hêviya Biyîqlû Paşa ranewestiya û sivik xwe gihande welatê xwe û gernas û mêrxasên kurd li xwe gihandinhev û bi gernasî berê xwe da dijmin û qizilbaş zû şikandin û serê Nûrelî Xelîfe jêkirin û Pîr Huseyn Beg, bi serbestî di welatê xwe de rûnişt û bi kamîranî 30 salî fermandarî kir û paşê serê xwe danî û 13 kur Xalid Beg, Mihemed Beg, Rustem Beg, Yûsif Beg, Pelten Beg, Keyqubad Beg Behlûl Beg, Muhsin Beg, Yaqûb Beg, Keykawis Beg, Perwîz beg Celeman Beg, Firoxşad Beg bi şûn xwe ve hiştin û çû

Tenê wan birayên pir li hev nekirin û bi hev re çûne cem padîşah Suleyman Xanê Qanûnî û jê re çîroka xwe gotin. Dîxwazî Cimişkezik û salyana filehên welatê û salyana pez û çend gundên hêja bidin padîşah li me her sêzdehan parvekî. Ma padîşah çî dixwazî.

Welat kire du senceq û çardeh zeamet û teymar û li wan parvekirin û di nav xwe û padîşah de ji bo vê yekê peyma - nek nivîsîn, ko ne ew bikevin delametên dewletê û ne dew - let karibî van gund û hindaman ji wan bistênî û rûsipî ve - geriyana mala xwe.

PERÇÊ YEKEM:

HINDAMA MECENKURD

Bi fermana hemayûn ev hindam kete destê birayê mezin, Mîr Mihemed Beg û piştî salekê Mîr Mihemed Beg serê xwe danî û çar kur bi şûn xwe ve hiştin û ji ber, ko her çar kur jî biçûk bûn bi fermana Suleymanxan ev hindam kete destê Firoxşad Beg.

1- FİROXŞAD BEG, KURÊ PÎR HUSEYN BEG :

Lê çawa bû fermanarê Mecenkurd, birayên wî ji padîşah re nivîsîn, ko Firoxşad Beg malê dewletê xwariye, diziye û nagihan ferman bi kuştina wî derket û di cîde kuştin. Hubeyn Beg, Xelîl Beg du kur jê man û zeametek ji hindama Mecenkurd dane wan û ê mayî kete destê Qasim Beg, birayê Senan Paşayê Ernawît, ko diwê çaxê de ev Senan Paşa mîrêmî ran ê Erzeromê.

Çawa, ko çend zeamet ketin destê zariwên Mihemed Beg. De temaşa bikin li peyman û bextê dijmin û li nezaniya mezinê kurd, ko çawa bi hesanî û ji nezaniya têne xapandin û xwe bixwe şerê hev dikan û xwe bi destê dijmin didin kuştin.

Lê piştî pêlakê Rustem Beg, fermanarê Pertik nivîsarek rêkire dergehê bilind û jê hêvî kir û got:

-Eger Firoxşad Beg kêmasiyek kir û bi wê kêmasiyê hate kuştin û çû, lê ji ber, ko peymanek di navbera we de heye, ko ev hindam nekevî destê bêgana, hêvî dikan, ko hindama Mecenkurd bixî destê Pelten Beg.

Padîşah ev hêviya wî bicîkir û Mecenkurd da destê Pelten Beg

2- PELTEN BEG, KURÊ PÎR HUSEYN BEG :

Diwê çaxê de Pelten Beg di gel Serdar Mistefa Paşa çûbû şerê welatê Şêrwan û li vegerê destûr xwest û hate welatê xwe, lê bi rêde li hindama Tercan serê xwe danî.

Elî Beg, Cihangîr Beg, Osman Beg, Gulehmed Beg çar kur bi şûn xwe ve hiştin û koça xwe barkir û çû.

3- ELÎ BEG, KURÊ PELTEN BEG :

Bi alîkariya Serdar Mistefa Paşa, hindama Mecenkurd kete destê Elî Beg, kurê Pelten Beg, lê gelek neçû serê xwe danî û sê kur Heyder Beg, Elahvêrdî Beg, Pelten Beg bi

şûn xwe ve hiştin û bi fermana hemayûn senceqa Mecenkurd kete destê birayê mezin Heyder Beg. Lê hêj fermana Murad - xan negihabû destê wî serê xwe danî û bi fermana padîşah kete destê Elahvêrdî Beg.

4- ELAHVÊRDÎ BEG, KURÊ ELÎ BEG :

Di sala 1005 ê koçî de ev mirov fermandarê hindama Mecenkurd bû û tişttekî hêja neketiye destê me, ko bi ser ve zêde bikin.

PERÇÊ DUWEM:

PERTİK

Ev hindam yek ji senceqên, ko di parvekirinê de ketibû destê Rustem Beg, kurê Pîr Huseyn Beg, kurê Hacî Rustembeg û ji wê rojê de ev hindam di destê neviyên wî de ye.

1- RUSTEM BEG, KURÊ PÎR HUSEYN BEG, KURÊ HACÎ RUSTEM BEG :

Piştî mirina bavê xwe bû fermandarê senceqa Pertik û piştî pêlakê serê xwe danî û sê kur Baysenqer, Mihemed, Elî bi şûn xwe ve hiştin.

2- BAYSENQER, KURÊ RUSTEM BEG :

Piştî mirina bavê xwe bû fermandarê Pertik. Mirovekî za na û şiyar û comerd û dilovan bû ristevanekî navdar û paye dar bû. Herwekû mosîqarekî bi deng û jîrek bû.

Gelek alav û çekên hêja li nik peyda dibûn, ko hêj li cem kesî peyda nebûne. Di çaxê Şerefxan de fermandarê Pertik bû, 1005.

PERÇÊ SÊYEM:

SEQMANA

Di çaxê Suleymanxanê Qanûnî de ev hindam kete destê dew letê û bû qada hemayûn û her sê kurên Pîr Huseyn Beg, bî navên Keyxesro, Keykawis, Keyperwîz, ko ji dêkê bûn bi zemet û teymaran dilxweş bûn, lê piştî, ko mezin bûn çûne cem padîşah û jê hêvî kirin, ko hindama Seqman bidî destê wan û bi fermaneke padîşah kete bin destê Keyxesro Beg, kurê Pîr Huseyn Beg.

1-KEYXESRO BEG, KURÊ PÎR HUSEYN BEG, KURÊ HACÎ RUSTEM BEG:

.. Pêlakê bi femandarî, serbilindî rabiward û paşê sê kur Salih Beg, Umer Beg, Qasim Beg bi şûn xwe ve hiştin û serê xwe danî.

2-SALÎH BEG, KURÊ KEYXESRO BEG :

Piştî mirina bavê xwe bû fermandarê Seqman û birayê wî Qasim Beg ji ber, ko derwêş û bêkêr û tiredînî bû doza fermandariyê nekir û li mala xwe rûnişt.

Lê birayê siyem, Umer Beg meger çehdan di rûre bi fermandariya birayê xwe dilxweş dibû jî, lê di dilê xwe de gelek jê nexweş bû û hergav dixwest ji xwe re rêkê peydakî ko li ber birayê xwe serê xwe hildî.

Dawî rojekê bi bêbextî birayê xwe kuşt û bû fermandarê Seqman û welat xiste bin destê xwe.

3-UMER BEG, KURÊ KEYXESRO BEG :

Birayê xwe kuşt û bi ser de dixwest jina wî jî li xwe mar bikî. Lê çawa pêşiya gotiye, şêr şêre çî jine, çî mêre jinbirê jê re erê kir û çend mirov ji berdest û mirov û peyayên xwe civandin û ji wan re got:

- Çawa hate mala min wî bikujin.

Ji lewra di şeva zavatiyê de ketin riya wî û di hindirwê bûkê de dane ber xencera û kuştin û bi vî rengî xatûnê tola mêrê xwe sitand û dijminê xwe kuşt.

Şêrejinê kurê xwey mezin bi xwe re bir û çûne cem padîşah, dergehê bilind û bi fermaneke şahanî welatê Seqman ji kurê xwe re sitand û vegehiyan mala xwe û ta bi sala 1005 ê koçî Keyxesro Beg, kurê wê şêrejinê fermandarê Seqman bû.

Lê her neh birayên di weke, ko Şerefyan Beg didî zanîn.

1-YÛSÛF BEG, KURÊ PÎR HUSEYN BEG :

Di wê parvekirinê de zeametêk bi 70 hezar aqçe kete destê wî, lê piştî mirina wî û ji ber, ko kordûnde çû ev zeametê kete destê hersên kurên Mihemed Beg, Mistefa, Zulfeqar Beg, Suhrab Beg.

2-MUHSÎN BEG, KURÊ PÎR HUSEYN BEG :

Zeametêk bi 70 hezar aqçe kete destê wî û piştî mirina wî her pênc kurên wî Îbrahîm, Cafer, Şêx Hesên, Murad, Eybe li xwe parkirin.

3- YAQÛB BEG, KURÊ PÎR HUSEYN BEG :

Zeametêk bi 40 hezarî kete destê wî û piştî mirina wî, her sê kurên wî Firox, Dûndar, Babo li xwe parvekirin.

4-KEYQUBAD, KURÊ PÎR HUSEYN BEG :

Zeametêk bi 50 hezar aqçe kete destê wî, lê ji welatê xwe derket û çû welatê Yemen û careke di vegehiya Îstanbolê û li wir serê xwe danî û Zahîd Beg, Mesîh Beg, Huseyn Beg, Îslam Beg her çar kur bi şûn xwe ve hiştin û çû.

- 5-KEYKAWÎS BEG, KURÊ PÎR HUSEYN BEG :
 Zeameteke biçûk kete destê wî û piştî mirina wî kete
 destê kurê wî Mistefa Beg.
- 6-PERWÎZ BEG, KURÊ PÎR HUSEYN BEG :
 Zeameta wî giha kurê wî Heyder Beg.
- 7-BEHLÛL BEG, KURÊ PÎR HUSEYN BEG :
 Zeameta wî bi çil hezarî kete destê kurê wî Mihemed Beg.
- 8- KULABÎ BEG, KURÊ PÎR HUSEYN BEG :
 Zeameta wî bi çil hezarî kete destê kurê wî Mihemed Beg
 û ev Kulabî Beg di şerê Çaldêran de hate kuştin û piştî mi
 rina Mihemed Beg kete destê kurê wî Elîxan Beg.
- 9- YELEMAN BEG, KURÊ PÎR HUSEYN BEG :
 Zeameta wî bi 20 hezar bûn û heta sala 1005 ê koçî jî
 di destê wî de bû.

1966.3.27 Mûsa Hesên

Cigerxwîn

FERMANDARIYA ŞÊRWAN

Şerefxan dibêjî, kalikê vê malbatê yek ji wezîrên mala Eyyûbin Silahidîn bû. Di sala 662 de çawa dawîya dewleta Eyyûbî hat yek ji wan hate Heskîfê û kalikê vê malbatê pê-re bû.

Herwekû di tarîxa Mufericilkirûb de navên Şerwe û Şerwîn hatine, ko herdû jî serdar û fermandarên dewleta Eyyûbî-Kurdî bûn û bi xwe Hekarî bûn. Gelek diriste kalikê vê malbatê yek ji wan herdû mirovan bî, yan yek ji zariwên wa bî, ji lewra navê wan bûye Şêrwan.

Şerefxan dibêjî, sê bira Îzidîn, Bedridîn, Îmadidîn hatine kufra, lê ew mirovê, ko ji wan navdare navê wî İbrahîm e.

1- İBRAHÎM :

Gelek diriste, ko Îzidîn bernavê Mîr İbrahîm bî. Mîr İzidîn İbrahîm pêlakê li Kufra fermandarî kir û paşê serê xwe danî û Mîr Huseyn, kurê wî kete şûna bavê xwe.

2- MÎR HUSEYN, KURÊ MÎR İBRAHÎM :

Mîr İbrahîm İzidîn, mirovekî navdar û bidenge û di dewleta Eyyûbî Kurdî de çend cara dizdar û fermandar navê wî Mîr İzidîn İbrahîm, kurê Şerwe yê Hekarî ye.

Mîr Huseyn pêlakê li hindama Şêrwan fermandarî kir û paşê serê xwe danî û pênc kur bi şûn xwe ve hiştin. Mîr Mihemed, Mîr Şah Mihemed, Mîr Mîrza Beg, Mîr Şemsidîn Beg, Mîr Meccidîn Beg.

Di saxiya xwe de Mîr Huseyn Beg welatê Şêrwan li zari - wên xwe parvekir û Şebistan da kurê xwe Kor Mihemed û Kufra da kurê xwe Mîrza Beg û Êrûn da kurê xwe Mîr Şemsidîn Beg û Awîl da kurê xwe Mîr Meccidîn Beg û Mîr Şah Mihemed, li şûna bavê xwe rûnişt.

3- MÎR ŞAH MÎHEMED, KURÊ MÎR HUSEYN, KURÊ MÎR ÎBRAHÎM, KURÊ MÎR ŞERWE :

Çawa bavê wî serê xwe danî ew kete şûna bavê xwe û li Kufra rûnişt û piştî birayê wî Mîr Meccidîn kordûnde serê xwe danî. Hindama Awîl jî bi ser xwe ve berda û piştî pêla kê serê xwe danî û çar kur bi şûn xwe ve hiştin. Mîr Mihemed, Mîr İbdal, Mîr Elî, Mîr İzidîn.

4- MÎR İBDAL, KURÊ MÎR ŞAH MÎHEMED :

Piştî mirina bavê xwe çend salan fermandarî kir û serê xwe danî û kurê wî Mîr Şah Mihemed kete şûna wî

5- MÎR ŞAH MÎHEMED, KURÊ MÎR İBDAL, KURÊ MÎR ŞAH MÎHEMED :

Di çaxê wî de Kurdistan kete bin destê Şah İsmailê Sefewî. Şahê Îran û diwazde mîrekên Kurdistanê xistin zindanê, tenê ev Şah Mihemed û Elî Begê Sasûnî li cem xwe serbest û gerdenazad hiştin û xistin nav serdarê leşkerê xwe û bi şah re dixwarin û vedixwarin û digeriyan û rûdiniştin û şah gelek rûmeta wan digirt, ji ber, ko zû çûne ser Ola qizilbaş û ji dil xwe sipardin şah heta kincê qizilbaş wer digirtin û xwe dixistin kirasê şah. Ji ber vê yekê Şah welatê wan nexiste bindestê bêgana û di bindestê wan de hişt piştî mirina Şah Mihemed Beg çar kur jê man Mihemed Beg, İbdal Beg, Elî Beg, İzidîn Beg û bi saxiya xwe welat li wan parvekir û fermandarî xiste destê Mîr Mihemed Beg û deh sala piştî vîqasî ma û serê xwe danî.

6- MÎR MÎHEMED BEG, KURÊ MÎR ŞAH MÎHEMED :

Piştî, ko sîh sal bi fermandarî rabiwardin birayê wî İbdal Beg li ber pozê wî rabû û doza femandariya welatê Şêrwan kir û Mîr Muhemed bi fermaneke Suleymanxan derebegî bi destê birayê xwe veberda û kete keheha Barkêr û piştî sale kê Şah İsmail hate ser Adilcewaz, Erdîş, Barkêr, ko di wê salê de zivistanê barekî giran ji sermayê bi ser welêt de berdabû û Şah İsmail sê meha ma û nikaribûtişteki bikî, lê Mîr Mihemed keheha Barkêr bi destê ecem ve berda û vegeriya İstanbulê, lê padîşah ew bi darvekir û kuşt.

7- MÎR İBDAL BEG, KURÊ ŞAH MÎHEMED BEG :

Piştî, ko birayê wî hate bi darvekirin welat bicarek xiste bindestê xwe, lê çawa Melek Xelîlê Hîzanî han ji İb-

dal Beg xwest bi leşkerê Şêrwan ve çû ser hîzanê û gelek ji peyayên Mihemed Begê Hîzanî kuştin û dextl û şînahiyên wa dane ber lingê hespa û bicarek pelixandin û Mîr Mihemed Beg û xelkê welêt çûne cem padîşah û giliyê wî kirin û padîşah ferman da Îskender Paşa, mîrê mîranê Wan û paşayê xwînaxwar Îbdal Beg bi fermaneke padîşah di zindana xwe de da kuştin û şeş(6) kur bi şûn xwe ve hiştin, Mihemed Beg, Zeynel Beg, Şah Mihemed Beg, Hacî Beg, Mehmûd Beg, Zulfe - qar Beg.

Lê padîşah welatê Şêrwan kire du perçe. Perçak xiste bindestê Sarûxan Begê Hezo û yek xiste bindestê Hesên Begê Gurnî.

8- MÎR MÎHEMED BEG, KURÊ ÎBDAL BEG :

Dema bavê wî hate kuştin zarok bû, lê çawa mezin bû çû Istenbolê û Selîmxan, hindama Kufrî bi fermanekê xiste bindestê wî û bi serbilindî vegeriya welatê xwe û bi dilşadî û kamîranî û xweşbextî di welatê xwe de fermandarî kir.

Tenê mirovekî serxweş û tolaz bû û herdem jinê ciwan û zarokên xweşik li xwe dicivandin û şerab û kebab û saz û a waz û govend û sazband karê wî bûn û bi wan re bi dilxweşî û şadîmanî derbas dikir. Lê piştî sê saladi nav cihê xwe de hate kuştin û çareke dî ev hindam kete destê Mîr Hesên Begê Gurnî.

9- ZEYNEL BEG, KURÊ ÎBDAL BEG :

Me da zanî, ko çilo birayê wî hate kuştin û welat careke dî kete bindestê Mîr Hesên Begê Gurnî û di wê çaxê de Zeynel Beg hêj zaro bû. Lê piştî, ko mezin bû çû cem padîşah û digel Senan Paşa û Elî Paşa, tevî hin derebegên Kurdistanê çûne şerê keleha Eqilbend û li vegerê Senan Paşa bi fermaneke hemayûnî welatê Şêrwan ji Hesên Begê Gurnî sitand û da Zeynel Beg û dilxweş û rûgeş vegeriya welatê xwe û sîh(30) salî bi camêrî û kamîranî di welatê bav û kalê xwe de fermandarî kir û paşê serê xwe danî.

Mirovekî zana û zanaperwer bû, bi mezinahî hînî xwendinê bûbû. Pênc kur bi şûn xwe ve hiştin. Îbdal Beg, Xelîl Beg, Mihemed Beg, Mehmûd Beg, Suleyman Beg.

10-MÎR ÎBDAL BEG, KURÊ ZEYNEL BEG :

Mirovekî zana û hêja bû, li ser gotina bavê xwe şûna wî sitand û ta bi sala 1005 ê koçî fermandarê welatê Şêrwan bû.

FERMANDARÊN GURNÎ

Herwekû me derbas kir, çawa Mîr Huseyn di saxiya xwe de welatê xwe li zariwên xwe parvekir, keleha Şebistan da kurê xwe Kor Mihemed Beg û di sala 1005 ê koçî de Zeynel Beg kurê Suleyman Beg ji vê malê fermandarê vê hindamê bû, bi zeamet tê de rûniştibû.

Sê kurên Suleyman Beg têne xuyakirin, Zeynel Beg, Hesên Beg, İbdal Beg. Zeynel Beg şûna bavê xwe girt û Hesên Beg, carna dibû fermandarê Kufri û İbdal Beg li cem birayê xwe Zeynel Beg rûniştiye.

Zeynel Beg, Axakîş bi senceq sitandiye û Gurnî daye kurê xwe, Mîr Şerefhan gelek pesnê wî didî.

FERMANDARIYA ERÛN

Mîr Huseyn keleha Êrûn dabû kurê xwe Şemsidîn û di sala 1005 de ev hindam di destê Mîr Melek, kurê Mîr Hesên neviyê Mîr Şemsidîn deye, bicamêrî û huşyarî hindama Êrûn li hevradigrî û bi kamîranî radibiwêrî û bi serfirazî jîna xwe derbas dikî.

JÎ TARÎXA NAVDARÊN KURD: HUSEYN, HUSNÎ MUKRİYANÎ

1- Xan İBDALXANÊ CİHANBEGLÜ :

Bajarê Sar ji welatê Xerasan, peytexta vê ferdandariyê bû û ji bav û kalên xwe de ev malbat ferdandarê vê hindamê bûn.

Xan İbdalxan, mirovekî rûmetmend û aza û gernas bû xwe dî leşker û keleh û dewlet bû. Kerîmxanê Zendî, Şehinşahê, Îran ev Xan İbdalxan bi ferdandarî naskiribû û Xan İbdalxan cihekî bilind di nav dewleta kurdên Zendî de girtibû Teqîxanê Zendî, ko ji ber Kerîmxan ve ferdandarê Rey-Taran bû girêbend û peymanî navbera Kerîmxan û Xan İbdal de şikand û dest bi sergêjiya kir û çavên xwe berdane welat û derebegiya Xan İbdal û çiqas Xan İbdal xwest, ko pêre bidilxweşî derbaskî, lê çare nedît û naçare ala serxwebûna welatê xwe di riwê dewleta Zendî-Kurdî de hilda û serbixwe rûnişt.

Lê di sala 1193 koçî de Kerîmxan serê xwe danî û Aqamihe med, kurê Hesexanê Qacarî ji Şîrazê bazda û hate bajarê Rey-Taran û hana xwe bire Xan İbdal da, ko wî biparêzî û xanê kurd bi leşkerekî giran ve hate hana wî û şerê kurdên zendî kir û bajarê Rey ji teqîxanê Zendî sitand û da destê Aqamihemê Qacarî û ev tenê bese, ko kurde.

Lê Murtedî-Qulîxanê Qacarî bi leşkerekî giran ve hate şerê birayê xwe û Xan İbdalxan bi leşkerekî mezin ve hate

hewara Aqamihemed û Qulîxan şikand û Mistefaxan, birayê Murtedaqulîxan di vî şerî de hate kuştin û kurdên Cihanbeglû talanekî bêjimar xistin destê xwe û Xan İbdal serbelend û payedar vegeriya Sar û leşkerekî mezin ji xwe re da hev û saz û tekûz kir.

Di sala 1195 koçî de birayên Aqamihemed bihev re û di bajarê Barfiroş de hawîr Aqamihemed girtin û agir berdane xaniyên wî û Xan İbdal bi leşkerekî giran ve hate hana Aqamihemed û ji remiyên agir parast û deranî û xanê kurd bî cengawerî leşkerê turkman şikand û bi zor Mihemed kire pa-dîşah û Xanzadeyên Qacarî girtin û xistin zindanê.

Lê piştî şikestina leşkerê Qacar, Murtedaqulîxan û Caferqulî û Mistefaqlî bi leşkerekî bêjimar ve çûne ser xanê kurd û li ser bajarê Sar şerekî xwîndar û dijwar destpê kir û Xan İbdal bi 700 siwarî ve çû pêşiya leşkerê dijmin, lê leşkerê kurd perîşan û şerpeze şikest û perakende vege-riya nav baje, lê Xan İbdalxan zû xwe pêkanî û karê xwe û şerekî mezin kir û di sariya sibê de bi ser dijminê xwe de girt û gelek ji wan kuştin û vegeriya nav baje.

Lê cara siyem xanê kurd xwe li ber leşkerê Qacarî negirt û bixwe bi dîlî kete destê dijmin û bi bend û zencîra girêdayê ajotin zindanê û Murtedaqulîxan, paytexta xanedanê kurdên Cihanbeglû xist destê xwe û paşê Xan İbdal kuştin û serê wî bi diyarî ji Aqamihemed re şandin. Tarîxa Qacar, perçê yekem, rûpel 19-21.

2- SADIQXANÊ ŞIKAKÎ :

Fermendarê hindama Serab, ji welatê Azerbaycan bû, miro vekî hêja û hinermend û serdar bû. Ji çaxê dewleta Efşa î de fermendarê vê hindamê bû û dewleta Kurdên Zend jî li ser vî awayî pêre peyman û girêbend girêdan.

Di sala 1205 koçî de Qacaran dest bi sergêjiyan kirin û xwestin, ko welatê Azerbaycan bicarek bixin bindestê xwe û ji bo vê yekê leşkerekî mezin şandin ser bajarê Serab, Paytexta Sadiqyan. Lê Sadiqyan xwe negirt û bi hezar dijwarî, xwe gihande Qerebax û leşkerê Aqamihemedxan, bajarê Serab tar û mar kir û vegeriya Erdebîl. (Rûpel 32).

Lê çawa Sadiqyan dî, ko mayina wî li cem İbrahîm Xalîl-xanê Qerebaxî jê re tiştêkî nakî, çend birayên xwe rêkirin cem Aqamihemedxan û li hevhatin û careke dî vegeriya welatê xwe, lê dawî bû serdarê leşkerê Aqamihemedxan û nêzîkî çar sala bi vî awayî rabiward, tenê Sadiqyan di bin rê ji xwe re hevalbend çêdikirin û berebere leşker li xwe dicivand.

Herwekû Sadiqyan, bi serdariya leşkerê Qacarî çû ser we

latê Xerasan sitand û vegeriya welatê xwe û karê xwe dikir ko herî ser keleha Pene-ava û Aqamihemedxan bi leşkerekî giran ve dihate ser xanê Şikakî, lê Sadiqخان du kurdên ger nas jê re kar kiribûn, ko wî bikujin. (Rûpel 45).

Herwekû di sala 1212 koçî de herdû kurdên gernas bi dizî ketin binê çadira Aqamihemedxan û serê wî jêkirin û bi diyarî ji xanê Şikakî re pêşkêş kirin.

Lê Sadiqخان bi koçemal wê şevê bazdan û çûne Iraqê, lê çawa sipîdê leşker bi kuştina Aqamihemedxan agah bû destê deste reviyân û hatin cem Sadiqخان û xanê kurd bi leşkerekî giran ve çemê Aras derbas kir û Şikak gihandin xwe û bajarê Tebrîz xiste destê xwe û birakî xwe tê debi fermandarî danî û Caferxanê birayê xwe kire fermandarê Qerebax û Azerbaycan bicarek xiste bindestê xwe û bi leşkerekî mezin ve berê xwe da bajarê Qezwîn û birayên wî çûne ser keleha Xoy, lê çiqas xanê kurd hawîr bajêr talan kir, ewqas xelkê nav bajêr xwe asê kirin.

Herwekû di wê navê de Feteh Elîxan bû padîşahê Îran û leşkerekî mezin şande hana xelkê Qezwîn û Sadiqخان naçare berepaş şikest û vegeriya welatê xwe. Herwekû ji alîkî di ve birayên wî nikaribûn bajarê Xoy bigrin û çawa bihîstin, ko Sadiqخان şikest, Azerbaycan berdan û hatin Serab û paşê Sadiqخان bi fermandariya Serab qîma xwe anî û kete bindestê dewleta Qacarî û rûnişt.

Tenê di sala 1213 koçî de Caferqulîxanê Dinbilî (Kurdî), çû cem Feteh Elîxan û fermandariya Azerbaycan ji xwe re jê sitand û berê xwe da bajarê Tewrêz û Sadiqخان ji tirsarê reviya û xwe avête nav Şêrwan, lê Caferqulîxan jê re şand û bi sûnd û peyman ew vegerand û herdiwa bi dizî destê xwe dane hev û ji bo dijminahiya pêkanîn. Lê Hesenqulîxanê Evşarî kurdî bi dizî xwe gihande Feteh Elîşah û li Taran ev serpêhatî bi darvekir û got û Feteh Elîşah ew kire fermandarê bajarê Ormî û şande Azerbaycan. (Rûpel 50-51).

Lê Sadiqخان digel Huseynqulîxan bi hev re çûne ser bajarê Ormî û sitandin û dane destê Huseynqulîxan û Şah Feteh Elîxan bi vî awayî gelek dilxweş bû û gelek diyarî û perwa dane Sadiqخان û bire Taran. (Rûpel 58).

Lê piştî pêlakê Feteh Elîşah bi serdariya Sadiqخان leşkerekî giran şande ser welatê Xerasan û şerê Memeşxanê kurdî û çawa Memeşxan hate pêrgî dijminê xwe, Sadiqخان jê re şand û got:

- Xwe mespêre destê min, naçare gere ezê te bikujim. (r.58)

Memeşxan berê xwe da bajarê Meşhed û Sadiqخان bajarê Çi naran xiste destê xwe û Feteh Elîşah, jê re şand û got :

- Dixwazim zû ji Çinaran derkevî. Lê Sadiqخان jê re şand û

got :

- Dixwazim Elahverdîxanê Qelîç bişênî cem min û şahê navdar Elahverdî jê reşand.(r. 55).

Lê çawa Elahyarxan ji Taran derket di keleha Aqkela de asê bû û ala serxwebûnê hilda û ji nûve Feteħ Elîşah leşkerê xwe kişande ser û Sadiqyan berê xwe da welatê xwe û kar û bara şerekî mezin kir û xwe tekûz kir.

Sadiqyan ta bi sala 1215 koçî jî di welatê xwe de fermandar û serbixwe rûniştî bû, lê di vê salê de Şahzade Ebasmîrzayê Qacarî ji hawîr Îran leşkerekî giran da hev û hate ser Sadiqyan û sê mehan şerên dijwar û xwîndar li ser hev dirêj bûn, lê mexabin, ko Sadiqyanê Şikakî di meydana şer de hate kuştin.

Lê piştî kuştina Sadiqyan, Ebasmîrza Sarûxanê birayê Sadiqyan kire fermandarê Serab û Mihemed Elîsultan birayê bîçûk, bi navê Xan serfiraz kir û kire serdarê leşkerê xwa û ev axa, ko çend sedsal kurd têde fermandar bûn, kete bindestê Qacaran û kurdên, ko ketibûn nav leşkerê Qacar paşê û berebere bûn qizilbaş û xwe windakirin û pirên wa bûne cotkar û li gundên Kurdistanê rûniştin û li welatê Mukrî, cîgirtin û kêr ji wan mane, ko pez û sewal, xwedî dikin û li zozan û germiyana bigerin.

3- MEMEŞXANÊ EMÎRAN, JÎ KURDÊ ZAFERANÎ :

Ji bav û kalê xwe de fermandarê Çinaran bûn û Memeşan, serê xwe ji Qacaran re dananî û her û her serbixwe jîneke mêrane radibward.

Çawa, ko di serpêhatiya Sadiqyanê Şikakî de me derbaskî riye di sala 1213 koçî de Sadiqyan bi leşkerekî giran ve hate ser Çinaran û bidizî ji Memeşan re şand û got :

- Zinhar xwe nespêrî destê min. Ji lewra Memeşan Çinaran berda û çû bajarê Meşhed, lê piştî Sadiqyan bajarê Çinaran berda û hate welatê xwe. Memeşan xwe gihande Çinaran û serbixwe fermandarî kir û xwe ji bo şerpêkanî û karê xwe kir.

Lê di sala 1217 koçî de Feteħ Elîşah, bi serdariya Husaynaxanê Qacarî leşkerekî mezin şande ser Memeşan, lê şerpeze, perîşan, pozşikestî vegeriya û Memeşan bi serbilindî di welatê xwe de ma.(r.64)

Ev Memeşan ta bi sala 1228 koçî jî serbixwe, gerdena - zad femandariya welatê xwe dikir, lê çawa Yûsifxwaceyê Kaşxerî li Xeraskan kurd û turkman li xwe civandin û li ber Qacariya serê xwe hilda. Memeşan, naçare alîkariya wî kir û ji kurdên zaferanî ji xwe re leşkerek pêkanî, lê Yûsif - xwace dest bi talan û xwînrijandina kurdên rafidî kir û Feteħ Elîşah bi serdariya Mihemed Welî Mîrzayê Qacarî leşker-

rek şande ser û Yûsifxwace şikest û kurd li herdû .rexan tar û mar bûn û Memeşxan di vî şerîde bi dîlî kete destê We lîmîrza û bi hezar û pêsed mirovî re şandin Taran û bica rek kuştin.

4- MUSTEFAXANÊ TALÎŞ :

Di çaxê dewleta Zendî-Kurdî de gelek payedar û serfiraz bû. Lê çawa padîşahiya kurd konê xwe pêça û welatê Îran se ranser kete destê Qacaran, Mihemedaqayê Qacarî, şahê Îran bi serdariya Can Mihemedxanê Qacarî, leşkerekî mezin şande ser Taliş û şerekî giran di navbera kurd û Qacaran de destpêkir û leşkerê Qacar şerpeze şikest û talanekî mezin kete destê kurd.

Lê di sala 1209 koçî de Aqamihemed, ji bo girtina welatê İbrahîm Xelîlhanê Ciwanşêrî bi serdariya Mustefaxanê Qacarî, leşkerekî giran şande ser kurdên Taliş û Mustefaxanê Talişî bi mal û mindal û hogir û hevalên xwe ve ketin gemiyekê û ber bi Salyan ve reviyar, lê xelkê Salyan ji tirsê ew nexistin nav bajêr û kurdên Taliş di gemiyê de çavneriya dijminê xwe kirin û hîna xwe di navçiyar de veşandin û qacaran zor dane dijminê xwe û gelek ji mezin û 200 mirov bi wan re ji gemiyê derxistin û dîl kirin û bi diyarî şandin Taran û Aqamihemed ew ji hev perçe kirin. Hin ji wan şandin Erdebîl û hin rêkirin Mazenderan, tenê Şahnewazxanê kurê Şah Pilingxan bi diyarî û perwa serfiraz kir û berda. (r.38).

Lê paşê biçûn û hatina xêrxwazan paşê Mustefaxan û qacarî li hevhatin û di bin siya Qacaran de Mustefaxan vegeerîya welatê xwe û bû fermandarê kurdê Taliş.

Herwekû di sala 1220 ê koçî de Mustefaxan bidizî bi Rûsa re peymanek girêda û çek û bosatê şer ji xwe re ji wan kirin û roj bi roj xanê kurd gavên xwe berepêş avêtin û keleh û derbend û çeperên xwe asê kirin û xwe pêkanî.

Lê di sala 1222 koçî de Mustefaxan ji Rûsa xeyidî û naçare digel Naibiseltene Ebbasmîrza doza lihevhatinê kir lê Mustefaxan nizanibû, ko rûs û ecem li serbûne yek û hawara xwe bire qacara, lê di hana wî nehatin û Naibiseltene Pîr-qulî bi dizî rêkire nav kurdên Taliş û kaxetek di nav wan de belav kir û got :

- Ez dixwazim bi carek ji pey Mustefaxan vegeerin û gelek ji wan kurdan vegeerandin, lê çawa Mustefaxan ev bihîst, si vik bi Rûsa re lihevhat û çend hezar ji leşkerê Rûs anîn nav xwe, lê çawa Naibiseltene ev bihîst leşkerekî giran bi xwe re hilanî û hate ser kurdên Taliş, lê dewleta Rûs leşkerê xwe kişande ser sînorê Ecem û Ebbasmîrza naçare bipaş-

de vegeriya û di sala 1223 de çend şerdi navbera rûs û Ece man de çêbûn. (r. 92-101).

Lê di sala 1224 koçî de Ferecilahxanê Hevşarî ji bo çûna ser Mustefaxan hate Erdebîl û bi şah Nezerelîxanê Şahsi wan ve fermanarê Erdebîl ji bo lihevhatinê çûn û hatinek dinav wa û Mustefaxan de çêbû û ji bo berberiya Qacaran li hevhatin û di wê navê de Mustefaxan mal û leşkerê xwe şandî bûn keleha Gamêşan û Mîr Huseynxanê kurê xwe jî bi wan re rêkiribû, bi leşkerekî ve şandibû ser Huseyn Elîxanê Makoyî û Mîr Huseynxan di vî şerî de Elîxanê rûdbarî û Haşimxanê Şêrwî û Mihemedxanê Şêrwî girtin û vegeriya Taliş, lê di wê navê de leşkerê qacaran kete bajarê Lengeran, paytexta Taliş û xan û malê Mustefaxan bicarek talan kirin û vegeriyan.

Mustefaxan, Mîrhidayetê kurê xwe şande cem Mustefaxanê Şêrwan û bi dilxweşî lihevhatin û hezar mirovên bi tiving, jêre rêkirin.

Herwekû di van nava de Mihemedxanê Hozarî, serleşkerê Qacar hate ser Mustefaxanê Taliş, lê pozşikestî vegeriya. Nâçare Feteħ Elîşah, serekwezîr naibiseltene şande Taliş û li bajarê lengeran bi diyarî mîrxanekevnê pismamê Mustefaxan ket û ji bo lihevhatinê şande kelehe Gamêşan û cara di wem ew bixwe çû cem Mustefaxan û konaxan bixwe re bir û bi diyarî Mustefaxan ketin û bi dilxweşî lihevhatin û serekwezîr vegeriya Taran, lê meger çenda lihevhatin jî tenê Mustefaxan peyman navbera xwe û rûsa neşikand û di sala 1227 koçî de Naibiseltene Ebbasmîrza, Kazim pismamê Mustefaxan û Feteħşaşmelaelî rêkirin cem Mustefaxan da ko destê xwe ji rûsa berdî, lê Mustefaxan herdû jî destevala vegerandin û Mustefaxan navbera xwe û rûsa gelek xweş kir û êl û mirovên xwe li hawîr xwe civandin û çek û bosatên hîja ji hevalbendê xwe kirîn û karê xwe û rojeke giran kir. (r. 104).

Çar salan şer û kuştin di navberarûs û qacar de ji pingava Qezwîn ta bi Qars û Erdehan destpêkir û Mustefaxan weke hevalên Şêrwan, Ciwanşêr, Cibiran li serhev şer bi qacaran re dikir. Geh xuht û geh di serê çiyayên xwe de asê dibû û kurdên gernas bi mêranîli ber xwedidan.

Herwekû di sala 1228 koçî de Napilyon û Qeralê Rûs bûne dijminê hev û karê xwe û şer kirin û ji tirsê rûsa doza lihevhatinê li qacaran kir û bi alîkariya sefirê Îngilîz herdû dewlet lihevhatin û Naibiseltene ev lihevhatin ji xwe re pîroz dî û kar û barê xwe û şerê Mustefaxanê kurdî kir û bi leşkerekî giran ve bi serde girt.

Lê Mustefaxan berê karê kiribû û derbend û kelehên xwe asê kiribûn û çavnêriya dijminê xwe dikir û dipêjinî û

kurê xwe Huseynxan şande pêşiya dijminê xwe û gemiyên şer ji Gamêşan berdane ser avê û şer destpêkir û ji herdû rexan bi topan gulebaran û agir hate dadan û çend serok ji rûsa hatin kuştin, lê leşkerê dijmin bi paş de'eviya û di çend kelehan de asê bûn û kurd li hawîr wan hatinhev û Eb-basmîrza Sadiqxanê kurê Necefyanê kurdê Gerosî û Mâster-lezê sertop û Mâster Kemîdektorê İngilîzî şandine cem ceneral Redîşcof ji bo, ko lihevben, lê General tiştê nedê destê wan. (r. 126).

Li ser vî şerî Rûsa kurdên wa nava bicarek biçek û cebilxane kirin. Qulîxanê Dinbilî, Mustefaxanê Talişî, Mustefaxanê Şerwî, Caferqulîxanê Cibirî bi rêzli Qerecebox, Qeredax, Êrwan dest bi kuştin û talana kirin û naçare Feteħ Elîşah ji Taran derket û bi leşkerekî giran ve berêxwe dane meydana şer û ew ecemên, ko di kelehan de asê bûbûn li Tewrêzê bi perîşanî gihane hev û Mustefaxan ew kelehên xurt û asê bicarek xistin destê xwe û welatê xwe ji qacaran paqij kir û gelek talan ji wan sitand. (r.138).

Lê divê salê bixwe de li Koltan, li qiraxa çemê Zêwe di hima Qereboxê de peymanek di navbera Rûs û Eceman de hate nivîsandin û îmzakirin, ko di mada diwem de hatiye sozdan, ko welatê Talişebîl û heta Enzelî xanedanê kurd bî û dibin destê herdû dewleta de bijîn û dewleta Rûs sûnd xwar, ko paşmêrê wa bû muhendisa sînorê Rûs û Ecem danîn û Mustefaxan karê xwe û dewleta xwe kir. Herdû salan ev hindam gelek xweş û ava bû û leşkerê kurd li ser pirojeke rûsî hînî her tiştî bûn û serdar û zana û mirovên hêja rûsa di nav wan de hiştin û Mustefaxan ta bi sala 1230 koçî bi gerdena zadî û serbilindî di welatê xwe de ma, lê di sala şerê mezin de, ko ji welatê xwe derketin, bi nexweşiyê serê xwe danî û Mîrhuseyn û Mîrhesen û Ebbasbeg sê kurên hêja bişûn xwe ve hiştin û koça xwe barkir û çû.

5- MÎR HUSEYNXAN, KURÊ MUSTEFAXANÊ TALİŞ :

Piştî mirina bavê xwe bû fermandarê welatê Taliş, lê za riwên wî li hev nekirin û di nav wan de sergêjî û berberî destpêkir û Hesexan xwe gihande serdarê Rûs li Azerbaycan lê ji ber, ko navbera Rûs û Eceman gelek xweş bû serdarê Rûs ew da destê Ecem û Eb-basmîrza ew da destê Qulîxan, Sadloyî, fermandarê Xilxal. Lê Hesexan xwe ji nav destê wî derxist û hate welatê xwe û leşkerekî giran ji xwe re dahêv û dest bi şerê rûsa kir û bajarê Lengeran xiste destê xwe û ajote ser bajarê Ergewan û ew jî bi şer ji destê rûsa deranî.

Hesexan, welatê xwe bicarek ji destê rûsa derxist û a-

la gerdenezadî hilda û leşkerê xwe saz û tekûz kir, lê li ser xeyda Rûs, Mîrza Ebbas leşkerekî bi xwe re anî û hate ser û ji Tewrêzê leşkerekî giran rêkire ser Hesexan û şer û kuştinê destpêkir. Ji alîkî dî veserdarê Rûs Mustefaxanê Şêrwî û Mihemed Huseynxanê şibi leşkerê Şek û Şêrwan ve di leşkerê Gurcistan bi top û leşkerê xwe ve şandin ser Huseynxan û li rê Hacî Mihemedxanê ciwanşêrî kurdî ajote ser Huseynxan, lê Mihdîqulîxan bi Huseynxan re li hevhat û her dî bi leşkerên xwe ve çûne ser Mustefaxan û hevalên wî û du leşkerên kurd weke dêwên çiya bihevketin û gelek ji hev kuştin. Çawa, ko ji kevnare de eve şop û rêça milletên bîndest û nezan, wek milletê kurd.

Fetehelîşah, ev dijminahiya navbera Kurd û Rûs ji xwe tiştêkî pîroz dî û nema bi serdariya Suleymanxanê Geylanî, leşkerekî mezin rêkire arîkariya Hesexan û ji rûsa gelek hatin kuştin û welatê Mustefaxanê Şêrwan bicarek kete destê Mustefaxanê Talişî û heta keheha Salyan, paytexta Şêrwan jî bi şer kete destê Talişî. (r.194).

Mîr Hesexan bi gernasî û mîrxasî di wê hindamê de deng da û bi pêşve çû û misilmana jêre digot, Esbeqilmucahidîn, ji ber, ko şerê rûsa dikir.

Navbera Hesexan û Eceman gelek xweş bû û bi femandariya Mîr Hesexan hate navkirin, lê Mustefaxanê Şêrwanî û Huseynmihemedxanê Şekî, welatê xwe careke dî ji Qacaran si-tandin û dibin destê rûsa de careke dî bûne femandarê welatên xwe û paşê Mîr Hesexan bi kurdên Şek û Şêrwan ve li hevhat.

Lê bivî awayî çar pênc sal derbas nebûn careke dî rûsa xeydnamak ji ecema re rêkirin û gotin:

- Me Hesexan girt û da destê we, ko careke nema karibî dewletekê lidarxî, lê niha vaye em dibênin, ko roj bi roj bêtir sitûr dibî û berepêş diçî û ditirsin rojekê êrîşî Qafqasya bikî, ji lewra dixwazin win çarekê tê bikin, ko dilê me ji hev nemînî, lê eger win tenê nikarin em dikarin alîkariya we bikin.

Li ser vê daxwazê Mîrza Ebbas leşkerekî mezin ajote ser Hesexan û Rûsa ji paşve leşkerekî têr çek û barxane ajote ser welatê Talişî û Hesexan naçare welatê xwe berda û çû Enzelî û Geylan û di sala 1245 koçî de çû Mazenderan û ji wir çû Taran.

Lê rûsa gelek dixwest, ko Qacar Hesexan bidin destê wa lê Fetehelîşah wilo nekir, tenê Hesexan bi nexweşî serê xwe danî û ji destê herdû dijminê dijar dûrket. Û ji wê rojê de welatê Talişî di nav Rûs û Eceman de hatiye parvekirin. Enzelî û pingava Qezwîn ketin destê Rûs û Erdebîl jî

Ecema re ma û navê dewleta kurd ji riwê çugrafiya hate hila-
lanîn.

6- MÎR İBRAHÎM XELÎLXANÊ CIWANŞÊRÎ :

Xanedanê Ciwanşêr, di hindama Qerebax(Qerecedax) de fer-
mandarî dikirin û di nav derebeg û fermanarên Kurdistanê
de navdar û bi deng bûn û di çaxê dewleta Zendî-Kurdî de
Xelîlخان weke heval û hogirên xwe bi Zenda re li hevhat.

Lê çawa qacaran welatê İnan xistin bindestê xwe İbrahim
Xelîlخان serê xwe ji wan re dananî û di sala 1207 koçî de
Aqamihemedخان jêre şand û doza lihevhatinê lêkir, tenê İb-
rahîmخان Xelîlخان bi hişkî bersiva wî da û guh neda goti-
na wî.

Ji lewra Aqamihemedخان şeş hezar mirov rêkirin şerê wî
û ev leşker bi serdariya Nîzamidewle Suleymanخان bû, lê İb-
rahîm Xelîlخان lihevhatin ji şer xwestir dî û pismamê xwe
Ebdîsemedbeg ji bo lihevhatinê rêkire Taran, lê Murtedaqu-
lîخانê Qacarî li rê û piştî şerekî xwîndar û dijwar Ebdîse
medbeg bi birîndarî girt û serê wî jêkir û şande Şîraz û
Xelîlخانê kurd çawa ev serpêhatîya nexweş bihîst naçare be-
rê xwe da bajarê Tiflîs û bi Rûsa re peymanek girêda.

Herwekû ji alîkî dîve kurdên Şêrwan, Şemaxî, Qubbe, Der-
bend bi dostanî kirin hevalbendên xwe û sûndê mezin ji hev
re xwarin û li Eceman ya xwe kirin yek.

Lê Aqamihemedخانê Qacar leşkerekî dî bi serdariya Mîrza
nûrîesedخان şande ser kurdên Ciwanşêr. Çawa, ko İbrahim Xê-
lîlخان jî cî û derbend û keleh û çeperên xwe gelek xurt û
asê kirin û ji mêr û barxanê dagirtin û li ser herdû rexê
Pira Xudaaferîn li ser çemê Aras top danî û xwe ji bo şer
û lêdanê re pêkanî.

Tenê leşkerê Qacar her çende kurdan xwe gelek asê kiri-
bûn jî lê bi şer xwe gihandin ser pira Xudaaferîn û bi zor
girtin û ji nû ve avakirin û Aqamihemed bixwe dî veşerî de
giha ser pirê.

Ji herdû aliya şer destpêkir û leşkerê Qacaran di kele-
ha Penahava de gihanehev û asê bûn û Xelîlخان bi gernasî
şer dikir, lê çawa Aqamihemedخان dî, ko bi şer nikarî xanê
kurd bindest bikî, hin mirovên mezin û zana ji bo lihevha-
tinê şandin cem Xelîlخان û ji alîkî di vî şeş hezar siwar
şandin ser birazayê wî û girtin.

Lê çawa İbrahim Xelîlخان ev bihîst bêtirliber xwe da û
şerê mezin û dijwar ji nû ve destpêkir. Tenê Aqamihemedخان,
biraziyên wî jê re bi diyarî rêkirin û doza lihevhatinê kir
û piştî, ko lihevhatin qacarî veşerîyan.(r.39).

İbrahim Xelîlخان piştî vî şerî careke dî xwe tekûz kir

û leşker' gihandehev û pêkanî û peymaneke xurt û ji dil nav
bera xwe û Rûsa de çêkir û ji bo hînbûna topavêtin, zana û
serok û topçiyên rûsî anîn welatê xwe û leşkerêkî bi rist
û destûr kazkir û di sala 1212 koçî de imperatorê Rûsiya
serê xwe danî û karbidestên rûs bicarek vegeyriyan welatê
xwe û Îbrahîm Xelîlخان piştî, ko dest bi kar û barê dewle-
tê kir û xwe ji her awayî ve pêkanî

Aqamihemedxan, şahê Îran ji bo girtina welatên Faliş,
Şêrwan, Qerebax leşkerêkî giran gihande hev û ber bi Erde-
bîl ajot û Îbrahîm Xelîlخان ji tirsra pira Xudaaferîn wê -
ran kir û şikand û asêgeh û derbendên xwe ji kozik û cepe-
ran dagirtin û karê xwe û şerekî giran kir.

Lê çawa Aqamihemedşah dî, ko pir hatiye şikandin bi ke-
leka leşkerê xwe derbaskir, lê gelek ji wan bi avê de çûn
û çawa Îbrahîm Xelîlخان dî, ko nikarî şerê dijminê xwe bi-
kî, tevlî mal û zarok û leşkerê xwe ve çûne nav kurdên Şe-
kî û Qacarî bê şer ketin nav keleha Penahava û xwînrêjî û
talan û berdîberdan li nav kurdên belengaz hatin barandin
û mal û can û namûs bicarek ketin bin linga. Qacara, Turk-
mana bi serê rima zikê jina diçirandin û jin û mal û zarok
direvandin û gelek mal hebûn, ko kordûnde bûn.

Lê herwekû di serpêhatiya Sadiqxanê Şikakî de hatiye go-
tin: Du kurdên gernas û çeleng dilşewat bi şev ketin çadî-
ra şah, êvara yekşemê, bîstê meha Zûlhicê di sala 1212 ko-
çî de bi dizî ketin çadira Şahê Îran û Aqamihemedşah kuş-
tin û tola zar û zêrçên xwe jê sitandin û serê wî jêkirin
û bi diyarî ji Sadiqxan re şandin.(r.45).

Lê çawa Aqamihemed hate kuştin Îbrahîm Xelîlخان bi leş-
kerê kurd ve da ser piştê leşkerê Qacar û gelek ji wan kuş-
tin û taianekî bêjimar, giranbiha kete destê kurd û serfi-
raz vegeyriya paytexta welatê xwe û dest bi karê dewletê
kir.

Lê di sala 1213 koçî de Feteħ Elîşah, leşkerêkî giran
bi serdariya Huseynqulîخان İzziddînlû şande ser kurdên Ci-
wanşêr, lê pozşikestî şerpeze bi şûnde vegeyriya û divê sa-
lê bi xwe de Feteħ Elîşah hîmê dostanî dinavbera xwe û Xe-
lîlخانê kurd de avakir û femandariya Ciwanşêr ji rexê Fe-
teħ Elîşah ve li Îbrahîm Xelîlخان ji nû ve hate pîroz kirin
û nîşan û perwa û diyarî ji xanê kurd re hatin şandin û E-
bûfeteħ bi navê Xan hate pîroz kirin.(r.5-62). Ū di sala
1215 koçî de Feteħ Elîşah, Hesexanê Qeregozlû şand nik İb-
rahîm Xelîlخان û keça wî ji şahê Îran re xwest û bi xwe re
anî.

Lê Qacara bi vî rengî qîma xwe nanîn û herdem sergêjî ,
diafirandin û dixwestin vê dewletê winda bikin, ji lewra

Xelîlخان dî di xew re neçû bû û dostaniyeke mezin û xurt bi Rûsa re girêda û top û serdarên leşkerê rûs anîne nav xwe û Feteħ Elîşah ev dostanî ya Kurd û Rûs ji xwe re bêqî doşî didî û jî lewra bi serdariya Mîrza Ebbas Naibiseltene leşkerekî giran şande ser welatê kurdê Ciwanşêr û Xanê kurd, Caferqulîxanê neviyê xwe û Fedil Elîbegê Ciwanşêrî şandin bajarê Gencê û han û hewar ji Rûsa xwestin û bi xwe re top û leşker û barxanake mezin anîn û hatin keleha Şûş û Xelîlخان, Mihemedhesenê kurê xwe digel leşkerê Qerebax û Rûs rêkirin ser pîra Xudaaferîn û leşkerê Qacar bi serdariya İsmâilxanê Damxanî û li ser pîrê herdû leşkerên mezin dirêjî hev kirin û leşkerê dijmin şikest, lê zû Ebasmîrza, pêre giħan hev û zor dane kurda û çawa şev bi ser wan de hat kurd veġeriyān keleha Şûş û leşkerê Qacar berê xwe da keleha Penahava, paytexta Ciwanşêr û İbrahîm Xelîlخان karê xwe û şer kir.

Gurgîn- Ponîk û Kitilrawiskî herdû fermandarên Rûs ji bajarê Gencê derketin û sivik hatin hana kurd û êrîşî ser pîra Xudaaferîn kirin û gelek ji navdarên Ecem di vî şerî de hatin kuştin û naçare Feteħ Elîşah, Huseynqulîxanê Damxanî bi şeş hezar peya ve şande hana Mîrzaebbas û leşkerê rûs şikandin û di keleha Ternave de asê kirin. Polonîk sê caran di vî şerî de birîn bû, lê Eceman hawîr kelehê girtin û şerên dijwar destpêkirin û dawî naçare Rûsa keleh ji Qacaran re berdan û reviyān Gence. (r.66-67).

Lê İbrahîm Xelîlخان, pîra Xudaaferîn girt û leşkerekî giran rêkire pêrgî leşkerê Feteħ Elîşah û Textetawis ji destê dijmin derxist û keleha Penahava ji leşkerê kurd da-girt û hawara Rûsa bi xurtî jê re hat û leşkerê Qacar şikandin û naçare Feteħ Elîşah bi wan re lihevhat û veġeriyā Tāran-Rey. Ji bo dilxweşiya navbera Kurd û Rûs İbrahîm Xelîlخان serdarê leşkerê Rûs İşpexter bi govend û şahî bire ma-la xwe û bihev re peymaneke dostanî imza kirin.

1- Dewleta Kurdî bin siya dewleta Rûs de berxwedar û serbixwê bimênî.

2- Dewleta Rûs arîkariya dewleta Kurd bikî û çek û barxanê ji wan re pêşkêş bikî.

Û ji bo vî awayî çarsed siwar bi çar topa ve li cem Xelîlخان hiştin û veġeriyān Gence û Xelîlخان heta sala 1221 koçî jî dibin siya İmperatorîya Rûs de gerdenazad û serbixwe fermandarê welatê xwe bû.

Lê divê salê de dewletên Turk, İngilîz, Firansa bicarek bi Qacaran re lihevhatin û dewleta İnan(Qacar) bû hevalben dê dewletên mezin û naçare İbrahîm Xelîlخان berê xwe da Qacara'û doza lihevhatinê kir û dixwest Rûsa ji welatê xwe

derxî û Feteħ Elîşah ferman da Mîrzaebbas û got :

-Dixwazim bi her awayî arîkariya İbrahîm Xelîlîxan bikî.

Û Ebbas Mîrza leşkerekî giran bi serdariya Fecerilahxanê , Şahsiwan û Emenilahxanê Evşar û İsmailîxanê Damxanî xiste bin serdariya Ebîfeteħxanê, kurê İbrahîm Xelîlîxan û ev leşkerê giran di pira Xudaaferîn derbas bû û Caferqulîxan kurê Ebîfeteħxan, pismamê İbrahîm Xelîlîxan li ser destê Rûsa di wê çaxê de doza fermandariya Ciwanşêr dikir û bi sêsed siwarî ve hate keleha Guzîd û di sala 1221 koçî de Caferqulîxan bi çend siwarên Rûs ve bi dizî xwe gihandin mala İbrahîm Xelîlîxan û tevî jin û zar û zêçên wî bicarek kuştin. (r.79).

Lê çiqas Caferqulîxan ev bêbextîjî kir, lê careke dî Rûsa fermandariya Ciwanşêr dane destê Mihdîqulîxan, kurê İbrahîm Xelîlîxan ji ber, ko jina İbrahîm Xelîlîxan xuşka Selîmxanê Şekî bû û bi destê Caferxan û Rûsa hate kuştin. Selîmxan nivîsarek rêkire nik Ebbas Mîrza û got :

-Her çende ji bo Mustefaxanê Şêrwî, hevalbendê Rûs bûm, lê niha jî şerê Rûsa re xwe kar dikim. Ji min re han û hewarê bişênin û bi serdariya Ferecilahxanê Şahsiwan leşkerekî giran çû hana Selîmxan. (r.79).

7- MIHDÎQULÎXANÊ, KURÊ İBRAHÎM XELÎLÎXAN :

Dema Caferqulîxan, İbrahîm Xelîlîxan û zariwên wî bica - rek kuştin. Dixwest, ko ew bikevî şûna wî, lê serdarê Rûs Mihdîqulîxan xiste şûna bavê wî û Mihdîqulîxan bi Rûsa re gelek xweş û bi rast û ronî derbas dikir, lê di sala 1226 koçî de Qacaran êla Emîre ji nav Qerebax dizîn û veheran - din û kurdên Emîre bi dizî xwe gihandin keleha Şûş û ew barxana, ko Rûsa ji bo arîkariya kurd tê de danîbûn bi ca - rek şewitandin. (r.116). Û Feteħ Elîşah bi serdariya Hacî Mihemedxanê Qeregoz leşkerek şande ser Qerebax û Feteħ Elîşah bixwe jî bi leşkerekî giran ve di ava çemê Aras derbas bû.

Herwekû Mihdîqulîxan jî di keleha Eskeran de karê xwe û şer dikir û Hacî Mihemedxan newêribû xwe nezîkî kelehê bikî û xwe bi diyarî leşkerê kurd xî. Ji lewra di çemê ser - ser derbas bû û çû ser kurdên Cibiran, lê Cibiranî aza û gernas leşkerê Qacar şerpeze û perîşanî şikandin û talanekî mezin ji wan sitandin û Rûsa Caferqulîxan û Lutufelîaxa Ê Cibirî girtin û xistin zîndanê. Çawa, ko Mihemedaxayê Cî birî bi êl û eşîrên xwe ve bi serê çiya ketin û ji alîkî dî ve Ebû Feteħxanê Ciwanşêrî bi Eceman re lihevhat û arîkarî ji Mirza Ebbas xwest û Mirza Ebbas leşkerekî giran kar - kir, ko bişênî hana kurd, lê çawa Rûsa ev bihîst Caferqulî

û Tutufelî şandin bajarê Gence, lê herdû gernasa hevsarên hespên xwe li ser pira Serser bi destê Rûsa ve berdan û bi siwarî, bêhevsar bazdan û xwe gihandin nav Cibira û ew jî dane barkirin û xwe avêtin nav Îran û ketin bindestê Qacaran û Ebbasmîrza, Caferqulîxan kire fermandarê Qerebax û her sal çar hezar tûmen mûçe jêre vebirin. (r.117-118).

Caferqulîxan, tevlî leşkerê xwe di Eslandûz ve berê xwe da keleha Sultan û çû hana Evşariya û hemû eşîrên kurdên, ko xwe veşardibûn li Caferqulîxan kom bûn û di çemê Aras derbas bûne nav Eceman, lê Ebbasmîrza leşkerekî giran şande ser keleha Sultan.

Mîster Lez, ê İngilîzî û topçiyên İngilîz bi Eceman re hatibûn hana Qacara û şerê Mihdîqulîxan dikirin. Kurd û Rûs li alîkî û İngilîz û Qacar li alîkî dirêjî hevkin û gelek ji herdû rexa hatin kuştin. Di vî şerî de çend serdar ji Rûsa hatin kuştin û Macorek û çend topçî ji Rûsan hatin girtin, lê ji keleha Penahava çarsed siwarên Rûs û du ser siwarên kurd hatin hewara kurdên keleha Sultan.

Lê çawa bihîstin, ko leşkerê kurd û Rûs ji keleha Sultan reviyane û gelek ji wan hatine girtin û kuştin, berepaş vegeyriyan û ketin keleha Neznawût û Caferqulîxan bi leşkerê xwe ve hate ser wan û keleh ji wan sitand û xelkê kelehê reviyân û xwe avêtin çiyayê Cemreq û Caferqulîxan, bişer ji pey wan vegeyriya û hinek Ermen ji wan hindama rakirin û bixwe re anîn û li hindama çemê Aras bicîkirin.

Di wê çaxê de General Menkîz, serdarê leşkerê Rûs çû cem Şêx Elîxan, serokê eşîra Qubbe û Legren û Daxistan û Mustefaxanê Şêrwan kirin dost û hevalê xwe û vegeyriya Qerebax û bi diyarî Mihdîqulîxan ket û general Ketil Rawiskî, pêre di keleha Şûş de hişt û vegeyriya Tiflîs. Herwekû Ebbasmîrza nedixwest di zivistanê de li nav çiya bimênî, ji lewra bakire Caferqulîxan û nîşan û perwa pêvekirin û ew kire fermandarê Qerebax û Qeredax û vegeyriya Tewrêz.

Di sala 1238 koçî de navbera Rûs û Ecem li ber xweşbûnê bû, ji lewra Rûsa baweriya xwe bi femandariya Caferqulîxan anîn û bi leşkerekî giran ve berê xwe date Qerebax, te nê leşkerê kurdên Qerebax ew şikandin û di vî şerî de Mês ter Giriştî ingilîzî, serdarê leşkerê kurdê Nexciwan, bi çend kurdên navdar ve hatin kuştin û Mîrza Ebbas di hespê wer bû û bi hezar dijarî xwe parast, lê paşê Rûs û Ecem lihevhatin û fermandarên kurd dinav herdû rexan de winda bûn. (r.334).

8- CAFERXANÊ BEYATÎ KURDÎ :

Ev Caferxan weke hevalên xwe gerdenazad û serbixwe ferman

darî dikir û di çaxê dewleta Zendî-Kurdî de li hindama Nîsabûr fermandarî dikir. Lê di sala 1210 koçî de Aqamihemêdê Qacarî, bi leşkerekî giran ve berê xwe da Xerasasan û Caferxan bidiyarî ket û şah femandariya wî pîroz kir û Caferxan kurê xwe li cem giraw danî û vegeriya Nîsabûr, lê şahê Qacarî ew soz û peyman bicarek xistin bin lingê xwe û çû ser keleha Nîsabûr û talankir û Caferxan û jin û zaro - kên wî birin Taran û bajar bicarek talan kir.

Lê di sala 1213 koçî de Caferxan ji zindanê derket û ku rê xwe giraw hişt û çû welatê xwe û dost û mirovên xwe ciyandin û divê salê de leşkerek bi serdariya Sadiqxanê Şikakî çû ser Çinaran û Feteş Elîşah, bi leşkerekî mezin ve hat ser Nîsabûr, lê Caferxan rê neda dijmin û şer destpêkir. Lê Huseynqulîxan, pîşmamê Caferxan bi dizî reviya û hate cem Feteş Elîşah û bi koletî ya şahê dijmin, dilxweş û serfiraz bû û leşkerê Qacara dest bi talanê gunda kir û Feteş Elîşah, kurê Caferxan, ko bi giraw li cem xwe hiştibû bire bere nezîkî kelehê kir û got:

- Eger xwe nedî destê min, ezê kurê te bikujim.

Lê Caferxan goş neda kurê xwe û şer bêtir xweşkirin û şahê xwînxwar ew bêguneh kuşt û serê wî jêkir, lê Caferxan bêtir zor da şer û guh neda kuştina kurê xwe û leşkerê dijmin bi paşde ve gerend û naçare şahê vîlikgerîn pêre lihevhat û ve geriya Taran, lê di sala 1216 koçî de leşkerekî giran şande ser keleha Aqqela, ko Elahyarxanê kurd tê debû û di sala 1216 koçî de keleha Pengê, ko yek ji kelehên Yarilahxan bû wêran û talan kir û ve geriya ser keleha Sebzewar. (r.58).

Lê piştî şerekî mezin Feteş Elîşah, keça Yarilahxan li xwe mar kir û ve geriya ser Nîsabûr.

Ji nivişta navdaranê kurd Huseyn Husnî Mukriyanî hatiye guhaztin. 1971.9.10 Cigerxwîn û Mukriyanî jî ji tarîxa Qacaran guhastiye. Avirekberî niha bi deh-diwazdeh sala min ev guhaztiye, lê niha nujen dikim.

FERMANDARIYA EŞİRA MUKRÎ

Dibêjin, ev eşîra Mukrî ji Şehrezûr hatiye û hin dibêjin fermandarê Mukrî ji fermandarê Baba derketine.

Lê çawa dibî bere bî, tenê ew mirovê, ko ji vê malbatê deng daye, navê wî mîr Seyfidîn e, mirovekî jîr û zana hin xelkê Kurdistanê Çapiqlo sitandiyê, lê piştî pêlakê hindali xwe civandine bi zordestî hindama Deryas ji Turk mên Dolbarîk, Axtacî, Êltemûr, Seldûz bi zorxistine bindes tê xwe û eşîrên kurdên van hindaman bi navê Mukrî xistine bin femandariya xwe û piştî pêlakê du kur, Sarim û Babamer bi şûn xwe ve hiştin û serê xwe danî.

1- SARİM BEG, KURÊ MÎRSEYFÎDÎN :

Çawa bavê wî serê xwe danî Sarim Beg bi gernasî kete şûna bavê xwe û bi mêranî êl û eşîrên welatê xweli hev ragirtin.

Çawa Şah İsmailê Sefewî bû padîşahê Îran çavê xwe berda ne Kurdistanê û dixwest bi ser Îran ve berdî û imperatoriya kevna mezin vegeerî, ji lewra jî rê ve leşkerî giran, bi serdariya Abdî Beg Şamlû û Mehredar Sarimelî di sala 912 koçî de şande ser Sarim Begê Mukrî.

Tenê Sarim Beg dijminê xwe şikandin û herdû serdarên Ecem hatin kuştin û kuştî û girtî nedihatîn jimartin. Herwekû talanekî bêjimar ji wan sitand.

Şahê navdar çend carên dî jî leşkerê xwe rêkire ser wela tê Mukrî, lê Mukriyanê gernas dijminên xwe pozşikandî bî

paşde vedigerandin û zora Eceman dibirin.

Naçare Sarim Beg tevlî mîrekên kurd bûne hevalbendê dewleta Osmanlî-Turk û xwe dane ber siya Selîmxan û di çaxê Suleymanê Qanûnî de Sarim Beg femandariya Mukrî bi fermaneke padîşah ji xwe re pîroz kir û vegeriya welatê xwe, te nê gelek nema û serê xwe danî. Qasim Beg, Îbrahîm Beg, Hacî Beg sê kur bi şûnxwe ve hiştin û koça xwe barkir û ji cihana jîndarî çû. Piştî mirina Sarim Beg, hersê kurên Rus tem Beg, kurê Babaumer Beg, kurê Mîr Seyfidîn welatê Mukrî li xwe parvekirin.

Deryas, Dolbarîk, Seldûz ketin bindestê Şêx Heyder û hindama Êltemûr giha Mîr Nezer û hindama Axtacî giha Mîr Xidir û hersê bira xwe sipardin Şahtehmaseb û ketin bin siya dewleta Îran û destên xwe ji dostaniya romiyan bicarek kişandin.

Lê di sala 948 koçî de Suleymanxan ferman da Sultan Huseynê Badînî û Zeynel Begê Hekarî û mezinên biradosta, ko herin ser va hersê bira û piştî şerekî xwîndar û mezin her sê bira jî bi destê kurda hatin kuştin û ji Şêx Heyder Emî re Beg, Huseyn Beg man û ji Nezer Beg, Beyram Beg û ji Xidir Beg, Elox Beg, Hesên Beg man.

2- EMÎRE BEG, KURÊ HACÎ UMER BEG, KURÊ SARÎM BEG :

Piştî, ko Şêx Heyder û birayên xwe bi gernasî hatin kuştin, bi alîkariya femandarên Kurdistan û bi fermaneke Suleymanxan bû femandarê welatê Mukrî û bi camêrî û gernasî sîh(30) salî femandarî kir û paşê serê xwe danî û kurek bi navê Mustefa Beg bi şûn xwe ve hişt û çû.

3- EMÎRE BEG, KURÊ ŞÊX HEYDER BEG :

Piştî mirina apê xwe berê xwe da dîwanxana Kesrayê Îran Tehmaseb û Şahtehmaseb femandariya Mukrî xiste destê wî û payebilind vegeriya mala xwe û piştî mirina Şahtehmaseb, Emîre Beg çû dergahê Şah Îsmailê diwem, padîşahê Îran û payedar û serbilind vegeriya.

Tenê di çaxê Şah Mihemed Sultan de serdar û Miftexwerên dewlet û imperatoriya Îran, welatê Îran xistin nav berdî -berdan û talan û sergêjîyan û Emîre Beg û femandarên Lorrîstan, Erdelan bicarek li ser destê Mihemed Paşa, mîrê mîrê Wan hatin cem turkan û di sala 991 koçî de xwe avêtin dîwanxana Muradxanê siyem û bi fermaneke padîşahê welatê Bane, Mûsil bi ser derebegiya Mukrî ve hatin berdan û kurê wî kirin femandarê Erbîl û hinek ji Meraxe xistin bindestê wî û di zivistanê de Emîre Beg û Mihemed Paşa êrîş kirin hindama Meraxe û femandarê Meraxe Begdaşqulîxan ji ber reviya û xwe negirt û mal û welat dane ber talan û ber

dîberdan û heta hespêr. Şahtehmaseb, ko navdar û bideng bûn bicarek ketin destê dijmin û gelek ji wan bi xwe re anî Wan.

Piştî vê serbilindî û gernasiyê Mihemed Paşa, kurê Emîr Beg bi xwera bir û çûne Erzerom û bi nivîsarekê gernasîx, dilpakî û mêraniya Emîre Beg ji Ferhad Paşa, serdarê ordiya Osmanlî re pêşkêş kir û Ferhad Paşa bi ser ve zêde kir û ji dergahê Hemayûn re şand û bi fermaneke hemayûnî welatê Meraxe bi ser welatê Mukrî ve hate berdan û Emîre Beg kirin Paşa.

Tenê çawa Emîre Paşa vegeriya welatê xwe Hesên Beg, Kurê Xidir Beg li ber paşayê Mukrî serê xwe hilda û doza fermandariyê kir, lê piştî şerekî xwîndar û mezin Hesên Beg hate kuştin û birayê wî, Olox Beg reviya û çû cem Ferhad Paşa û ji çû cem Sultanmihemed û hindama Dehxwarkan ji welatê Meraxe, bi fermaneke padîşahî ji xwe re pîroz kir û vegeriya.

Herwiha Emîre Paşa birayê xwe Huseyn Beg jî kuşt û welat bi carek ji xwe û zariwên xwe re hişt û payedar û serfiraz di Meraxa de rûnişt, tenê gelek neçû Tebrîz kete destê dewleta Osmanlî û wezîr Cafer Paşa li Tebrîzê bû mîrê mîra û serdarê ordiya turka û wezîr çavên xwe berdane hindama Meraxe, ko bixî bîndestê xwe ji ber, ko ji kevnare de Meraxa dibin femandariya Tebrîz de dima, belê Emîre Paşa xwe neda ber siya wezîrê mezin û Cafer Paşa li herderî gîlî û gazin ji Emîre Paşa kirin û hîmê mezin bi serda gêr dikirin û bi vî awayî berebere paşayê kurd berjêr daxistin.

Welatê Baban, Mûsil, Erbîl ji destê wî derxistin û Meraxe xistin bîndestê Cafer Paşa û hersal yazde kîs zêrên Osmanlî ji Emîr Paşa distandin û didane leşkerê Tebrîz, lê wezîrê dijwar li ser vê yekê jî ranewestiya û rastarasta Meraxe xiste bîndestê xwe û femandarek ji cem xwe rêkire Meraxe û ev hindam bi carek xiste nav qada padîşah., tenê, piştî salekê hindama Meraxe perîşan û bê havîl û sefil bû û kes di wê hindama mezin û ava de nema û eşîrên kurd ji hev belav bûn û nema karibûn kîsek zêr bidin dewletê.

Bi vî rengî dijminê mîletê kurd beg û axayên nezan dixapandin û di rojên tengasî de nîşan û surme bi wan vedikirin û di rojên firehî de digirtin û dixistin binê zindana û dîkuştin û nezanê kurd carekê jî bi xwe şiyar nebûne û destên xwe nedane hev û yek ji xwe nekirine padîşah.

Emîre Paşa, ji neçarî careke dî li derebegiya Mukrî veegeriya û navê paşa pêve hate girêdan û ji perwa û diyariyên hemayûn ev navê bi qirêj jêre ma, tenê kurê wî Şêx Hey

der keleha Saroqorxan ji xwe re ava kir û heta sala 1002 ^ê koçî jî têde bû, lê çawa welatê Azerbaycan bi carek bi ser Bexda ve hate berdan, dijminê Şêx Heyder ji mîrêmîra Xidir Paşa re gotin :

- Ko ve wêranî û perîşaniya hindama Meraxe ji destê Şêx Heyder hatine, eger Şêx Heyder keleha Saroqorxan ava nekira wilo hindama Meraxe wêran nedibû.

Ev gotin kete serê Xidir Paşa û keleha Saroqorxan sipar de êla Mehmûdî-Êzdî-Kurdî û li ser vê kelehê şer û kuştin û talan ketin navbera herdu eşîrên kurd û dijmin kuçik bi kuçik dane kuştin.

Herwekû di sala 1003 koçî de û bi navtêdana eşîra Mehmûdî Xidir Paşa bi leşkerekî giran ve hate ser keleha Saroqorxan û her çiqas Şêx Heyder xwest, ko bi haştî di ser xwe ve derbas kî, lê naçare dawî destê xwe avête qefta xer cerê û di kelehê de asê bû û li serhev şerên xwîndar û dijwar destpêkirin û Ewed Beg, kurê Hesen Beg Mîrlîwayê Mako dî şer de hate kuştin û hewar li ser şêxê zirav qalin û si tûr bû.

Lê Emîre Paşa, kurê xwe haşt kir û şer da rawestan û Xidir Paşa vegeriya Tebrîz û di van şeran de gelek ji Mehmûdiya hatin kuştin û Qubad Beg û Hemze Beg birazayên Mensûr Beg zariwên Zeynel Beg hatin kuştin.

Bodaq, Qasim, Huseyn, Şêx Heyder herçar kurên Emîre Beg. Her çar jî mîrên şêxa bûn û Bodaq Beg bi xwe mîr û Qasim Beg li ser destê Huseyn Beg hate kuştin û Huseyn Beg jî li ser destê Şêx Heyder hate kuştin.

Heta sala 1005 koçî jî hindamên Tirqe, Acrî, Saroqorxan Dûab, Lîlan bicarek di destê Emîre Paşa û Şêx Heyder di destê bav û kur de bûn.

Awirek: Çawa ji rewşa tarîxa vê malbatê tê xuyakirin ko Êzdî bin, ji ber, ko şêx û mîrê şêxan navên êzdiya ne.

Herwekû Mihemed Emîn Zekî Beg, bi ser ve zêde dikî û dibêjî di sala 991 koçî de Emîre Paşa, fermandarê Mukrî bû û leşkerê turk, ko li hindama Tebrîz cî girtibû gelek malwêranî û talanî bi ser kurdên wa navan de barandin û kurdên hindama Seldûz, Meyanêduab, Meraxe gelek êşandin. Herwekû eşîrên dijwar û mezin berdane hindama Qereçoq û dest bi talan û kuştin û berdîberdanê kirin.

Di çaxê paşatiya Emîre Beg de kurê wî kiribûn fermandarê wê hindamê û navbera wî û Cafer Paşa, fermandarê Tebrîz nexweş ket û ji Osmaniya xeyidî û xwe gihande Şah Ebbas ko di wê çaxê de êrîşî Azerbaycanê dikir.

Şah Ebbas, welatê Meraxe bi ser welatê wî veberda û Şêx Heyder herdem bi şah re digeriya û paşê di şerê Rewanê de

hate kuştin û Şah Ebbas, Qubad Beg, kurê Şêx Heyder kire fermandarê Meraxe, lê ji ber ko biçûk bû diya wî fermana rî dikir û dijminahî kete navbera jinêkê û çend mirovên Şêx Heyder û tevan dixwestin, ko yek ji wan bibî ferman- dar. Li ser vê yekê dest bi giliyê hev kirin û paşê Şah Eb- bas ji Qubadxan, kurê Şêx Heyder xeyidî û ji ber, ko navbê- ra wî û fermandarê qizilbaşan nexweş bû, ji lewra şah fer- mar da, ko fermandarên êla Mukrî bicarek bêne kuştin û bi- xwe bû serdarê ordiya Îran û çû şerê Qubadxan.

Herwekû, Şah, Qubadxan xapand û çend diyarî jê re şandin û xwest, ko bi diyarî şah kevî û Qubadxan û bi sed û pêncî (150) siwarî ve çûne nik şah û şah dixwest, ko tevan bigrî û bidest bikujî, lê bixwe agah bûn û dest avêtin şûra û bi carek bi gernasî di meydana şerde hatin kuştin.

Şah ji wir berê xwe da keleha Kadul û bi hezaran ji kur- dên Mukrî hatin kuştin û hezaran jin û zarokên wa dîl gir- tin û tiştên kesnedî bi serê wan de anîn.

Herwekû perçak ji leşkerê şah berê xwe da ser keleha Germerûd, ko birayê Şêx Heyder, Emîrexan tê de bû û bi hovî kuştin û qiziybaşan ji xwedê rojeke wilo dixwestin.

Herwekû gelek kurdên, ko ne ji êla Mukrî jî bûndî vê toşê de hatin kuştin û ji fermandarên Mukrî tenê Şêr Beg hate parastin, ew jî ji ber, ko berî hingî di belatadinav mala) şah de bû û birayê Meqsûd Beg bû, ko bi şah re digeriya.

Mihemed Emîn Zekî Beg, pê de diçî û dibêjî, Şah Ebbas û peyrewên wî gelek ji kurdan kar kirine û bêtir ji kurdên Mukrî, kodi nav leşkerê Îran de cîkî bilind girtibûn û ge- lek serdarên mezin ji wan rabûne. Weke: Elîcansultanê Şika- kî, Gedayîsultanê Kolanô, Qelendersultanê Kelegîrî, İmam Qulîxanê Çeknî.

Herwekû di sala 1034(1623)de careke dî bi serdariya Şêr- beg, kurdên Mukrî li ber Eceman rabûn û êrîşî welatê Mera- xe kirin û gelek ji Eceman kuştin û Şah Ebbas careke dî or- diya Îran bi serdariya Zeman Beg kişande ser wan, lê vê çā- rê Şêrbeg û leşkerê xwe kişandin çiya û Eceman hin gundên wa talan kirin û şewitandin.

Lê piştî mirina Şah Ebbas, Xesro Paşa, wezîrê mezin di sala 1039(1629) de berê xwe da Îraq û zivistana xwe li Mû- sil derbas kir û Seydxan, fermandarê Badîna û Mîre Beg fer- mandarê Sora bi leşkerên xwe ve di hana paşê hatin û mezi- nê eşîra Bacilan bi çil hezar mirovî hate Mûsil û sîh he- zar pez ji paşê re pêşkêş kir. Tarîxa Neîma C.3, Mihemed E- mîn Zekî Beg, ev ji Tarîxa Neîma guhastiye.

DEWLETA ERDELAN

Koka fermandarên Erdelan :

Mîr Şerefexan Beg dibêjî, ev malbat ji mala padîşahên Farqînê ne. Di sala 598 ê koçî de çawa Şah Mensûr, padîşahê Farqîn, Diyarbekir, Cizîrê li ser destê Cigermijê turkmanî li Cizîrê hate kuştin çar kur bi şûn xwe de hiştin ko mezinê wan bi navê Feyrûz bû û piştî kuştina bavê xwe navê xwe guherand û kire Qubad û reviya û çû cem Mîr Surxabê kurê Mîr Hesên, fermandarê Kurdîstana Çiya Şarezûr û Dînewer û çend sala di nav Goran de bi rûmet û serbilind rûnişt. Lê piştî windakirina dewleta Berzikanî, Qubad serê xwe hilda û doza femandariya wê hindamê kir û di sala 630 ê koçî de di hindama Gul Enber(Helebce) de leşkerekî giran da hev û berê xwe da Azerbaycan.

Lê Muzeferidîn, fermandarê Erbîl, turkmanî leşkerekî mezin şande devê riya wî, belam leşkerê wî pozşikestî bi paş de veşerîya û di nêzîkî keleha Niwî de Qubad zora dijminê xwe bir.

Herwekû di sala 636 ê koçî de şerekî mezin di navbera Mîr Qubad û Mîr Şerefidînê Celalî, fermandarê Erbîl de çêbû, lê vê carê leşkerê Qubad Feyrûz şikest û naçare di welatê xwe de rûnişt.

Tenê di sala 656 ê koçî de, ko Hulagûxan hate ser Îraqê û kurê Emîr Yeşmûtxan ji Kermaşah berê xwe da Îraqê Mîr Qubad-Feyrûz leşkerê xwe jê re pêşkêş kir û kete nav fermandarên wî û li ber destê wî rûnişt û ji ber, ko Qubad-Feyrûz

rûz mirovekî por sipî û mezin bû Yeşmûtxanjê re digot Baba Urdil û paşê Yeşmûtxan ferdandariya Şehrezûr siparde destê wî, lê di sala 675 ê koçî de serê xwe danî.

Lê hin dibêjin, Qubad, kurê Xusro, ferdandarê bajarê Me rû bû. Çawa, ko di sala 31 ê koçî de Yezdîgurd, ji ber ieq kerê Erebiya û hate nik Xusro xwe veşard, lê Xusro ew kuşt û zêr û gewherên wî ji xwe re hiştin û piştî mirina Xusro, Behremê kurê wî di sala 65 de di şerê Muheleb, kurê Ebîsufre, ferdandarê Xerasan de hate kuştin û Qubad, kurê Behram, kurê Xusro li ber destê Quteybe, ferdandarê Xera - san rûnişt. Lê çawa Ebûmislimê Xerasanî serê xwe hilda û Ebdilahê Seffah bû peyrewê Islamê, Qubad tevli mirov û zar û zêçên xwe hate bajarê Mûsil û piştî pêlakê welatê Mûsil, Diyarbekir xistin bin destê xwe û piştî wî re zariwên wî welatê Şehrezûr jî girtin û tê de rûniştin û hetta sala 564 ê koçî jî di hindama Şehrezûr de ferdandarî dikirin û keleh Zelem, paytexta wan bû û dawî Pilingan ji destê Gor û Kelher derxistin û keleheke mezin tê de avakirin, ko heta î ro jî kaviên wê xuyadikin.

Her çawa bî, lê Kulûl Beg, li şûna bavê xwe rûnişt û bû ferdandar.

1- KULÛL BEG, KURÊ QUBAD BEG :

Di sala 606 ê koçî de Kulûl Beg, kurê Pîr Bodaq li ser awira diwem, lê kurê Qubad Feyrûz li ser awira pêşî bû ferdandar û bajarên Seqiz, Siyahmensûr, Zerînkemer, Geros, E-sedabad, Elîşukir xistin destê xwe û sînorê welatê wî ji rojhilat ve Hemedan û ji rojava de Erbîl û Mûsil û rajor Zengan û rajêr Kermaşah bûn.

Herwekû Suleymanî, Şahrebajar, Koysenceq, Herîr, Îmadî û Rewandiz jî di bin destê Kulûl Beg de bûn û di keleha Zelem de rûdinişt, lê dawî Pilingan ji xwe re kire paytext, lê piştî, ko 23 salan biserbilindî rabiward serê xwe danî.

2- XIDÎR BEG, KURÊ KULÛL BEG, KURÊ QUBAD BEG :

Piştî mirina bavê xwe bû ferdandarê welêt û di sala 629 ê koçî de bû ferdandar û 34 sal bi kamîranî û serbilindî rabiwardin û di sala 663 ê koçî de serê xwe danî.

3- İLYAS BEG, KURÊ XIDÎR BEG, KURÊ KULÛL BEG, KURÊ QUBAD BEG :

Di sala 663 de bû ferdandarê welêt û di sala 710 de serê xwe danî. Mirovekî dilovan û mihreban û gelek ji xelkê Kurdistanê ra dilpak û paqij bû.

4- XIDÎR BEG, KURÊ İLYAS BEG, KURÊ KULÛL BEG :

Di sala 710 de bû ferdandarê Erdelan û di sala 746 de

serê xwe danî. Mirovekî rûnêrm, dilovan, dilpaqij bû, di civata wî de pêzan û hozan rûniştî bûn û rûmeta xwendewaran gelek digirt û dilbijokê zanîn û olperest bû. Dûrî zor û setem û xwînrêjîyê diçû û leşker li ser kîsê xwe xwedî di kir û bi her awayî malê xwe dida û belav dikir û nedixwest di welatê wî de berdîberdan çêbibî û ji ber vê yekê dewleta Osmanlî dirêjî welatê wî kir û Herîr, Rewandîz, Koysenceq, Erbîl, Şhrezûr jê sitandin û Xidir Beg nedixwest xwî nê birjênî û bi hindikî dilxweş bû û şerê Osmaniyan nekir.

5- EBÛ HESEN, KURÊ XÎDÎR BEG :

Di sala 746 de li şûna bavê xwe rûnişt û di sala 784 de serê xwe danî. Gelek mêr û dilovan û dilpaqij bû, comerd û camêr û nandar bû. Sê hezar siwar xistibûn bin çekan û ji leşkerê xwe re destûr û qanûnek danî bûn û ji kîsê xwe xwedî dikir û leşkerê xwe hînî şerbazî dikir û şevgerî û şûrbazî, nîşanî wan didan û li hindama Sine, di serê çiyakî bilind de keleheke mezin û bilind avakir û gundê Hasanabad ava kir û 38 sala fermandarî kir û ji cihana jîndarî koça xwe barkir û çû bin axa sar.

6- BABLO BEG, KURÊ HESEN BEG :

Di sala 784 de li şûna bavê xwe rûnişt û di sala 828 de serê xwe danî. 44 sala bi fermandarî rabiward.

Mirovekî xwînrêj û zorker û setemkar bû. Ji bo şaşîyeke biçûk dikaribû serê mirovekî jêkî, ji ber vê yekê serdar û serkarên dewletê jê dil bitirs û dilsar bûn, çend caran xelkê şoriş û lephilanîn diriwê wî de çêkirin, lê wezîrê wî İbrahîm Beg ew didane rawestan.

7- MUNZÎR BEG, KURÊ BABLO BEG :

Di sala 828 de bû fermandarê Erdelan û di sala 862 de serê xwe danî. 34 sala bi fermandarî rabiwardin û ew zor û setema, ko bavê wî di navmilet de hiştibûn bicarek rakirin û dilsariya millet bi hêvî hate guhertin û serdar û mezinên welêt serê xwe jê redanîn û di fermandariya wî de bûn û bû ne dost û heval û di karê dewletî de bi dilpaqijî kar dikirin, lê piştî 34 sal bi gerdenezadî biwardin serê xwe danî.

8- MAMÛN BEG, KURÊ MUNZÎR BEG :

Di sala 862 de li cihê bavê xwe bi fermandarî rûnişt û weke mêra berê xwe da avanî û pêşvebirina welatê Erdelan û sazkarin û pêşvebirina leşkerê xwe û berê xwe da dijminê xwe û çavên xwe berdane vergirtina welatê bav û kalên xwe, ko dewleta Osmanlî bi zor girtibûn û bi carek vegerandin bin destên xwe û serkarên xwe di Şhrezûr, Erbîl, Koysen-

ceq, Herîr, Rewandiz, Îmadiye de danîn û hinek leşker di keleha Rewandiz de danî, ko sînore welatê wî bêne parastin û 38 sal bi serbilindî û payedarî rabiwardin û di sala 862 de serê xwe danî. Û di saxiya xwe de welatê xwe li zariwên xwe parvekir.

Zelem, Gulenber, Şemîran, Hawar, Oraman, Teqse dane Begêbeg. Hişlî, Merîwan, Tenûre, Nişkaş, Pilingan, Kelaş, Ciwanrûd, Senendij, Esedabad, Mihreban dane Surxab Beg. Si-rûç, Qeredax, Şurebajar, Alan, Erbîl, Koysenceq, Herîr, Rewandiz, Îmadiye dane Mihemed Beg.

9- BEGÊBEG, KURÊ MAMÛN BEG :

Bi serbilindî li şûna bavê xwe rûnişt û herdû birayên wî bi camêrî mezinahiya birayê xwe li ser xwe girtin û serê xwe jê re danîn û her yek di cihê xwe de bi kamîranî fermandariya hindamên xwe dikirin û şev û roj di kar û xizmeta birayê xwe de sergerdan û xidmetguzar bûn û bi vî rengî Begêbeg û birayên xwe 42 salan bi kamîranî û serbilindî rabiwardin û di sala 942 de serê xwe danî.

Lê gereke di sala 934 de serê xwe danîbî, ji ber, ko bavê wî di sala 892 de serê xwe danî bû û gereke Begêbeg, di wê salê de ketibî şûna bavê xwe.

10-MAMÛN BEG, KURÊ BEGÊBEG :

Di sala 934 de bi serbilindî kete şûna bavê xwe, lê piştî du salan Suleymanxanê Osmanlî-Turkî bi serdariya Huseyn Begê(Huseyn Paşa) yê Behdînî leşkerekî giran şande ser welatê Erdelan û Mamûn Beg bi çar hezar siwar vê rê li ber dijminê xwe girt û di roja duşembê sala 944 de li hindama Şehrezûr herdû leşkerên kurd raperikîne hev û rojekê heta êvarî li ber xwe dan û gelek ji herdû rexan hatin kuştin û çawa perda şevê xwe bi ser meydana şerde berda, her yek ve geriya wargeha xwe û Mamûn Beg dest bi asêkirina keleha Zelem kir û du nivîsar şandin ji herdû apên xwe Surxab û Mihemed re, ko han û hawarê jê reverêkin, lê apên nezan zû jêre han rênekirin û bi tena leşkerê xwe hetta mehekê di keleha Zelem de bi gernasî şer kirin.

Herwekû leşkerê Huseyn Paşa bi hovîtî dirêjî kelehê dikirin û Mamûn Beg, şevê bi çend mirovên xwe ve bi dizî xwe avêtin çadira paşê û Huseyn Paşa roja dî mirovekî xwe û nivîsarekpê re, ko tê dehêvî ji padîşah kiribû, ko Mamûn Beg azad bikî û jê reqencbî rêkin Asîtanêbolê û çawa gihiştin ber destê dewletê, ew xistin zindanê û leşkerê kurd û turk welatê Erdelan tar û mar kirin.

11-SURXAB BEG, KURÊ MAMÛN BEGÊ PÊŞÎ, APÊ MAMÛNÊ DÎWEM :

Di sala 945 de Surxab Beg, li şûna birazayê xwe bi fermandarî rûnişt û hindama birayê xwe, Mihemed Beg bi zorê si tand û bicarek Kurdistana Erdelan xiste bindestê xwe û bî Şahtehmaseb re da û sitand û peymanên dostanî di nav xwe de girêdan. Herwekê gelek diyarî û nivîsar jê re şandin û gerdena xwe jê re xwarkir û xwe da ber siya dewleta Îran.

Çawa, ko li serê çiyayê Merîwan keleheke mezin û asê û bilind avakir, ko hetta îro jî hêj dîwar û kaviên wê xuyadikin. Lê Mihemed Beg, ko destevala mabû bazda û çû cem Sulaymanxanê turk, padîşahê Osmanlî û padîşah gelek rûmeta wî girt û ji bo xatirê wî Mamûn Beg berda û kire fermandarê Hule û bî serdariya Serdar Rustem Paşa sîh hezar leşker siwarî dane Mihemed Beg û Mamûn Beg û şandin ser Surxab Beg û di sala 947 de leşkerê kurd û turk gihane hindama Şarezûr. Û çawa Surxab Beg ev bihîst han û hewar ji Şahtehmaseb xwest û bî heşt hezar siwarên kurd ve kete meydana şer û di roja pêşemê 24 ê meha Recebê, sala 947 ê koçî şer di nav ap û birazî de destpêkir û di deşta Şarezûrê de herdû leşker raperikîne hev û di serê pêşî de çend caran leşkerê Erdelan zora dijminê xwe bir, lê leşkerê Taristanê, herdû leşker ji hev dane alî û her yek çû leşkergeha xwe û hetta heşt rojan li ser hev şer di nav wan de dirêj kir û gelek, ji herdû rexan hatin kuştin. Heft hezar ji leşkerê Osmanlî û sê hezar ji leşkerê Erdelanî di vî şerî de hatin kuştin, lê dawî û naçare Surxab Beg dest bi asêbûnê kir û keleh û derbendên xwe ji leşker û çek û barxanê dagirtin.

Nêzîkî du sala leşkerê Osmanlî bi serdariya Rustem Paşa û di bin fermana Mamûn Beg de li hawîr keleha Zelem şer û talan û berdîberdan dikirin û welatê Şarezûr berbad û tar û mar kirin, lê çare di keleha Zelem nekirin, lê leşkerê Erdelanî Kurdî di hindirê kelehê de gelek bêzar û şerpeze bûn.

Tenê mizgîn ji wan re hat, ko yazde hezar leşkerê Şah-tehmaseb di hana wan de hat û nêzîkî li kelehê kirin û bivê mizgînê dilê şervanê kelehê xweş bû û bihna wan derket û bi gernasî zor dane şer û nav di xwe dan û kevir hawîr ji mencenîka bilind dibûn û bi ser dijmin de dihatin xwar û qîr qîr û halan berbiezmanî ve bilind dibûn, lê ya xweş ew bû, ko ji nişka ve tîrek li serdar Rustem Paşa ket û di cî de can siparde axa sar.

Herwekê bi kuştina serdar şewşew kete nav leşker û hev-dîberdan û leşkerê Erdelan ji kelehê derket û bi mêranî di rêjî dijminê xwe kirin û leşkerê dijmin perakende şikandin

û gelek ji wan kuştin û gelek dîl û perîşan girtin û leşkerê Erdelan Kurd û Îran çadir û barxana dijmin talan kirin.

Tenê serdar Mihemed Paşa bi şeşsed mirovên Turk ve xwe avêtin hindirwê keleha Zelem û jin û zarokên Surxab Beg ne hiştin kes wan bikujî û bi camêrî parastin û tevî çekên wan ew vegerandin nav welatê Osmanlî û serdar Huseyn Beg, serleşkerê Îran bi serbilindî vegeriya cem Şahtemaseb.

Piştî vî şerî Surxab Beg, paytexta xwe ji keleha Zelem, guhazte keleha Merîwan û tê de bi kamîranî, serbilindî rûnişt.

Herwekû piştî vê serpêhatiyê rûmeta Surxab Beg li cem Şahtemaseb gelek mezin bû û di sala 956 de Mîrza Îlqas, birayê Şahtemaseb, ko li ber birayê xwe radibû reviya û hate şarezûr û bi serdariya Behram Mîrza û mihredar Şahqu-lîxan û İbrahîmxan bîst hezar siwar li pey şopa wî dihatin û li hindama Merîwan, leşkerê Mîrza Îlqas şerpeze ji hev belav kirin û naçare Mîrza bi bîst û yek mirovî ve xwe avêtin kelehê û ketin bextê Surxab Beg û mîrê Erdelan bi şanazî ew xwedî kirin û rêkirin ji Şahtemaseb re.

Herwekû di hember vê qencyê de Şahê Îran hezar Tûmen mehiya Surxab Beg vebirîn û gelek payedar û serfiraz kir.

Lê Şerefexan vê serpêhatiyê neweke Mirdoxî dibêjî û Şerefexan dibêjî, Mîrza Îlqas reviya û çû cem padîşahê Osmanlî û kete nav olika turkan û Surxab Beg bi devê Şahtemaseb ev Mîrza Îlqas xapand û kişande cem xwe û da destê Şahtemaseb û şahê Taran, birayê xwe xiste zindana Qehqehe û paşê ew di kelehê tera kir û kuşt.

Surxab Beg, di saxiya xwe de kurê xwe Sultan Elî Beg, xiste şûna xwe û kurê pêncem Behram Beg, kire fermandarê Rewandiz û İmadiye jî xiste destê wî. Ji ber, ko li 'de kurê wî hebûn. Hesen Beg, İskender Beg, Sultan Elî Beg, Ya-qûb Beg, Behram Beg, Zulfîqar Beg, Esmiş Beg, Şehsiwar Beg Saroxan Beg, Bîsat Beg.

Lê piştî du salan Surxab Beg, serê xwe danî û gelek neçû Sultan Elî Beg jî da pey şopa bavê xwe û serê xwe danî û zarokên Mihemed Beg, hetta, ko Kor Mihemed Paşa, bû fermandarê Rewandiz hê jî li wan navan fermandarî dikirin. Herwekû du kurên biçûk ji Sultan Elî Beg man. Teymûrxan Beg û Hiloxan Beg.

12-BÎSAT BEG, KURÊ SURXAB BEG :

Piştî, ko Sultan Elî Beg, serê xwe danî û ji ber, ko zarokên Sultan Elî Beg biçûk bûn û ji ber, ko Bîsat Beg jî birayên xwe yên mayîn zanatir û gernastir bû çendan, ko biçûkê birabû jî, lê ew li şûna birayê xwe rûnişt û di sala

975 de bû fermandarê Erdelan. Mirovekî gelek zana û dostê xwendewar û hozan û pêzan û torevana bû û bi wan re rûdinişt û gelek dostê wekhevî û dostêgîrê reben û ketî û belengaza bû û bi vî rengî deh sala rabiward, lê di sala 975 de Teymûrxan û Hiloxan, ko herdû kurên Sultan Elîxan, ji keça yekî ji mala Menteşa-Îstaclû bûn, li ber apê xwe ra bûn û keheha Pilingan xistin destê xwe, lê Bîsat Beg diya wan mar kir û ordiya leşkerê xwe şande ser wan û herdû zarak reviyân û çûne cem Şah Îsmailê diwem û nêzîkî salek li Qezwîn man û di sala 986 de Şah Îsmail koça xwe barkir û ji cihana jîndarî çû bin axa sar. Lê Teymûrxan û Hiloxan hatin Kurdistana Erdelan û gelek ji mezin û serdar û serkarên Bîsat Beg kirin hevalên xwe, lê gelek diwê navê neçû Bîsat Beg serê xwe danî.

13-TEYMÛRXAN, KURÊ SULTAN ELÎXAN :

Di sala 986 de li şûna apê xwe bi serfirazî rûnişt û bi padîşahê Osmanlî Muradxan re da û sitand û jê regerdenxwarî û dostaniya xwe da xuyakirin û padîşah sed hezar aqçe (sîh hezar zêrên Osmanlî) ji hatina Şehrezûr bi mûçe vebirin salyane danê û navê Paşa bi ser navê wî ve zêde kir û ji wê rojê de navê wî bû Teymûr Paşa û Teymûr Paşa di saxiya xwe de welatê xwe li her çar kurên xwe parvekir. Şarezûr, Qizilce, Zelem, Senendij, Hesênabad dane Sultan Elî û Qeredax, Koysenceq, Herîr dane Bodaq Beg û Merîwan, Saqiz, Siyahkoh, Têlkoh, Xurxure dane Murad Beg û Şarebazar, Suleymanî dane Elemidîn.

Û Teymûr Paşa bi siwariyên xwe ve berê xwe da firehkirîna welatê xwe û Kermanshah, Senqer, Dînewer, Zêrînkemer ko îro jê redibêjin Geros yan Bêcar bi carek xistin bin destê xwe û bi ser welatê xwe ve berdan û ala berxwedari û serxwebûnê bilind kir û bû padîşah û guh neda ne Îran û ne Turkan û çend caran welatê Kelhor talan kir û di sala 993 de bi hezar siwarî ve careke dî dirêjî welatê Kelhor kir û fermandarê Kelhor Umer Beg, han û hewar bire Şahwerdîxanê Loristan û bi hev re ketin devê rîya Teymûr Paşa (Teymûrşah) û çawa Teymûrşah bi ser wan de hat şer destpêkir û di nav şer de hespê Teymûrşah ket û dijmina ew dîl girtin, tenê Şahwerdîxan ew bi rûmet bire mala xwe û gelek qencî pê kirin û dawî bi serbilindî rêkire mala wî.

Lê gelek neçû Dewletyarê Siyahmensûr bi fermaneke şahê Îran bû fermandarê Zerînkemer û bi sê hezar siwar ve hate welêt, lê Teymûr Paşa-Şah, çawa ev bihîst bi dûhezar siwar ve berê xwe da Zerînkemer û piştî çend şerên dijwar leşkerê Erdelan zora leşkerê Qizilbaşan bir û naçare Dew-

letyar Beg di keleha Zerînkemer de asê bû û Erdelanîyan ha wîr kelehê girtin û şer kirin, lê Teymûrşah, bi tîrekê jî nişka ve hate kuştin û Erdelanîyan dev ji kelehê bernedan û Hiloxanê birayê Teymûrşah kirin fermanदार û şer ji nû ve destpêkir û dused mirov ji Qizilbaşan hatin kuştin û Dew - letyar girtin û kuştin û bajar û keleh ji destê dijmin derxistin.

14-HILOXAN BEG, KURÊ SULTAN ELÎ BEG :

Di sala 996 de li şûna birayê xwe bû fermanदारê Erdelan û dostanî da padîşahê Osmanlî, Mûradxan û vê dostaniyê heta dû salan ajot û dawî bû dostê îranîyan û paytexta dewleta xwe ji Zelem û Merîwan bire keleha Pilingan.

Dibêjin, ev keleh wilo asêye, ko padîşahên wa çaxan nikaribûn bi zor bixin bin destên xwe, berî hingî di destê Goran de bû û heta îro jî pîj û dîwarên kelehê bitarîxê re şer dikin û bi derbasbûna tarîxê kavil û wêran û herivî ma bû, lê Hiloxan, ew nûjenkiriye û ji xwe re kire paytext. Herwekû kelehên Hesênabad, Merîwan, Zelem jî nûjen kirin, asê kirine.

Hiloxan, mirovekî destgîrê belengaz û reben û dostê wek hevî û dijminê setemkarî û zordestî bû, cotkar û bîndest gelek jê xweşbûn û jê re xêrxwaz bûn. Herwekû bi hevsînoren xwe re dost û haştîxwez bû, çawa, ko di çaxê wî de gelek gund, bajar hatin avakirin û rê û rêbiwarî hatin vekirin û sindoqa dewletê tijî zîv û zêr dibû, Hiloxan her çar şabatên salê li ser herçar kelehên xwe parvedikirin. Zivistanê li Zelem, biharan li Pilingan, havînan li Hesênabad û payîzan li Merîwan rûdinişt û gelek li leşkerê xwe dibû xwedî û dawî ala serxwebûn, gerdenazadîyê hilda û bû padîşah.

Herwekû gelek dostê zana û torevana bû, seydayên navdar li xwe kom dikirin û rûmeta wan digirt. Di sala 1019 de Huseynxanê Lor, bi navtêdana Şah Ebbas bi hezarsiwari ve hate şerê Erdelan û li ser keleha Hesênabad rû bi rû bi Hiloxan re kete nav şer û herdû Xanên kurd bi hovîti dirêjî hevkin, lê sê caran leşkerê Huseynxan şikest û xanê Lor ji desthilanîn neket û di cara çara de leşkerê Huseynxan, gelek şerpeze şikest û Erdelanîyan ew çar fersexan ajotin û bi paş de şikandin û bêtir ji hezar mirovî ji wan kuştin.

Lê çawa mîzgîna şikestina leşkerê Loristan giha Esfehan, Şah Ebbas, bi leşkerê giran ve berê xwe da welatê Erdelan û dirêjî welatê Hiloxan kir, lê careke di Erdelanîyan, leşkerê dijmin şikandin û Şah Ebbas vegeriya Esfehan û leşkerê giran dahev û careke di hate ser Kurdistana Erdelan û li hêla Esfendabad li gundê Mihem çadirên xwe vegirtin.

Alîbalî, ko mirovekî zana ji êla Zengene bû hate cem şah û her cihên asê jêre bidar vekir û dane xuyakirin û got :

- Hiloxan, ne hêjaye, ko Şehinşahê îran herî şerî wî, ez tenê bê şer dikarim wî bênim ber destê şah.

Û Şah Ebbas gotina wî xiste serî xwe û vegeriya Esfehan û diyarî, perwa bi Alîbalî re ji Hiloxan re rêkirin û Hiloxan naçare di hember vê qenciya şah de serê xwe danî û kurê xwe Ehmedxan bi hin diyariyên giranbiha ve şande Esfehan, nik Şah Ebbas û şahê zana û mezin gelek rûmeta Ehmedxan girt û xwarziya xwe lê mar kir. Zerînkulahû ji wan re şahiyek mezin li dardanî û piştî çend rojan bûk û zava bi serfirazî ji Hiloxan re şandin Hesenebad.

Lê şahê mezin ji zavayê xwe re got:

-Bêje bavê xwe bere namûsa Şehinşah neşkênî û bi camêrî bê nik min û Ehmedxan xiste serê bavê xwe, ko çûyin jêre çêti re û pêda zanîn, ko şah wê wî serfiraz vegeerênî mala wî.

Lê bavê biserhatî ji kurê xwere got :

-Ne diriste, ko di îro de herim nik Şah Ebbas, ma kî li bextê dijmin ewle dibî? Ma nizanî şah çi qas dijminê bavê te ye? Û me çi qas ji leşkerê şah kuştine?

Lê Ehmedxan, Mela Yaqûbê seydayê xwe jî kire hevalê xwe û bavê xwe tajote ser mirinê. Lê Hiloxan, kurê xwe û seydayê wî Mela Yaqûb xistin zindanê, lê gelek neçû mezin û rûsîyên welêt bihev re hatin cem Hiloxan û bihev re jêre gotin:

- Ne raste, ko xwe bikî dijminê Şah, eger Şah Ebbas bixwesta bêbextiyê li te bikî, xwarziya xwe nedida kurê te û bi-vî awayî xistin serê wî û Hiloxan kurê xwe û Mela Yaqûb ji zindanê berdan û piştî çend rojan Hiloxan çû nik Şah Ebbas û xwe bi destmaçkirina Şehinşahê îran serfiraz kir û bêjimar diyariyên giranbiha jêre pêşkêş kirin û Şah Ebbas, gelek bi hatina wî dilxweş bû û gelek rûmeta wî girt û cihê bilind û perwayên giranbiha danê û piştî şeş mehan ew bi serfirazî î diyariyên giranbiha şande Erdelan û Şah Ebbas bi fermanekê welatê Erdelan ji Hemedan û heta Îmadiye jêre pîroz kir.

Lê di sala 1023 koçî de Hewreman. li ber Hiloxan asêbûn û Ehmedxan bi fermana bavê xwe çû şerê wan û gelek ji wan kuştin. Ji kuştîyan 18 mirov ji mezin û rûsîyên wa bi desthatir girtin û kuştin û Hiloxan di sala 1025 de serê xwe danî.

15-EHMEDXAN, KURÊ HİLOXAN :

Di sala 1023 ê koçî de çawa Hiloxan serê xwe danî Ehmed

xan kete şûna bavê xwe û bîst hezar siwarî ji kurdên Erdelan xistin bin çekan û tekûz kirin û alavên şer bicarek ji xwe re pêkanîn û di wê navê de fermandarên Mukrî û Bilbas, li ber Şah serê xwe hildan û Şah Ebbas, Ehmedxan bi leşkerê Erdelan ve rêkire ser wan û ji bo parastina tac û textê Şah Ebbas herdû leşkerên kurd dirêjî hev kirin û piştî çend şerên xwîndar, leşkerê Erdelan, dijminê xwe şikandin û gelek ji herdû rexan hatin kuştin û Mukrî û Bilbasî gelek bi dîlî ketin destê kurdên Erdelan û pirê wan bi ser çiya ketin û xwe veşardin û ên mayîn di keleha Rewandiz de asê bûn û leşkerê Erdelanî welat bicarek tar û mar û talan kirin û hawîr kelehê girtin û piştî pêlakê keleh sitandin û bi ser Erdelan ve berda û Qerehesen Beg, kurê Behram Beg yek ji mirovên xwe kire fermandarê kelehê û Xalid Begê Xoşnavî li ser xoşnava kire fermandar û Osman Beg, kurê Yaqûb Beg kire fermandarê Îmadiye-Badînan. Herwekû li Herîr, Koy senceq hin mirovên xwe kirin fermandar û fermandarên Rewandiz ji zariwên vî Qerehenî veketine û xanzadeyên malbatê Mihemed Reşîd Wekîl ji Xalid Beg veketine, ko mîrekên Xoşnavin.

Lê Ehmedxan, li vir ranewesta û dirêjî Mûsil jî kir û fermandarê Mûsil reviya û çû Diyarbekir û Xan Ehmed bê şer kete nav bajêr û mezin û navdar û gerekên Mûsil diyarî jê re pêşkêş kirin û hatin xweşhatina wî û çû ser gorna Nebî-yûnis û mizgîna vegirtina Mûsil ji xezûrê xwe re rêkir û Şah Ebbas xencera xwe, ko bi gewheran hatibû xemilandin jê re bi diyarî rêkir û hespê xwe jî pê re şand û diwazde hezar polên avzêrkirî pere jê re şandin.

Xan Ehmedxan, piştî çil rojî berê xwe da Kerkûkê û bê şer xiste destê xwe û femandarektê de danî û sivik berê xwe da Bexdayê. Lê çawa Şah Ebbas bihîst, ko Xan Ehmedxan, berê xwe daye Bexda, ew jî bi leşkerekî mezin ve hate Bexda.

Lê çawa Ehmedxan, giha Bexda, xanedan û mezinên bajêr diyarîjê re anîn û hatin cem û bi dîtina wî serfiraz bûn û Ehmedxan bi çepik û hos û lîlanê ve kete nav bajêr û çawa hatina Şah Ebbas bihîst bi giregirê bajêr ve çûne pêrgî şe hinşahê Îran, şahê serbizêr û payebilind û Xan Ehmedxan bi destûreke şahanî vegeriya Erdelan.

Heft sal Ehmedxan di nav şer û tevgerê de rabiwardin û di van heft salan de Mûsil, Kerkûk, Bexda bi ser dewleta şahê Îran ve berdan û vegeriya welatê xwe. Herwekû Şah Ebbas di sala 1038 de serê xwe danî û Şah Sefiyidîn kete şûna wî.

Şah Sefî, weke Şah Ebbas rûmeta Ehmedxan digirt û her -

dembi xwe re digerland û ji xwarziya Şah Ebbas, Zerînkulah, kurek ji Ehmedxan re çêbû û navê wî kirin Surxab.

Me berî niha gotibû Zerînkulah, xwarziya Şah Ebbas bû, lê niha em dibêjin xuşkawî ye. Nizanim ev newekhevî ji ku derketiye? Û Şah Sefî di nav zarokên xwe de xwedî dikir û dida xwendin, lê Suleymanxanê Erdelanî, ko hêj wê dabaşa wî bê bi Şah Sefî dazanîn, ko Surxab Beg dixwazî wî bikujî û ew bibî şahê Îran.

Şah Sefî, bêko kûr binerî herdû çavên Surxab Beg dera-nîn û di sala 1039 de ew kor kir û çawa Xan Ehmedxan ev re şemizgîn bihîst dîn û har û bêhiş bû û roj bi roj nexweşî-ya Mêxolî lê peyda dibû û bêtir xemgîn û sergerdan dibû û hin tevgerên dînîtiyê lê xuyadikirin û li ser şîretên dek-tor û pêzan û rêzanan ew girtin û serkariya welêt sipardin wezîrê navdar û zana İsmail Beg, bapîrê İnayetulah Beg û bi camêrî welatê Erdelan lihevragirt, lê piştî salekê Eh-medxan vejeriya ser textê dewletê û hişê wî hate serê wî û ji wê nexweşiyê pak û paqij bû û Ehmedxan vê carê berê xwe da dewleta Osmanlî û bi Sultan Muradxan re da û sitand û di sala 1041 de dirêjî welatê Îran kir û di çaxekî hindik de Kermanşah, Sencer, Geros, Hemedan, Xoy, Ormiye xistin destê xwe û di wan de fermandarên xwe danîn û pere û xutbe li ser navê xwe dane xwendin û heta pênc salan serbixwe û gerdenazad padîşahî dikir.

Mirdoxî wê xutba, ko di roja îne de li Hesenabad li ser navê Ehmedxan hatiye xwendin di tarîxa xwe de nivîsiye û dibêjî Ebdilxefarê Merdoxî xwendiyê û tê de gelek pesnê Eh-medxan daye, lê ji ber, ko pir dirêje min nexwest di vir de binivîsim.

Lê çawa ev serpêhatî ji Şah Sefî re hatin gotin, leşke-rekî giran bi serdariya Zalxan û Siyawaşxan şande ser Xan Ehmedşah û naçare Xan Ehmedşah ev serpêhatî bi padîşahê Os-manlî da zanîn û Muradxan leşkerekî giran bi serdariya Me-nûçeher Paşa di han û hewara Şah Ehmedxan rêkir sînorê Kur-distan û di sala 1046 ê koçî de herdû li hêla pingava Merî-wan rastî hev hatin û şer di nav wan de destpêkir, lê piş-tî neh rojan şer, leşkerê Erdelan û Rom şikestin. Şah Eh-med bazda û çû Mûsil û Suleymanî û Şehrezûr xistin bin des-tê xwe û bajarê Mûsil ji xwe re kire paytext.

Belam Muradxan, piştî vê şikestinê careke dî karê xwe û şerekî mezin kir û şeş tîp û çar hezar siwarî bi leşkerê Kurdistan ve û bicarek xistin bin femandariya Xusrew Paşa û şande ser Erdelan û leşkerê giran bi rêket.

Herwekû Şah Sefîxan jî, bi serdariya Zeynelxanê şamlû leşkerekî giran şande Kurdistan(Erdelan) û bi xwe bi ordi-

yeke mezin ve li pişt leşkerê Zeynelxan, li Hemedan rawesta û careke dî herdû leşker, li Merîwan li hev rasthatin û şer destpêkir, lê piştî çend şerên dijwar, xwîndar leşkerê Îran bi paşde şikest û perakende bazde û leşkerê Xusrew Paşa û Ehmedxan Paşa pêre bi zor ketin Senendij. Lê piştî rojekê berê xwe dane Hemedan û gihane Esedabad. Tenê dîn, ko welat vala maye û xelkê welat berdaye û bi paşde reviyane, naçare leşkerê Osmanlî bi paşde vegeriya Derguzîn û li wir şerê giran destpêkir û leşkerê Xusrew Paşa şikest û vegeriya hêla Bexda.

Şah Sefî, piştî vê serbilindiyê Suleymanxan, kurê Elemî dîn, neviyê Teymûrxan kire fermandarê Erdelan.

16-SULEYMANXAN, KURÊ ELEMÎDÎN, KURÊ TEYMÛRXAN :

Di sala 1046 ê koçî de bû fermandarê Erdelan û gundê Senendij ji xwe re kire paytext û têde rûnişt û dest bi avanî û avakirina welêt kir û keleheke mezin di nav gund de avakir û navê wê kire Senediz (Senendij-Senenduc), ko berî hingî eşîra Zerînkevej, ko bixwe ji neviyên Tûzênêzerin di vê hindamê de bûn.

Heta sala 1347 ê koçî jî fermandarên Senediz kurd bûn, lê ji wê salê virde Senediz bû leşkergeha leşkerê îranê. Herwekû Suleymanxan ji kelehê pêve jî hin mizgevt û bazar avakirin û co kolan û av kişandin kelehê. Herwekû kelehên, Zelem, Pilingan, Merîwan û Hesênabad jî ava û nûjen kirin.

Lê Xan Ehmedxan, li ser vê şikestinê raneza û rojekê bi diwazde hezar leşker ve ji Mûsil derket û berê xwe Erde - lan û çawa Suleymanxan ev reşemizgîn bihîst şande nik Şah Sefîxan û her tişt pê da zanîn, Şahê Îran bi serdariya Alî balî, femandarekî kurdê Zengene bi sêsed siwarî ve şandê Senedij û bi serdariya Siyahoş Beg, Qolaxasî û Şah Wêrdîxanê Loristan û Axaxan, mezinê kurdên Ciwanşêr her bi leşkerê xwe ve rêkirin hana Suleymanxan û xwestin rê liber Ehmedxan bigrin û herdû leşkerên kurd careke dî li Merîwan, lihev rasthatin û şer destpêkir û piştî, ko çend serdarên, Ehmedxan hatin kuştin, careke dî berê xwe da Mûsil û bi paşde vegeriya û di sala 1048 de li Mûsil serê xwe danî û di mizgevtê Yûnis Peyxamber de hate veşardin û 23 sala li Erdelan femandarî kiriye û 5 sala padîşah û serbixwe maye.

Bi mirina wî, çola femandariya Erdelan ji Suleymanxan re vala ma û bîst salan femandarî kir û di sala 1066 de serê xwe danî û Suleymanxan mirovekî mêr û gernas bû. Di şerên Turk û Ecem de gelek mêraniyên mezin nîşan dan û serê çend serdarên turk ji Sefîşah jêkirin û anîn û Şah Eb-

basê duwem jî gelek jê re baş bû.

17-KELİB ELÎXAN, KURÊ SULEYMANXAN, KURÊ ELEMİDÎN, KURÊ TEYMÛRXAN :

Piştî mirina Suleymanxan û li ser hêvîkirina Uweys, sultanê Kulhur Şah Ebbasê diwem, Kelim Elîxan kire fermandarê Erdelan û welat li zariwên Suleymanxan parvekirin.

1- Senenduj û rojhilat dane Kelib Elîxan, mezinê zariwên Suleymanxan.

2- Merîwan dane Xesroxan, kurê Suleymanxan.

3- Seqiz, dane Sultan Suhrab û Siyahko bi ser ve berdan.

4- Pilingan dane Mîrweys, sultanê Kelhorî.

5-Şarezûr, dane Mihemedxanê Furcî.

6- Ciwanrûd, dane Sefîxanê Sultan.

Û gereke hemî dibin fermana Kelib Elîxan de bin û Mihemed Sultan Gelbaxî û hemî mezinê welêt xistin bin destê Kelib Elîxan û di sala 1067 de Kelib Elîxan di bajarê Senendiz de bi kamîranî û serfirazî rûnişt û Şah Ebbas gelek jê xweş û pêbawer bû.

Di wê navê de xelkê Xozistanê li ber Şah Ebbas serê xwe hildan û bi fermana Şah Ebbas, Kelib Elî çû ser wan û bi-zor vegerandin bin siya dewleta Îran û agirê sergêjî û berdîberdanê bicarek vekujt û ji wê rojê de gelek li ber dilê Şah Ebbas şêrîn bû û di çavê wî de mezin û payedar bû û Kelib Elî gelek dewlemend û serbilind bû û malê xwe ji destê dost, xwestek, belengaz, reben û bêmala nedigirt û di cihê camêrî de belav dikir û bi vî rengî serbilind, payedar paz-de(15) sal rabiwardin û di sala 1082 ê koçî de serê xwe danî.

18-XAN EHMEDXAN, KURÊ KELİB ELÎXAN, KURÊ SULEYMANXAN :

Piştî mirina bavê xwe bû fermandarê welêt û li ser fermana Suleymanşahê Sefewî, Ehmedxan ala fermandarî di welatê Erdelan de bilind kir û hilda. Lê çawa rûnişt dest bi vexwarin û dan û malrijandinê kir û guh neda dewletê û gelek neçû sendoqa dewletê vala hişt. Ji lîzlik, serxweşî pê ve guh nedida tişteki dî û zor û setem li millet û welat hatin barandin û berdîberdan kete nav dewletê û Xusroxan, apê wî her çiqas jê redigot, lê guh lê nedikir û naçare çî rok gihandin ber destê Suleymanşah û di sala 1090 ê koçî de hevsarê femandariya Erdelan dane destê Xusroxan.

19-XUSROXAN, KURÊ SULEYMANXAN :

Piştî, ko Ehmedxan bi fermaneke Suleymanşahê Sefewî hate avêtin, Xusroxanê apê wî di sala 1091 de hate ser textê

dewletê û bi ferman û diyariyên Suleymanşahê Sefewî hate pîrozkirin û ji keleha Merîwan dewleta xwe guhazte Sine û Xan Ehmedxan girt û xiste zindanê û şande zindana Esfehan û serbixwe bû fermandarê welêt.

Lê ne li gora dilê xelkê derket , dest bi zor û setem û talana kir û hawarên perîşan û setembaran digihane çerxa gerdûn û herkesî gilî gazin jê dikirin û naçare çend mirov bidizî çûne Esfehan û gilî û gazinên xwe ji şehinşah re pêşkêş kirin û Şahê Sefewî liberdilê wan da û dilxweş ve gerandin nik Xusroxan û çend şîretên giranbiha jê re şandin, lê Xusroxan ew çend mirov dane ber çavên setem û zorê û hin ji wan bidarvekirin û gelek ji wan bê qiram hiştin û guh neda şîretên Suleymanşah û çawa padîşahê Îran ev bihîstdi cî de Teymûrxanê Emîlû şande Sine û Xusroxan destgîrêdayî di sala 1093 de ew li meydana Esfehan bidarvekirin û Teymûrxan, Emberlo kire fermandarê Erdelan(Kurdistan) ko mirovê pêşiyê ji bêgana li Kurdistan(Erdelan) bûye fermandar.

Jivir tê xuyakirin, ko dara dewleta Erdelanî kete payîza jînê û kurmî bû û ji vir û ha dewê roj bi roj berepaş ve gerî û di bin destê bêgana kevî û hespê dewletê sivik ber bi kortala mirinê ve gavên xwe tavêjî.

20-TEYMÛRXANÊ EMBERLÛ(BIYANÎ) :

Di sala 1093 de bi fermana Suleymanşahê Sefewî bû fermandarê Erdelan û Xusroxan hate bidarvekirin, lê tevlî, ko ne ji malbata mala Erdelan bû jî lê gelek ji xelkê hezdi-kir û dostê hûr û gir û dûr û nêzîka bû û bi vî rengî herkes kire dost û hevalê xwe, lê piştî şeş(6) salan û di sala 1099 de hate avêtin û careke dî Xan Ehmedxanê, Erdelanî bi fermana şah bû fermandarê welêt û li cihê bav û kalê xwe rûnişt.

21-XAN EHMEDXAN DÎ CARA DÎWEM DE :

Di sala 1099 de Ehmedxan, kurê Kelib Elîxan bi ferman û diyarî careke dî bû fermandarê Erdelan û hate Sine rûnişt.

Tenê kurd dibêjin, kurmê şîrî heta pîrî. Ehmedxan careke dî ne li gora dilê xelkê welêt derket û careke dî zor û setem û careke dî lîztik û vexwarin û serxweşî.

Ji lewra Suleymanpaşayê Babanî dilê xwe bijande welatê Erdelan û rojekê bi leşkerekî giran ve ji Kurd û Ereb dirêjkire welatê Erdelan û di sala 1100 ê koçî de Merîwan, Seqiz, Oraman bi zor xistin destê xwe û Zehrab Sultan, kurê Kelib Elîxan, fermandarê Seqiz û İbrahîm Beg, Mîr İskender fermandarê Merîwan girtin û kuştin û Xan Ehmedxan serpeha-

tî ji şah re da zanîn û ji bo şerkirinê karê xwe kir û leşkerê Şah Suleymanxan, bi serdariya Supahsalar Rustemxan Ebbasqulîxan Ziyadoxilî, ko navdare bi Ebbasxanê Qacar şande hana Ehmedxan û bihev re berê xwe dane meydana şer û li Merîwan şerê mezin destpêkir û piştî du rojan ceng û şer leşkerê Babanbi paş veşikest û nêzîkî çar hezar mirov ji leşkerê wî hatin kuştin û bi carek kon, çadir, barxane di bertalanê çûn û çek û xwarin û barxane ji dijmin re man û Qasim, Sultanê Oramî binbar kirin, ko wî Suleyman Paşa aniye ser Erdelan û dest bi girtinê kirin û gelek di binperda şevê de reviyân û çûne nav dewleta Osmanlî û gelek hatin girtin û hezar û dused mirov dane ber lêdanê û êşandin û gelek ji wan kuştin û serê Qasim Sultan jêkirin û xistin serê darekî û di serê girekî de çikandin û heta îro jî ew gir di cihê xwe de maye û navê wî bûye Keleko, girê seriya, lê Suleymanşah ji vî karê hovane gelek dilsar û nexweş bû û sivik Ebbasqulîxan Ziyadoxilî kişande Esfehân û bidar vekir û di sala 1105 de Suleymanşah, serê xwe danî û Şahsultanhuseyn bû Şehinşahê Îran û di sala 1107 de bi fermana Şahsultanhuseyn Ehmedxan ji fermandarî hate avêtin û Mihemedxan, kurê Xusroxanê Erdelanî kete şûna wî û fermandariya Ehmedxan cara diwem heşt sal û hinek bûn.

22-MIHAMEDXAN, KURÊ XUSROXAN :

Piştî avêtina Ehmedxan, Mihemedxan kete şûna wî û di sala 1107 de li ser textê fermandarî rûnişt û dest bi avakirin û pêşvebirina welêt kir û dilê xelkê xweş kir û ew mirovên, ko ji zor û setema Ebbasqulî Ziyadoxilo reviyabûn, bi carek vegezenadin welêt û Huseynxanê serdar ji rexê Şah huseyn hate Kurdistan û bêguneh vegezanadin cihê wan, lê di sala dilê xelkê bi wan xweş nebû û di sala 1113 de Cihangîrsultan bi hemdostên xwe ve li ber pozê Mihemedxan rabûn û giliyê wî li cem şah kirin û careke di Mihemedxanê Gurcî kirin fermandarê Erdelan û mihemedxanê Erdelanî avêtin şeş sala di fermandarî maye.

23-MIHAMEDXANÊ GURCÎ CARA DIWEM(BIYANÎ) :

Piştî avêtina Mihemedxanê Erdelanî, bi fermaneke Şahhuseyn Mihemedxanê Gurcî bû fermandarê Erdelan û ji ber, ko bixwe mirovekî Sinî û Şafiî bû gelek xêr û qencî bi xelkê welêt dikirin û herkes ji xwe re kire dost û heval û her roj bi civakî nimêj dikirin û bajarê Senedij gelek ava û fireh kir û gelek mizgevt û xwendegeh tê de avakirin û xaneke mezin, ko 66 ode tê de bûn avakir û gelek weqfên hêja li ser danîn û çaryeka wê weqfê digiha Mela Eb dilkerîm, ko çavdêrê wê xanê bû û piştî sê sala careke di

Mihemedxanê Gurcî hate avêtin.

24-HESEN ELÎXAN, KURÊ MIHEMEDMÛMÎNXAN Î 'TÎMADÎDEWLE :

Çawa Mihemedxanê Gurcî hate avêtin, Şahhuseynxan, ev Hesen Elîxan kire fermandarê Erdelan û di sala 1113 de hate Senendij û ev mirov bi rikê Mihemedxanê Gurcî bû, ji ber , ko şêî bû şerê sinî û şafiî yan bi hovîtî dikir û daxwaza wî xurtbûna rêçika şêltiyê bû û dixwest sinîtî di nav Kur - distanê de nehêlî, yan kêmbikî. Malê mêrikê sinî xwarina wî dirist didêra, dirêjî rêçika sinî dikir. Carek li gornistana Pîr Umer nerî û got :

- Ev gornistana kêye?

yekî jêre got :

- Gornistana Pîr Umere.

Di riwê mêrik de got:

- Naxwazim navê Umer bibihîzim û naka ferman da, ko vê gornê winda bikin û bicarek windakirin. Lê piştî du salan serê xwe danî. Ev cara siyeme, ko bêgan dibin fermandarê Kurdistan(Erdelan).

25-HUSEYN ELÎXAN, KURÊ MIHEMEDMÛMÎNXAN(BÎYANÎ) :

Piştî mirina Hesen Elîxan bi fermaneke Şahhuseyn bû fermandarê Erdelan û di sala 1118 de hate Senendij û ji birayê xwe bêtir dijminê sinîya bû û bi her awayî berê xwe da zor û setem û talan û eşandina millet, dawî hew xelkê karibû vê zor û setemê hilgirin û di sala 1119 de li ber rabûn û careke dî gerek û mezin û rîsipiyên welêt çûne Esfehan û gazin û giliyên xwe bi Şahhuseyn kirin û Şahhuseyn ew danî û Xusroxanê Yesawlî xiste şûna wî û salekê ev Huseyn Elî bi fermandarî li Erdelan rûnişt û cara çaran bû, ko bêgane dibin fermandarê Kurdistan(Erdelan).

26-KEYXUSROBEGÊ YESAWLÎ(BÎYANÎ) :

Di sala 1120 de ev Keyxusro beg, bi fermaneke Şahhuseyn, kete şûna Huseyn Elîxan, lê ji ber, ko ne xercê vî barê giran û karê mezin bû xelkê guh nedayê û fermanên wî badîheva diçûn û kesî bi gotina wî nedikir û dawî xelkê welêt li ber rabûn û rewşnamak dane destê şah û têde gotin :

- Kurdistana Erdelan sinî û şêî ne, em naxwazin, ko yekî şêî li ser me bikî fermandar. Eger zanibin, ko şahê Îran , rûmeta ol û rêçika me nagirî emê her yek ji xwe rebi cîkî, de birevin.

Lê çawa Şahhuseyn, rewşnama wan xwend, daxwaza wan nas-kir. Keyxusro Beg, danî û Ebbasqulîxan, ko yek ji neviyên, Xan Ehmedxan, kurê Hiloxane bi ferman û diyarî kire fermandarê Erdelan û Keyxusro Yesawlî salek neqedand û çû. Herwê

kû ev cara pêncem bû, ko bêgane dibûn fermandarê Erdelan.

27-EBBASQULÎXANÊ ERDELANÎ, KURÊ MÎHEMEDXAN, KURÊ XAN EHMEDXAN :

Di sala 1121 ê koçî de bi fermaneke Şahhuseynxan, Ebasqulîxan bû fermandarê Erdelan û xelkê welêt bi dilxweşî û dilpakî berê xwe dane kar û serê xwe jê re xwar kirin û bi mal û canê xwe sipardin mîrê xwe û kemera serbilindî û gernasî li bejna xwe girêdan û bi korî li pey gotina wî çûn û di sala 1128 de Şahhuseyn ew kire serdarê leşkerê xwe û şande ser Uweysxanê Efxanî û Ebbasqulîxan bi heşt hezar siwarê kurd ve berê xwe da daxwazê û çû.

Lê çawa gihane Taran, Elîqulî, kurê Cihangîr, kurê Kelîbelîxan, ko bixwe di nav siwaran de bû, bi dizî ji xelkê re got:

- Ebbasqulîxan me tajoyî ser mirinê û yek ji me bi ser mala xwe de sax venagerî û bi vî rengî siwarên Erdelan bica - rek reviyân û çûne mala xwe. Tenê çend mirov bi Ebbasqulîxan re man.

Ûnaçare Ebbasqulîxan ev vîlik ji Şahhuseyn re got, lê Şahê bîrewer naka ew ji fermandarî avêt û xiste zindanê û Elîqulîxan, kire fermandarê Erdelan û bi diyarî û ferman vegeande welêt.

28-ELÎQULÎXAN, KURÊ CIHANGÎR, KURÊ KELÎBELÎXAN :

Piştî girtin û avêtina Ebbasqulîxan, bi fermaneke Şahhuseyn, Elîqulîxan bû fermandarê Erdelan û di sala 1129 de hate Senedîj û di wan rojan de xelkê Loristanê serê xwe li ber Şahhuseyn bilind kirin û serbixwe ala gerdenazadî hildan û Şahhuseyn bi serdariya Elîqulîxan leşkerek rêkire ser wan û çawa lihev rasthatin û piştî çend şerên xwîndar leşkerê Loristan û Bextiyar şikestin û mezinên welêt xwe a vêtine binê çadira Elîqulîxan û digel çend mirovên, ko ji Loristan girtibûn bi diyarî ji Şahê Îran re rêkirin û nivî sarek ji şah re nivîsî û têde mehdera girtiya kir û Şahhuseyn mehdera wî bicîkir û kes ji wan nekuşt û bi diyarî û perwa ew vegeandin mala wan, lê piştî du salan nexweşiya Hal kete welatê Erdelan û nêzîkî heştê hezar mirov pê çûn.

Herwekû di sala 1132 de dewleta Îran gelek weza bû û bi paşde çû û berdîberdan kete nav welêt û Efxanî û Ozbegî serê xwe hildan û şewreşên giran destpêkirin.

Di wê çaxê de Huseyn Beg û Derwêş Begê Mamoyî û birek ji xelkê Erdelanê li ber pozê Elîqulîxan rabûn û bi hev re peymanek girêdan û bûne hevalbendê Xanepaşayê Babanî û Xanepaşaya ev hevalbendî ji xwe re pîrozî dî û berê xwe da Erdelan

û Merîwan girt û hate ser bajarê Senedij û çawa Elîqulîxan ev bihîst ji ber bazda û çû Esfehan û malmezînan û zana û rîsipîyên welêt ji tirsan bi hev re çûne cem Xanebeg û serfiraz anîne nav bajêr. Elîxan 3 salan fermandarî kir.

29-XANEPAŞAYÊ BABAN, BÎYANÎ-KURDÎ :

Piştî reva Elîqulîxan û di sala 1132 de Xanepaşayê Babanî bû fermandarê Erdelan û ji Kerkûk û heta bi Hemedan ke-
te bin destê wî. Ji xelkê welêt re gelek mehreban û dilo -
van bû, di çaxê wî de dilê xelkê gelek xweş bû û hemî dew-
lemend bûn û kar û xebat zêde bûn û mizgevt û xwendegeh li
nêzîkî kelehê ava kirin û minareke bilind tê de çêkir û sed
salî ev mizgevt û minare di bajarê Sine de ava û sax man,
lê di çaxê Emanilaxanê Erdelanî de hilweşîyan yan hilwe -
şandin.

Xanepaşayê, çar salan bi serfirazî femandariya welatê Er-
delan kir û di sala 1136 de kurê xwe Elîxan, kire ferman-
darê Erdelan û bixwe çû nav Baban.

Di wê çaxê de welatê Îran, berdîberdan û seranser şoriş
û sergêjî û kesî nikaribû lihevragirî. Ji alîkî ve Ehmedpa-
şayê Babanî, welatên Kermanshah, Hemedan, Birocird, Niha-
wend xistin bindestê xwe û ji alîkî dî ve leşkerê Osmanî,
welatê Wan, Başqela, Azerbaycan, Ta, Xemse xistin bindestê
xwe û heçî mayî Rûs û Efxan girtibûn.

30-ELÎXAN, KURÊ XANEPAŞAYÊ BABANÎ :

Çawa Xanepaşayê di sala 1136 ê koçî de vegeriya welatê
xwe, kurê xwe Elîxan, li şûna xwe kire fermandarê Erdelan.
Tevlî, ko jîndariya wî hindik û bixwe hêj, biçûk bû jî, lê
gelek mirovekî zana û mezin û bîrewer û mîletperwer bû, mi-
rovperest û gelek ji cotar û gundiyan hezdidar, dostê xwe
dewar û zana û hozan û torevana bû û herdem di civata wan
de bû. Di çaxê wî de zor û setem ji welêt rabûn û rebenî û
belengazî konê xwe barkirin û çûn, şeş salan bi kamîranî û
serfirazî fermandarî kir û di sala 1142 de, ko Nadîrşah ha-
te meydanê û berê xwe da Kermanshah û Hemedan, Elîxan destê
xwe ji Erdelan kişand û vegeriya welatê xwe û careke dî Eb-
basqulîxanê Erdelanî bi fermaneke Şahtehmaseb û bi girtina
Nadîr, ko jê re digotin Tehmasebqulîxan û bixwe ji xelkê Ev-
şar bû, Ebbasqulîxan bû fermandarê Erdelan û heta bajarê
Senedij û careke dî çira Erdelaniyan vêket û dewlet û mî-
let vegeriyan bindestê wan.

31-EBBASQULÎXAN, CARA DÎWEM :

Piştî, ko Elîxanê Babanî vegeriya welatê xwe, Ebbasqulî-
xan bi devê Nadîrşah, Tehmasebqulîxanê Evşarî bû ferman-
darê

rê Erdelan û hate bajarê Sene û di sala 1142 de bû ferman dar, lê gelek neçû serê xwe danî û ji cihanê koça xwe bar kir û çû.

32-SUBHANVÊRDÎXAN, KURÊ EBBASQULÎXAN :

Di sala 1143 de û piştî mirina bavê xwe bû ferman darê Erdelan. Mirovekî zana, dilovan, Mihreban û miletperwer bû pirên cara digel Şêx Cemalidînê pêşî, kurê Şêx Ebdilmûminê pêşî, ko Şêx û seydayê mizgevtê Xanepaşa bû rûdinişt û li ser destê wî hînî jimarê bû û bajar û welat gelek bipêş de birin û ava kirin û di sala 1147 de Nadirşah ji Esfehan ha te ser welatê Şêrwan û Gurcistan û paşê hate Senendij û Subhanvêrdîxan jê re hezar rîtil rûn-rûxen û hezar tûman pêşkêş kirin û ji Kurdistan berê xwe da Xerasan û Ehmedxanê kurê Subhanxan tevî çend rîsipî û mezinên kurd û pêsed siwar bixwe re birin û Nadirşah di sala 1148 de Subhanvêrdîxan danî û Mustefexanê birayê wî kire ferman darê Erdelan û femandariya Subhanvêrdîxan pênc sal û hinek bûn.

33-MUSTEFAXANÊ, KURÊ EBBASQULÎXAN :

Di sala 1148 ê koçî de û bi fermana Nadirşahê Evşarî Mustefaxan, kurê Ebbasqulîxan bû ferman darê Erdelan û Nezerelî Beg ji ber xwe ve şande Senendij û di sala 1149 de bixwe hate Erdelan(Kurdistan), lê ji ber, ko nezan bû, nizanibû dilê xelkê bixwe xweş bikî. Piştî çend mehan ew avêtin û li Esfehan dîn bû û paşê serê xwe danî.

34-SUBHANVÊRDÎXAN, CARA DÎWEM :

Di sala 1149 de û bi fermana Nadirşah careke dî Subhanvêrdîxan vegeziya ser textê femandariya Erdelan û ala ser bilindî di Kurdistanê de bilind kir û kurê wî Ehmedxan dînav leşkerê Nadirşah de şev û ro dînav pêlê ceng û şer de bû û gelek gernasî û cengawerî nîşan didan û çawa Nadirşah ji Hindê vegeziya û berê xwe da welatê Xwarzem, şande pey Subhanvêrdîxan û Ehmedxanê kurê wî li şûna wî kire ferman darê Erdelan.

35-EHMEDXAN, KURÊ SUBHANVÊRDÎXAN :

Di sala 1153 de çawa bavê wî hate avêtin, bi fermaneke Nadirşah kete şûna bavê xwe û ji Mûsil heta Hemedan xiste bindestê xwe û gelek serbilind û payedar bû.

Lê di sala 1154 de careke dî Nadirşah ew bixwe re bire şerê Daxistan û Subhanvêrdîxan li şûna kurê xwe rûnişt, lê piştî salek û sê mehan û di sala 1155 de Ehmedxan li şûna bavê xwe rûnişt û ji ber xwe ve İbrahîm Beg şande Erdelan û piştî pêlakê ew jî hate Senedij. Tenê di wê salê de giraniyeke pir mezin kete welêt û nan û can weke hev bûn û ji

bo, ko xelkê welêt ji birçîna nemrin devê embaran vekir û çî li cem hebû da mîlet û leşker. Bê xwarin hişt û ji nişkave Nadirşah, mirovek rêkire û got :

- Çî tiştê di embarên Kurdistanê de hebî barkin û bibin Azerbaycan.

Lê çawa mêrik hat dî, ko bicarek embarên dewletê valane û bi xeyd vegeriya û ev serpêhatî ji şah re bi darvekir û nivîsî.

Çawa Nadirşah, ev nivîsar xwend, di cî de ferman bi kuştin û darvekirina Ehmedxan derxist, lê dost û hevalên Ehmedxan berî, ko bê girtin jê regotin û naçare bi du hezar suwar ve berê xwe da dewleta Osmanî û birê de Zahir Begê, Cav kuşt û Xalidpaşa Babanî kire fermandarê Baban û ji şeh rezûr berê xwe da Mûsil û fermandarê Mûsil ji tirsan derê kelehê lixwe girt û li ber asê bû, lê Ehmedxan di çaxekî hind de bajar xiste destê xwe û fermandarê Mûsil kuşt û mirovek bi navê Mihemed Çelebî, kire fermandarê Mûsil û berê xwe da Diyarbekir û Heleb û piştî mehk û çar rojan kete bajarê Qestentînye.

Sedrêazem , Şeyxilislam û mezinên bajêr derketin pêrgî wî û bi xweşî û bi serfirazî, dilşadî ew birin mêvanxana padîşah û paşê bi fermana Hemayûnî kirin fermandarê Edirne.

Lê çawa dengê reva Ehmedxan kete guhê Nedirşah, Subhanvêrdîxanê bavê Ehmedxan, kire Beglerbegê Taran û di sala 1156 de Hacî Melavêrdîxanê Qacarî kire fermandarê Erdelan û çawa Hacî Melaxanê Qezwî giha Senedij ji ber hevrikiya , olperestî û nezaniya xwe salek nema û hate avêtin û careke dî Subhanvêrdîxanê Erdelanî bû fermandarê Kurdistanê Erdelan û Mihemedridabegê Gurcî bû serdarê leşkerê Erdelan û ji ber Nedirşah ve li Kurdistanê rûnişt û deh hezar tûmen, bihayê wan embarên, ko Ehmedxan vekiribûn ji Îbrahîm Beg , serkarê Ehmedxan sitandin. Ev Mihemedridaxanê Gurcî mirovekî çors û gotin nexweş û dijwar bû, xelkê welêt dixwestin, li ber rabin û şewreşeke mezin di riwê wî de çêkin lê zû ji wan re mizgîn hat, ko Nadirşah hate kuştin û Subhanvêrdîxan bi dizî ji Mihemedrida Beg re got û bi siwarên xwe ve bişev û dizî ji welêt bazdan. Kuştina Nadirşah di 1156 de bû, lê çawa xelkê welêt bi vê serpêhatiyê agah bûn, xwestin pey Mihemed Begê Gurcî kevin, lê Subhanvêrdîxan nehişt.

Piştî heft mehan Adilşah, ko navê wî Îbrahîmxan bû û bi rayê Naderşah bû li şûna birayê xwe rûnişt û ji ber xwe vê Erdelanî kir fermandarê Erdelan û Subhanvêrdîxan di sala 1161 ê koçî de li Hemedan serê xwe danî û laşê wî anîn Kurdistanê veşardin di kelehêde Kumbeda Şeyda de hate veşar

din. Heşt caran di femandariya xwe de hate avêtin û hijde salan perçe perçe femandarî kiriye.

36-HESENXANÊ ERDELANÎ :

Di sala 1161 ê koçlî de bû femandarê Kurdistanê û Adilşah, ferman û diyarî jê re şandin û Hesexan ji rê ve dest bi avaniya welêt kir û sînorên xwe parastin û derbend û ke lehên xwe asê kirin, lê di sala 1162 de, ko welatê Îran bû berdîberdan û her xanek di cihê xwe de bû padîşah û serbi-xwe rûnişt. Îmamqulîxanê Zengene di Kermanshah de leşkerekî giran ji eşîra Zengene, Goran, Kelhurda hev û berê xwe da Erdelan û Hesex Elîxan bi leşkerekî hindik ve naçare çû pêrgî dijminê xwe û li hindama Bilwar, kurdên Zengene şikandin û piştî çend şerên xwîndar û dijwar û şikandina dijmin bi serfirazî vegeriya paytexta xwe, lê leşkerê kurdên Zengene û hevalbendên xwe perîşan, perakende şikest û mal û çadir û barxane ketin destê Erdelaniyan û Hesex Elîxan, di bajarên Kermanshah, Senqer, Kulyayî, Kengawer, Melayir, Birocird û hin hindamên dî de serkarên xwe danîn, talan li Erdelaniyan parvekir û hatin mala xwe.

Lê di sala 1163 de Mehir Elîxanê Birocirdî, kurd ji bertirs û sawa Kerîmxanê Zendî-kurdî hana xwe anî Hesex Elîxanê Erdelanî û Hesex Elîxan ji bo, ko nedixwest Kerîmxan bi pêşde herî ev tişt ji xwe re pîroz dî û bi leşkerê Erdelanî kurdî ve çû hana Mehir Elîxan û Kerîmxan û Şêx Elîxan û Îskenderxan bi leşkerekî giran ve çûne şerê Hesex Elîxan û li hindama Melayir herdû leşkerên kurd lihev rasthatin û piştî çend şerên dijwar û xwîndar, leşkerê Zend şikest û bê pergal, perakende bi paşde reviyar û 80 siwar û 36 gernas û mirovên navdarên Zend hatin kuştin û Hesex Elîxan, Mehir Elîxan kire femandarê Birocird û vegeriya mala xwe.

Tenê di dawiya vê salê de Selîm Paşayê Babanî ji rexê padîşah û dewleta Osmanlî ve bû femandarê Baban û Suleyman Paşa Baban, ko hat avêtin, reviya û xwe li bextê Hesex Elîxanê Erdelanî girt û piştî pêlakê Selîm Paşa nivîsarek ji Hesex Elîxan re rêkir û doza Suleyman Paşayê Babanî lê kir û got :

- Dixwazim pismamê min bidî destê min.

Lê Hesex Elîxan, di bersiva wî de got :

- Ev tişt bicarek nêdiriste û nayê gotin.

Lê Selîm paşa, ev bersiva Hesex Elîxan rêkire nik waliyê Bexda, Keyyawezîr û Kehya nivîsarek li ser zimanê xwe ji Hesexan re nivîsî û got :

- Eger Suleyman Paşa nedî destê me, wê di nevbêra me de sergêjî û dilsarî çêbibin û dawî gelek dijwar dibî.

Lê Hesên Elîxan guh neda tirstêfirandin û fort û portên wezîr û di bersiva wî de bi hişkî nivîsî û vegerand. Wezîrê navdar bersiva Hesên Elîxan rêkire nik padîşah û wezîrê Bexda berî, ko fermana padîşah derkevî, leşkerê xwe da ser hev û eşîrên ereb û Turkên Yenîçerî û fermandarê Mûsil û fermandarê Koysenceq û fermandarê Herîr Ferec Paşa di gel leşkerê Baban, ko digihane bîst hezar mirov dirêjî welatê Erdelan kirin û li ser sînore Erdelan Selîm Paşa, kurê xwe Ferhad Paşa ji ber xwe ve şande nik Hesên Elîxan.

Naçare Hesên Elîxan mezin û geregerên Erdelan civandin û li ser vê daxwazê bi hev re dan û sitandin û dawî bi pira nî bersiva Ferhad Paşa Baban dan û gotin :
- Meger cihan bi ser hev de bikumişî, nabî, ko em Suleyman Paşa bidin destê we.

Iê çawa Ferhad Paşa Baban, vegeriya û bersiva Erdelaniyan jê re got, leşkerê Selîm Paşa êrîşî welatê Erdelanê kir û careke dî dijminê kurd, kurd bi kurd dane kuştin.

Û Hesên Elîxan, naçare kozik û çeperên xwe li ber dijmin asêkirin û bi deh hezar siwar û peya ve digel Mihemedemînxanê Geros, pijiqîne pêrgî dijminê xwe û şerê giran di navbera herdû rexan de li hindama Merîwan destpêkir û qîr û halan di ezmanê Kurdistan ve bilind dibûn û weke gernas û pehlewana bi hovî dirêjî hev kirin, lê piştî 6 saet beyreqa leşkerê Erdelan vajî hate xwar û şikestin û Hesên Elîxan perîşan xwe gihande Senedij û Suleyman Paşa tevî mirovên xwe reviyar û xwe veşardin û ordiya Osmanî têkel berê xwe da Senedij.

Naçare Hesên Elîxan, berê xwe da êlaxa û kete çiya û bajar ji dijminê xwe re berda û leşkerê Selîm Paşa bi hesanî hate nav bajêr û sêzde rojan welat û bajar di bin giraniya zor û setema leşkerên dijmin de hatin perçiqandin û jinê Fileh û Cihwan hatin berbadkirin û namûs dane nav lingan û malên dewlemend birin Suleymanî, Herîr, Koyserceq û paşê leşkerê dijmin vegeriya welatê xwe.

Hesên Elîxan, vegeriya welêt û dest bi avanî û nûjenkirina bajar û cihên wêran kir û jinû ve her tişt avakir, lê gereke ji bîra me neçî, ko di nav şer de İbrahîm Beg wekîl bi mirov û siwarên xwe ve bû hevalê dijmin û şerê Hesên Elîxan dikir û çawa ordiya dijmin vegeriya, ew jî reviya û çû Rewanser û keleheke mezin û asê ji xwe re avakir û Pilingan, Bilwar, Rewanser xistin bin destê xwe û di gundê Elik de rûnişt û serê xwe hilda û doza fermandarîyê kir û ji nik xwe nivîsarek şande nik Kerîmxanê Zend û got :
- Hesên Elîxan, gelek sêfil û weza ye. Eger dixwazin tola xwe jê bistênin, îro roja weye.

Kerîmxan û Elîxan ji xwe re fersende dîtin û di sêzdehê Remedanê de sala 1154 de bi bîst hezar siwar ve dirêjî Erdelan kirin û Hesên Elîxan û çend mirovê mezin pêre ji bajarê derkitin û çûne Horaman û Mela Mustefa Şeyxilislam, rê kire nav ordiya Kerîmxan û got :

- Dixwazim bi çî rengîbî, tu wî ji ser welatê me vegeerî û em şer naxwazin û dixwazim lihevhatinek dinav me de çêbîbî.

Lê Kerîmxan guh li gotinên Şeyxilislam nekir û dirêjî nav bajarê kir û naçare Hesên Elîxan bi koçemal ve kete keleh Qereto û têde asê bû û leşkerê Kerîmxan çawa kete nav bajarê Senedij, tiştên kesnedî bi serê xelkê de anîn û şexelîxanê Zend, keleha Qereto xist asêgehê, lê ji ber, ko keleh asê û dijwar bû tu çare tê nekir û destevala vegeerîya.

Herwekû çawa Suleyman Paşayê Babanî, ko di serê çiya de bû, bihîst, ko leşkerê Kerîmxan kete Senedij, bê perwa xwe avête nav leşker û xwe da destê Kerîmxan û leşkerê Şeyx Elîxan jî vegeerîya nav bajarê û hawîr bû, kuştin, talan, ber dîberdan û berê xwe da welatê Geros û ji ber, ko Mihemed Emînxanê Gerosî dost û hevalbendê Hesên Elîxan bû bajar û sera û eywanê xanê Geros bicarek wêran û tar û mar hiştin û Xorşîdexanim, keça Mihemed Emînxan bi dîlî bixwe re birin û çûne welatê xwe.

Lê Hesên Elîxan piştî çûna dijmin vegeerîya nav bajarê lê çî bajar, bajarekî kavil, wêran, tazî û birçî û perîşan na çare berê xwe da Azerbaycan û serê xwe ji Esedxanê Efxanî re xwar kir û xwe da bin siya beyreqa Efxanî û diwêçaxê de pirê welatê Îrandî bin siya wê de dijî û azad-Esedxan, li Azerbaycan, Sayinkele rûniştî û doza padîşahiya Îranê dikir û Hesên Elîxan ji nû ve firêliyên bazdayî dane hev û leşkerê xwe saz kir û dest bi avaniya kirin û her tişt di welatê xwe de nûjen kirin û du sala lîser hev di vî karî de bê rûniştin tevgerên mezin dikirin.

Herwekû di sala 1166 de Elîmuradxanê Bextyarî(Lorî) leşkerêkî bê jimar kişande ser Kermanshah û bizor xiste destê xwe. Çawa, ko di wê navê de mirovekî li Bexda bi navê Şahsultan Huseynê diwem, doza padîşahiya Îranê kir û di got :
- Ez kurê Sultan Huseyn, padîşahê Îranî û êrîşî welatê Erdelan kir û hat.

Naçare Hesên Elîxan, karê xwe û cengê kir û Mîrzamihdîxanê Şikakî bû hevalê Şahhuseynê diwem û got :

- Raste, ev kurê Şahhuseynê pêşiyê û bixwe re anî û hatin Kermanshah.

Lê çawa Kerîmxan ev bihîst bi leşkerê xwe ve hate hana Hesên Elîxan. Herwekû Elîmuradxanê Lorî (Bextiyarî) ev ji xwe re pîroz dît û di binsiya Şahhuseynê diwem de û bi leşkerê giran ve êrîşî Kurdistanê Erdelan kirin û careke di fermandarên kurd bûne dijminê hev û bîr nebirin, ko yekî ji xwe bikin padîşah û bicarek serbilind di hinda xwe de femandariya xwe bikin û careke di herdu leşkerên kurd di hindama Bilwar de dirêjî hev kirin, lê piştî şerekî dijwar leşkerê Zend û Erdelan dijminê xwe şikandin û çadir û barxane bicarek xistin destên xwe û gelek ji Bextiyariyan kuştin û Şahhuseynê derewîn bi dilî kete destê Kerîmxan û Hesên Elîxan bi dilxweşî hate Senedij û Kerîmxan çû Kerman - şah.

Çawa, ko di sala 1147 de Azadxanê Efxanî li Esfehan ala padîşahî bilind kir û Hesên Elîxan xweste nik xwe, lê Hesên Elîxan ji ber xwe ve Şeyxilislam Mela Mustefa şande cem û paşê bixwe û çend mezin û gererekên Erdelan ve çûne nik Azadxan.

Lê Selîm Paşayê Babanî, ko xwe sipardibû Azadxan û gelek karên hêja jê re kiribûn, bi hezar siparên kurd ve mêvane Azadxan bûn û bi dizî çar hezar tûmen dabûn Azadxan, ko wî bikî fermandarê Erdelan û Hesên Elîxan bigrî û çawa Hesên Elîxan giha Esfehan, Azadxan ew girt û da destê Selîm Paşa, lê Mela Mustefa û Ebdilahsultan xwe veşardî û Azadxan bi fermanekê Erdelan da destê Selîm Paşa.

37-SELÎM PAŞAYÊ BABANÎ-BÛYANÎ-KURDÎ :

Di sala 1167 de bi fermanê Azadxanê Efxanî bû fermandarê Erdelan û Hesên Elîxanê Erdelanî bi zencîr û bend xistin zindana keke Qereçûlan û piştî heft mehan Hesên Elîxan li gundê Elik hate kuştin, lê çend meh di ser ve neçûn xelkê welêt serê xwe hildan û şewreşeke mizindi riwê Selîm Paşa de çêkirin û naçare Selîm Paşa berê xwe da Newabwala Mihemedxanê Qacarî û jê hêvî kir, ko careke di femandariya Erdelan bixî bin destê wî.

Lê Xusrewxanê kurê Ehmedxanê Erdelanî, ko ev çend salin ko seraser mal û canê xwe di ber Newabwala de Hesên Mihemedê Qacarî de dabûne û roj û şev di ber zenguwa wî re digerriyâ, ev karê ha jê re pêşkêş kir, gilî û gazine xwe pê kirin.

Lê Hesên Mihemedxanê Qacarî jêre got :

- Bere ji bîra te neçî, ko tucarî ez qenciya te ji bîr nakim û welatê bav û kalên te nafirosim kesî û ev welat weke qapûtekî bi ser milê te de hatiye berdan û ji te pê ve kes nîkarî wî qapûtî bi ser milê xwe de berdî.

Hesen Mihemed Qacarî, wilo got û piştî çend rojan Selîm Paşa avêt û Xusrewxan bi diyarî û ferman rêkire Erdelan.

38-XUSREWAXANÊ ERDELANÎ :

Xusrewxan, kurê Ehmedxan, kurêSubhanvêrdîxan piştî, ko perwa û ferman ji Newabwala Hesen Mihemedxanê Qacarî sitan din bi serbilindî hate welatê bav û kalên xwe û di sala 1168 de ala fermanarî di Kurdistana Erdelan de bilind kir û bi jor ve hilda û di bajarê Senedij de rûnişt û ji bo alkarî Ebbasxan bi dused siwarî vepê re hatin Erdelan. Xusrewxan mirovekî jîrek, bîrewer û gernas û camêr bû, ko Edî bekurd, ristevaneke navdar li ser Xusrewxan çend ristên giranbiha çêkirin, lê bi Farisî çêkirine. Ji Ehmedxan du kur mabûn Xusrewxan, Ridaxan û piştî Xusrewxan bû fermanar û welat û millet ji malewêran, zor û setemên bêgana parastin û xelkê welêt bicarek kirin dost, Mihemedreşîd Beg, kurê İbrahimwekîl tenê dilsar û nexweş mabû.

Di çaxê Xusrewxan de derketî Aware, bicarek vegeeriyar welatê xwe û ji ber, ko bajarê Senedij ji ber setema dijmin wêran û kavi mabû, Xusrewxan pêlakê li Hesenabad rûnişt. Xusrew Beg û Mehîr Elî Beg, herdu pismamên Mihemed Reşîd Beg-Wekîl bûn û di derametên bilind de bûn. Herwekû, bi dev dost û bi dil dijminê Xusrewxan bûn û bi dizî vîlik digeranandin û dixwestin xelkê Hesenabad li ber Xusrewxan rakin û guh li ferman û gotinên wî nekin.

Lê çawa Xusrewxan bi vîlikên wan agah bû, ferman bi girtina wan da û herdu girtin û kuştin. Tenê çawa Mehîr Elî Beg girtin, Xusrew Beg xwe neda destê leşker û bi xencerê çendek ji wan birin kirin, lê leşker Xusrewxan dawî bi şûra ew kuştin û piştî kuştina Xusrew Beg, Mehîr Elî Beg ji kuştin û gundên wa ji xwe re hiştin û piştî vî qasî kesî ji xelkê Hesenabad serê xwe hilneda û sergêjî di riwê dewletê de nekirin, lê Xusrewxan ew rakirin û şandin Senedij û bajar avakir.

Lê di sala 1168 ê koçî de Azadxanê Efxanî, ji tirsê Kerîmxanê Zend û Hesen Mihemedxanê Qacarî bajarê Esfehnan berda û çû Azerbaycan û bi navtêdana Suleyman Paşayê Baban bi du hezar siwar ve berê xwe da Erdelan û Xusrewxan çawa ev bihîst, leşkerê xweda hev û ketin keleha Hesenabad û karê xwe û asêbûnê kirin û barxane û alavên şer ji xwe re pêkânin û dane serhev û çavneeriyê dijminê xwe kirin, lê Azadxan, hawîr kelehê girt û Mihemed Reşîd Beg û Mihemed Salih Beg ji bo, ko tola mirovên xwe Xusrew Beg Mehîr Elî Beg bistênin bûne hevalbendên dijmin û diwazde rojan liser kelehê man û tucara tenekirin.

Dibêjin, Siwerekî (Efxanî) gelek mêr û çeleng hebû, ko her roj dihate meydana şer û şer ji siwarên kurd dixwest û çend mirov ji şervanên kelehê bi vî rengî kuştin û hew kesî wê rabû, ko dakevî şerê wî û hero dihate meydana şer û siwar dixwestin heta rojekê Mihemed Axayê Celewdar jê reda kete meydanê û ew kuşt û serê wî ji Xusrewxan re bi diyarî bire serê kelehê û Xusrewxan ew kire Mîraxur û gelek rûmeta wî girt û ew Mihemed Axa, kalikê Rustem Beg mîraxure.

Lê çawa Kerîmxanê Zend ev bihîst, bi serdariya Elîxanê Zendî leşkerek şande han û hewara Xusrewxan û Elîxan ji Hermedanê derket û berê xwe da Erdelan û leşkerên Kurdistanê, ji hawîr lê gihane hev û Azadxan ji tirsê berê xwe da Azerbaycan û reviyan.

Tenê çawa Xusrewxan dî, ko dijmin dîrevî, ji kelehê derketin û dane ser şopa dijminên xwe. Çawa, ko leşkerê Elîxan ji Esedabad derket û berê xwe dane ser şopa Azadxan û herdu leşkerên kurd heta bajarê Geros li pey şopa dijminê xwe çûn û bargiranî û çek û xwarin û alavên şer ji leşkerê Azadxan sitandin û Azadxan bi hêla lingên hespê xwe azad kirin û Xusrewxan veşerîya Senedij û Elîxan çû ser Suleyman Paşayê Baban û talanênê wî bir û çû Hemedan.

Xusrewxan ev serpehatî bi wala Hesên Mihemedxan da zanîn û Hesên Mihemedxan jê re sê hezar tûmen û hespek û gelek diyarî û perwa rêkirin. Herwekê Elîxanê Zend jî çawa gişte Hemedan jê re hin xwarin û diyarî rêkirin.

Xusrewxan bajarên Sene û Hesênabad sipardin Mîrza Ebdilâhê Wezîr û Yûsif Beg û bixwe çû hindama Gerdûş, lê bişev ev herdu mirovên, ko Xusrewxan bi wan bawer bû reviyan û çûne Şarezûr û zar û zêçên Xusrewxan di kelehê de hiştin. Na çare Xusrewxan, mal û zarokên xwe ji Hesênabad rakirin û birin Senedij û keleha Hesênabad kavil û wêran hişt.

Newabwala Hesên Mihemedxanê Qacarî di şerekî de, ko bi serdariya Elîxanê Zend hatibû şerê wî û bi destê mirovekî kurd bi navê Sebselî hate kuştin û welatê Îran seranser ketiye bin destê Kerîmxanê Zend û Kurd bûne padîşahê Îran.

Kerîmxan bajarê Şîraz ji dewleta xwe re kire paytext û tede rûnişt û ferman û diyarî û perwa ji Xusrewxan re rêkirin Erdelan û dilê Xusrewxan xweşkir. Ji ber, ko hevalbend û dostê Wala Hesên Mihemedxanê Qacarî bû ditirsiya, ko Kerîmxan wî bêşênî şerê wî. Di sala 1172 ê koçî de Hesên Mihemedxanê Qacarî hate kuştin û Kerîmxan bû padîşahê Îran û hate Çîmen Sultan û Xusrewxan, kurê xwe Ehmedxan bi diyariyên giranbiha ve şande cem û di sala 1176 de Suleyman Paşê Baban gelek diyarî û perwa bixwe re birin û çû cem Kerîmşah û sê hezar tûmen danê û Kerîmşah femandariya

Erdelan ji Xusrewxan sitand û da Suleyman Paşa.

39-SULEYMAN PAŞAYÊ BABANÎ-BÛYANÎ-KURDÎ :

Kerîmxanê Zend şande cem Xusrewxanê Erdelanî û bire Şîraz û ji fêrmandarî avêt û welatê Erdelan xiste bin destê Suleyman Paşayê Baban û Suleyman Paşa di sala 1177 de hate Senedij û piştî şeş mehan bi leşkerê Erdelan û Baban ve çû ser bajarê Şerezûr.

Herwekû Elî Paşa, wezîrê Bexda, Osmanlî bi leşkerekî giran ve berê xwe da şerê Suleyman Paşa û Ehmed Paşayê Baban ko fermandarê Şarezûr bû, pêre bû û bixwe serdarê bîst hezar siwarên Têkel, Kurd û Turk û eşîrên Ereb bû.

Herwekû Emîr Paşa, fermandarê Mûsil û Ebdilah Paşa, fermandarê Zihaw di nav leşkerê Paşê de bûn û çawa gihane Kurfî deng kete guhê Suleyman Paşa û bi du hezar siwar veberê xwe dane meydana şer. Tenê leşkerê Suleyman Paşa xwe li ber leşkerê wezîrê navdar negirt û naçare meydan ji dijmin re berdand û ji meydana şer bazdan û dijminê dijwar dane ser şopa wan. Wezîrê Navdar, Ehmed Paşa Baban kire fermandarê Şarezûr û wegeriya Bexda.

Lê gelek neçû careke dî Suleyman Paşa bi leşkerekî ve berê xwe da Şarezûr û ji Ehmed Paşa sitand û Elîxanê kurê xwe şande Şîraz û bixwe geh li Sene û geh li Şarezûr rûnişt.

Lê yekî Kurd, bi navê Feqe İbrahîm, ko Suleyman Paşa li dor jina wî digeriya bişev di nav ciyê wî de bi xencera kuşt û piştî kuştina Suleyman Paşa, Kerîmşah bi fermanekê welatê Şarezûr da destê Mihemed Paşa, birayê Suleyman Paşa û Elî Paşa kire fermandarê Erdelan û di sala 1179 ê koçî de Elîxan hate Senedij.

40-XUSREWAXANÊ ERDELANÎ-CARA DÛWEM :

Di sala 1179 ê koçî de Elîxanê Babanî destê xwe ji Erdelan kişand û Xusrewxanê Erdelanî careke dî bû fermandarê welatê bav û kalên xwe û bi fermana Kerîmşahê Zend(Kurdî), bû fermandarê Erdelan û li Sine rûnişt û di sala 1180 ê koçî de hate nav bajêr û dest bi avanî û pêşvebirina welêt û bajêr kir.

Lê di sala 1191 ê koçî de waliyê Bexda bi fermana padîşahê Osmanlî, bi leşkerekî giran ve, ko ji kurd û turk û eşîrên ereb bû berê xwe da welatê Erdelan û di riya Zihaw - Helwan ve bi rêket. Çawa, ko Ebdilah Paşa, waliyê Mûsil û waliyê Kerkûk bi leşkerên xwe ve di riya Qereçûlan ve berê xwe dane Erdelan û Şarezûr Mihemed Paşa, fermandarê Şarezûr, ko hevalbendê Kerîmşah bû, bû hevalbendê dijmin û leşkerê xwe tevlî leşkerê wan kir û bi hev re berê xwe dane

Erdelan. Herwekû Mihemed Paşa, heşt hezar leşker ji wezîr sitandin û girtina Erdelan da ser milên xwe û çû. Lê çawa Xusrewxan ev bihîst, rêkire nik Kerîmşah û ev serpêhatî pê da zanîn û bi du hezar siwar ve berê xwe da meydana şer û di rê de nêzîkî heftsed siwar ji Meraxa û Geros ji paşve gihanê û li nêzîkî perayên pingava Merîwan herdû leşkerên kurd dirêjî hev kirin û şerekî xwîndar di nav wan de çêbû, lê gelek neçû leşkerê Meraxê û Geros ji meydana şer bazdan û leşkerê Xusrewxan vegeyriyan Senedij, lê piştî, ko sed mirov hatin kuştin û sed û heftê mirov bi dîlî ketin destê dijmin, ji kuştîyan mirovên navdar, Mîrza Elî û Mîrza Mihdî bûn û ji girtiyan Ebdilahê Wezîr, Nesrilah Beg, kurên Yûsif Beg, Mihemed Beg Rida-Erdelan, Ebdilahmenteşî bûn û Mîrza Ehmed, kurê Mîrza Ebdilahê Wezîr û gelek ji gernasên Erdelan hatin kuştin û girtin.

Lê Mihemed Paşayê Baban, ji tîrsa Kerîmşah newêribû bi-pêş de herî û ji tîrsa wezîrê Bexda newêribû. Bi paş de vegeyri ji lewra di Merîwan de rûnişt û kozikên xwe asêkirin û leşkerê xwe tekûz û saz kir.

Lê Kerîmşahê Zend çawa ev serpêhatî bihîst bi çend têrê jan êrîş kire welatê Osmanlî. Sadiqخانê birayê xwe bi leşkerê giran ve şande ser bajarê Besra û bi serdariya Nezer Elîxanê Zendî leşkerê giran şande ser Bexda û Kelibelîxan û Elîmuradxan Zend di rîya Erdelan ve şandin ser Mihemed Paşayê Baban.

Sadiqخان zû Besra xiste destê xwe û Nezer Elîxan bi sê fersexan nêzîkî li Bexdayê kir û ew nav bicarek xistin destên xwe û Kelibelîxan û Elîmuradxan hatin Senedij û tevî leşkerê Erdelan û bi serdariya Xusrewxan berê xwe dane Merîwan.

Lê di sala 1191 ê koçî de Mihemed Paşa, Merîwan bê şer berda, lê ordiya kurd ajote ser Qeleçolan û Qizilce û ketin nav bajêr, ko bi pêncî fersexan dîrî Qeleçolan dikevî û Lutifelîxanê, kurê Subhanvêrdîxanê Erdelanî, pîsmamê Xusrewxan da ser şopa Mihemed Paşa û talanî û wêranî biser welatê Şarezûr de hatin barandin.

Lê ji rexê Kerîmşah ve Gerekelî Beg (Ciledar), hate cem Xusrewxan û got:

- Padîşahê Osmanlî, ji bo lihevhatinê peykên xwe rê kirine nik Kerîmşah û bi fermana Şahê Îran, gereke agirê cengê bê vemirandin û şer rawestî heta çaxê dî.

Ji lewra Elîmuradxan vegeyriya Kermaşah û Xusrewxan û Kelibelîxan vegeyriyane gundê Zaxe, ji Kurdistanê Erdelan. Lê piştî du mehan careke dî fermana Kerîmşah hat, ko lihev hatin neçû serî û gereke win careke dî êrîş bikin welatê

Osmanlî bikin. Û leşkerê kurd bi serdariya Xusrewxan û Elî muradxan û Kelibelîxan dirêjî Kurdistanê bin destê Osmanlî yan kir û berê xwe dane Şarezûr û Xusrewxan herwekû leşkerê Zulfiqarxanê Xemse-kurd kete nav leşkerê Kerîmxan û êrîşî dijmin kirin û berê xwe dane Qeleçolan, paytexta Baban.

Herwekû ji rexê Osmanliyan ve Hesen Paşa, wezîr, waliyê Bexdad Kehya bi leşkerekî bêjimar ve dihan. û hewara Mihemed Paşa hat û çawa tîrêjên rojê serê xwe avêtin leşkerê kurd û îran dirêj kirin meydana şer, lê meydan vala dîtî û dijmin bişevbipaş de vekîşiyabû û berî hingî Ehmed Paşa birayê Mihemed Paşa ji nav ordiya turk û kurd reviya bû û hatibû nav ordiya kurd û îran û leşkerê Kurd û Qizilbaş êrîş kirin Şarezûr û bicarek berbad û talan kir û jin û zarok dane nav lingan û revandin.

Lê Xusrewxan, jin û zarok ji leşker sitandin û dane xwe diya û talan kire malê dewletê û Ehmedxanê Baban kirin fermandarê Şarezûr û Redîqulî Xanê, birayê Xusrewxan bi hinek leşker ve ji bo piştixurtî li cem hiştin. Belam Mihemed Paşa bazda û çû cem Kerîmşahê Zend û xwe avête dergahê Hemayûnî û rûnişt û bi vî rengî fermana dewleta Baban û diyarî û perwa sitandin û bi serbilindî vejeriya welatê xwe û Ehmedxanê bira hate avêtin.

Wezîrê Bexda ji xwe re fersend dît û bakire Ehmed Paşa û jê re ferman bi derebegî û dewleta Şarezûr deranî û hinek leşker dayê û şande Şarezûr û Mihemed Paşa çîrok ji Kerîmşah reda zanî û pir neçû Elîmuradxan, bi leşkerekî giran ve dihana Mihemed Paşa hat, lê çawa Ehmed Paşa hatina Elî muradxan bihîst vejeriya Bexda û Elîmuradxan jî vejeriya Şîraz. Lê careke dî Ehmed Paşa bi leşkerekî giran ve berê xwe da Şarezûr û careke dî Elîmuradxan dihana Mihemed Paşa hat û di nav şer de Elîmuradxan bi dîlî kete destê dijminê xwe û leşkerê Zend û Baban xerab şikest û Ehmed Paşa, Elîmuradxan rêkire Bexda û wezîrê Bexda gelek rûmeta wî girt û bi diyarî û perwa vegerande Şîraz.

Lê Kerîmşahê Zend ji vê serpêhatiyê gelek xemgîn bû û Mihemed Şefî ê Xanêzend bi diwazde hezar siwar ve şande ha na Mihemed Paşa û Şefî ê Xan di serma zivistanê de hate Kurdistanê Erdelan-Sine û piştî du mehan tevlî Xusrewxan berê xwe dane Şarezûr.

Tenê Ehmed Paşa, careke dî bê şer welat ji dijminê xwe re berda û xwe gihande Bexda û Mihemed Paşa, serbixwe rûnişt û nêzîkî heft mehan Xusrewxan û Mihemed Şefî 'exan li wanava rûniştî man û paşê vejeriyane mala xwe û di sala 1193 ê koçî de Kerîmşahê Zend-Kurd koça xwe ji cihana jîn-

darî barkir û serê xwe danî.

Tarîxa mirina Kerîmşah Ayway, Kerîmxan mird, wilo di ta rîxa Merdoxî de hatiye nivîsandin, bêgoman bi jimara ebce-
dî ye. Serdarên leşker û mezinên welêt di Îran de berdîber
dan çêkirin û her yek di cihê xwe de ala serxwebûnê hildâ
û şer hawîr di hindirwê welêt de destpêkir û sergêjî û ma-
lewêranî bi ser millet û Îran de hatin barandin.

Ji rexekî ve Elîmuradxanê Zend xwe li şûna Kerîmşah ki-
re padîşah û ji rexekî di ve Zulfîqarxanê Evşarî serê xwe
hilda û doza padîşahî kir û naçare Elîmuradxan, leşkerê Es-
fehan kişande ser Evşar û Ehmedxanê kurê Xusrewxanê Erde-
lan û Mihemedxanê Loristanî û Mihemedaxayê Başaxurlo, di
nav leşkerê Elîmuradxan de êrîşî ser Evşar kirin û li Esed
abad şer di nav du leşkerên kurd de careke di destpêkir û
leşkerê Evşarê kurd ji ber leşkerê Zendê-Kurd şikest û Zul-
fiqarxan bi du sed siwarî ve bi hêla lingê hespan xwe gi-
hande keleha Terem, lê li Xilxal fermanarên kurdên wa na-
van ew girtin û dane destê Elîmuradxan û serê wî jêkirin .
Û piştî vê xurtî û serbilindiyê Ehmedxanê Erdelanî, bi ser
firazî û diyarî hate mala xwe û Elîmuradxan, berê xwe da
Taran û Xusrewxanê Erdelan bi hezar û pêsed siwarî ve çû
Taran û Elîmuradxan bi mezin û serdarên bajêr ve derketin
xweşatîna wî û heta du fersexan ji bajêr dûr ketin û bi
rûmet û serbilindî ew bixwe re bire nav bajêr û Xusrewxan,
hêviya berdana Elahqulîxan, fermanarê Kermanşah jê kir û
ji bo xatirê wî Elahqulîxan berda û bi diyarî û perwa û
ferman ew rêkire Kermanşah.

Lê piştî pêlakê Elîmuradxan û mezinên kurd pêre çûne
Qezwîn û vejeriyane Esfehan û li Esfehan Mihemed Reşîdê We-
kîl li ser zîmanê xelkê Erdelan gilî û gazin ji Xusrewxan,
kirin û Elîmuradxan ev ji xwe re kire bihane û Xusrewxan,
ji fermanarî avêt û Kehzadxan, kurê Subhanvêrdîxan kire
fermanarê Erdelan û ferman û diyarî û perwa danê û di gel
Mihemed Reşîd Beg û leşkerê Erdelan rêkire Sine.

Herwekû di vênave re zariwên Sadiqxanê Zend, leşkerê
mezin dane hev û doza padîşahîyê kirin û Elîmuradxan çend
serdarên kurd û Mihemed Reşîd Begê wekîl û sêsed siwarên
Erdelanî bi wan re şandin şerê mirovên xwe, lê çawa şer
destpêkir, leşkerê zariwên Sadiqxan zora leşkerê Elîmurad-
xan bir û xerab şikandin û Mihemed Reşîd Beg û hevalên xwe
bi paş de bazdan û hatin Esfehan û ji wir berê xwe dane Er-
delan û Xusrewxan çawa ev şikestin bihîst, digel birayê
xwe Ridaqulîxan û apê xwe Lutifelîxan ji Esfehan berê xwe
dane Erdelan û çawa gihane Esedabad, naçare Mihemed Reşîd
Beg û Kehzadxan û Mîrza Yûsif û Mîrza Ehmed, zariwên Mîrza

Ebdilahê wezîr bi dost û mal û mirovên xwe ve koçemal bar-
kirin û çûne keleha Pilingan.

Lê Xusrewxan, bi çend mirovên xwe ve dane ser şopa wan
û mal û barxane û sewalên wan bicarek talan kirin û salt
û bi serê xwe û bi hêla lingên hespan xwe avêtin Şehrazûr ,
nik Mihemed Paşa û Umer Beg, herdû birayên Mehmûd Paşa Ba-
ban û Xusrewxan tevlî talan ser bilind vegeriya mala xwe,
bajarê Sine.

Û di wê navê de herdû birayên Mehmûd Paşa Baban, Mihe-
med Beg û Umer Beg, reviyên û hatin nik Xusrewxan û Mehmûd
Paşa ji Xusrewxan re şand û got:

- Eger herdû birayê min bidî destê min, ezê Kuherzadxan û
Mihemed Beg bidim destê te û bi vî rengî mirovanî û dostanî
di nav me de xurt û mezin dibin û xwepêkirtên xwe bihev gu-
herandin çendan, ko di nav miletê kurd de ev kêmasiyeke ge-
lek mezine jî.

Mehmûd Paşa, herdû birayên xwe kuştin. Tenê Xusrewxan,
gelek rûmeta pismamê xwe girt û perwa pêve kirin. Lê Mihe-
med Reşîd Beg û hevalên xwe bi dizî reviyên û çûna Zihaw
cî girtin û pismamê xwe Nezer Elî Beg, li wir hişt û bixwe
çû Bexda û wezîrê mezin çar gund ji hindama Zihaw dane des-
tê wan û tê derûniştin.

Lê ji ber, ko Mihemed Reşîd Beg, destdirêjî dikirin û
koçerên Erdelan zor û setem li xelkê dikirin, kurdên pêre
vegeriyane welatê xwe, cem Xusrewxan.

Lê Mihemed Reşîd Beg, bi xwe çû cem Şahelîmuradxan û hê-
vî kir, ko Xusrewxan, çend gundan li Erdelan bidî wî û mi-
rovên wî û Elîmuradşah ahêzend hêviya wî bicîkir û Xusrew-
xan çend gund û hindama Pilingan dane destê wan û ciwanrû
bi serve berda û bicarek ji Erdelan hatin raqetandin û ser-
bixwe ferdandariyek lidarxistin.

Lê Kuhzadxan û Lutifelî Beg, herdû pismamên Xusrewxan
di bin ve vîlikik gerandin û bende di navbera xwe û Mihe-
med Reşîd Beg de çêkirin û Nezerelî Beg, pismamê Mihemed
Reşîd Beg ev'vîlik bi dizî ji waliyê Bexda re da zanîn û
walî nivîsarek nerm û xweş bi dizî ji Mihemed Reşîd Beg re
nivîsî û li ser destê Nezerelî Beg jê reşand û nivîsar ke-
te destê Kohzadxan û ji Xusrewxan re rêkir û Xusrewxan ji
Elîmuradşah re şand û jêre got :

- Li ser fermana Şehinşahê Îran, min hindama Pilingan û Ci-
wanrû dabûn Mihemed Reşîd Beg û gelek perwa û diyarî bi mi-
rovên wî vekirin, lê hêj xwe ji dewleta Osmanî dûr nekiri-
ye û zar û zêçên xwe li Zihaw hiştine û dixwazî bêbextîye-
kê bi min re bikî.

Çawa nivîsar kete destê Elîmuradşah, ferman bi girtin û

talan kirina Mihemed Reşîd Beg derxist û naka girtin û xistin zindanê û hezar tûmen ji mirovên wî sitandin, lê piştî pêlakê Mihemed Reşîd Beg ji zindana Esfehanê hate berdan û dawî Mihemed Reşîd Beg, ji Şahelîmuradxan re got :

- Xusrewxan, doza padîşahî dikî û kengî fersende jê re bê, wê beyreqa padîşahî bilind bikî û şerê te bikî û zû ev gotin kete serê Elîmuradşah û di sala 1196 de Xusrewxan ji fermandarî xist û bire Esfehan û birayê wî Ridaqulîxan kire fermandarê Erdelan û birayê xwe ê ji dê bi leşkerekî ve pêre şande Sine, ko destgirêdayî Xusrewxan bibin Esfehan.

Lê çawa Xusrewxan ev bihîst, digel mirov û dost û hevalên xwe koçemal berê xwe dane welatê Şehrezûr. Tenê Ridaqulîxan fermandarî nekir û bazda û çu cem Ehmedxan û Caferxan, welatê Erdelan da ber talan û wêran û bi carek tar û mar hişt û Ridaqulîxan, Ehmedxan li Şehrezûr hişt û berê xwe da Ormiye, cem Îmamqulîxan, ko di Azerbaycan de doza padîşahî dikir û Îmamqulîxan şeş hezar siwar dane Ridaqulîxan û şande ser Erdelan.

Herwekû Caferxan, melayê mizgevtê Ebdilmûmin şande Şehrezûr nik Ehmedxan û Ridaqulîxan, ko ji wan re bêjî, bere bîn welatê xwe û bi serfirazî femandariya Erdelan bikin. Lê Mela Ebdilmûmin Merdoxî hew vegeriya û çawa, ko Îmamqulîxan û Ridaqulîxan nêzîkî li Sine kirin Caferxan bazda û bi şev ji welêt derket û çu û Îmamqulîxan, Ridaqulîxan kire fermandarê Erdelan û berê xwe da Esfehan, lê bi rê de fermandar û serdarên wî, jê re gotin, ko femandariya Ridaqulîxan, nediriste. Ji lewra ji rê vegeriya û çu Azerbaycan.

Lê piştî pêlakê û bi navtêdana Mihemed Reşîd Beg, Kohzadxan û Lutifelîxan bi hin leşker ve berê xwe dane bajarê Sine û şer di navbera wan û Ridaqulîxan de destpêkir û dinav şer de Nezerelî Beg, tîrek li Ridaqulîxan da û bi birîndarî reviya û çu û li Geros serê xwe danî.

Xusrewxan, bixwe li Esfehan bû û Elîmuradşah guh lê nedikir û gelek perîşan û bêhavl mabû, lê çawa serpêhatiya Kohzadxan bihîst û kuştina Ridaqulîxan ji şah re hate gotin, gazî kire Xusrewxan û dilê wî xweşkir û ferman û perwa û diyarî danê û şande cem Ehmedxan, kurê wî û jê re nivîsî û got :

- Dixwazim naka Şehrezûr berdî û zû bê Erdelan.

Çawa Ehmedxan, ev bihîst û xwend, berê xwe da Kurdistanê û çawa kete welêt Kohzadxan û Lutifelîxan, çûne pêrgî wî û serê xwe jê re nixûn kirin û bi dilşadî û serbilindî, bi hev re çûne Senedij û di sala 1198 de Elîmuradşah bi nexweşiyê serê xwe danî. Li her der fermandar û serdarên we-

lêt serên xwe hildan û her yek ji xwe re doza padîşahîyê ,
dikir û careke dî berdîberdan kete nav welêt û naçare Xus-
rewxan hate Kurdistan û welat û keleh û derbendên xwe asê
û ava kirin û leşkerê Kurdistan pêkanî û tekûz kir.

Diwê navê de Elahqulîxanê Zengene-kurdî, bi navê padîşa
hî û bi navtêdana Mihemed Reşîd Begê wekîl, berê xwe da we
latê Erdelan û ji xwer çayir û hesanî dî. Çawa, ko leşkerê
Kelhor û kurdên hêla Zihaw-Helwan bi carek di nav leşkerê E
lahqulîxanê Zengene de bûn û bi top û zembûrek û qorxane û
alavên şer gelek pêre hebûn û Mihemed Reşîd Beg û zaro û
mirovên xwe di pêşiya leşkerê wî de bûn.

Naçare Xusrewxan bi heftsed û pêncî siwarên xwe ve pêr-
gî dijmin çûn û siwarên xwe li kurên xwe parvekirin û her-
yek ji wan sed siwar dane wan û ji xwe re tenê pêncî siwar
hiştin û Ehmedxan, kurê Xusrewxan bû qolçî û pêşing û kete
pêşiya leşkerê bavê xwe û çawa li leşkerê Zengene rastha-
tin, ko zariwên Mihemed Reşîd Beg, di nav de bûn û piştî şe
rekî dijwar zora dijminê xwe bir û talanekî mezin ji bavê
xwe re anî û hate cem bavê xwe. Di vî şerî de Mîrza Yûsif,
kurê Mîrza Ebdilahê wezîr bi Ehmedxan re bû û çawa leşkerê
Sipîdeyê serê xwe derxist Elahqulîxan leşkerê xwe rast û
çep saz kir û top û zembûrek di cihên wan de tekûz kirin û
şerê mezin jinû ve destpêkir, lê piştî şerekî dijwar û
xwîndar leşkerê Xusrewxan zora dijminê xwe bir û şikandin.

Ehmedxan, dipêş de û herdu birayên wî Eslanxan û Mihe-
medxan di rast û çepê leşkerê bavê xwe de bûn û di nav şer
de Rida Beg Celewdarê Xusrewxan dirêj kire ser Elahqulîxan
û kuşt û serê wî ji Xusrewxan re bi diyarî anî û leşkerê
Erdelan bû du perçe. Yekî da ser şopa dijmin û yek talan û
gelepûrên dijmin dane hev û mal û barxane bi carek ketin
destê Erdelaniyan û Xusrewxan bixwe kete çadira padîşah û
Mihemedaxayê kalikê Mîrzaelîkber, Sadiqîmelik pêre bû.

Di sindoqa padîşah de gelek tiştên giranbiha dîtî û
derxistin. Ji wan qutiyeye biçûk hebû, ko nikaribû vekin,
lê Xusrewxan miftak ji berîka xwe deranî û lêxist û vekir
û Xusrewxan wê çaxê got:

- Îro xwedê ji me re her tişt lihev aniye, ko heta mifta me
li sindoqa dijmin derdikevî û çawa vekirin gustîlek têde
dîn û Xusrewxan xiste tilya xwe û Mihemed Reşîd Beg û Ne-
sirxanê Kilyayî dest girêdayî anîne cem Xusrewxan û ferman
darê mezin hesp û şûr û malê Mihemed Reşîd Beg ji esiwaran
sitandin û lê vegerandin û bi ser de gelek perwa û diyarî
danê û pêve kirin û got :

- Wekîl! , şêlim û savara Kurdistan ji xwarin û dayina bê-
gane û Kermanshah xweştire.

Xusrewxan, ferman û perwa û diyarî ji apê Elahqulîxan , Hacî Elîxan re dan û kire fermandarê Kermanşah û Hacî Elîxan nêzîkî sed hezar tûmen ji malê Elahqulîxan bi xwe ra hi lanî û hate nav ordiya Xusrewxan û serê xwe jê redanî û ew mal û zêr û barxane jê re pêşkêşkirin û Xusrewxan bicarek li leşkerê xwe parvekirin. Tenê çadir û perdên Elahqulîxan ji xwe re hiştin û bi serbilndî vegeyriyane Senedij.

Lê di sala 1200 ê koçî de Caferxanê birayê zikmakê Elîmuradşahê Zend, ko doza padîşahiyê dikir ji Esfehan bi leşkerê giran ve hate Hemedan û Xusrewxan xweste nik xwe lê ji ber, ko diwan rojan de Xusrewxan ji Caferxan xurttir bû neçû cem, lê bersiva wî da û got :

- Meydana şer tenê dikarî me bighênî hev.

Û piştî du rojan Xusrewxan bi leşkerê giran ve berê xwe da Hemedan û Mihemedhuseynxanê Qeregozlû û Mihemedemîn xanê Geros û Elîxanê Xemse bi pênc hezar siwar ve li gundê Salihabad gihane leşkerê Xusrewxan û bûne hevalbendên wî û pêre çûn û di 24.ê şabana sala 1200 ê koçî de şer di navbera Xusrewxan û Caferşah de destpêkir.

Di roja pêşî de yekî zora yekî nebir û her yek wekişiya leşkergeha xwe, lê di roja diwem de leşkerê Elîxanê Xemse û Huseynxanê Qeregozlû ji meydana şer bazdan û şikestin û Xusrewxan ji vê revê gelek xeyidî û dilgîr bû û bi hezar siwarên gernas ve, ko di binserdariya zariwên wî de bûn êriş kire ser dijmin û dijminê xwe şikandin û Caferxan di cîkî teng de asê kirin û talanekî mezin xistin destên xwe û hezar û sêsed mirov ji Lor û Zend hatin kuştin û bişev Caferxan ji Xusrewxan re şand û got :

- Dixwazim bext bidî min, ko bi saxî herim mala xwe û ezê her tiştî ji te re bihêlim û gewherên padîşahî û cewher û Quranek ji Xusrewxan re şandin û bi sê mirovan ve ji nav pêlên mirinê derket û barxane û hasincaw bi carek ji dijminê xwe re hiştin û çû Esfehan.

Lê Xusrewxan, piştî vî şerê pîroz û dijwar berê xwe da bajarên Melayir, Rêgirt, Tûserkan, Kizar, Ferehan, Gulpaykan û di çaxekî hin de ev hindam hemî girtin û Mîrza Ehmed Wezîr di nav civatê de ji Xusrewxan re got :

- Îro roja teye, ko tu doza padîşahî bikî. Mihemedxanê Qacarî nikarî serê xwe li ber te bilind bikî û serdar û fermandarê di wê civatê de tevan, ko gotina Mîrza Ehmed di ci hê xwe de ye û raste, lê Xusrewxan ev ji xwe re rast nedî û ew barxane û çek û cewahirên padîşahî bicarek bi diyarî, ji Mihemedşahê Qacarî re rêkirin Taran û ew bajarên, ko si tandibûn dane destê Qacariyan û heta mala xwe.

Û çawa Mihemedxanê Qacarî, ev tişt dîtin gelek dilxweş

bû û ji xwe re rojeke pîroz dî û daxwaza padîşahî di serê wî de cîkî mezin girt û gelek diyarî û kincên xwe yên padîşahî û şûr û xencerên gewherdar û kemera piştta xwe û hespê xwe di gel fermanekê ji Xusrewxan re rêkirin û hindamên Senqer û Gulyayî xistin bin destê wî.

Lê di sala 1211 de Îsmâîlxanê Zendî, êrîşî Kermanşah kir û Hacî Elîxanê fermandarê Kermanşahî, ko hevalbend û fermanzarekî Xusrewxan bû xiste asêgehê û Hacîxan, han ji Xusrewxan xwest û serpêhatî ji Mihemedxanê Qacarî re rêkirin, lê Xusrewxan li hêviya hana Mihemedxanê Qacarî rane westa û bi hezar siwarî ve dirêjî Kermanşah kir û çû hana Hacî Elîxan û Îsmâîlxan ji Kermanşah derket û çû Kohebêsitûn. û li Kermanşah fermana Mihemedşahê Qacarî ji Xusrewxan re hat û got :

- Xwe ragre, vaye dihana te hatim.

Lê Xusrewxan da ser şopa Îsmâîlxanê Zend(Kurd) û li Sîlaxun, ji paş ve gihayê û şerekî mezin di nav wan de destpê kir û talan û barxana dijmin bicarek ketin destê wî û jî cem xwe û bi navê Mihemedşahê Qacar fermanek nivîsî û da Mîrza Fethilah, kurê Mîrza Ebdilahê wezîr û kire fermandarê Tûbiserkan û ev tişt ji Mihemedşah re şand û da zanîn û Mihemedşah imza kir û lê vegerand û got :

- Dixwazim Xusrewxan li Hemedan bibînim.

Tenê Xusrewxan, neçû cem û pismamê xwe Lutufelîxan, kurê Subhanvêrdîxan bi diyarî û talan û perwayên giranbiha ve rêkire cem û got :

- Dixwazim di min biborî. Ji ber, ko nikarim bême Hemedan, û nêzîkî du salan Lutufelîxan li nik Mihemedşah rûnişt û gelek rûmetmend û serfiraz dibû û paşê ew bi diyarî û perwayên giranbiha vegerande Erdelan-Sine û careke dî xwest, ko Xusrewxan herî dîtina Şahê Îran û di sala 1204 de Ehmedxanê kurê xwe li şûna xwe danî û Hesanelîxan û Mustefaxan, û Mîrza Ehmedwezîr bixwe re birin û berê xwe dane Taran , paytexta Qacar û çawa nêzîkî li bajêr kirin, xelkê bajêr , mezin û fermandar û şah bicarek fersexekê hatin pêrgî Xanê Kurd û pîrozî û xweşhatin danê û bi serfirazî birin nav bajêr û Şehinşahê Îran gelek rûmeta wan girt û roj biroj bêtir digirt, heta rojekê bi hev re vexwarin û şah bixwe mey rête pegala Xusrewxan û çawa vexwar serxweş bû û hew bihişê xwe hat û reng dîn bû.

Lê çawa dengê dînîtiya Xusrewxan hate Kurdistanê hawîr serê xwe hildan û liber Ehmedxan rabûn. Mukrî û Bilbas şew reş û sergêjî di riwê wî de çêkirin. Lê Ehmedxan, bi hezar siwarî ve çû ser wan û bi zor ew serkûb vegehandin bin destê xwe û hin ji wan bi serê çiya ketin. Tenê li vegeê E-

lahvêrdîxan, kurê Nezerelîxan, kurê Subhanvêrdîxanê Erdela nî di kemînê de bi tîrekê Ehmedxan kuşt.

Lê piştî kuştina Ehmedxan, Mihemed Reşîd Beg wekîl bi hevalbendiya Eslanxan, kurê Ridaqulîxanê Erdelanî dane ser şopa wa û şerekî mezin destpêkir û heta Seqiz û Siyahkoh, li pey wan çûn û piştî şikandina dijmin, laşê Ehmedxan anîn û dijmin talan kirin û hatin nav bajêr û çîrok ji Mihemedşahê Qacarî re dane xuyakirin.

Mihemedşah, fermanek bi navê Lutufelîxan derxist û perwa û diyarî jê re şandin û ew kire fermandarê Erdelan.

41-LUTUFELÎXANÊ ERDELANÎ, KURÊ SUBHANXAN :

Piştî kuştina Ehmedxanê kurê Xusrewxan û di sala 1205 de ferman bi navê Lutufelîxan derket û bû fermandarê Erdelan û Hesanelîxanê kurê xwe bi diyariyên giranbiha ve rêkirin Taran û di sala 1206 de Xusrewxan bi nexweşiya xwe serê xwe danî û Mîr Eslanxan, laşê wî xiste texterewanekê û anî Kurdistan û veşardin.

Di wê salê de xelkê Xozistan liber Şah Mihemedxan rabûn û bi serdariya Lutufelîxan, Mihemedşah leşkerekî bêjimar rêkire ser wa û leşkerê Kermansah û Loristan bi nav leşkerê wî ketin û çûne ser dijminê Şah û Serkûp û Berbêş kirin û vegerandin bin dewleta îran û bêş û salyanê, ko dabûn hev rêkirin Taran û vegeriya Erdelan.

Herwekû di zivistana sala 1207 de Ehmedxanê fermandarê, Bane û hin ji mezin û serekên Heraman pêre bûne hevalben dên Ebdirehman Paşayê Baban û di nav xwe de peymanek çêkirin û bi vî awayî ji bin destê Lutufelîxan derketin û karê xwe û şer kirin û naçare Lutufelîxan di nav berf û baranê de bi sê hezar siwar ve çû ser wan û çawa Ehmedxan bihîst bazdan û çûne nav eşîra Bilbas û Lutufelîxan femandariya Bane da destê Fetehelî Sultan, pismamê Ehmedxan û gund û hindamên, ko di bin destê Ebdirehman Paşa de bûn vegerandin bin destê xwe û Mihemed, kurê Menûçehr Beg kire serdarê leşkerê sînorparêz û nehişt koç û koçerên Şehrezûr derbasbin welatê Erdelan û gelek ziyar bi vî rengî li koçerên Şehrezûr hatin kirin.

Herwekû di sala 1208 de fermandarê Huweyze serê xwe li ber Xanê Erdelan hilda û ji bin femandariya wî derket û Lutufelîxan, kurê xwe Hesanelîxan şande ser wan û bê şer ve gerandin bin destê bavê xwe û di sala 1209 de Lutufelîxan, serê xwe danî.

42-HESENELÎXAN, KURÊ LUTUFELÎXAN, KURÊ SUBHANVÊRDÎXAN :

Piştî mirina bavê wî Mihemedşahê Qacarî, bi navê Hesanelîxan ferman û perwa û diyarî rêkirin Kurdistan(Erdelan)

û di sala 1209 de Hesemelîxan bû fermanarê Erdelan, lê mirovekî xwedênas, nîmêjker û rojîgir û dilovan bû û pirê çaxên xwe bi nêçîr û rav radîbiwardin û hevsarê dewletê bi destê Mihemed Reşîd Beg Wekîl ve berda bû.

Lê piştî du sal bi vî rengî û du sala 1211 de, ko padişahê Îran berê xwe da Azerbaycan, Qerebax, Qereşîşe, Heselxan pêsed siwar bi xwe re hilanîn û çû dîtina Şah Mihemedxan û piştî, ko keleha Şîşe bi zor sitandin Şah Mihemedxan û çend mirovên navdarên dewletê çûne nav kelehê û bi şev sê mirovan Şah di xewde kuştin û revîyan û çawa leşker ev bihîst, hemî ji hev belav bûn û her yek bi cîkî de çû.

Hesemelîxan û leşkerê Erdelan bi Elîqulîxan re ji bajêr derketin û çawa xelkê bajêr bihîst, dane ser şopa wan û tîr li wan barandin û Hesemelîxan birîn kirin û berê xwe dane Senedîj û destûr ji Elîqulîşah xwestin û çûne Erdelan. Tenê Emanilahxan û Subhanvêrdîxan, herdû pismamê Hesemelîxan berî wî gîhabûn welêt û dixwestin fermanariyê bixin destê xwe, lê Mihemed Reşîd Beg Wekîl, nehişt, ko vê bêbextiyê li pismamê xwe bikin û çawa Hesemelîxan hate nav bajêr herdû pismam revîyan û çûne nik Ebdîrehman Paşabab û leşkerek bi serdariya Selîm Beg, birayê Ebdîrehman Paşabi wan re şande ser Erdelan û leşkerê Baban û Seqez û Bane bi hev re dirêjî Erdelan kirin.

Hesemelîxan û Mihemed Reşîd Beg, bi hev re koçemal barkirin û berê xwe dane derbendê Mahîdeşt û ji wir peykê xwe şandin nik waliyê Bexda û pêre dan û sitandin. û çîroka leşkerê Baban jê re bidarvekirin û Mela Şerîfê Qadî şandin nik Selîm Beg û li Merîwan jê re gotin :

- Eger walî welat siparde we, ji xwe wintê de ne, lê eger da dest me, wê çaxê win bi dilê xwe dimênin. Yan bi gotina walî dikin û yan dilê wî ji xwe dihêlin.

Lê çawa peykê Hesemelîxan giha Bexda, walî ferman kir û got :

- Naka divê leşkerê Baban ji welatê Erdelan bêkişandin û vegerin û naçare Selîm Beg vegeriya welatê xwe û Hesemelîxan û Mihemed Reşîd Beg vegeriyanê Senedîj.

Tenê Emanilahxan, berê xwe da Taran û çû cem Şahê Îran û Subhanvêrdîxan vegeriya cem Hesemelîxan û serê xwe ji pismamê xwe re danî û li mala xwe rûnişt.

Herwekû Mihemed Reşîd Beg, çû Taran, ko xwe derman bikî û ji alîkî dîve fermanariya Hesemelîxan nûjen bikî. Ji ber, ko Şah Fetehelîxanê Qacarî ji nû hatibû ser text û Emanilahxan li Taran dixwazî fermanariyê ji xwe re bistênî tenê Mihemed Reşîd Beg, piştî heşt rojan li Taran serê xwe danî û laşê wî anîn Kurdistan û kurê wî Mihemedzeman Beg

kete şûna bavê xwe û bû wekîl(Serkar). Lê Fetehelî Beg û herdû birazayên wî Ehmed Beg û Nesrilah Beg ji vî karî dil sar bûn û xeyidîn û digel çend mezinên welêt bendek girêdan û di sala 1213 de berê xwe dane Taran û giliyê Hesene-lîxan li cem Şah kirin û li wir Emanilahxan dîn û bûne hevalên wî û di wê çaxê de Hacî Mîrza, Ehmedê wezîrî di derameta Îstîfa de bû û Ehmed Beg zavayê wî bû, ji lewra gelek alîkarî ji wan re kir û piştî pêlakê Hesene-lîxan xwestin Taran û di sala 1214 de ferman bi navê Emanilahxan derket û Hesene-lîxan ji fermandarî hate avêtin û Fetehelî Beg, kurê Mihemed Reşîd Beg-serkar, bû serkar û berdevkê Xanê nû û vegeriyan mala xwe Erdelan.

43-EMANILAHXAN :

Bi fermana Şahê Îran, Emanilahxan bû fermandarê Erdelan û Hesene-lîxan hate avêtin. Emanilahxan mirovekî gelek mîr û gernas û dilpola û merd û camêr bû, dilovan û mehreban bû. Heta, ko bi Emanilahxanê mezin hate navkirin û zor da avakirina keleh û bajar û welatê xwe û barxane û alavên şer gelek danehev û bax û bexçe û rez û mizgevt, çimengak, avakirin û danîn. Weke, mizgevtta Darilihsan, çimengeha Şefa, talarê Dilgeşan û bax û qesrên Hesenebad û keleh û serşok û bajara Qelan û bax û avaniyên Xusrewabad û gelek ci-hên xweş û ava û xeyrgah pêkanîn û çêkirin û hemî avaniyên bajarê Sine wî çêkirine û Xusrewabad, bi navê kurê xwe Xusrewxan avakiriye. Erdelan, di çaxên wî de gelek ronak û ava û navdar û bilind bû û piştî du sal ji dewleta wî çûn Hesene-lîxan di sala 1216 de ji Taran bazda û di nav eşîrên Bilbas de xwe veşart û çend mirov li xwe civandin û berê xwe da şerê Emanilahxan û herdû alî li Merîwan li hev rast hatin û piştî şerekî xwîndar û kuştariyeke mezin Hesene-lîxan birîn bû û kete destê dijminê xwe û leşkerê wî ji hev belav bû û Emanilahxan, Hesene-lîxan destgirêdayî şande Taran û li wir winda kirin.

Di çaxê Hesene-lîxan de girtin û berdan û kar hemî di destê Serkar de bûn. Lê di çaxê Emanilahxan de nexwest, ko kare xwe bidî destê xelkê û her tişt bixwe dikir.

Ji lewra, Serkar Fetehelî Beg, kurê Serkar Mihemed Reşîd Beg bi mirov û malbat û dost û xelkên bajêr bicarek xeyidîn û bend li Emanilahxan gerandin û şewreşê destpêkir. Lê Emanilahxan diya xwe Gulendam Xanim, şande mala Seyid Mehmed(Şeyxilislam), ko civat li cem civiya bû û ji wan re sînd xwar, ko ji îro pê vetiştek bêserkar nabî û nayê kirin û weke berê wê her tişt di destê serkarê me de bî û bere bere ew şewşar û sergêjî rabûn, tenê çend mirov çûne

nik Şah û ev tişt hemî jê re gotin û gilî û gazin ji Emanilahxan kirin.

Lê Şah, ew tirsandin û ji wan re got :

- Herin û di binfermana Emanilahxan de bi camêrî rûnin. Lê ji ber, ko baweriya wan bi xelkê welêt hebû di bersiva Şah de gotin :

- Eger Şahê Îran li me nepirsî emê ji welêt barkin û bi çola kevin û ev mirovên ev gilîname morkirine wê bicarek bi-revin û em nikarin zor û setema Emanilahxan derbaskin û hilgirin.

Şah li ber vê dilxurtiya wan destên xwe dan serê xwe û got :

- Eger nerastbî ev xelk di riwê min de nikarin wilo bêjin , xuyaye kêr gihaye hestî û nagihan ferman da, ko herdû alî bêne Taran.

Emanilahxan û çend mirov bi hev re çûn, lê çi bînêrin, dîn, ko bajarê Taran ji gilîçiyên hatiye dagirtin û bax û hawîr Qesra Şah, Erdelaniyan girtine û weke kulî diçin û tîn.

Tenê Şah, bi destê Emanilahxan girt û gote xelkê: Herin mala xwe. Ez Emanilahxan bi we nadim. Baş ewe, ko pêre li-hevbên û wezîr gilîçî birin mala Emanilahxan û lihevanîn û careke di perwa û diyarî danê û vegerande Erdelan û Emanilahxan, careke di perwa dane Fetehelî Beg û ew kire serkarê xwe û Mihemed Zeman Beg û Mehmûdcem û Nezerelî, ko bi Hesanelî re xistibûn zindanê berdan û bi xwe re birin Erdelan.

Lê roj bi roj hevalbendên serkar bêtir dibûn û di nav wan û fermanî de dilsarî xurttir dibûn û her tişt ji destê mirov û hevalên Emanilahxan derxistibûn û bêgotin kiribûn.

Emanilahxan, hevsar bi dest wan ve berda heta, ko gelek ji ser xwe çûn û şevê Fetehelî û sê birayên wî xwestin cem xwe û got:

- Karekî mezin heye, ko dixwazim li ser bipeyivim.

Û çend mirovên xwe bi çek di hindirû de veşartin û çawa her çar bira hatin, ew girtin û xistin zindanê û Fetehelî-beg û du birayên wî kuştin û birayê biçûk piştî salekê di zindanê de kuştin û laşê wî bi dizî veşartin.

Fetehelî Beg, Ehmed Beg, Nesrîan Beg, Mihemed Zeman Beg, her çar kurên Mihemed Reşîd Beg Serkar hatin kuştin û serkarî dane destê Mehmûdcem, kurê Mehîrelî Sultan, zavayê Mihemed Reşîd Beg. Hevalên zariwên Mihemed Reşîd hebûn bi carek xistin zindanê û her tişt bi destê xanê Erdelan, bi camêrî hate gerandin û dewlet weke gustîlekê xiste tilya

xwe û hew kesî karibû bêjî çilo û çira.

Emanilahxan, zor da gund û qada baş û pirê qad û gundên welêt li ser navê xwe tapo kirin û di pirên wan de avani - yên hêja avakirin û keleh û serşok û bex û bostan çêkirin.

Lê di sala 1219 de Ebdirehman Paşayê Babanî, ji ferman-dariya Şehrezûr hate avêtin û ji dewleta Osmanlî xeyidî û hate Îran û bi heftsed siwarî ve koçemal hate Erdelan, nik Emanilahxan û fermandarê Erdelan leşkerê paşê ji derve bi cî kirin û Ebdirehman Paşa bi xwe re bire sera mezin û li Senedij danî û serpêhatî ji padîşahê Îran re nivîsî.

Herwekû ji rexê waliyê Bexda ve Suleyman Paşa Fexrîzade hate Erdelan û doza danedesta Ebdirehman Paşa kir, lê çawa ev serpêhatî giha ber destê şah, ji bo xwarina leşkerê paşê hindama Seqiz da wan û Ebdirehman Paşa û Emanilahxan bi hev re xwestin Taran û gelek jê re rûmet kir û Şah Fetehelî xan ji Suleyman Paşa re şand û got :

- Dixwazim careke dî dewlet û derebegiya Şehrezûr bidî destê Ebdirehman Paşa, Baban û em dostî bi hev re derbaskin.

Lê dewleta Osmanlî gotina Şah nexiste serê xwe û herdû rexan şûrê şer kişandin û dirêjî hev kirin. Dewleta Osmanlî bîst hezar mirov têkel ji Kurd, Turk û eşîrên Ereb dane hev û ketin Qesirşêrîn û sînore Zihaw (Helwan). Herwekû padîşahê Îran bi leşkerê xwe ve di çîmena sultanîyê de çadîrên xwe vegirtibûn û çawa hatina leşkerê Osmanlî kete guhê Şah, ferman kir û Mihemedelî Mîrza, ko Kermanşah, Loristan û Xozistandi bin destê wî de bûn, bi leşkerekî giran ve şande Kermanşah û Ferecilahxan bi sê hezar siwar ve tevlî Emanilahxan şandin Erdelan, ko di rexê Merîwan ve êrîşî o lika Osmanlî bikin û di dawiya Cemadê diwem sala 1221 ê ko çî de Emanilahxan deh hezar siwar danehev û xwe pêkanîn û berê xwe dane dijmin û roja pêşî li Şêxetar rûniştin.

Lê çawa ev serpêhatî gihane waliyê Bexda, Xalid Paşa Baban û Suleyman Paşa-Kehye û paşayê Koysenceq û Herîr bi hev re sîh hezar leşkerên kurd û turk û ereb şandin pêrgî Ebdirehman Paşa û leşkerê Îran.

Lê çawa Ebdirehman Paşa ev bihîst, şande ji Emanilahxan û serdarên Îran re, ko karê xwe bikin û hay ji xwe hebin û herdû ordî ajotin ber hev û li nêzikî pingava Merîwan weke du pêlên mezin lihev ketin û dengê top, tiving û şûr û mertalan di kumbeda gerdûn ve derket û himhim bi çol û çiyâ ket. Hespên bêsiwar û siwarên bêhesp û tenên bêser û serên bêten li wan çol û deştan gêrbûne ser qadê û bûkên dar û ber û giya destên xwe bi xwîna gernasnan hine kirin û gul û kulîlkan lêvên xwe sor kirin. Bi şûra weke şêra êrîş dibirin hev û birîn weke gulan di sînga xweşmêran de geş dibûn

û gule weke awirê çavên esmera êrîşî sînga xurta dikirin û mendenîqa çiya bi ser siwara de digindirandin, siwar tevî hespan ji ser riwê qadê bilind dikirin û dikumişandin, tîra hewr û seywan di ser şergehê re girtibûn û toz û tira - bêlkê roj winda kiribûn. Simê hespa qatek ji qadê rakiri - bûn û li ser serê siwaran xistibûn û ezmanek zêdekiribûn..

Lê ji nişka ve beyreqa Îran bilind bû û leşkerê Osmanî şikest û top û cebilxane û talan bicarek ji dijminê xwe re hiştin û çûn.

Îraniyan, leşkerê kurd û qizilbaş talan ji nav destê hev revandin û Suleyman Paşa û hin mezinên leşkerê bi dîlî ketin destê dijminê xwe, lê Selîm Begê Babanî, di vî şerî de mêraniyên mezin nîşandan û di nav şerde birîn bû û paşê serê xwe bi wê birînê danî.

Piştî vî şerê navdar û tarîxî Ebdirehman Paşa Baban di welatê xwe de ala serxwebûn û femandariyê hilda û bi serfirazî rûnişt û femandarên kurd Emanilahxan Erdelanî, Suleyman Paşa, Waliyê Bexda û bi dused mirovên dî ve rêkirin cem Şah Fetehelîxan. Û di rexê Zihaw(Qesirşêrîn) de leşkerê Şahzade Mihemedelî, leşkerê Bexda şikand û ta bi nêzîkî Bexdayê li pey wan çû û gelek barxane, çek, talan, dîl ji wan sitandin û ew nav bicarek talan û berbad kir. Û di sala 1223 de Emanilahxan, bêjimar diyarî û perwa bi xwere birin û berê xwe da Taran û çû dîtina Şah û femandariya Erdelan li ser navê kurê xwe Mihemed Hesexan pîroz kir. Û diwê tarîxê de Xan Ehmedxan, kurê Ridaqulîxan û Mihemedqulîxan kurê Xan Ehmedxan û birayê Emanilahxan û Mehmûdcem serkar û Nezerelî Beg û Îmamvêrdî Beg tevî mirov û dostên xwe bihev re sûnd xwarin, ko Emanilahxan bikujin.

Lê Mîrza Lutfilah, kurê Mîrza Ebdilah, wezîrî, ko yek ji wan bû, ev gotin gihande Mîrza Ebdilkerîm, ko berdestiyê Emanilahxan bû û çawa ev bedkarî giha ber destê femandar, bicarek girtin û xistin zindanê û serpêhatî ji Şah re nivîsî û Şahê Îran bê dan û sitandin ferman da, ko bicarekê wan bikujin û Emanilahxan, Mihemed Rehîm, Mihemedelîbeg Nezerelî, Îmamvêrdîbeg kuştin û gund û xanî û malên wa talankirin. Lê Xan Ehmedxan, Mihemedqulîxan pismamên xwe û mirovên dî berdan û hinek hinguv ji wan sitand û şande Taran.

Di sala 1225 de Ebdirehman Paşa Baban, serbixwe ala berxwedariyê û padişahi di welatê xwe de hilda û bû dijminê her dî dewletan û êrîşî Bexda kir û leşkerê Suleyman Paşa Kehya, waliyê Bexda, leşkerê xwe rêkire pêşiya wî û leşkerê Erdelan bi navê Îran êrîş kire Şehrezûr, lê Ebdirehman Paşa zora leşkerê Bexda bir û xerab şikand û walî reviya û

Ii nav eşîrên ereb xwe veşart' û dawî hate kuştin û paşayê Babanî berê xwe da Îran û şah ferman da, ko leşkerê Erde - lan bi paş de bêkişandin û ji bo parastina sînorên xwe Şahzade Mihemedelî Mîrza pêrgî Ebdirehman Paşa çû û leşkerê Erdelan kete nav leşkerê Şahzade û çûne sînorê Zihaw.

Ebdirehman Paşa di sala 1216 de ji bajarê Suleymaniye , derket û kete Koysenceq û karê xwe û asêbûnê kir û Şahzade li hawîr kelehê çember girêdan û paşa xiste asêgehê. Lê piştî çend rojan paşa xwe da destê ordiya Îran û du kurên xwe bigiraw şandin nik Şahzade û Şahzade veşeriya Kerman - şah û Emanilahxan hate mala xwe.

Lê çawa Ebdilah Paşa, wezîr, waliyê Bexda, ev bihîst bi leşkerekî giran ve berê xwe da Şehrezûr û Ebdirehman Paşa ji rexê xwe ve bi leşkerê Baban ve êrîşî dijmin kir û çû pêşiya wî, lê piştî şerekî xwîndar, leşkerê Şehrezûr ji meydana bazda û şikest û Ebdirehman Paşa reviya û çû Ker - manşah.

Çawa Şahzade Mihemedelî Mîrza, ev serpêhatî ji şahê Îran re nivîsî Şah ferman kir û got :

- Haha, gereke leşkerê Îran, bi serdariya Şahzade Mihemedelî Mîrza, bajoyî pêşiya Ebdilah Paşa, waliyê Bexda.

Û xañê Erdelan û çend xanên dî leşkerê xwe dane tenişt leşkerê Şahzade û leşkerê Îran kişiya meydana şer û leşkerê dijmin şikandin û heta nêzîkî Bexda dane ser şopa walî Paşa û ew nav bicarek tar û mar kirin û bi vî rengî Kurdistan herdem ji ber nezaniya mezinên kurd, di nav xwîn û talan û şewat û malwêranî de digevizî û dihate gevizandin.

Ebdilah Paşa, di Bexda de asê bû û Şêx Cafer û çend Şêxên Elewî, ko li Necefê rûniştîbûn, rêkirin nik Şahzade û hêvî jê kirin, ko ji ser Bexda veşerî û gotin :

- Ebdilah Paşa wê serê xwe ji dewleta Îran re nixûn bikî û xwe bidî bin siya Hemayûnî Îran.

Şahzade, ev tişt ji Şahê Îran re da zanîn û Şehinşah , wê çaxê li Çîmenê Sultanî çadirên xwe vegirtibûn û ji xwe re ev tişt pîrozî dît û diyarî û perwa û ferman jê re rêkirin û Ebdirehman Paşayê Babanî bû fermandarê Şehrezûr û fermandarê Erdelan veşeriyên mala xwe û Şahzade veşeriya Kermanşah û Emanilahxan ji nû ve dest bi avanî û xweşkirin, û pêşdebirina welat û bajar û kelehên xwe kir.

Ev serpêhatî di sala 1227 de bû, lê Emanilahxan, mizgefta Darilihsan, di sala 1228 de ava kir û Şêx Cemalîdînê Merdoxî Diwem, kire îmam û seyda û Şêx Hacî Mihemed Seîdê, Texte kire seydayê dergo.

Lê di sala 1230 de Mihemed Zeman Beg, û kurê wî Yûsif Beg, bi dost û mirovên xwe ve ji bo giliyê Emanilahxan bi-

kin berê xwe dane Taran. Herwêkû Emanilahxan ji ber xwe ve Mihemed Axa Tîrvanê dewlet û hinek hinguv û nivîsarek pê re rêkirin, berî geha Padîşah û her tişt jê re da zanîn û bi-darvekir û got :

- Ev mirovên, ko hatine giliyê min, bermayên wan mirovên , ko dijminê dewletê û dixwestin min bikujin.

Di wê çaxê de, ko heytehola padîşah li Feyrûzkoh bû û herdû rexan gilîname û nivîsarên xwe dane destê wezîrê mezin, Mîrza Şefîe, lê ji ber, ko wezîrê zana welatperwer û jîrek bû herdû alî li cem xwe kom kirin û gilîname herdu a liyan xwend û da destê Hemayûn û soz wilo hate dan, ko herdû alî herin Kurdistan û Mihemed Axa wan lihev pêni û Şah ji wan re bi vîrengî nivîsarek nivîsî û da wan.

Mihemed Zeman Beg û gerekên kurd bi axê re vegeeriyên Si ne(Kurdistan) û herdû kurên xwe, Ridaqulî Beg û Yûsif Beg û pismamên xwe vegeerandin Daridewle(Kermaşah) û Şahzade meger çendan eşkera rûmeta wan girt, lê dawî çavên her çaran rijandin û şandin Kurdistanê û Seyid Mihemed Şeyxilislam li Qeklan û Girifto bi darvekirin û Seyid Mihemed li gundê Doreqêla veşartin û kurê wî Zekî, li Seqiz xistin bin axa sar û heta îro jî gorna herdiwa jî pîroze.

Di sala 1230 de Emanilahxan, bi diyariyên giranbiha ve berê xwe da Taran û çû dîtina Şahê Îran û gelek rûmet û qîmet jê re hatin kirin û ji padîşah re pêşkêş kir û got :

- Hêvîdarim, ko kurê min Xusrewxan bi berdestî û rîncberî ji xwe re bibênî û keça xwe Şahzade Husincihan bidî wî.
Lê Şah kenîya û got :

- Ji xwe min dixwest berîvî qasî ez Kenîza xwe li te marbîkim û paşê keça xwe bidim kurê te.

Û Şahê mezin Kenîza û hezar tûmen bi diyarî danê û navê wê kire Qebazer Xanîm û xiste nav mala xwe û ji nûve karê bûk û zavê kirin û piştî salekê û di sala 1232 de bixwe û serdar û fermanदार û mezin û zana û xwendewarên welêt ve bi diyarî û perwayên kesnedî û barxane û xwarin û rewşek mezin ve çûne Taran û xalîçe û mafûrên kesnedî û zana û hozan û navdarên welêt biçarek li Taran civandin û her tiştên giranbiha dane nîşandan û xuyakirin û perwayên mezin bi wezîr û sefîr û mêvan û serdar û fermanदारên Taran vekirin û heta mehekê bi bezm û rezm û şadî û saz û awaz bi kurtî du sed hezar tûmen avzêrkirî di vê babetê de xerc kirin û paşê bi serbilindî bûk bi heytehol birin Kurdistanê.

Lê Hesen Mihemedxan, birayê mezin ji vê desgîranê dil-sar bû û xeyidî û got :

- Çira birayê biçûk di ser min re girtiye.?

Û gelek ji xortên malmezin û xwendewar bi xwere birin û çû

ne rexê Zihaw û Germesîr û li wir êl û eşîrên kurd û ereb, ko li Germesîr bûn, kirin hevalbendê xwe û leşkerek ji xwe re pêkanî û berê xwe da dijminahî, keleşî û talana û mezinê ereba kuşt û talanê kurd û erebên wa navan anîn û dawî berê xwe da dijminahiya bavê xwe.

Lê Emanilahxan, çendek ji mezin û zana û olperestên welêt rêkirin cem û jê re gotin :

- Ev tiştêkî wiloye, ko hêj di tarîxa de kesî nekiriye. Çi dixwazî wê bavê te ji te repêk bênî, lê her çiqas gotin ne xistin serê wî û destvala bi ser bav de vegeyriyan.

Emanilahxan, çîrok ji Şah re pêşkêş kir û Ebbas Mîrza Naibiseltene tirs tê firandin, lê tu kêr nekir û ji nû ve bavê dilovan karê xwe û şerekî xwîndar kir û mezin û zana û xwendewar û olperest bi xwe re birin û çû şerê kurê xwe û herdû leşker raperikîne hev û gelek ji herdû rexan hatin kuştin.

Ji navdarên, ko di vî şerîde hatin kuştin, Mîrza Ebdilah Wezîr, Mihemedelî Sultan, Huseynaxa Daroxe, Mîrza Bakir kurê Mîrza Lutfilah û van pê ve jî gelek ji rexê Emanilahxan, hatin kuştin. Lê dawî birîn kirin û bi birîndarî girtin û leşkerê wî reviyar û gelek ji wan hatin kuştin û girtin û ji herdû rexan kuştin çêbû û piştî mehekê Mihemed Hesenxan bi birîna xwe mir û ji derdê kurê xwe Emanilahxan bêhiş bû û di sala 1240 de serê xwe danî û 27 sala bi fermandarî ra biwardin, ji sala 1220-1230 çî avaniyî hene li ser destê wî hatine avakirin.

44-XUSREWAXAN NAKAM, KURÊ EMANÎLAHXAN :

Zavayê Şahê Îran, piştî mirina bavê xwe bû fermandarê , waliyê Erdelan û Nakam, mirovekî jîr û rîstevan bû û nivîs vanekî mezin bû. Destvekirî û payedar bû, lê gelek tolaz û meyxwer û serxweş bû. Şev û roj li mala yekî ji gundiyê xwe bi navê Ridaelî rûdinişt.

Di sala 1241 de Heyder Sultanê Heramî û Mihemed Sultanê Heramî li ber Xusrewaxan serê xwe rakirin û şewreş di riwê wî de çêkirin û ji bo serkûpîya wan Xusrewaxan Mihemed Ridaelî, birayê xwe bi leşkerekî ve şande ser wan û çawa şer destpêkir Caferaxa Erdelanî hate kuştin û ordiya Erdelan , gelek li ser xeyidî û bi hovî êrîş kire ser dijmin û gelek ji wan kuştin û Heyder Sultan di cîkî teng de asê kirin û ji tirsê xwe avête nav çem, ko xwe bi avjênî biparêzî, lê bi tivinga ew di nav çem de kuştin û gelek ji Heramîyan hatin kuştin û gelek bi dîlî ketin destê leşkerê Xusrewaxan.

Çawa, ko Cafer Sultan Serejdan bi leşkerê xwe ve êrîşkirin ser Mihemed Sultan û naçare Mihemed Sultan û hevalên

xwe bazdan û çûne nav Baban, Şehrezûr û Mihemedxanê serdar pêlakê li wan nava ma û dawî bi talanekî mezin ve mal, pez sewal hate Senedij.

Herwekû di sala 1243 de giranî kete nav welêt û birçîbûnê serê xwe hilda û xelk ji nêza li kuç û kolana bi serhev de gêr dibûn û ji birçîna dimirin, lê Xusrewxan pêncî hezar Tixar, ceh û genim ji enbarên xwe derxistin û li gora jimara kifletê mala li wan parvekirin û xelk ji mirin û birçîbûnê parastin û li ser wan nivî, ko kengî giranî rabî wê bihayê vê dextê bidin. Lê piştî giranî rabû û welat bû erzanî, Ferecilahê wezîr, jê re got :

- Vaye welat xweş û ava bû û giranî nema û erzanî kete şûna wê gereke îdî xelk bihayê dexla dewletê bidin. Wilo got û bi hazaran bendnama jê re pêşkêş kirin. Lê Xusrewxan Nakam, ev bendname bicarek çirandin û got:

- Malê millet ji millet re ye û nêzîkî du hezar tûmen di nav xelkê de winda bûn.

Lê Xusrewxan ji birayên xwe re gelek nebaş bû û tev şer peze û perîşan mabûn û di sala 1244 de Mihemed û Mistefâ Beg herdû kurên Fetehelî Beg Serkar, ko Emanilahxan ew dûr kiribûn û şandibûn Semnan û Damxan û piştî 27 sal derbide-rî, perîşanî Xusrewxan ew vegerandin Sinidij û Elîmihemed Beg, kurê Ehmed Beg, ko ji xalanê Xusrewxane gelek serfiraz û payedar û bi rûmet bû.

Di wê navê de ordiya Qeyserê Rûs êrîş kire welatê Îran û Azerbaycan xiste bin destê xwe û di welatê Îran û bêtir di Azerbaycan de sergêjî û berdîberdan hatin meydanê.

Ekber Beg, kurê Mihemed Zeman Beg, kurê Mihemed Reşîd Beg bi mirov û dost û siwarên xwe ve reviyên û xwe gihan-din ordiya Rûs. û Huseynqulîxanê walîzade, ko nû ji walîtiya Esedabad hatibû avêtin, bû hevalê wan, lê çawa ev tişt jêre hate gotin, hate cem Xusrewxan û jêre got :

- Ewê, ko ev vîlik gerandiye ebû Hesên Beg e û eger ji min bawer nakî rabe kincên xwe biguhere û bi min re were pişt xaniyê Ekber Beg, tê her tiştî bi guhê xwe bibihîzî.

Lê çawa Xusrewxan çû, her tişt bihîst û bawer kir û diwê şevê de ferman da û hemî girtin û xistin zindanê û piştî çend rojan zariwên Fetehelî Beg û Sultan, kurê Nezerelîbeg kuştin, lê Ekber Beg û Îsmâil Beg, birayê wî û Ebû Hesên Beg, bavê Mestûre Edîbe û hevalên wa di hember hinek pere de berdan û Mestûre Edîbe markir.

Lê piştî kuştina zariwên Fetehelî Beg, serkar malbata mala Serkar lihev geriyan û xeyidîn. Emanilah Beg, kurê Fetehelî Beg û Elîmihemed Beg, kurê Ehmed Beg û deh mirov bi wan re bi şev reviyên û çûne Taran û gilînamak ji Şahê Îran

re pêşkêş kirin.

Lê Xusrewxan, wezîrê xwe Ferecilah, li pey wan rêkir û bêbextî û diminahiya wan bi şah da zanîn, lê mala Serkar, çûne cem Şahzade Seyfidewle û pišta xwe pêgirêdan û li ser destê Tacidewle Xanim, gilînama xwe ji Şah re pêşkêş kirin ji lewra gotinê wezîrê Erdelanî li cem padîşah cî negirtin û neketin serê wî û mala Serkar sipardine Seyfidewle û di sala 1245 de çawa padîşahê Îran hate Hemedan, Xusrewxan Na kam ji bo dîtina xezûrê xwe berê xwe da Hemedan. Û Ekber Beg û Elîmihemed Beg û Îsmâil Beg û hin mirov bi wan re li pey Xusrewxan çûne cem Şah û careke dî gilî û gazin jê kirin, lê Xusrewxan di bin ve pêncî hezar tûmen dane abdarxane, ko Şah van mirovan bidî destê wî û Şah Fetehelîxan tev lî, ko jina wî Tacidewle diya Seyfidewle û Ebdilahxan Emînidewle, hevalê wan bûn jî, lê Şah destê wan girêdan û dane destê Xusrewxan û ew anîne Erdelan û çend car, çend qat li wan perên, ko dabûn Şah ji wan sitandin û mal û gund û qada wan bicarek talan kirin û Ekber Beg, dawiya jîna xwe di nav pêlên belengazî, perîşanî, derwêşî de rabiward û derbaskir û bicarek xwe di qozî û kunca desttengî de jîna xwe rabiwardin û xwe veşartin.

Lê piştî pêlakê, li ser hêvîkirina Ferecilahê Wezîr û Mîrza Hidayetilah Emîn, Elîmihemed Beg berê xwe da gundê Belebenabad û ji mirovên xwe re şand û got :

- Dixwazim win sewal û mirovan bixwe bi şev benin û min bi dizî bibin cem xwe.

Lê Mîrza Cafer, kurê Mîrza Hidayetilah Emîn, ev çîrok bihîst û da pey şopa wan û tevlî, ko zaro bû jîlê bi mîranî şerê wan kir û Elîmihemed bi şûr birîn kir û koç û sewal û malê wî hemî talan kir û vegeriya û çend mirov ji hevalên wî girtin û dane destê walî. Xusrewxan, çavên Lutufelî Beg, kurê Mihemed Rehîm Beg û Huseynqulîxan walîzade, rijandin û kor kirin.

Di sala 1246 de Şah Murad Beg, fermandarê Rewandiz di hindama Koysenceq û Herîr û Rewandiz de serê xwe hilda û doza fermandarî kir û hindama Serdeşt, Mukrî, Sablax, Laccan bicarek xistin bîndestê xwe. û li ser fermana Şah Fetehelîxan, Xusrewxan leşkerekî giran da hev û çû ser mîrê Rewandiz û ew şikand û heta Herîr û Koysenceq da ser pišta wî, lê dawî sê hezar tûmen jê sitandin û vegeriya Erdelan, Sine.

Di sala 1247 de Mehmûd Paşayê Baban ji ber Suleyman Paşayê birayê xwe reviya û hate Îran û li ser fermana padîşahê Îran, Xusrewxan bi leşkerekî ve ew bire Suleymanîye û kire paşa û Suleyman Paşa reviya û çû Bexda û Xusrewxan bi

serfirazî vegeriya mala xwe.

Çawa, ko di sala 1250 de nexweşiya Hal kete Senedij û xelkê bajêr ji hev belav bûn û naçare Xusrewxan ji bajêr derket û di çadir û kona de rûnişt, lê dawîbi wê nexweşiyê Xusrewxan Nakam serê xwe danî û heşt hezar mirov ji xelkê bi vê nexweşiyê mirin. Çawa, ko Elahvêrdîxan, kurê Nezere-lîxan û Elîmurad Sultan, kurê wî jî bi vê Halê mirin.

45-RİDAQULÎXAN, KURÊ XUSREW XAN, KURÊ EMANÎLAHXAN :

Diya wî Husincihan, keça Şah Fetehelîxan bû. Di sala 1250 ê koçî de bû fermandarê Erdelan û hêj bixwe deh salî bû û kalikê wî ferman û perwa û diyarîjê re şandin û Hatem xan Şihabidewle û Şahzade Fethilah Mîrza, birayê Husinci - han û Tacbêgem Xanim, Xuşka Şah bi diyariyan re rêkirin serxweşiya Ridaqulîxan û piştî serxweşî û xwendina fermanê lihev rûniştin û Ferecilah Mîrza kirin wezîr, yan di weza-retê de hiştin û her tişt dane destê wî û vegeyriyane Taran.

Lêdi wê çaxê de Şahzade Erdeşêr Riknidewle, fermandar û waliyê Geros bû û berê xwe da Kurdistan û dilê wî bijiya girtina welêt û bi leşkerekî giran ve berê xwe da Senedij. Lê Ridaqulîxan, leşkerê xweda hev û bixwe bû serdarê leş - ker û li hindama Zaxe û Elbaq çadirên xwe vegirtin û çavnê riya dijminê xwe kirin.

Lê Şahzade çawa dî, ko ji şermîkarî pê ve tişteke nakevî destê wî, şer bi şîranî guhart û şande cem Ridaqulîxan û got :

- Hatime Xanimxan bixwazim !

Û di sala 1251 de Fetehelîşah serê xwe danî û neviyê wî Mî hemedxazî, kete şûna wî. Lê çawa ji Azerbaycan çû Taran , Mîrza Hidayetilah ji ber Ridaqulîxan ve çû pêrgî Şahê nûha tî û pê re çû Taran û çawa tac da serê xwe Mîrza Hidayeti - lah bi perwa û diyarî û fermanê ve vegeyrande Erdelan û fer - maneke mezin derxist û xwend, ko dibêjî, gereke Ridaqulî - xan û leşkerê Kurdistan digel ordiya Behram Mîrza, birayê Mihemedşah herin Kermanşah û Mihemed Huseyn Mîrza, kurê Mî hemedelî Mîrza, ko fermandarê Kermanşah, Loristan, Xozis - tan, Erebiştan bû zû ji fermandarî deynin û Behram Mîrza , birayê Şah Mihemed bikin fermandarê van hindaman û naçare Ridaqulîxan, bi heşt hezar siwarên Erdelanî ve û tîpek leş - kerê dewletê berê xwe da nav leşkerê Behram Mîrza û li Kar vanserayî(Mahîdeşt) têkelîlî leşkerê Ecem bûn û Mihemed Hu - seyn ji ber, ko nikaribû desthilênî, tevî koç û zarokên xwe berê xwe da Taran û çû û paşê çû Erdebîl û li wir xis - tin zindanê. Behram Mîrza, bê şer kete Kermanşah(Darilima - re û bû Xanêxana û rûnişt. Lê Ridaqulîxan vegeyriya mala

xwe. Di wê salê bixwe de Husincihan, waleya Kurdistan Tûba Xanim ji kurê xwe re xwest û di sala 1252 de bi gerek û sermiyanê Kurdistanê ve çûne Taran û bi nazdarî û şahî û govend û dan û xwarin û vexwarin bûk anîn Kurdistanê û dinav şadî û xweşiyê welat pêlakê hiştin.

Herwekû di sala 1254 de padîşahê Îran, bi leşkerekî giran ve berê xwe da welatên Herat (Turkistan) û Ridaqulîxan, bi serdariya Necefqulîxan, kurê Mihemed Hesexan, kurê Emanilaxan leşkerek ji pêsed siwarî bi Şah re şand û di wê navê de Mihemed Sadiqxanê Erdelanî, ko ji femandariya Ridaqulîxan nexweşbû û Menûçehirxan, Mûtemedidewle, ko bixwe femandarê Kermansah bû, bi dused siwarî ve dirêjkirin Kurdistan û naçare Ridaqulîxan û wezîr û çend siwar biwan re bi mêranî çûne pêrgî dijmin û karê xwe û şer kirin û di wê şevê de li gundê Nedan razan. Lê çawa Mihemed Sadiqxan bihîst, ko Ridaqulîxan hatiye gundê Nedan bişev berê xwe da gundê Yemînan û Kizreçarnîvê şevê kete Senedij û mala Mîrza Ferecilah wezîr û Mîrza Hidayetilah Emînidewle û mela Ebas Şeyxilislam bi şev ji bajêr derketin û çûne nav êlâ Caf û çawa walî û wezîr ev bihîstin berê xwe dane bajêr û Mihemed Sadiqxan di Darîliyale de asê bû û heta nîvro şer kirin. Lê Emanilax Beg Serkar û Qubad Beg, Feraşbaşî û çend mirov ji begzade û tivingçiyên Horamî bi werîsan ji paşve çûne serê kelehê û zor dane dijmina û piştî, ko ji wan gelek hatin kuştin û naçare xwe dane destê Ridaqulîxan.

Lê di sala 1255 de navbera Mîrza Ferecilah wezîr û Mîrza Hidayetilah Emînidewle nexweş ket û xelkê welêt jî li ser vî awayî bûne du bendî û waliyê Husincihan bû hevalê, Emînidewle û walî Ridaqulîxan bû hevalê wezîr.

Tenê wezîrê Şehinşah Hacı Mîrza Axa liser xwestina walî alî wezîr kir, lê dawî çîrok birin ber destê Hemayûn û di çaxê, ko şah hate Elaxên (Elwend), Ridaqulîxan çû cem û Husincihan û wezîr û çend gerek û mezinên Kurdistan şêx û mela çûne Hemedan, ko padîşah bibênin, lêbi rêde navbera wezîr û waliyê Xanim nexweş bû û Husincihan vegeriya Senedij û her tişt da destê Emînidewle û wezîr çend mehan di mala xwe de bê kar rûnişt û di sala 1257 de serê xwe danî.

Herwekû di vê salê bixwe de careke di Mehmûd Paşayê Baban, bi hezar malî ve hate Kurdîstana Erdelan û piştî çend mehan Ridaqulîxan digel Mehmûd Paşa û çend navdarên Baban çûne Taran û piştî pênc meha, li ser fermana Şahê Îran, bi leşkerê Kurdistan ve, bi Mehmûd re çûn ser Şehrezûr.

Herwekû me da zanîn, ko navbera kur û dê nexweş ketibû û wezîrê nû Hidayetilah Emînidewle, hevalê Xanima mezin bû û niha wezîrê bêbext dixwazî vîlikân xwe bigerênî û çiqas

siwarên navdar bi Ridaqulîxan re çûbûn Şebrezûr û bi dizî, şande cem Ebdilah Paşayê Babanî û got :

- Vaye min hemî gernas û mêrxasên Erdelan bi carek bi Mehmûd Paşa re rêkirine û leşkerê Ridaqulîxan perkende maye, bi şev werin êrîşî leşker bikin û welêt bi hesanî bigrin. û ezê bi dizî alîkariya we bikim, gelek naçî winê leşkerê Erdelan tar û mar bikin.

Ebdilah Paşa, ev ji xwe re tişteki pîroz dît û bişev êrîşî ordiya Erdelan kir û wezîrê bêbext ji qolçiyên re gotibû, kengî we dî leşkerê Baban hat, dengê xwe mekin û bazdin, lê Mîrza Fedlilah Mihredar û Mîrza Ebûfetih û Mîrza Rida Beg û Şêx Elî Beg, kurê Nezer Beg û Mîrza Îbrahîm Beg kurê Mîrza Yûsif û Mistefaxan, kurê Mîr Eslanxan û Necefqulîxan, kurê Mistefaxan û Mihemedqulîxan, kurê Nezerelîxan û Mîrza Ehmerrefîle bê, ko daxwaza wezîr zanibin hatin cem qereqolçiyên û di wê navê de leşkerê Baban êrîşî leşkerê Erdelan kirin û qereqolçiyên bazdan û şer nekirin, lê van mirovan rev jixwe re kêmasiyeke mezin dîn û dest bi şer kirin û walî bi serdariya Ebdilhemîd hezar siwar ji Bane û Seqiz rêkirin hana wan. Tenê wezîr ji Ebdilhemîd re got:

- Xwe bide rexekî û mekeve nav şer. Uçîrok jê re got, ji lewra Ebdilhemîd Sultan, bazda û xwe dane qozîyekê û şer nekirin û leşkerê Baban ew çend siwarên navdar koz kirin û li hawîr wan hatinhev û her neh mirov kuştin.

Wezîrê bêbext ji Ridaqulîxan re got :

- Cihê desthilanînê nemaye. Ya baş ewe, ko walî ji meydana şer birevî û canê xwe biparêzî.

Û naçare walî Paşa bazda û çadir û barxane bicarek li ber destê dijminê xwe hiştin û leşkerê Baban dost û hevalên wî bicarek kuştin.

Lê Emanilah Beg û Mehmûd Paşa, nêzîkî li Suleymaniye kiribûn û çawa ev reşemizgîn bihîstin berepaş vegehiyan û hatin Senedij û xwe siparde walî Ridaqulîxan. Lê wezîr ev serpehatî hûr û kûr ji şahê Îran re da xuyakirin û got :

- Ev şikestina leşkerê Erdelan û malewêranî tev ji nezaniya walî û serdarê leşkerê wî Ebdilmecîde.

Herwekû walî jî, Ebdilmecîd rêkire Taran, ko Şah alîkariya wî bikî û careke dî herî şerê Baban. Lê ji ber, ko Xanîma mezin di nivîsara wezîr de gelek giliyê kurê xwe û serdarê wî kiribû, çawa Ebdilmecîd giha Taran, Şah ferman bi kuştina wî da û di cîde kuştin û Ridaqulîxan xweste Taran û çawa Ridaqulîxan, walî bi çend mezinê hevalên xwe ve çû Taran, Şah ew ji walîtiya Erdelan danî û li Taran hiştin û Mûsaxan kire fermanê Erdelan (Kurdistanê) û jê xwest, ko ew mirovên ev şikestin xistine rexê leşkerê Erde

lan bigrî û bişênî Taran.

Mûsaxan Babaxan, birazayê Ehmedxan, beglerbegê Meraxe , ko Mîraxûrê walî bû û Elîxanê Erdelanî, fermandarê Tûserka Serkarê walî û Îsmâil Beg Daroxe û Qubad Beg feraşbaşî gir tin û destgirêdayî şandin Taran û heşt hezar tûmen zîyana ser ji xelkê Kurdistanê sitandin.

Herwekû Şah Mîrza Hidayetilah wezîr şande Kurdistanê û hertişt xiste destê wî û got: Dixwazim li gora zanîna xwe welêt lihev ragirî û wezîrê pirjîr Ebbasqulîxanê apê Ridaqulîxan, li cihê wî danî û ji ber ve fermandarî dikir û bi navê walî hertişt dikir, lê piştî sê mehan Ebbasqulîxan danîn û Mihemed Sadiqxan, birayê Ebbasxan kirin Naibidewle û hijda meha welat bê fermandar(walî) ma.

Eger em kûr binêrin, dibênin, ko dawiya vê malbatê nêzîk tê û li ber windabûnêye. Ji ber, ko jin ji dijminê xwe anîn û têkilî karê dewletê dibin û berdîberdan ketiye rawelêt û xwe bixwe bûne dubendî û dijminahiya hev dikin. Ev hemî nîşanên windabûna malbat û dewletê ne, çi millet, çi eşîr, çi gund, çi malbat, ko ev reng, dubendî, berdîberdan û jinê bêgane ketin nav mezinahiyê wê winda bibî, wek mirovê, ko bi çend nexweşiya nexweş bikevî.

Lê Tûba Xanim Şahzade, jina Ridaqulîxan, xuşka Mihemedşah çû cem birayê xwe û hêviya vegera mêrê xwe kir û Şah Mihemed, Ridaqulîxan careke dî vegerande ser textê Erdelan û Ridaxan Tûba Xanim û hevalê xwe pêre şandin Erdelan û ew bixwe li Taran ma heta çar meha û paşê bi diyarî û perwa û ferman bi serfirazî vegeriya Kurdistan.

Lê çawa giha gundê Cameşoran, kirasdirêjan bihîst , ko diya wî ji Senedij derket û berê xwe da Taran û çavê wê bi kurê wê bar nebû, ko bi fermandarî rûnî. Tenê Ridaqulîxan. birayê xwe yê biçûk li pey diya xwe rêkir û jêre got :

- Bi çi rengî bî gereke diya xwe vegeřenî û haşt bikî !
Lê çawa Emanilahxan, ko bi Xulamşah navdare giha diya xwe pîrê ew kire hevalê xwe û bi hev re çûne Taran û Şah hindama Esedabad ji Erdelan veqetand û da kur û dê û bi fermandarî têde rûniştin û hevalên xwe, mirovên weke Qemberelîxan, Sadidewle bi fermana padîşah pê re çûn û Mîrza Hidayetilahê wezîr, Mihemed Sadiqxan, Huseynqulîxan, Ebbasqulîxan, Ebû Fetihxan û mela Mihdî-Qadî û Elîmihemed Beg, kurê Ehmed Beg û ji vanpê vejî hemî dost û hevalên Huwincîhan koçemal barkirin û çûne Esedabad.

Lê Ridaqulîxan, vêcarê nêzîkî du salan fermandarî kir û di sala 1261 ê koçî de hate avêtin û kişandin Taran û Xulamşah kirin fermandarê Kurdistan.

46-XULAMŞAH, KURÊ XUSREW XAN :

Di sala 1261 ê koçî de bû fermandarê Erdelan (Kurdistan) navê wî Emanilahxanê diwem e. Lê ji ber, kodi nav mala Fetehelîşah de mezin bûye û kalikê wî timjê redigot, Xulamşahxan, navê wî wilo ma, lê di sala 1262 ê koçî de hate Se nedij û berê xwe da hevalbendên Ridaqulîxan û her tiştê ne baş, zor, setem di biware kirin. Heta nedihîşt, ko xew bî çavên wa kevî û ji tirsê hew karibûn razin, naçare Emani - lah Beg, Serkarê Ridaqulîxan tevlî mal û kirovên xwe reviyân û çûne Horaman û li Hoşbedranê çadirê xwe vegirtin û Mela Ebbas, bi mirov û dostên xwe ve çûne Evşar û jina Ridaqulîxan, Şahzade Tûba Xanim li Sine ma, heta, ko dost û hevalên Ridaqulîxan ji xwe re cîkî bibênin, kopê de herin, lê bêjimar zor û setem lê dibû û tu şûnjê re nedane nîşandan, kopê de herî, naçare nivîsarek nivîsî û şande cem Emanilahê serkar û got :

- Eger win zû min ji vê zor û setemê neparêzin ezê jehrê vexum û xwe bikujim.

Emanilah Beg, nivîsar da destê Hesên Sultan û Ehmed Sultanê Horamî û ji wan re xwend. û Horamiyan gotin:

- Em bi mal û can li ber tene, lê divê, ko Tûba Xanim, ji bajêr derkevî û bê gundê Hesênabad û emê wê bi zor bînin cem xwe.

Û Emanilah Beg, ji Tûba Xanim re şand û got:

- Gereke bi çî rengî bî tu xwe bighênî gundê Hesênabad. Û bi siwarên Horamî ve berê xwe dane Hesênabad, lê Xulamşah, ev serpehatî bihîst û nehişt Tûbaxanim, herî û xanê Kurd leşkerekî giran bi xwêre hîlanî û çû Hesênabad û çawa Horamiyan dî, ko Tûba Xanim nehat û bihîstin, ko Xulamşah tê şerê wan, ji hev perçe bûn û hinek ji wan 200 siwar çûne nik Xanê Erdelan û ev ji eşîra Lek bûn û hina berê xwe da mal û çend siwar jî bi Emanilah Beg-Serkar re man.

Lê çawa Emanilah Beg, dî, ko ji mirovên wî pê vekes bi wan re nema, kete keleha Hesênabad û tê de asê bûn û şer destpêkir û Şahkemê Sorsorî hate kuştin û Hewremaniyên, ko mabûn ji kelehê bi dizî reviyân. Tenê Emanilah Beg û kurê xwe Esed Beg û birazayê xwe Fetehelî Beg û çend hevalên xwe man û naçare keleh asê kirin û navdi xwe da.

Tenê Xulam Şah, çend mezin û mela şandin cem Emanilah û bext dayê û hatin cem Xulam Şah û xwe dane destê wî û Xanê Kurd çû riwê wan û gelek rûmeta wan girt û piştî nîv saetê ew şandin Sene.

Emanilah Beg, di xanîkî de qelebend kirin û piştî hijde rojan kuştin û li ser hêvîkirina jina wezîr, hevalên wî berdan û di sala 1262 de li ser fermana Şah, Tûba Xanim û

hevalên wê rêkîrin Esedabad û Xanima wana dost û hevalên xwe, ko li wa nava perakende bûbûn, bicarek lixwe dane hev û civandin û nivîsarek ji Hacî Mîrza(Sedrêazem) re nivîsî û got:

- Ma tu ne ew bû, ko digot, ez bi mal û canê xwe herdem di xidmeta zariwên Naibiseltene de me, çi bûye, ko bê pirs te xwe ji me daye paş û dijminahiya me dikî ?.

Çawa reşbelek kete destê Hacî Mîrza, gelek poşman bû û di bersiva wê de got:

- Ev tiştê, ko te nivîsiye rast û diriste. Eger mir di riya we de xwe dût kiriye, gunehkar û poşmanim. Hêvî dikim di min biborî û hêvîdarim zû kemasiyên xwe rast bikim û gelek naçî wê Ridaqulîxan vegeî ser textê Kurdistanê.

Û bi rastî gelek neçû û Sedrêazam, Ridaqulîxan vegeî ser text û çawa hate nav bajêr ferman da, ko hemî mirov û dost û hevalên Xulam Şah bixin zindanê û gelek ji wan re viyan û çûne Şehrezûr.

Herwekû heçî, ko di kuştina Emanîlah Beg-Serkar de hevpar bûne, girtin û her yek li gora wî pêre kir û kurê Emanîlah Beg, Esed Beg kire Serkar û wezîr û her tişt bi destê wî ve berda û reşa xwe li ser bavê Esed Beg-wezîr girêdan û ji nû çûne serxweşiya wî.

Lê piştî du salan ji Şahmihemed re gotin, ko Ridaqulîxan dixwazî birayê te Mîrza Behmen, fermandarê Azerbaycan, bikî padîşah û te bavêjin. Û Şahê xwînrêj, Xusrewxanê Gurcî bi leşkerekî ve şande Azerbaycan û Kurdistan û Behmen - mîrza û Ridaqulîxan girtin û xistin zindanê û Xusrewxanê, Gurcî bû fermandarê Kurdistanê, biyaniye.

47- XESROXANÊ GURCÎ :

Xesroxanê Gurcî, ko bi Xesroxenê Xwace navdar bû di sala 1264 de bû fermandarê Erdelan û hate nav bajarê Sine û çend mirov û hogir û hevalên Ridaqulîxan çûne Taran û xelk di hindirwê mizgevtê de asê bûn û Hacî Mîrza axayê sedrêazem çawa şewreş û sergêjiya xelkê Kurdistanê bihîst, livî karî poşmam bû, lê ji bo, ko rûmeta dewletê bê parastin û di çavê xelkê Kurdistanê de kêmbûn, tîpek leşker şande haña Xesroxanê Gurcî û çar top bi wan re şandin û ew kurdên ko çûbûn Taran dane ber tirs û sawiran. Tenê Kurdên gernas ji pey heval û mezinê xwe venegeriyan û di wê navê de padîşahê Iran serê xwe danî û xelkê Kurdistan digel leşkerê kurdê Geros, bi zorêrîşî gundê Temberrîş kirin, ko cihê topa bû û bizzor Ridaqulîxan derxistin û berê xwe dane Sine.

Xesroxanê Gurcî, yan Xwacexesro, bi du top û hin leşkerê xwe ve bazda û reviya û di riya Geros ve berê xwe da

Zengan û ji nişka ve Ridaqulîxan û leşkerê Geros ketin nav bajêr û xelk gelek dilxweş bûn û walî gelek perwa û diyarî dane fermanîdar û serdarên Geros û destûra wan da û şandin mala wan.

48-RÎDAQULÎXAN, CARA ÇARA :

Di sala 1264 de careke dî herwekû me derbaskiriye Ridaqulîxan hate ser textê femandariya Kurdistan(Erdelan) û dest bi pêkanîna leşker û parastina sînor û derbendên wela tê xwe kir.

Di wê navê de Nasiridînşah, ji Azarbaycanê berê xwe da Taran û bû padîşahê Îran û di rê de Xulamşah xwe gihande Nasiridînşah û di Sultaniye de pîroziya Şah kir û gelek jê re rûmet girt û Ridaqulîxan, ji ber xwe ve Mihemed Elîxanê Seqizî û Mîrza Elahqulîxanê Daroxe bi diyarî û perwayê giran biha ve rêkirin pîroziya Nasiridînşah û di civîneka pîrozbayî de rûniştin.

Lê Xulamşah, nêzîkî şeş mehan xebitî heta, ko ferman û perwa ji xwe re sitandin û vegeziya Erdelan û Ridaqulîxan, careke dî hate avêtin û li Taran rûnişt. Mirovekî mêr û xurt û milhesin bû.

Ji Tûba Xanim, xuşka Mihemedşah sê kur man, Xesroxaq, Walî û Îftîxarilwilat Hacî Elî Mihemedxan, serdarê mukerem serdarê leşkerê Kurdistan û Fexrilmelik Hacî Ebûlhesenxan, ko herdem bi Nasirşah re digeriya.

49-XULAMŞAH-CARA DÎWEM :

Emanilah(Xulamşah) li ser fermana Nasiridînşah, careke dî bû fermanîdarê Kurdistan(Erdelan) û di sala 1265 ê koçî de hate Kurdistan û Mîrza Elahqulî kire pêşkar û Mihemed Elî Seqizî kire Naibidewle û piştî sê meha keça Huseynqulîxan, Xanim markir. û di sala 1266 de herdû dewletên mezin, Îran û Rom, li ser kurdê Suleymaniyê bûne yek û Xulamşah ji rexê Îran ve û li ser fermana Şah Nasiridîn bi leşkerê Kurdistanê ve çûne şerê birayên xwe, Kurdên Baban û bica - rek paşa û paşazade hatin girtin û birin Îstanbolê. Tenê Ezîz Beg û hin leşkerê kurd reviyên û çûne Zihaw, lê waliyê Bexda çû ser wa û naçare reviyên û çûne nav ereban û walî serfiraz vegeziya Bexda. û di sala 1267 de Xulamşah, wezarret da destê Mîrza Mihemed riyê mûtemed, kurê Mîrza Ebdilkerîm mûtemed û bi destûra walî Mîr Teqîxan, mîrê mezin tîpek leşker, ko hezar mirovê digel serheng û yawer û sultan hin hindamên kurdistan girtin û serhengiya wî tîpî da destê birayê xwe Ehmedxan û di dawiya wê salê de şah hate Esfehan û Mîrza Teqîxan, serdarê mezin û walî û hin ji xelkê kurdistan tevî tîpê leşker û siwanên kurd xwestin cem xwe

û walî siwar û tîp birist li çîmena Elîabad gihandî nav leşkerê Hemayûn û walî vê carê dostî û mirovanî bi sedrêazem re girêdan û gelek alîkarî ji walî re kir.

Lê di sala 1268 de Hesên sultanê Hewramî beyreqa serbes tî hilda û serbixwe bû û gund û hindamên wa nawan bicarek girtin û talankirin. Lê walî, bi leşkerekî giran ve berê xwe da Hewreman (Text) û pismamê xwe Necefqulîxan, kurê Mihemed Hesênxan digel Ebû Qasim Beg, Yawer û siwarî û tîvingçîyan şandin ser Mihemed Seîd Sultan Lehûn û Ehmedxanê birayê xwe bi leşkerekî ve rêkire ser Hewramênê text û di riya derbendê Dizlî de şer destpêkir, lê gelek neçû Hewramênê Derbend reviyên û leşkerê walî çeper û kozikên wa sitandin û leşkerê wadîdi derbend ve derbas bû û Ehmedxan di derbend derbas bû û çû ser Hewşabedranî, ko cihê rûniştina Hesên Sultane û êrîş kire ser dijmin û 24 mirov ji Hewramîyan hatin kuştin û 47 mirov birîn û dîl bûn û leşkerê walî da ser piştê dijmin û Hesên Sultan bişev reviya û çû Şehrezûr û leşkerê walî gund û xanî û cihên wa tev şewitandin.

Çawa, ko Necefqulîxan, bi leşkerê xwe ve di ava Çemê Sêrwan derbas bû û direjî Neqsûd kirin, ko cihê Mihemed Seîd Sultane û Hewramanî şikestin û Neqsûd kete destê Erdelaniyan û Mihemed Seîd Sultan reviya û çû Şehrezûr û bicarek welatê Hewreman kete dest leşkerê Walî.

Lê piştî çend roja hate gotin, ko padîşahê Îran, hate kuştin û çawa ev gotin kete guhê Xulamşah, bi fermanê, Şehrezûr re kete nav guft û go û bi hev re dan û sitandin û di hember sê hezar tûmen de Hewramî vegerandin welatê wan, lê di Neqsûd de Necefqulînaçare kete şer û heftê mirov û 26 tîvingçî hatin kuştin û Necefqulî, Neqsûd berda û hate Ciwanrûd.

Lê piştî Xulamşah, hate Sene bihîst, ko kuştina şah derewe û dest bi govend û şahiyê kirin û sê roj û şevan dîlan û şahî kirin û hevdi pîroz dikirin.

Di sala 1268 de eşîra Caf, gelek zor û setem li Xulamşahê wa nava kirin û heta destê zor û setemê gihane nav bajarê Sine, bixwe jî naçare Xulamşah, walî çîrok gihande ber destê Şah û ferman bi lêdana wan derket û walî leşkerê xwe da hev û şeşsed siwar û peyade û tîpê Geros bi xwere birin û tevli top û alavên şer berê xwe da Tewrêz Xatûn û li wir Xanehmedxan, Îsmailxan, Necefqulîxan bi hin siwarî û leşkerên Mendemî, Sorsorî, Kejikî, Ciwanrûdî bi wan re rêkirin ser dijmin û di rexê Merîwan ve şandin.

Lê walî ji rexê Saral ve dirêjî Cav kirin û eşîra Caf, deh hezar mal hene û şer di nav herdu leşkerên kurd de destpêkir. Tenê Caf nikaribûn xwe li ber hilma leşkerê walî,

bigrin û naçare bazdan û Xanehmedxan ji rexê dî ve li wan derket û sîh mirov ji mezinên wa girtin û gelek ji wan kuştin û sê hezar pez ji wan sitandin û di sînore Îran derbas kirin û serbilind vegeyriyan Senediz.

Herwekû di sala 1271 de Mîrza Ebdisemed Beg, yek ji xelkê Hemedan û li ser mezhebê Şêxî bû ji rexê Hacî Kerîmxanê Kermanî ve hate Kurdistanê û ji walî re got:

-Gereke tu rêçika xwe ya sinî, bi rêçika şêxî biguhêrî û Hacî Kerîmxan wê bixwe bê Kurdistanê û mizgevtî Darileman, bikî cihê Îrsadê û vî mezhebî li Kurdistanê belav bikî.

Walî ev tişt xiste serê xwe, lê kesî bi gotina wî nekir û şêx Meda xwendewar û hemî olperest hevdi çixirandin û bi dilovanî ji walî re gotin :

- Ev bicarek nabî, ji ber, ko xelkê nav bajêr bicarek sinî û şafiî ne, lê walî paşa nexiste serê xwe û naçare yek şandin nik Şêx Osmanê Tewîle û ji bo xêrxwazî Şêx Ebdirehmanê kurê xwe û Mewlewî şandin nik walî, lê dîsa nexiste serê xwe û venegeriya.

Ji lewra jin û mêr di roja 16 de rebî'êwel 1227 de bicarek li gornistana Şêxan civiyan û nivîsarek ji walî re şandin û gotin:

-Eger walî karbidestê dewletê ye çî îşê wî ji ol û mezhebê me heye? Dixwazin Şêx Ebdisemed ji bajêr derkevî. Eger wî lo nekî yan emê ji welêt derkevin û yan ewê ji Kurdistanê, derkevî?

Tenê walî, bihişkî bersiva wan da û top û leşker hawîr wan danîn. Lê hin mirovên nezan û serserî êrîşên nav bajêr kirin û gelek dikan û bazar talankirin û gelek ji xelkê kuştin û berdîberdan afirandin û xwedîdikan sinî û şêfî bicarek kirin hawar û qêrîn û çûne Baxê Firdewsî û walî ferman da û bi top û tivinga hawîr li xelkê reşandin û gelek ji talankeran hatin kuştin û naçare vegeyriyan û destên xwe ji şewreş û berdîberdanê kişandin û çil mirovên pertal biwan re hatibûn girtin û guhê wan jêkirin.

Şêx Ebdîqadir ê Merdoxî, xwediyê nivîştî Tehzîbîkelam, ko ji mezinê pêzanê Kurdistanê bû, piştî vê yekê bi dost û mirovên xwe ve ji Kurdistan barkir û çû Şehrezûr. Padîşahê Osmanî, jê re mûçeyek birî û bi nivîsarekê dilê wî xweş kir.

Şêx Ebdilkadir Merdoxî, di sala 1211 ê koçî de çêbû ye û di sala 1305 de serê xwe danî ye.

Di sala 1273 de dixwestin Qanûna Medenî, di Îran de li-darxin û ev çîrok hawîr di nav Îran de belav bû û bicarek, pêzan û xwendevanên welêt şandin Taran û gotin:

- Em, vê Qanûnê naxwazin û ji ber, ko ola fileha xwedayî

nîne. Dixwazin Qanûneke mirovan di welatê xwe deli darxin. Lê ê me misilmanan Qanûna meya xwedayî heye, em jê pê ve hîç qanûnan bawer nakin û nahêlin, ko di welatê islamê de cî bigrin.

Di sala 1275 de Nasiridîn Şah, hate Kurdistanê û li Xesroabad çadirên xwe vegirtin û Ebdilmûminê Merdoxî, jê re xîtabek xwend û şah gelek diyarî û gundên Hindimî danê û gelek rûmeta wî girt. Şah pehlewane xwe û pehlewane kurd ber dane hev û Nadir Pehlewan ê kurd, zora pehlewane şah bir û şah perwa pêvekirin.

Di sala 1283 de Xulamşah, nexweş ket û birin Taran û di sala 1284 de serê xwe danî û fermandarî ji destê vê malbatê bicarek derket û biyanî bûne fermandarê Kurdistan(Erdelanê) û dawiya tarîxa Erdelan li vir tê qedandin

14.8.1967 Mûsa Hesên- Cigerxwîn

COGRAFIYA ERDELAN

Paytextê welatê Erdelan(Kurdistan), bajarê Sene(Senediz Senendic) e. Lê gelek caran Pilingan, Zelem, Hesenabad jî bûne paytexta welêt, lê Sine di îro de navdare.

Herwekû ji vê hindamê re dibêjin Erdelan(Kurdistan) lê bi rastî perçak ji Kurdistanê ye, ko ji rexê rojhilat ve Hemedan û ji rojava de hindama Suleymanî ye. Herwekû di ra jorê wê de Geros, Sayinqe, Tebrîze û di rajêrê wê de welatê Kermaşaha.

Bajarê Sine, di rajorê çiyayê Avdêr de, Suleymanxanê Er delanî avakiriye. Di sala 1046 ê koçî de hatiye avakirin . Hawîr bajêr çiya û keleh, di nîvê bajêrde ye. Çemê Meyaper wan, bajar dikî du perçe. Tara Gulbaxî û tara Qatirçiyân , îrojê re dibêjin Bihişt û ji bajêr veqetandine. Herwekû ev çem diçî ser çemê Qişlaq.

Çawa, ko di çiyayê Avdêr de gelek cihên xweş û navdar û havîngehên hêja peyda dibin. Weke Xidirzende, Kanîşefa , Sertext, Zeferiye, Amaniye, Kawesale, Nasiriye, Mubareka - bad, Neqdî, Tekye, Şêx Elî, Çîmena, Şerêfilmelik, Wîle.

Ca eger bê û Kurdistan rojekê serbixwe bijî, wê ji Ewrû pa havînan bêne temaşagehên we.

Avên, ko ji çiyayên Avdêr derdikevin raserî qadê ne û li ber wan gelek bax, rez, bostan û dar û ber û çandinî çê dibin. Eger rojek bê û kareva bikevî welêt av dikarin Erde lan bicarek ronî bikin û dezgehên mezin bigerênin.

Bajarê Sine, 36 pêpelûka raserî jorê xêzika nîvcî ye , herwekû ji riwê pingavê bi 1570 mitir bilindtîre. Çawa, ko jimara xelkê nav bajêr di sala 1337 ê koçî de ji 35 hezaran bêtir bû, lê di îro de 25 hezarin.

Firehbûn û dirêjahiya welatê Erdelan 2250 fersexe, bi dirêjî ji Bokan(Mukrî) heta Zihaw(Zihab-Helwan) 50 fersexe û firehî ji Çeqan(Şehrezûr) û heta Almequlax(Hemedan) 45 fersexe. Çawa, ko sêyeka hindama Erdelan çiyaye û 1500 gun dên avatê de hene, hemî tiştî, ko têne çandin tê de hene, ceh û genimê wê ji 5-10 davêjî, lê bersînahî ji 20-30 davê jin. Tenê ji ber zor û setema xwedîgund û sergêjî û şer û nezanî çaryekê vî welatî beyar dimênî.

28 hindam di Erdelan de navdarin.Kelanterzan, Keroz, Me rîwan, Kemre, Pilingan, Hewremanêtext, Hewremanêlehûn, Pa-

we, Ciwanrûd, Rewanser, Şadîabad, Bêlwar, Sorsor, Kawrûd , Jawrûd, Hesenabad, Emîrabad, Lîlaq, Esedabad, Çardolî, Huseynabad, Saral, Hobato, Qereto, Xurxur, Têlkø, Siyahkoh , Girifto, Seqiz, Bane.

Lê di îro de Hesenabad, Jawrûd, Gewrûd, Emîrabad, Sor - sor, Bîlwardî nav Sine de û di binsiya bajêr de ne û Erdelan kirine 10 perçe. Seqiz, Bane, Merîwan, Esedabad, Çardolî, Lîlaq, Huseynabad, Saral, Hobato, Qereto, Têlko, Xurxure, Girifto û di van hindaman de her yek fermandarek rûdinî.

EŞÎRÊN KURDÎSTAN

Di hindama Erdelan de ji hemû eşîrên kurd re Kurd dibêjin. Tenê ji gundî û cotkaran re dibêjin Goran. Eşîrên kurd bicarek gernas, tivinçî û siwarên hêja û navdarin. Weke, Babacanî. Qubadî, Îmamî, Îxnî, Weledbegî, Tayşa, Taycözî, Qadir Mîr Weysî, Êlerûtî, Sanyarî, Kelawkok, Zerdoî , Pêtyarewend, Kemanker, Başokî, Çardelî, Gereke, Deracî, Perîyêşe, Temertûze, Sorsorî, Lek, Kejikî, Kuwîk, Belîlewend Ehmedzeynel, Komasî, Wermizyar, Gulbaxî, Menmî, Boreke , Qalqalî, Segewer, Ebdirehman, Birûkulahker, Lale. 19 eşîrin.

Herwekû êla Gulbaxî bixwe 8 bavikin. Muradgoranî, Qemerrî, Gamilî, Kaksewend, Çoxreşî, Pînaweserî, Hemzekelkenî , Çawa, ko êla Wermizyar (Hirmizyar) bixwe du perçene. Hirmizyar Mereder, Hirmizyarzerîne. Çawa, ko êla Mendemî jî çar bavikin, Tahir Muradî, Elî Muradî, Lolerzî, Axesorî. Û tenê êla Şêx İsmailî di kona de ne, lê ew jî di sala 1338 ê koçî de weke eşîrên mayin ketine gunda. Herwekû eşîrên kurd bicarek meger çendan di gundan de rûniştî ne jî, lê di bihar û havînan de hin di tonan de û hin di keperan de rûdinin.

Êlên Qubadî, Babacanî, ko di Ciwanrû de rûniştî ne zivistana bi koçerî diçin hindama Zihaw û havîna têne gundên xwe.

Jimara xelkê Erdelan 250.000 re, herwekûbîst(20.000) siwarên wa hene. Lê di rojên giran de dikarin şêst(60.000) hezar siwarî derxin meydanê.

ÇEMÊN NAVDAR

Gelek av û çay û çem û co û cobar di Kurdîstana Erdelan de peyda dibin, lê çemên navdar evin. Qışlaq, bi nîv ferse xê dikevî rojhilatê Sine. Çemê Sorgul, Gawrûd, Pilingan, Garan, Merîwan, Zilan, Bane, Ev her heşt dikevin nav çemê Dicle û şeş ji van çemê Sêrwan çêdikin.

Çemê Çeto, Seqiz, Qizilwezan, Kole, Tirwal Hacîça, ev her çar diçin ser pingava Mazenderan(Xezer). Çemê Rewanser çemê Zerîngop ev herdû çem têkilî çemê Qereso dibin, ko di Kermanşah ve diçî. Pirê van avan derdikevin ser riwê Qad û zewiyê û gelek zewî bi wan tên avdan û şînahî, dar, ber li ber wan diçênin.

Lê kanî û co nayêne jimartin, lê mexabin ji ber nezanî û paşdemayin tiştêkî hêja ji wan kar nakin û bedîhewa diçin.

Herwekû çiyayê navdar evin, Avdêr, di navbera rojava û jêrê Sine dikevî. Çiyayê Şahkoh(Şako), di jêrê Sine daye û diwazde fersexa dûrî bajêre û gelek dirêj û di her hindame kê de navekî lê dikin. Ji gundê Dariyan(Hewreman) ta bî darbendê Kermanşah navê wî Şahko ye. Lê di Kermanşah de jê re dibêjin Peraw û di hin ciyên dî de hin navên dî lê dîkin û bicarek cihê berfê ye û di hin ciyan de gelî û newalên kûr hene, ko çil-pêncî metir berf tê de bilind dibî. û ji wan ciha re xelk dibêjin No.

Di bihar û havîn û payîzan de gul, giyayên binxweş bi her nifşî di ciyan de şîn dibin û bi dar û ber û giyayê kesk têne xemilandin û xelkê welêt havîngeha xwe li vî çiyayî digrin, radibiwêrin.

Çiyayê Kohsaran, ko dikevî pişt gundê Zirav, xelkên wê hindamê havîngehên xwe li vî çiyayî vedigrin. Çiyayê Pîr Rustem, ev çiya di navhindama Hewreman de ye, ko jê re Zerdele dibêjin û dighê heta Şehrezûr.

Çiyayê Kohmeyane, bi farisî û soranî Koh, bi daxwaza çiya ye û Meyane, navê gundekî ye, ko bi heşt fersexan dûrî bajarê Sine dikevî û navê vî çiyayî bi navê vî gundî hatiye hildan. Herwekû gundên Nesil û koçxane jî di vî çiyayî de ne, lê dikevin jêrê wî û gundê Zirav(Ziraw) di raserî wî de ye.

Çiyayê Evdalan, bi heft fersexa di jêrê bajarê Sine de ye, nêzikî Serçî û Dolabî ye. Çiyakî pir xweş û di serê wî de heft mirov hatine veşartin, ko ji wan re dibêjin İbdal (Derawîş) perkend û perîşan evdalin û pîvazên pir hêja di vî çiyayî de peyda dibin, ko gelek navdarin. Ji lewra xelkê welêt dibêjin, ev tişt xweşe weke pîvazên Evdalane.

Çiyayê Sultan Sîraç, ev çiya dikevî jêrê rojhilatê baja rê Senediz, nêzikî pênc fersexa dikevî navbera Neran Mûçîk ko di serê wî de gornek heye, ko jê re dibêjin Sultan Sîracidîn, lê ji ber, ko di gelek ciyan de şerab(Seraw), Rewrewk, Mij û Moran serê wî winda dikî, jê re dibêjin Seraw, seranser, Sereraw, ji şeraba erebî hatiye, lê kurmanc dibêjin Leylan Rewrewk.

Çiyayê Mîhemîn, ev navê du gunda ye, ko ji wan re dibêjin Mîhem(Mîhemîn), gelek bilind û dijaware, lê gelek xweş û hêjaye. Di jêrê wî de kaniyek derdikevî, ko navê wê kaniya Şahpesend, li wir Şah Nasiridîn çadirên xwe vegirtine û pesnê wê daye û eşîra Çardolî dikevî rojhilat û Esedabad, dikevî rajor û Lîlaq dikevî rojava û bajarê Sine jî di rojavayê wî de ye, lê di jêrê wî de wargehên eşîra Kilyayî ne.

Kohêşeyda, dikevî rajorê rojhilatê bajarê Sine û heşt fersexa dûrî bajêrê. Di serê wî de kubedek heye, ko jê re dibêjin Şeyda-Şeydayê Nazar(Nazdar), herwekû Subhanvêrdî - xan, li ser daxwaza wî di vê kumbedê de hate veşartin, çêre û xwarina pez û sewal di vî çiyayî de nayê pesindan.

Sultan Şeşrî, bi sê fersexan dikevî rojhilatê Sine, di serê wî de cihek bi kûrbûna çil gazî heye, ko didî zanîn, ko di çaxên kevnare de agir jê derdiket û bere-bere ziwa bû ye, vemiriye û ew tiştên, ko jê derdikevin weke şûşe xuyadikin, ji lewra jê re dibêjin Şîşerî û rê bi daxwaza Şop jî hatiye.

Çiyayê Tewrêz Xatûn, bi diwazde fersexa di rajorê rojavayê Sine de ye, dikevî navbera Saral û Hobato. Di serê wî de gornek heye, ko xelkê wê hindamê diçin ser û dibêjin Gorna Tewrêze Xatûne yan Xatûn ji Tewrêzê hatiye.

Xesroxan, çiyakî bilinde, dikevî hindama Xurxure û li hember sêvesore. Ji ber, ko Xesroxanê Erdelanî di çaxê Şah Ebbas de ji ber bavê xwe ve fermandarê vê hindamê bû û pirê çax û demên xwe li vî çiyayî radibwardin navê wî bûye Xesroxan.

Çîrik, dikevî navbera Hobato û Têlko, ko qunaxa yek fersexê rêpê de diçî, lê jê wê de gelek dijaware û di zivîstana de rê pênakevî û di havînan de cihên xweş tê depeyda dibin.

Çilçeme, dikevî navbera Xurxure, gelek mezin û bilinde. Çemê Çeqetû û çemê Xurxure herdu jî, ji vî çiyayî derdikevin. Herdem serê wî bi berfe.

Garan, bi diwazde fersexan dûrî Sine dikevî û riya Sine Merîwan di nav re derbas dibî. Gezo, mazî, berû, rêvas gelek lê peyda dibin.

Kelxan, di navbera Seqiz-Bane, ji rojava berbi rojhilat ve diçî şînahî pir lê peyda dibî. Çemên Seqiz û Bane herdu jî, ji vî çiyayî derdikevin.

Arbiya, di rajêrê Bane de û gelek mêşe û baxên hêja têde peyda dibin.

Lekezor, dikevî jêrê rojavayê Seqiz û digihê sînorê Bane. Têr av û cihê çerê ye.

MIZGEFTÊN WELATÊ ERDELAN

Di gund û bajarên hindama Erdelan de ji 1500 mizgevtî bêtir peyda dibin, lê mizgevtên navdar Darilihsane, ko Ema nilahxanê mezin avakiriye. Dîdar şêrîn û ciwan hatiye avakirin, der û dîwar, ji kevirên Kaşî hatine lêkirin û li ser 24 sitûna ye û 35 kumbedê wê hene û du heywan(eywan) , tê de nedu parek ji quranê li ser nivîsî ne.

Herwekû diwazde xwendegehên feqehan li ber hatine avakirin. Mermerê wê ji gundê Qeslan kişandine, lê mexabin ev Kangeh winda bûye, ax bi ser de hilweşiyaye, avîrek ji heşt bircan têde çêkirine tê de çêkirine û gundê Axlîcan li ser kirine wexf, lê mexabin diz dixun û nadin mizgevtê û ditirsim hilweşî. Çend ristên Erebi û Farisî li ser nivîsîne û naxwazim biguhêzim nivişta xwe, lê seydayê Merdoxî di ni - vişta xwe de anîne.

Mizgevtê Walî, ko bi Darilemane hatiye navkirin Xulam - şah, ko Emanilahxanê diwem avakiriye û di sala 1268 de qedandiye, diwazdeh xwendegehê ber da avakirine û gundê Xelîfe Terxan û Mezra Hacî Abad û baxçak di Meyaperwarn de kirine weqfa wê.

Xwendegehên nû du xwendegeh di nav bajêr de hebûn Ehmediye û Îtîhad, lê xwendegeha Ehmediye kirin Şahpûr û di çaxê Merdoxî de çar xwendegeh di Sine de hatine avakirin û tevlî van her çaran bîst û çar(24) xwendegeh di Erdelan de hatibûn avakirin.

BAJARÊN ERDELAN

1- SEQİZ :

Yek ji hindamê navdarên Erdelane û dikevî jorê rojavayê Sine û 25 fersex dûrî bajêre. Bixwe qesebe ye û pênc hinda mên wê hene. Mêredo, Serşîr, Kendelan, Kelenbe, Ezinsifil, û 360 gundê wê hene û di nav bajarê Seqiz de pênc(5000) hezar mirov rûniştî ne.

2- BANE :

Dikevî rexê rojavayê Sine û 24 fersexan dûrî bajêre. Neh (9) perçe hindamên wê hene. Kêwedûd, Deştetal, Nemeşîr, Şoyî û Saman, Belwedînexoy, Birînwêjî, Tenûre, Pişterbiya, Tajan. Ceh, genim, tirî, hinar, garis, maşik pir li hindama Bane çêdibin û tebayên kedî û çolî pir lê peyda dibin .

Herwekû xelkê hindama Bane hov û bêtoze ne û ji fermandarê wê hindamê re dibêjin Sultan, di hember paşayê Kurdistanê, bindestê turkan de hatiye, du sed perçe xanî, avayî tê de hene û ji hezar mirovî bêtir tê de rûniştî ne û tevî gun - dên hawîr xwe ji çil hezarî bêtirin û bicarek sinî-şafiîne û ev hindam ji berê darên çiya kareke mezin dikan û di hin dirwê bajêr de yek serşok û heşt mizgevt peyda dibin û tev dikarin di mizgevtê mezin de nîmêj bikin. Salyana wê hinda mê 5600 tûmene û sê xanên mezin tê de hatine avakirin, ko mazîkir tê de radizin.

3- MERÎWAN :

Ko dikevî rojavayê Sine û bi hijde fersexan dûrî bajêre û bi Kurdistanê bindestê turkan ve hevşînor, û girêdayî ye di hindama Merîwan de pingaveke biçûk heye, ko dirêjahiya, wê nêzîkî yek fersex û nîv û firehiya wê yek fersexe. Pingava Zerîwan, ji kaniyên avê pingivye û raserî Qadê ye, lê ji ber nezanî, badîhawa diçî û di zivistana de dibî qeşem û berf lê dibarî û rêwîdi ser ve derbas dibin û gundê Kanî senan cihê rûniştina mezinê wê hindamê ye û gund di rojava yê pingavê de ye. Herwekû di rojhilatê pingavê de kelehekê xurt û bilind û asê heye, ko di çaxê Nasiridînşah de hatiye avakirin û di sala 1282 de hatiye çêkirin û navê wê Keleha Şah Abad e, lê di îro de hilweşiyaye û jê wêde avaniyeke mezin heye, ko ji wê re jî Keleh dibêjin. Sed xanî tê de avakirî hene û yek mizgevt û yek serşok hatine avakirin û li ser destê Ferhad Mîrza ciwek avê anîne ser mizgevt û serşokê û li ser destê Hacî Mihemed Elîxan nûjenkirine û avgîrek û serşok di nav kelehê de avakirine û ji gund wêde xaneke mezin hatiye avakirin û ciwek dî ji avê vekiriye, çawa, ko bax, bostan tê dedanîbûn, lê ziwa û hişk bûne û di çaxê Pehlewîyan de ev keleh asê kirine û tije çek, barxane kirine, lê pir germ û nexweşe. Ji ber, ko gelek nêzîkî pingavê ye.

4- HINDAMA MERÎWAN :

Tijî çiya û dar û bere, birinc, titûn, gezolî wir peyda dibin û derdixin derve, çawa, ko xelkê wê hindamê gelek mêr û gernas û şervan û pehewan û navdarin, ko pirê caran Turk û Ecem herdû ji wan ditirsin û bicarek sinî-şefîî ne. Dused gund û 26 hezar mirovin û du hezar û pêncsed tivingçî ji nav wan derdikevin. Keleha Surxab, ko li ser destê Surxab begê Erdelanî hatiye avakirin û li ser destê Suleymanxanê Erdelanî hatiye hilweşandin, di rojavayê keleha Şahabad de kavlên wê xuyadikin.

Hatina Merîwan 1650 tûman salyana wê ye. Mihemedxanê Ka

nîsanan, kurê Elî Beg, kurê Suleyman Beg, pismamê Hacî Heyder Beg e. Herwekû Keyxesroxanê Zehîriseltene, kurê Huseyn qulî Beg, ko mirovê Feteħ Elî Beg Wekîl ê. Ev hersê mal pismamên hev û ji xelkê Merîwanin.

5- HEWREMANÊ TEXT :

Dikevî rojavayê jêrê bajarê Sine û bi şazde fersexan dû rî bajêre, pir asê û dijawabê. Ji rexê rojava de dighê sînô rê Şehrezûr û ji rexê jêrî ve digihê ser sînôrê Hewremanê Lehûn û du rê tenêtê de derbas dibin, ji ber vê yekê xelkê vê hindamê guh nadin feramanên dewleta û serê xwe ji kesîre danaxin û natirsin. Di sala 1349 de bi serdariya Elîşah ser heng Mihemedxanê Emînî, ko fermanarê tîpê leşkerê Erdelan bû, ji nişka ve êrîşî gundên Didizlî û Kildî kir û Mehmûdxan û çend mirovên xwe revîyan û çûne Cizîrê.

Herwekû di sala 1350 de bi serdariya Elîşah, fermanarê Tîpê Erdelan, bi çend fermanarên qizilbaş ve êrîş kirin ser Hewremanê Text û Lehûn û dibin fermanariya Sipehdêminzin Emîr Ehmed Axa Xan de êrîş kirin ser kurdên Hewreman. Text û Lehûn û Merîwan û Ciwanrûd û Qubadî û Babacanî û Cafer Sultan, kurê Mihemed Seîd Sûltan tevlî zar û zêçên xwe revîyan û çûne Cizîrê û nêzîkî çarsed mirov ji mezinên kurdên wê navê di zivistanê de girtin û rakirin û birin zînda na Taranê û paşê birin Semnan û Damxan û Esfehan û welat bicarek talan û wêran kirin.

Hewremanê Text 32 gundin û hatina wan pirê wê ji hejîr, henar û tirî ye û di çiya de ber û hatineke mezine û xelkê wê navê nêzîkî çar hezar(4000) mirovin û salyana wan 700 tûmane.

Malmezînê wan, Nadir Sultan, kurê Rustem Sultan, kurê Hesên Sultan e û Mihemedxan Dizlî, kurê Ezîzخان, kurê Behramخان e, ko birayê Mistefa Sultan, bavê Ebasqulî Sultanzi rav e û Ferecilah Sultanê Elmana. Û Ridaqulî Beg, zariwên wî Huseynخان, Mecîdxan, Mihemed Elî Beg Çolax e û ji Huseyn Beg du kur man. Mihemed Reşîd Beg, bavê Ebdilah Beg û Hesên Beg. Û ji Mihemed Elî Beg, çar kur man. Mihemed Beg, Ehmed Beg, Mehmûd Beg û Mihemed Emîn Beg. Û ji Mecîdxan, yek kur ma, Mihemed Beg.

Lê Hesên Sultan, Mistefa Sultan, Behram Beg, her sê kurdên Mihemed Sultan, kurê Yûsif Sultan, kurê Pîrî Beg in. Û ji Behram Beg 6 kur man. Serdar Beg, Qadir Beg, Ezîz Beg, Şêx Can Elah Beg, Heyder Beg, Hebîb Beg mane. Ji Qadir Beg Mihemed Sultan Salih û Îskender Beg mane û ji Îskender Beg Ebdilahserhen Beg maye.

Herwekû ji Ezîz Beg, Mehmûd Beg veketiye, ko bi Mehmûdxanê Dizlî navdare û ji Şêx Canilah Beg, Elî Mihemed Beg,

Mihemed Reşîd Beg çêbûne. Herwekû ji Hebîbilah Beg, Mihe - med Beg maye.

6- HEWRAMANÊ LEHÛN :

Yek ji hindamên Erdelan Hewramanê Lehûn e, ko dikevî navbera rojava û jêrê bajarê Sine û bi hijde fersexan dûtî bajêre û paytexta wan gundê Neqsûd e. Ji rexê rojava û rajêr ve digihê ser sînore Kurdistana bindestê Turka û herdû Hewraman di hember dewleta Îran debi hev re radiwestin, şe rê dijminê xwe bi hev re dikin.

Riya Hewramanê Lehûn, ko di ser çemê Sêrwan ve derbas dibî, gelek diware. Çawa, ko 22 gund di hindama Lehûn de hene û li her der çiya û zinar û şaxurên mezin, bilind û a sê ne. Deştên, ko bi kêr çandiniyê bêtê de peyda nabin û hatina wan bicarek hejîr, hinar, tirî û berê daristanê çiya ne. Çawa, ko jimara xelkê vê hindamê çar hezar mirove û salyana wan 300 tûmane û ji fermanarê wan re Sultan dibêjin. Nêzîkî pira mezin, ko li ser çemê Sêrwanê, gorna mirovekî mezin heye, ko jê re dibêjin Sultan Îshaq, ko bixwe bî rayê Hemzeyê Xerate, ko herdû jî neviyên Caferê Sadiqin û Hemze di gundê Nekar de hatiye veşartin.

Fermanarên Lehûn, Cafer Sultan, kurê Mihemed Seîd Sultan e, ko li ser destê Elî Ekberxan-Şerefilmelîk û bi fermana Şahzade Mûtemeididewle, tevlî kurê wî di keleha Ciwan rûd de hatin kuştin û ji Mihemed Seîd Sultan kurekî dî binavê Rustem Sultan bû fermanarê Lehûn. Lê piştî pêlakê Cafer Sultan, Huseyn Beg, kurê Mistefa Sultan, ko bixwe pismamê Rustem Sultan bû, lê deger kir û bi destê wîda kuştin û Mihemed Salih Sultan kete şûna bavê xwe. Çawa, ko Cafer Sultan, Huseyn Beg da destê Hacî Serdar Zeferirmelik û tola Rustem Sultan jê sitandin û kuştin û piştî kuştina Huseyn Beg, Cafer Sultan bi destê Mihemed Beg, kurê Osman Beg, Mihemed Salih da kuştin û Cafer Sultan bû fermanarê Lehûn û li Neqsûd rûnişt.

Ji Osman Beg, Ehmed Sultan û Mihemed Seîd Sultan man û ji Mihemed Seîd Sultan şeş(6) kur man. Ebdîrehman Beg, Osman Beg, Rustem Sultan, Fetah Beg, Cafer Sultan, Mihemed Beg-Hemîte

Herwekû ji Ebdîrehman Beg, sê kur man. Ebbas Beg, Ferîdon Beg, Keyxesro Beg û ji Rustem Beg Sultan çar kur man, Mihemed Salih Sultan, Efras Siyab Beg, Tewfîq Beg, Huseyn Beg. Û ji Hemîte, Mihemed Emîn Beg. û Huseyn Beg man û ji Osman Beg, Mehmûd Beg maye.

Lê ji Cafer Sultan hijde kur mane. Ehmed Beg, Kerîm Beg, Xefar Beg, Ebdîlxfêr Beg, Mihemed Reşîd Beg, Qadir Beg,

Mistefa Beg, Salar Beg, Hesen Beg, Mehmûd Beg, Mihemed E-
mîn Beg, Mihemed Teqî Beg, Fethilah Beg, Mihemed Seîd Beg,
Elî Beg-Paşake, Elî Mihemed Beg, Mensûr Beg, Seyfilah Beg.

Nêzîkî sed ji mala wan siwar dibin û Cafer Sultan û
pênc kurên xwe ji dewleta Îran muçe distandin, lê çawa dew-
letê xwest tivingê wan bistênî Cafer Sultan tivingên xwe
nedan û seydayê Merdoxî dibêjî, li ser destê min dewletê
xwest, ko tivinga ji wan bistênî û çiqas min li ber Cafer
Sultan da, ko tivingên xwe bidî dewletê, lê Cafer Sultan,
bi gotina min nekîr û leşkerê Îran, bi serdariya Serheng
Xulamhuseynxan û hinek ji leşkerê Erdelan di sala 1350 ê
koçî de êrîş kirin Neqsed. Herwekû bi serdariya Serheng
Mistefa Mensûrxan û hinek ji leşkerê Erdelan, di çarê meha
Recebê de êrîş kirin ser wan. Lê li pey wan û bi serdariya
Hacî Elîxan, leşkerê Kermansah di riya Bawe ve dirêj kire
ser Hewramîyan û di heftê Recebê de bi serdariya Sertîp E-
lîxanê Rehîmî, ko bi Elîşah navdare, leşkerê Erdelan berê
xwe da meydana şer û çûne ser Zirav (Ziraw) û li ser van te-
van Emîr Ehmed-Supehpêde mezin di heştê Şabanê de hate ba-
jarê Sine û di roja nehan de berê xwe da Neqsed û di riya
Zirav re êrîşî Hewramîyan kirin.

Di roja 14 Şabanê de ji me re ji seydayê Merdoxî re li
telefûnê dan û gotin:

- Piştî du şeran Cafer Sultan bi zar û zêçên xwe ve derbas
bûne Îraqê (Kurdistana Îraqê) û leşkerê Îran, Neqsûd xiste
destê xwe û di roja cejnê de min ev mizgîn di civatê de
xwend û hevalbendên dewletê dilxweş û hevalbendên Cafersul-
tan xemgîn bûn.

Merdoxî, di nivîsta xwe de nivîsara xwe, ko ji Cafersul-
tan re nivîsî bû û bersiva Cafersultan nivîsîne, lê naxwa-
zim di virde binivîsim.

Tenê herwekû ji gotinên seydayê navdar tê zanîn xuyaye,
ko dijminê miletê xwe û dostê dewletê bû. Şahperest bû.
Herwekû Cafersultan bi nermî bersiva wî dabû û gotibû, her
gav dixwazim tivingên xwe bidim dewletê, lê kengî hevalên
min teva tivingên xwe dan, bi hesanî dikarim ji we ra bişê-
nim û bextê Sedrileazem bidin min, dikarim xwe bidim destê
dewletê. Tenê li bextê Serheng û serdarên ewle nabim. Çend
van serdar û serhengan ji bo, ko xwe li nik dewletê rûsipî
bikin ê wek min kuştine.

7- CIWANRÛD :

Ev hindam dikevî rojavayê Sine û bi şazde fersexan dûrî
bajêre. Keleha Ciwanrûd di nivê welêt de ye û ji hawîr ve
bi şeş fersexa dûrî sînore.

Emanilahxanê mezin, keleheke dî di vê hindamê de avaki-riye, ko 20 gaza pêpelûkên wê bilindin û di sala 1224 ê koçî de hatiye lêkirin. Gelek asê û xurte, di hindirwê wê de avaniyên bilind hatine çêkirin û ji çiyê av anîne serê kelehê û hin avgîrên mezin kolane û baxekî mezin û ciwan têde danîne, ko di Esfehan de wilo peyda nabin.

Lê fermandarê vê hindamê guhê xwe nedanê û keleh wêran bûye, belam di çaxê Nasiridînşah de muhendis rêkirin, ko keleheke dî li wê hindamê avabikin, tenê nebirin serî.

Ba û menaxê wê hindamê nexweş û bi qerêjin û coke avê di nav re derbas dibî û di nêzîkî kelehê de kaniyeke avê xweş heye, serşokek li ber çêkirine, ko xelkê wa navan xwe têde dişon. Çar mizgevt û du xanegahtê de hatine avakirin, û xelkê wa navan bicarek sinî-şafiî ne û li ser rêçika Neq şebendî ne û malbateke mezin di nav wan de heye, ko dibêjin, em ji neviyên Ebîbekirê Sedîqin û navê wan bûye Sedîqî û mela Ehmed-melabaşî-Şeyxilislam ji wê malê ye.

Ji rexê rojava de dikevî sînorê Şehrezûr û ji rexê jêrî ve Zihaw(Kermanşah) ve ye. Herwekû ji rojhilat ve bi sînorê Rewanser ve hatiye girêdan û ji rexê jorî de bi Hewramanê Lehûn ve hatiye girêdan, ji sed gundî bêtirin û pirê gundê wê hindamê cihê çandinîyê ne.

Herwekû çend gundên navdar hene, ko seydayê Merdoxî gelek pesnê wan daye. Weke, Pawe, Kawat, Rewanser û dibêjî, navê Ferhad di serê çiyakî ji hindama Rewanser de hatiye nivîsandin. Û navê çend mezinê vê hindamê didî xuyakirin. Weke, Huseynxan û Ebbasxan, ko herdû kurên Elîxan, neviyê E lîekberxan-Şerefilmelîk bûn.

Huseynxan, Xemîde Xanim, keça apê xwe Suleymanxan Şerefilmelîk markir û bû fermandarê welêt, lê li ser destê birayê xwe Ebbasxan bi jehrê hate kuştin û Ebbasxan jina wî markir û bû fermandarê welêt. Lê dawî hate girtin û heta çaxê Merdoxî jî di zindana Taran de jîndar bû.

8- KELANTERZAN :

Yek ji hindamê navdarê Erdelane, ko bi yek fersexê dikevî rojavayê Sine, dirêjîya vê hindamê ji yek fersexê heta heşt fersexê dirêj dibî. 64 perçe gund û avaniyên wê he ne û têde cihên xweş û bax û bostanên ciwan û xweş peydadî bin. Hatina wê genim, ceh, henar û tirî û hemî ber û dar têde peydadî bin û deh hezar mirov di vê hindamê de cîgirtine û gundên wa ji kanî û çeman têne avdan. Salyana vê hindamê 2862 tûmane û bicarek sinî-şefiî ne û di her gunde kî de mizgevtek hatiye avakirin û yek ji gundên herî kevnare di vê hindamê de ye, ko jê re dibêjin Nîgel, mizgevteke,

mezintê de ye, ko dibêjin, Ebdilah, kurê Umer yan kurê Umran avakiriye, kevnêquranek tê de ye, nivîsîna Kofî hatiye nivîsandin û yeke weke wê quranê duperçe tenê li Îstanbolê li mizgevtaya Ayasofya peyda dibî, ko dibêjin, bi destê Osman, kurê Effen hatiye nivîsandin.

9- GEREWEZ :

Yek ji hindamê navdarê Erdelane, ko dikevî rojavayê Sine û bi deh fersexan dûrî bajêre. Eşîra Komasi di vê hindamê de rûniştiye. Nezan û serhişk û comerd û gernasîn. Bîst perçe gundên wa hene, du hezar û pêsed mirov tê de rûniştî ne, hatina wan salyane wan 2500 tûmane û ceh û garis û genim wan bi zor têra wan dikî û ji nû ve titûn, pembû diçê nin.

10- JAWRÛD :

Ev hindam bi çar fersexa dikevî jêrê Sine. Xelkê vê hindamê bicarek xwedênas û olperestî, di her gundekî de mizgevtêk hatiye avakirin û di mizgevtan de avgîrek çêkirine, ko xwe tê de bişon. Herwekû, li ber her kaniyekê avê kevîrekî nimêjê danîne, ko li ser nimêj bikin û mizgevtê wê hindamê kevnarene û dibêjin, Ebdilah, kurê Umran avakiriye.

Gelek bax û bostanên xweş û hêja tê de hene sêvêsor û xox gelectê de peyda dibin. Genim, ceh, birinc, garis û hemî nifşên dexl û dandî wê hindamê de têne çandin, qed û zeviye wê ji ava Cobar, kanî û çeman têne avdan, xelkê wê hindamê ji deh hezar mirov bêtirin. Salyana wan 1314 tûmane. Gundê Bêsaran, yek ji gundên navdarên wê hindamê ye, ko tê de Babaşêx Elî hatiye veşartin.

Ev Şêx Elî birayê Şêx Nimetilahê walî ye, ko jê re Şahni metilah digotin, kurê Şêx Zekerîya, ko bixwe ji zariwên Hesenê kurê Elî ne.

11- PİLÎNGAN :

Pilingan, Bilwar, Emîrabad ji ber, ko gelek nêzîkî hev kirine yek hindam, ko dikevî jêrê rojavayê bajarê Sine û ji heşt fersex û heta diwazde fersexa dûrî bajêre. sîh û pênc(35) gundên wê hene, ko çarsed û pêncî mirov di wan de ne, salyana wê 1336 Tûmane. Zeviyên wê ji kanî û çeman têne avdan, şînahî, dar, bertê de peyda dibin.

12- HESENABAD :

Yek ji navdarên hindamên Erdelane, ko bi yek fersexê dûrî bajêre. Di sala 746 de Mîr Hesenê Erdelanî avakiriye. Di jêrê vî gundî de û di serê çiyakî bilind de keleşek mezin, bilind avakiriye, ko bi derbasbûna dem û tarîxê hati-

ye kumişandin û heriviye. Herwekû Hiloxanê Erdelanî di serê sedehê koçî de careke dî ava û parçîm kiriye û bixwe tê de rûniştiye, lê di sala 1048 ê koçî de Suleymanxanê Erdelanî careke dî wêran kiriye û bajarê Sine kiriye paytext, heft fersexan dirêje û du çem jê derdikevin. Çemê Qişlaq û çemê Gawrûd. 32 gundin û 5500 mirov tê dene, salyana wê 2400 Tûmane, hemî nifşên çandinî, dar, ber têde hene, qada wê ji çem, kanî, cobaran tê avdan. Yek ji gundên navdarên, vê hindamê Miqdade, mizgevtê kevnare tê deye, ko gorna Miqdadileswed tê deye û xelk gelek diçin ser vê gorna pîroz.

13- LÎLAX(LÎLAQ) :

Lîlax, Êlax yan Lîlaq, Êlaq, dikevî rojhilatê Sine, ji du fersex heta heft fersexa dirêje û heştê gundên wê hene, ko diwazde hezar mirov tê dene. Salyana wê 3614 Tûmane, qada wê ji kanî, cobar û çeman tê avdan. Bax, daristan di vê hindamê de hindikin, genim, ceh, nîsk, pembû tê dedîçênin, sar û pirên xelkên vê hindamê neh mehan di hindûrû de dimînin û gadime xwarina sewalên wa ye.

14- ESEDABAD :

Berî hingî jê redigotin Qelemro Elîşukir, ko dikevî rojhilatê Sine û ji kevnare de paytexta vê hindamê gundê Qeslan bû. Emanilahxanê Erdelanî Keleh, xan, serşok, mizgevt û baxçak tê de çêkirine, lê paşê fermandarên vê hindamê bicarek wêran û kaval hiştin û baxçeziwa kirin, lê tenê hêj bermayê serşokê xuya dikin. Kangeha kevirên mermer di vî gundî de ye, ko bicarek kevirên mizgevt û avaniyên bajêr biwan hatibûn avakirin, lê îro di bin axê de winda bûye. 94 not û çar gundên vê hindamê hene, ko çarde hezar mirov diwan de rûdinin. Her tişt tê de tî çandin û yek ji gundê navdarên vê hindamê gundê Babagurgur e.

Di serê girekî de tenûreke kûr û gilover xuyadikî, ko a veke zereleymûnî jê derdikevî, ko bihna Silfato jê tê û carna li hawîr kangehê av hişk dibî, dibî qeşem, ko xelkê wa nava jê redibêjin Pingav, Deryaçe-Biheyre û dibêjin di hindirwê gir de pingaveke mezin heye, ko dikelî û pêla navêjî derve û jê wê de ber bi rojhilat ve du kangehên weke wê hene, lê ziwa bûne û çend cî hene, ko dengê bilind ji wan derdikevî, ko jê re dibêjin, Dengemeşk û ji bo vî dengî ji gund re dibêjin Bawegurgur(Babagurgur). Av tevlî şorayî dibî û ev deng jê derdikevî û pir çîrokên derew di biwara vî dengî de hatine gotin.

Herwekû çend kanî di vê hindamê de hene, ko ava wan şor û bihnanexweş jê tê, di cihokên zirav re derbas dibî û hişk dibî û ji nexweşî ya çerm û laşê mirovan re gelek bikêr tê, dermane.

15- HUSEYNABAD :

Dikevî rajorê Sine û paytexta vê hindamê gundê Huseynabad e, ko bi pênc fersexan dûrî bajêr e. 34 gundin, ko 5000 mirov diwan de ne, salyana dewletê 1296 tûmane.

16- SARAL-HOBATO-QERETO :

Ev sê hindam bi yek hindamê danîne, dikevin rajorê Sine ji deh fersex heta diwazde fersexa dirêj dibî û heştê û du gund tê de ne û diwazde hezar kurd di wan de rûniştî ne. Gundê Hobato, gelek sar û serma ye, ko carinan ji ber serm û bahozê çar mehan rêbiwarî tê birîn, lê di biharan de gelekxweş û bi gul û giya ye, ji ciwantir û xweştirên cihên Kurdistanê Erdelanê ye. Çiyayên wê gelek bilind û serê wan fireh û pane, ava kaniya di ser riwê qadê re berjêr dibî, xelkê Telko pirên wa li van dera warên xwe digrin, dirêjî û firehî nêzîkî deh fersexen, eşîrên Mendamî, Gulbexîdi vê hindamê de rûniştî ne. Hemî nifşê çandiniyêdi vê hindamê de têne çandin. Dar, mêşe di van hindama de peyda nabin. Zeviyên wa ji çem, kanî û cihokan têne avdan, çemê Qizilwezan, ji vê hindamê derdikevî. Salyana dewletê 2822 Tûmane. Gundê Hezarkaniyan, ko di vê hindamê de gundê mala Merdoxî ye.

17- GİRİFTO :

Dikevî rajorê Sine, hijde fersexa dûrî bajêre, pazde gundê wê hene, ko hezar û şeşsed mirov tê derûniştî ne. Berî hingî ji Seqez dihate jimartin û ji genim û ceh pêve tiştêkî di li vê hindamê nîne. Di jêrê vê hindamê de keleheke kesnedî heye, ko ji lateke mezin hatiye birîn û bi destê mirova çêbû ye, lê kes nizanî bê kê çêkiriye û di kîjan tarîxê de hatiye çêkirin? Gelek şop û bermayên kevnare tê de têne xuyakirin û hêj kes negihaye dawiya wê. Gelek ode, taq, eywanên mezin û sitûnên kevirî, ko hemû bi desta hatine kolan, tê de peyda dibin. Gornek tê de heye, ko jê re dibêjin, Sarîbaba, bê ronahî kes nikarî pê de dakevî. Çawa, ko ser û hestiyê mirovekî tê de ne û çend roj ji mirov re divên, ko bixwazî lê bigerî, bixwe di binqadê de ye û gelek tiştên hêja û kesnedî li wê hindamê têne dîtin, ko devê mirov ji hev dihêlin. Ayîna jin û mêrekî ji kevir hatine çêkirin, di serê çiyê de ne. bi kurtî hatiye guhaztin.

18- XURXURE :

Bi heşt fersexan dŭrî Sine, dikevî rexê rajor ũ rojava, 38 gundê wê hene, lê berê 90 gund bŭn ũ ji ber zor ũ setema fermanदार ũ xwedîgundan wêran bŭn, yek ji gundên vê hin damê gundê Best e, ko heştê xanî tê de avane, berî çarsed ũ bîst sal hatiye avakirin, bi navê Şêx İbrahim, mirovekî di vî gundî de hatiye veşartin. Xelkê wê hindamê, wê gornê pî roz dikin. Şêx Qadirê Bestî ũ Şêx Hesenê Bestî, kurê wî şê xî ne. Çawa, ko gundê Mewlanabad di vê hindamê de ye ũ dikevî rajorê rojhilatê Sine ũ şazde fersexan dŭrî bajêre , nêzikî pêncî xanî tê de ne.

Herwekŭ ji şêxên wê navê re dibêjin Mewlanaabad, ko melana Keşakeş, kalikê mala Merdoxî li cem wî xwendiyê ũ gum bedek di wî gundî de li ser gorna Şêx Hesen Abadî hatiye avakirin, cihê pîrozkirina xelkê ye. Çawa, ko gorna diya wî jî li ber derê wê gornê ye. Heşt hezar mirov di vê hindamê de ne ũ salyana dewletê 390 Tŭmane. Çemê Xurxure berjor di çî, genim, ceh, birinc, pembŭ, titŭn têne çandin.


19- TÊLKOH :

Yek ji hindamên Erdelane, ko dikevî navbera rojava ũ rajor ũ bi hijde fersexan dŭrî Sine ye. Bîst ũ çar gund ũ çar hezar mirovin. Salyana wan 1506 Tŭmane, qada wê bica - rek avî ye ũ her tiştêŭ, ko têne çandin lê çêdibin.


HOZAN ũ TOREVANÊN ERDELAN

Mîrza Fethilah Xurem, Mîrza Ebdilbaqî Şeyda, Mîrza Elî-ekber Sadiqilmelik Efser, Mîrza Elîismaîl Axa, Mîrza Hebîb Mihemed Selîmxanê Erdelanî, Emhed Begê Komasi, Xanequbadî, Mîrza Mistefa Ciwanrŭdî, Mîrza Ebdilqadir Pawe, Seydî Hewramî, Mistefa Kevejzêrîn, Ferecilah Beg Kol, Şêx Mihemedse lîmê Merdoxî, Şêx Ebdirehmanê Merdoxî, Şêx Mihemed Fexrî-ulema, Şêx Yŭsif Muderis, Xesroxan İftîxarîlwilat, Mîrza Ebdilmecîd Mecdî Melekilkelam.


Hozan ũ torevanên, ko di çaxê Merdoxî de sax bŭn, Mîrza Ebdilmecîd, Mecdilmemalik, Seyid Mihemed Bakir, Riknilis - lak, Mîrza Mihemedxan Cewherî, Amirilkıtab, Salar, Urfî , Fikrî Bedwî, İlkutab.....




Beyazid - Kompleksa Seraya Ishaq Paşa




Diyarbakir - Medrese Mesudiye




Diyar-bekir- Camiye Fatih Paşa



Silvan - Camiye Mezin




Qızıltepe - Camiya Ulu



Qızıltepe - Didemk gîstî jî Camiye Mezâr




Hesen-Keyf - Kumbeta Zeynel




Xelat-Kumbeta Emir Bayındır




Xelat - Kumbeta Erzen Xatunê



Gewaş - Kumbeta Halime Xatunë




Lı ser rêya Keyseri-Aksaray, Koşka Gari Xan



CIGERXWÎN



TARÎXA
KURDISTAN



WEŞANÊN
ROJA NÛ